DİJİTAL KÜTÜPHANE KANALI

# Keyifli Okumalar Dileriz

Binlerce kategoride milyonlarca PDF e-kitap, ders kitapları, dergiler ve romanlara platformumuz üzerinden ücretsiz ulaşabilirsiniz.

RESMİ WEB SİTEMİZ

https://rantey.org

Yedek ve Duyuru Kanallarımız
Sitemize erişim engeli gelmesi veya adres değişikliği durumunda aşağıdaki kanallardan güncel giriş adresine erişebilirsiniz:

• Telegram: https://t.me/birkitapbir

• WhatsApp Kanalımız : https://whatsapp.com/channel/0029VbDHv8uE50Us4IvMoc0Y

# PERIK

Selîm Berekat

WERGERANDIN JI EREBÎ: JAN DOST



AYRINTI

RÊZA PIRTÛKÊN ZER

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Wergerên Kurdî û Tirkî,
Yên Pirtûkên Nivîskarên Kurd
Yên ku ji zimanê xwe hatine nefîkirin
Û dewlemendiya Kurdî veguhastîne zimanên dî
Û ne li axa lê hatine dinyayê
Lê di welatên dî û zimanên dî de navdar bûne:

Pirtûkên Zer

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

SELÎM BEREKAT

Nivîskar û şair Selîm Berekat, yek ji navdarê edebiyata Erebî ya modern e. Berekat di sala 1951ê de li Qamişlo hatiye dinyayê û di sala 1970yê de li Şamê dest bi xwendina beşa Edebiyata Erebî kiriye lê wî tenê salekê ev beş xwendiye. Di navbera salên 1971-1982yê de ew li Beyrûdê maye û li wêderê di gelek rojnameyan de xebitiye.

Berekat yekemîn berhema xwe di sala 1973ê belav kiriye û gava li Beyrûdê maye pênc pirtûkên helbestan, bîranînek û du jî otobiyografî çap kirine.

Nivîskar beriya ku di sala 1999ê koçî Swêdê bike li Qibrîsê demek dirêj maye û li wêderê di rojnameya navdar El-Karmelê ya ku Mehmûd Derwêş derdixist de wek edîtor xebitiye. Selîm Berekatî wek roman, helbest, otobiyografî û pirtûkên zarokan bi dehan berhem nivîsîne û çap kirine.

JAN DOST (جان دۆست)

Romannivîs, helbestvan, wergêr û nivîskarekî kurd e.

Ew di 12'ê adarê sala 1965 an de li bajarê Kobanî hatiye dinyayê. Xwendina xwe heta lîseyê li Kobanî qedandiye. Ji sala 1985 an heta 1988an li zanîngeha Helebê fakulta zanistê beşê Biyolojiyê xwend, lê temam nekir.

Jan Dost di dehsaliya xwe de dest bi nivîsîna helbestên erebî kir paşê ji panzdesalî de qulipî zimanê kurdî.

Jan Dost ji sala 2000î de li Elmanyayê dijî.

Romanên bi kurdî

*Mijabad.* Weşanxaneya Belkî. Roman 2003.

*3 gav û 3 darek. Şeva dawî di jiyana Şêx Seîdê kal de.* roman. 2007. weşanxana Avesta.

*Mîrname.* Roman. çapa yekem 2008. Weşanxana Avesta.

*Martînê Bextewer.* Avesta, Stembol. Gulan, 2012.

Romanên bi erebî

*Eşîq el-Mutercim* عشيق المترجم. Roman, Dubay, 2014.

*Dem Ela El Mizana* دم على المئذنة. Roman, Qahire, Misir. 2014

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# Perik

Selîm Berekat

AYRINTI

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Ayrıntı: 863
Rêza Pirtûkên Zer: 1

Perik
*Selîm Berekat*

Navê Pirtûkê yê Eslî
*El Rish*

Edîtorê Rêzê
*Yavuz Ekinci*

Werger
Jan Dost

Edîtorê Pirtûkê
Ayhan Geverî

Xwendina Dawî
Ronî Hartmann

© Selîm Berekat, 2013

Mafên weşandina wergera vê berhemê
aidê Ayrıntı Yayınları'yê ne.

Wêneyê Bergê
John Foxx / Stocjbyte / Getty Images

Bergsazî
Gökçe Alper

Tîprêzî
Hediye Gümen

Çap û Cild
Kayhan Matbaacılık San. ve Tic. Ltd. Şti
Merkez Efendi Mah. Fazılpaşa Cad. No: 8/2 Topkapı/İst.
Tel.: (0212) 612 31 85 - 576 00 66

Çapa Ewil Stenbol Sibat 2015
1000 Hep

ISBN 978-975-539-971-3
Jimara Sertîfîkayê: 10704

AYRINTI YAYINLARI
Basım Dağıtım San. ve Tic. A.Ş.
Hobyar Mah. Cemal Nadir Sok. No: 3 Cağaloğlu – İstanbul
Tel.: (0212) 512 15 00 Fax: (0212) 512 15 11
www.ayrintiyayinlari.com.tr & info@ayrintiyayinlari.com.tr
Ücretsiz PDF Kitap Arşivi : https://rantey.org

# Perik

## Belgeyên Ku Mem Azad Di Seyrana
## Xwe Ya Kendar Ya Li Wir De Ji Bîr Kiribûn

Selîm Berekat

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# Karekterên Ku Ji Gêjeniya Qederê Re Hilbijartîne:

Kurdistan (welatekî ku Hemdî Azad dikare sînorên wî diyar bike)
Mem kurê Hemdî Azad (ciwanê ku vekirina rastiyê dest pê dike)

Hemdî Azad (cawfiroşek e)
Mela Selîmê Bidlîsî (xwediyê şoreşeke mexdûr e)
Konsulusê Rûsî û jina xwe (mazûvanên Mela Selîm in)
Şêx Seîd (serokê serhildana Kurdan ya yekem e)
Mirovê Mezin (kesek e ku nayê ser sehneya romanê )
Çar mirov (ew Mem digihînin "Mirovê Mezin")
Mirovekî bi destekî mîna baskan (hemsayê Mem)
Husên Mukriyanî (xwediyê yekemîn çapxaneya Kurdî ye)
Sê darên gulan (darkok in, ne zêdetir)
Dareke çilmisî ya bîberê (dareke cefaxur e)
Du balindeyên bi kumik (du balindeyên werzan in hebûna wan dubare dibe)
Goreke ne temam (li meydaneke bi kolanê ve ye)
Ehmed Kelîm (nêçîrvanekî hîç nedaye pey xezalan)
Dîno (cêwiyê Mem e)
Ehmedê Xanî (helbestvanekî Kurd î kevn e. Danerê mesnewiya *Mem û Zîn*ê ye)



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Hêvîn (18 salî) Welat (16 salî) Eyşan (14 salî) Rehîme (12 salî) Rohat (9 salî) Hêlîn (5salî): keçên Hemdî Azad in.

Kesbo (diya Mem e, jina Hemdî Azad e)

Qadî Mihemmed (serokê yekemîn komara Kurdan e)

Mehabad (bajarek e navê xwe da yekemîn komara Kurdî sala 1946an).

Ismaîl Axa Simko (mirovekî hewalên wî rûtirş in)

"Xwediya sola leşkerî" (keçek e bi navekî guhlênebûyî)

Şêro Baban (kesekî bêşens e, xwediyê patozan e)

Qadir Hemo (wêneyê Simko Axa di berîka wî de ye)

Comerd (xwarziyê Kesbo ye)

Cebbûr Murqus (cîranekî malbata Hemdî ye, suryan e)

Behramgûr (mîrekî efsaneyan e)

Radyoyeke nû (gelek pêlên wê hene)

Du darên Okalîptusê (qet ji darên din ên Okalîptusê ne cuda ne)

Hinek caw. Textinî mezin ên xewê. Hespekî reş. Patoz. Çeqel. Çemek. Nexweşxaneyek. Werz. Ezman. Ba. Serencam. Baran û hinek pirrbêjî.


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Beşa Yekem

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# Para Yekem

Plankirineke nelihevhatî ji demê re berî xwekujiya Mem.
Hûrgiliyên hema wisa diyarkirî, ku bê palpişt in.

Dema ku min hemû kincên xwe ji çenteyê çermîn derxistin, ji nişkêve, di kûraniya wî ya tarî de perikeke rengcûnikî diyar bû, ew li dora xwe zivirî, paşê çep û rast hejiya û hate xwarê heta ku di binê zivir yê çente de rawestiya. Ewê ku ew çente çêkiribû hîç nefikirî bû ku ezê wisa bi çavekî lêkolîner li binaniya wî binêrim, ku tayên stûr belawela dibin û difilitin, ew hema bi kişandina destan re ne bi cawbirê difilitin.

Min destê xwe dirêj kir, ew perik rakir û derxiste derveyî çente, ew êdî di ronahiyê de nema rengcûnikî bû. Ez di ser û binê wê de ramiyam. Rengê wê rengekî têkel ji cûn û spî bû. Pir piçûk û tîştîşî bû ew. Ez hatim ku wê bavêjim aliyekî lê ez rawestiyam. Min ew ji nav herdu tiliyên xwe berda û ew careke din dawerivî binê çente.

Min ji xwe nepirsî bê ka kê ew avêtiye nav kincên min, lê min ji xwe re pêşî bi ecêbmayîn li hejîna wê di tariya çente de temaşe kir, û ez di wî rengê ku nezelal bû lê paşê di ronahiyê de eşkere bû de ramiyam, loma jî min ew careke din avête tarîtiya ku di kel û kortên binê çente de ramediyayîbû, wî biniyê ku ji tayên berz î diyar ku bi hev ve şidiyayî bûn, hatibû çinîn.



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Ma ezê çima derbarî perikeke tenha de pirsê ji xwe bikim? Gelo ez li delîlekî digerim ku isbat dike ku rastî skandalek e û hin kes hene şareza ne ku ewê mîna pirtikên nan bavêjin xefkên kesên din? Tenê perikek. Perikek mîna xwekujiya min a iddiakirî. Ma mirov du caran xwe dikuje? Du caran hewl dide, erê, lê du caran xwe nakuje. Eger hewl bide dibe ku bifilite lê eger ku xwe bikuje mir û çû. Mir yanî mir. Ji xeberê re tu wateyeke din nîne. Min jî, berî ku ez wî çenteyê perika rengcûnikî di tariya wî de xuya bibe vekim, biryara xwekujiyê dabû.

Ez kêlîkekê di hin mijarên felsefîk de ramiyam, ku dişibihîn şemsiya min a ku ji ber baranê şilbûbû û min ew loma sipartibû quncikekî li pişt derî. Min ji xwe re got -bi xwe rewş ne bi hewceyî qerwelkên ji wî rengî bû- "Mirov bi xoyê xwe şerxwaz ji dayika xwe dibe û hemî temenê xwe di isbatkirina ku ew ne şerxwaz e de dibuhurîne." Mebesta min, ji dil, ku rewş ne hêjayî pirrbêjiyên ji wî rengî bû, madam ku ew kesê ku ez im, berî daye xwekujiyê.

Xwekujî jî, bêyî ku mirov wê xweşik bike, tiştekî kenê mirovan tîne heta radeya ku giyan ji kêfê rizgar bike. Ez dixwazim bibêjim ku em xwe dikujin dema ku em ji kêfa zêde a ku xwe dide ser giyanan bêzar dibin. Mesele jî, bi hêsankirinek hindik, dişibihe rewşa wî kesê ku dikene heta ku dilê wî diteqe.

Wisa, piçek xerabûna di miqdarên guhlêbûyî yên jiyanê de: ku tu dikenî tu diteqî. Tu hêrs dibî diteqî. Tu dixwî diteqî. Tu birçî dibî diteqî. Tu dikevî xew diteqî. Xew li te diherime tu diteqî. Tu hez dikî diteqî. Tarî dibe tu diteqî. Ronî dibe tu diteqî. Tu hukum dikî diteqî. Dibî kole diteqî. Nefesê distînî diteqî. Bîna te diçike tu diteqî.

Wisa. Piçeke xerabûna di miqdaran de mîna ku di pijandinê de. Erê jiyan pijandin e. Loma jî min wê rojê bi nihêrandina ji pencereya metbexê re li rêjnebaranê biryar da ku xwe bikujim. Min di pehnava pişt malê de cotek balindeyên werzan ên bi


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

kumik dîtin. Min şemsiya xwe rakir û di deriyê wê metbexê bi xwe re derketim û berê xwe da wî cihê ku herdu balinde nêzîkî hev veniştibûn, ewan xwe di bin baranê de komî hev kiribûn û êdî stûyên wan nema xuyabûn. Ku ez nêzîk bûm ew firiyan. Ez tênegihîştim bê ka çima firiyan. Ez jî mîna wan tev şemsiya xwe di bin baranê de bûm û min xwest ku ez wan jî mîna xwe biparêzim. Ez nizanim ka gelo ezê di wê pehnava pişt malê de rûnim yan jî ezê wisa rawestim heta ku baran bisekine. Tiştê ku ez ji dil dizanim, ew e ku min dixwest herdu balindeyan biparêzim lê ew firiyan.

"Balinde ji min fêm nakin." Min di kûraniya xwe de bi baweriyeke tehl wisa biryar da û ji berê xemgîntir vegeriyame hundirê malê û vê yekê hişt ku ez di xwekujiyê de bêtir bi israr bim. Ez ne bi hacetî sebebin zêdetir im, lê her zêdebûnek di hesaban de dirêjkirinê tarûmar dike: "De bila ez niha bimirim."

Lê ez dixwazim, ji xwe, beyan bikim ku di biryara min de hin kêmanî hene, ew kêmanî girêdayî sebebin din in ku tev li yên bingehîn dibin ku min -bê erê û na lê bi bêzariyeke mezin- xwe sipartiye wan da ku giyanê xwe teqawîd bikim. Wesweseya tiştên zêde heye. Ev lixwemukurhatina min e: wesweseya tiştên zêde heye. Her hûrgiliyek, çiqasî piçûk be, bi dilxurtiya tê de û bi hêza xwe ya iqnakirinê te mat dihêle, eynî mîna çîroka min û herdu balindeyên werzan yên ku firiyan. Ewê çawa ba gelo eger ew jî mîna min wisa fikirîbana: "Hemî dê bimirin. Êdî çi ferq e ku sal pirr bin yan hindik?" lê pirsa xav î ku dihişt ez biramim ev bû: "çima te xwe kuşt?" yanî ku kesek ji min bipirse: "te çima xwe kuşt?" Ew pirs bi çi awayî be ne di cihê xwe de ye, çiku tu kes dê piştî ku ez xwe bikujim, pirsa merivên xwe ji min neke. Lê ez nikarim ji vê ihtimalê derbas bibim, yanî ji ihtimala ku kesek ji min bipirse: "te çima xwe kuşt?"

"Min xwe kuşt." Dibe ku divê ez wisa bi zirzî û dilxurtî bersivê bidim: "Min xwe kuşt. Hema wisa. Min xwe kuşt."


Ücretsiz PDF Kitap Arşivi - https://rantey.org

"Nexwe, xwekujiya min hûrgiliyek e." Ez vê ji xwe re dibêjim. Û ji hûrgiliyan, mesela, ez bi qasî saetekê her sibeh xwe dişom, ta radeyekê ku ez nizanim sibeh çiye eger ne av û kefa sabûnê be, lê li ba dostên min ew delîl, anku sibeh, xwediyê wateyin din e. Ew hembalekî alavan î ku ji cûreyekî em nas nakin e di nav hembalên bajarên me de. Sibeh -li gor iddiaya wan- sifrxwarinek çêjdar e. Taştêyek bi tam e. Kûrramandinek malbatî ye. Deyneke ku mirov bêyî xwe bêzar bikin û dilteng bibin didin rojê. Û ez jî vê yekê nizanim. Ez çavgirtî radibim û diçim serşokê. Saetekê xwe dişom. Ne saetekê temam, lê bi qasî ku divê ez xwe bişom, paşê ez lê hay dibim ku divê ez bi lez ji mal derkevim.

Hûrgiliyekî bêzarker e lê xwegirtiye, ku ji hindir de kûr têde difikirî çiku tu êsîrê wî yî. Lê tiştê ku şokê bêtir peyda dike di nav wan hûrgiliyan de hebûna min a li vir e. Yanî hebûna min a li vê mala fireh a ku baxçeyekî piçûk li bakurê wî dikeve, û erdek ji giyayê ku tirîdarek wî dixemilîne, û hin darên hejîran, zeytûnan, û xoxan li rojhilatê wî dikevin, li başûrê wî jî erdekî beyar e ku du metreyan piştî darên leymûnan ên nêzîkî hefşiyê terasa oda nizm a razanê dest pê dike. Rêçikek ku têra buhurîna erebeyekê dike vê malê ji avahiya rojava dibirre, di wê rêçikê de pûng şîn hatine, laleyên ku dom nakin jî şîn hatine. Û ez jî, dema ku dibêjim "Dom nakin" di peyva min de delîlê ku ez li wî cihî gelekî mame heye heta ku serinc û têbîniyek weha bi min re derdikeve. Lê ez dubare vedigerim hûrgiliya şokdar ku ew jî pirsa min a derbarî hebûna min ali vir e! Ez hez nakim ku bi bîranînên xwe vegerim û çîrokê xelek bi xelek werbigirim. Hişê min tenbel e. Ez tenbel im. Bêrîkirina min tenbel e. Ji ber vê yekê jî xwesteka min a xwekuştinê jî tenbel mabû.

Dema ku min îro cilên xwe ji çenteyê çermîn derxistin, min ew piştî ku bi salan di tariyê de mabûn derxistin, min bi rastî biryar dabû ku ez wan li ser nivînên xwe rêz bikim ji bo ku ew ji wan kesên ku dê termê min piştî xwekuştina min ji malê


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

derînin re diyar bin. Lê ev perik ne di bala min de bû, mebesta min ew perika rengcûnikî a ku ji binaniya tarî ya çente hilpekiya.

Min ji bîr kir ku behsa meydana cirîdê ya li rojhilatê malê dikeve jî bikim, ewa ku ez dikarim wê ji baxçeyê pêşmalê de û ji wê erda beyar î li pişt malê de jî bibînim. Min ji bîr kir behsa wê ronahiya purteqalî jî bikim, ew ronahiya ku baxçe ronî dike ji wê stûna lempeyê de ku li şûna çiraya kêmşewq a berê ku kelm êş û pêşî bi qudreta xwedê har dikirin danî bûn. Min hemsayê xwe yê pîr ji bîr kir, ewê ku her û her li baxçeyê mirî ê mala xwe ya li bakur- rojhilatê kolanê rûniştîbû, çawa min ji xwe re behsa ihtimala mirina wî kir ew mir û ez jî xemgîn dibûm dema min didît jina wî eynî wê rûniştinê piştî mirina wî rûdinê. Lê jinik nemir, ji ber ku min -ji tirsa ku ew bimire- di dilê xwe de behsa ihtimala mirineke wê ya nêzîk nekir. Kêfa min ji dilbijandina wê ya tiştên cemidî re dihat. Çawa ku erebeya ku pîreke din ew diajot derbas dibû û di mikrofoneke zengarî de bi dengekî qetoqeto bang dikir, pîra jinebî bi gopalê xwe derdiket, paşê bi kovikek tijî dondirmeya rengîn di destê xwe de vedigeriya.

Ma gelo min tiştekî din ji bîr kiriye? Ezê bi her halî her tiştekî di dema xwe de bînim bîra xwe, ezê bi xwe vegerim wê tercîha xwe ya tenbel û bêzarker: yanî ezê xwe bikujim. Lê vê perika ehmeq bi rastî ez hêrs kirim: ew li vir çi dike? Min balîf di çenteyê xwe nehilanî bûn. Ev çente ji salan e ku li mala me bû, min ev cilên xwe têde bi cih kiribûn û paşê min ew nema vekiribû. Hin cilên min ên din jî ku min her carê dikirîn hebûn û min qet çente venedikir. Ez bi biryar bûm ku wî hîç venekim çiku ezê -dema dev ji vî cihî berdim- ezê tenê çenteyê xwe bi xwe re rakim û her tiştên din li pê xwe bihêlim. Ez nabêjim ku bêrîkirinekê ez dikişandim aliyekî bi xwe, da ku ez qîzaniya çente[1] ji bo wê biparêzim, mîna pêşkêşeke sivik ji kesekî winda,

1. Di Erebî de peyva çente mê ye. (J. Dost)


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

lê min ew bi tenbeliyeke bi hezkirinek bêhiş re têkel parast, hezkirina hebûna razekî da ku ez ne wisa eşkere bim bi vî awayê hetikî: bê bêrîkirin, bê lîstik û bê çîrok jî. Û va ye ez, bi jîrbûnek ku min berê di xwe de nedîtibû, çente vedikim mîna pêşkêşek comerd ji mirinê re wek hevbeşekî nû.

Ezê bimirim. Yanî ezê biryara mirinê bidim û heyfê ji mirina ji nişkêve hilînim. Mesele bi giştî çend kêlîkên ku hişyariyê ji wê jihişçûna dilovan cuda dike ye. Çavgirtinek e ew. Hişkhenasek e. Şikestinek piçûk e ku jiyanê heta vê radeyê dest ji te berda an jî ew kêmtir e ji wê yekê ku dest ji wê kêlîkê berde, wê kêlîka ku tu têde ji xwe re sînorekî dixwazî ku rê li ber likumîna ruhê te li baweriyeke kêm bigire.

Tu dê zêde di tiştê ku dê bi te re biqewime piştî wê kêlîka birûskî him jî giran de, nefikirî. Çiku dê her tişt bi pîvanekê ji pîvanan hesibandî be, çi nazik çi zirz. Tu di tiştê ku dê biqewime de nefikirî, çiku besî te ye ku te ew hetîketiya ku tu bi dînbûn ajotî mukemmeliya xwe, anku: mirin, derbas kir. Û ezê bimirim. Yanî min biryar daye ku tevliheviyekê di lîstikê de peyda bikim, her xwekujiyek tevliheviyek di lîstikê de ye.

Lê hebûna min a di vê malê de tevliheviyekê di kûraniyên min ên ku bi cesareta xwe ya xwekujiyê bawer in de peyda dike. Ez jî serhişk û har im. Xemgîn nabim lê ji êşê re teslîm dibim mîna ku ew taybetmendiyek be û dihêle ku ez baş xwe bigrim. Ez tevlihev jî nabim. Xoyekî min heye cangiraniya kesên din û jîrbûna wan sivik dike, giraniya rewşên ku min ne dipa jî sivik dike. Leza vî xoyê min î ku tevliheviyê dûrî min dike, ew e hêrsa xeşimgîn, û wisa ez nakokiyan dibirrim.

Û va ye ez ji nişkêve li vir im, li vê malê me, û divê ez bi awayekî mentiqî bifikirim di çawatiya hebûna xwe ya li vir de bêyî ku ez hêrs bibim, çiku ez ne di pêşberiya kesekî de me, ne jî di rewşekê de me ku ji bo derbaskirina wê divê mirov cesûr be da ku kiryareke bi qerebalix bike. Ez di malekê de me ku berê nehatimê û divê ez cihê wê, sînorên wê û tarîxa wê


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

destnîşan bikim berî ku dest bi xwekujiyê bikim, xwesteka xurt a xwekujiyê jî hîn xurttir bû dema min dît ku hebûna min a li vir û vekirina çenteyê xwe ku ji biniya wî perikeke piçûk î rengcûnikî bilind bû, hîç û vala ye.

Ew e perika ku di navbera min û xwekujiyê de rawestiyaye. Perika ku wisa bi delalî dadiwerivî binê çenteyê min eynî wekî çawa ku ez derbasî ofîsa emlakan û kirêkirina malan bûm û jineke ku di axaftinê de xebîstiyeke bêşarezayî dikir, ev mal nîşanî min kir.

Min jê hez kir. Min ji vê malê bi çavpêketina yekem re hez kir. Loma jî ez dibînim ku hebûna min a li vir plankirî bû û qet ne ji nişkê ve bû mîna ku min berê iddia kiriye. Bi delîlê ku bexçeyê pişt malê bexçeyekî ku min ew ji bîr kiribû anî bîra min, çola li aliyê başûr dirêjbûyî jî çoleke ku min hîn ji bîr nekiriye anî bîra min, ji min ve weha xuyabû ku tîrêjên rojê ên ku ji nav darên leymûnan re derbasî odeya xewê dibin ew in eynî wan tîrêjên ku ez sibehan, sibehên demekê ku salên wê naşibihin salên vê demê, ji xew radikirim. Ez jî bi her halî ne ji wan kesan im ku beranberiyekê di nav salên vir û wir de li dar bixim, çiku ez kesekî xwedan bêrîkirineke tenbel im û berê min li xwekujiyê ye û hîç tiştek di bala min de balê nakişîne bêtir ji wê perika ku di binê çente de xuyabûbû.

Ez nizanim çawa biryara min a xwekujiyê ez veguhestim mirovekî weha vala, gelekî aram, bêdaxwaz û di gel wê jî hate bala min ku ez cilên xwe li ser textê xewê raxînim da ku ji wan kesên ku dê termê min rakin ve xuya bin. Min dît ku, bêyî ez bifikirim çima, divê ez wan herdu balindeyên werzan bi şemsiya xwe biparêzim lê ewan hêviya min têk birin. Hema vê perika ku dîsa di binê çente de bi cih bû destê xwe da ser hizra min û ew hişyar kir û hişt ku ew di kiryara pêwist de bifikire.

Û min pişt re destê xwe dîsa dirêjî binê çente kir û li wê perikê peland lê min ji ber ku ew zêde piçûk bû nedît. Ez


Ücretsiz PDF Kitap Arşivi - https://rantey.org

rabûm min çente bire ber şewqa baxçeyê pişt malê û li hindirê wê baş venêrî û ew bi vî alî û wî alî de xwar kir, çavê min bi perikê ketin ku hîn her wekî min ew nas kiribû bû: rengcûnikî. Min ew bi du tiliyên xwe derxist û bi xemgînî lê temaşe kir.

Ez bi şikestinekê hesiyam. Ev cara yekem e ku ez bi tiştekî weha dihisim. Ez serhişk im û her hêrs dibim. Min awirên xwe ji perikê rakirin û li darên leymûnan, ên ku li pişt odeya razanê bilind bûbûn, nihêrî, mîna ku ezê hoyê şikestina xwe ji wir nas bikim, di nav şaxên lihevgeriyayî de ku pelên wan bêhiş in li destpêka vê buhara ku hîn xwe nedaye nasîn, û laşê min lerizî.

Min di nav wan şaxan de tiştek nedît, lê min likumîna balindeyekî li pelan bihîst -yan jî min wisa xeyal kir- mîna ku ew balinde dixwaze venişe lê ji terazûyê dikeve. Paşê perikeke tekane, mîna ya ku di destê min de bû, daket û ji şaxekî dawerivî yekî din heta ku li ser erda şil a li bin daran ku kulîlkên kinik î qewanê û hin giyayê stirîdar şînhatibûn, bi cih bû.

Min xwe daqûl kir û bi pêş de hatim da ku ji jêr de li şaxên bilind binêrim lê min tu balindeyek nedît. Lê per li wir bû, çend sentîmetreyan dûrî sola min a spî û neboyaxkirî bû, min rahiştê û bi eynî daqûlbûnê vegeriyam da ku xwe ji şaxên nizmik biparêzim û hatim cihê ku min çente lê hiştibû. Min ji xweber herdu perik dane ber hev, herdu bi qasî hev bûn û rengê wan jî yek bû.

Şikestina min zêde bû û hişt ku hêsir bi çavên min bikevin lê min bi israr rê li ber wan û girî girt, çiku ez hogirî girî nebûme û tenê min tiştên li dora xwe parçe kirin yan jî min xwe parçe kir. Vêca çi hatibû min wê gavê? Gelo ma li cihekî karesatek diqewime û ez nikarim rê li ber bigrim? Li deverekê hey karesatek diqewime û destûra min jî tune ku ez her gavê tiştekî weha bînim bîra xwe. Ew hikmeta hebûnê ye ku nahêle her tişt di eynî cihekî de bi yek derbê re biqewimin, lê ew wan qenc belav dike û dilên jar her jar dihêle û yên xurt her xurt dihêle.


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Û va ye ez xurt im lê hinekî şikestî me, ev jî ji yekî re ku berê wî li xwekujiyê be nabe. Eger tu bi şikestinekê hisiyayî ev tê wê wateyê ku tu li ber xwe dikevî, anku tu xwe efû nakî li ser kiryareke bi qerebalix mîna xwekujiyê. Û hey tu wê bi derengî dixî û çav li rê yî ku tu ji hemû hestan vala bibî da ku tu bigrî ser azadiya xwe. Wê gavê dê çîrok bibe gêjeneke ji teqdîr û hesaban û dê azadiya te li wir nêzîkî te be û tuyê newêribî xwe bidî ser çiku tu êsîrê wê yî.

Û ezê ku min biryar daye ku dê venegerim êsîrtiya azadiya xwe û dê xwe bigihînim devera ku divê ez lê bim, hinekî şikestî me niha bêyî ku çavên min ji herdu perikan werin birrîn. Dema ku ji nişkêve jî bayekî şil rabû û ewrên arîrengî yên lezok xwehên xwe yên spî dane ber gezan, min çenteyê xwe yê çermîn û vala rakir û ez derbasî hindir bûm piştî ku min herdu perik avêtin biniya çenteyê ku mîna devê marmarokê vekiriye.

Min deriyê metbexê li pê xwe kilîtkir, qerebalixek ji baxçeyê li pêş deriyê malê dihat. Min, di gel ku ew diyar bû jî, guh neda xirecirê. Ez di şikestina xwe de noq bûbûm, di xwe de jî ku valahiyeke spî heye û ezê xwe bavêjimê, lê dema ku min çente li erdê danî, di wê korîdora di navbera odeya razanê û salonê de, dengê xirecira li derve zelaltir kete guhên min, ez ber bi pencereya ku li aliyê baxçe dikeve çûm û min ji pişt perdeya tenik re nihêrî, min jin û mêrekî bi paltoyên stûr dîtin ku buxçikîn girêdayî û tûrikan û alavên bi çerman pêçayî dibin wê mala xalî a li bakurî baxçeyê pêş mala ez tê de, ew maleke ji çend salan ve bi kirê didan, min bala xwe nedabû kirêdarên berê. Ew malbatek bûn bi gumana min. Demên nîvro ku vedigeriyam malê min şopa wan nedidît, ne jî dema ku ez sibehan derdiketim, lê min gelek caran dengê xirecirê ji ba wan dikir, dengê mêrekî û çend jinan tev li hev dibû.

Min bala xwe da wan herduyên dihatin -ez nikarim teqez bibêjim ka ew xweh û bira yan jin û mêr bûn- ku wan piştî


Ücretsiz PDF Kitap Arşivi - https://rantey.org

pistepistekê hûremûr parçe bi parçe dibirin. Diyar bû ku erebeya ew gihandibûn, alavên wan hema çawa lê rast hatibe avêtibûn ser asfalt û rexê kolanê yê ji qûmê.

Min dît ku ew cirxweş in. Na. Tevgera wan bixwebawer bû heta dema ku diaxivîn jî bala min kişand, mîna ku ew bi zendên xwe qonaxin dipîvin ku di navbera wan û dîmenekî ku ew bi pistepista xwe dirêsin de bûn. Û herdu palto?! Çima ew paltoyan li xwe dikin û buhara ku hîn xwe nedaye der, di xefka qewanên nûbişkivî de eliqiye? Jinik kin e û birhên wê qalind in, ev têbîniya min bû. Di awirên wê de fedî hebû. Hinekî ne aram bû yan jî ketibû hev. Mêrik zirav û ji wê dirêjtir bû. Lêva wî ya jêr a daliqiyayî sext û dijwar bû. Çavên wî şikestî ne, li wê dinêre û nanêre. Dibe ku ew li wir bû ji ber ku ew alav bi haceta zend û bazên mêrekî bûn ku wan hilgirin.

Ez ji ber pencereyê vegeriyam hindir û di cilên xwe yên li ser text avêtî de ramiyam, parçeyek li rex yê din bû û li hêviya destên ku dê wan piştî xwekujiya min bidin hev bûn, ewan hema hema lêborîn ji min dixwestin. Erê, mirî lêborîna zindiya dixwazin, dema ku zindî şopên wan di malan de vedişêrin. Ew bi her halî lêborîneke nebihîstî ye ku kesên ji lêborînxwestinê westiyayî pêşkêşî kesên ne bi hewceyî lêborînan dikin. Lê dengê wan destan tê min ku dê van cilan bi pêçiyên nerm û stûr bi hev re berhev bikin û bi nazdarî bipêçin ji tirsa ku şiyar bikin wî laşê çilmisî yê ku karmendên mirinê ew birine mirîxaneya bajêr yan jî xemxurên tenêtiya wî ew di baxçe de binax kirine.

Ez nizanim çima tê bala min ku ez di baxçeyê pişt malê de werim binaxkirin, yan jî du metreyan dûrtir ku erdekî beyar e. Eger ez li wir bama, îroj, di bin wî qaşilê qûmê de yê ku herdu balindeyên bi kumik lê veniştibûn, min ê ji jêr de nikilên wan bidîta bê çawa bi ahengeke plankirî radibin û dadikevin, û min dê kariba şopên pencên wan bijimarta di wê tariya ku min gav bi gav bi rehên kulîlkên bejî û hindibaya li jora min a pelzivir, didiqdiqîne.


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Lê ez li wir ne binaxkirî me. Dema ku ez li cilên xwe yên li ser nivînan dinêrim wêneyê wan herdu kesên ku deriyê mala li rex min li pey xwe girtin û min dengê wî bihîst, xwe li min dide: qapûtên wan gelekî dirêj bûn, heta kabên solên wan dihatin, ji qehweyiyekî rengçûyî bûn, yaxeyên wan heta ber guhan çûbûn, mîna ku jin ji mêr û mêr ji jinê xwe vedişêre. Jinê serbendeke pehn li serê xwe gerandibû, bêyî ku desmalek porê wê yê li du rexan hûnayî veşêre, mêr jî serqot bû, por gijikî bû mîna ku bi rojan li ser kursiyê otobusekê di xew de mabe. Lê ewî hîç destê xwe yê rastê ji berîka xwe dernexist. Ewî alav bi destê çepê radikirin, bi destê çepê li gel jinikê xeber dida û qonaxeke nenas di axaftina xwe de bi destê çepê dipîva.

Ez zêde di wan de neramiyam, çiku min careke din ji xwe pirsî ka çi faydeya rêzkirina min a hema wa ji cilê min î li ser nivînan re heye. Min ew bêyî ku li bersivan bigerim, berhev kirin ji ber ku divabû ez wan bicivînim. Hûrgiliyên ku min dikişkişînin ber bi xwepêvegirêdana dînane ya bi xwe ve di hafizeya yên din de, kor in û naramiyê peyda dikin. Tiştê ku berê min lê ye jî hîç ne bi armanca ku hebûna min di kesên din de xurt bike, mîna ku tawîzek be ji nekarîna jiyanê re ku ez bibim endamekî wê. Û madam ez biryar didim ku bi rêya xwekuştinê xwe tune bikim, çima êdî li beşdariyeke jiyanê di rêya van cilên xwe re digerim? Of!

Min cilên xwe avêtin binê çenteyê ku her û her mîna jibîrbûnekê vekirî ye û ew bi lingê xwe dehfande quncikekî û dîsa vegeriyame metbexê, paşê jî derketim baxçeyê piştmalê ku bayê wî şil bû û ewran bêtir mahdê xwe tirş dikirin eynî mîna berî du saetan yan kêmtir dema ku kûraniyên xwe yên şil bi ser herdu balindeyan de weşandin, ew herdu yên... ax ji wan balindeyan re! Min li wê zeviya beyar a ku li pişt baxçe ramediyayî ye nihêrî û ramiyam mîna ku ezê wan yan xeyalên wan dîsa li wir bibînim, lê vê carê bêyî ku şemsiyê hilgirim da ku wan ji baraneke ku hindik maye bibare biparêzim.


Ücretsiz PDF Kitap Arşivi - https://rantey.org

Wê bifirin. Wê ew herdu ehmeq bifirin ku ez nêzîkî wan bibim. Wê pêşiyê venin. Kumikên wan dê bilind bibin û ewê tevgera bayê bipên, weke ku semtan nîşanî bayê dikin û li gel daxwaza baskan û firandineke ciwantir, hempeyman bin, û dê bifirin.

Dema ku ez derbasî vî bajarî bûm, ez nefikirîbûm ku dê wisa şikestî li ber du balindeyan rawestim. Ji berî bêtirî şeş salan ve ez nefikirîbûm ku weha, yan jî bi awayekî din, li pêşiya çoleke hetikî bisekinim ku buldozerek di havînan de bi temamî wê cot dike û her giyayê ku têde şîn tê hildikişîne: serxesan, qewanan, zîwanê, stiriyan, peqleyên bejî, hindiba, û şeytanokên (salyangoz) ku qalikên xwe yên vala û şîrêzhişk bi ser her derê de weşandine.

Ji wê çola li pişt bexçeyê piştmalê re tu nasname ji bilî wan helezonan nebû. Wan dîwar û giya hemî demsalan didane ber xwe heta ku hindik mabû bikevin nav nivînan jî. Lê giyayên wê çolê yên şermokî, ji cureyekî heta cûreyekî din û ji demsalekê heta yeka din desthilatdariya xwe diguherî; mesela dibû ku qewan bêtir serdest be, yan jî hindiba (ku herdu jî bi her halî cazibtir in). Dibe ku sinbilên vala jî -ku ne yên genim in û ne jî yên cehî ne- bi tena xwe li wê çolê monopolist bin, yan jî dikare xecxecok bin, tirşok bin, zimanê ga bin (ez nizanim ew ji ku tên), sîrên çolê bin û hinek giyayên tevlihev bin ku divê mirov ji nêzîk de li wan hûr bibe.

Ew çoleke bi dilêriya azadiya xwe ve hetikî bû û ez jî dixwazim ku ew di koletiya xwe de azad be. Dema ku dibêjim "Ez" qesda min ez im ku ji bendewariyeke giran hatime ristin li paytexta vê girava Yûnanîaxêv, ku ez ji zimanê wê, piştî şeş sal jiyana li wê, tenê çend peyvan dizanim ku kenê mirov tînin.

Ez mirovê bendewariyê me, dilxurt im mîna pûçiyê (absurdê), yan na ka ezê çawa ji xwe re yan jî ji kesekî din re rave bikim kirrîna van xefkên biçûk? Kî xefkan li bajarekî


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

dikirre ku paytext e û tijî avahiyên bilind û otomobîl û motor û biskilêt û meydana cirîda hespan û hêzên Neteweyên Yekbûyî ye, ku ji ser çeperên wan ên mîna lepikan nermik re sixêf û dijûn xwe çeng dikin, sixêf û dijûnên wan kesên ku ew girav parçe kirine û çend metreyan dûrî wan çeperan in û di kozikên xwe yên li himber hev de ne.

Giraveke parçekirî ye mîna tiqetiqa kenekî, û ez jî li wir xefkên çivîkan dikirrim, piştî min nas kir ku segvanî bi hewceyî destûrdayineke mîna iqameta ku ewan kesên ez vexwendime hevdîtina Mirovê Mezin ji min re peyda kiribûn, bi mesref e. Ha va ye ez jî piştî wê bêzariya xwe a mezin heta ji nêçîra bi van xefkan jî, hewl didim ku van herdu teyrikên werzan biparêzim.

Çima ew ecele ne gelo? Ez di şeş salan de ne ecele bûm. Min cilên xwe şeş salan di xew de di wî çenteyî bi xwe de hiştin. Ez roj bi roj di xwe de diramiyam û dişemitîm munaqeşeyên bêtir bi hikmet di wê bêdengiya ku li dora min bû. Zimanê min bû ewê ku mezin dibû, mîna ku ez hestiyên xwe li ber demê bi ewqas e rewanbêjiya ku li bal min heye û pê behaneyan ji bêhêvîbûna cadûker re dibînim, dihetikînim û xwe vedidizim û dikevim valahiya temenmeziniyê.

Ez bêtir biçûk dibim û axaftin mezin dibe. Tenê ziman di bêdengiyê de geş dibe. Sal geş dibin, û bawerî baweşînkeke di destê koleyekî de. Û ez jî ji ber ku azad im, mîna dîlekî, bêhêvîbûna min jî zêde dibe, weke ku bêhêvîbûn hikmetê temam dike, ez bi xwe jî dibim çavdêrê bendewariya xwe, mîna hakemê ku çavdêriya lîstikekê dike.

“Çima ez fêrî Yûnanî dibim?”, min çendbare ev pirs ji xwe kir, ez ne bi hewceyî gotûbêjan im, lê ez bi hewceyî çend peyvan im ku pê destnîşanî keskayî û meyweyan bikim. Gotûbêj meseleyeke din e. Mukemmeliya gotûbêjê di bêdengiyê de ye, ne di axaftinê de. Bi her halî gelek tişt nebûn ku ji kesên din re werin gotin. Besî te ye ku tu destê xwe dirêjî çiyê bikî da ku cîranê te bizanibe ku te roja xwe li nav kajedarên bilind derbas kiriye, yan jî


Ücretsiz PDF Kitap Arşivi - https://rantey.org

destnîşanî deryayê bike ku ew bizanibe te li xwaringehekê masî xwariye. Lê ew kesên ku hemzimanên te ne, bi zimanê te hîç napeyivin. Ew dengvedana dengên xwe ne. Eynî serpêhatiyê bi eynî vegotinê dibêjin heta ku axaftin diweste. Ji ber monotoniya rojên xwe bi kûranî çêja ku ji beharatan e werdigrin, şirove dikin heta radeya ku tu herdu qulên pozê xwe, ne guhên xwe, vedikî da ku tu peyvên wan bêhn bikî.

Zor bû ku ez ringîniya zimanekî din fêr bibim di halê ku ez hêdî hêdî dadiwerivîm valahiya kilîtkirî ya zimanê xwe bi xwe di nava bendewariyekê de ku tu ne bi hewceyî kesekî ji bilî yekî nediyar î ku tiliya xwe li milê te bide û bêdeng işaret bike ku tu bidî pey wî, û tu jî didî pey wî. Zor bû ku ez bêdengiya kesê biyanî yê ji zanînê tijî bişikînim. Min li zimanê Yûnanî dinêrî, mîna li her zimanekî din, weke ku peymanek be di navbera du kesên axafger de ku hinek lêgerîn divê daku mirov bigihê pişt tenêtiyê. Lê ez ne bi tenê bûm, hema ez bi hacetî ku taybetmendiya şênbûnê bi xwe bi kar bînim, bi hacetî bikaranîna her tiştî bûm ku bihêle ez şên bim, ew jî taybetmendiyek bû min ji ber karîna xwe ya bihîstina axaftinên rojane ên ku peyv bi peyv dubare dibûn, nas kir. Yan na ez çawa dikarim xwenekuştina heta niha rave bikim?

Lê ezê îro xwe bikujim. Ezê xwe bikujim. Wan herdu teyrikên ehmeq ez mat û qeherî hiştime. Ma divabû ku bifiriyana? Ma ez ne beşek bûm ji tevgera wê çola li pişt baxçe? Ez bayê wê çola li pişt baxçe me, ez wê çavgirtî yan jî çavvekirî hemêz dikim. Ez dikevim pêşiya pêla bayê ku hîn negihiştiye, ji kemîngeha mala min a vekirî heta giyayê dawî ê ku zer xuya dike li ber hevşiyên meydana cirîda hespan. Tevgera hindibayê û tevgera ku laşê min pê nêzîkî herdu teyran dibe, herdu jî viyan û iradeya yek bayî ne, de ka çima ew firiyan?

Dibe ku hatibe bala wan ew di ser nuqteyên kontrolê yên NY re ku li herdu parçeyên giravê ne, bibuhurin. Dibe ku ew teyrên bi wezîfeya peydakirina hîleyekê radibin ku pê bayê


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

bikin yek. Lê herduyan jî dilezandin mîna otombîlên NY yên mîna qedereke ne ku xwe diavêjin misyonên cûrbecûr, ew otomobîlên spî ku wêneyê darbesteke girover di şêweyê goga erdê de li ser e û li peyadeyan diqelibin, li baxçeyan, dîwaran, li çivîkan û kenarên rêyan û sîsirkên havînê, û li çirçirkan û giyanên aware yên ku nayên dîtin jî.

Wan otomobîlan her dilezandin li wê girava ku dê tu şeran li dar nexîne. Mirovên pirr spî, û hinek reşikên ku xwediyên aksenteke nuhênî mîna kumên xwe yên şîn bûn, weke ku artêşeke xwîna wê şîn be tevdigeriyan, li kolanên bajêr û li meyxaneyan jî, niştecihan pêşwaziya wan dikirin wek ku kesên bereketa Meryema deryayên dûr li wan bûyî bin, qereqolên wan jî mîna çermên wan ên ku bîra di bin de diherikî, luks bûn.

Lê çeperên feqîr ên serbazên herdu rexên li hember hev, Qibrisiyên Tirk û Qibrisiyên Yûnanî, weha li wê çolê di nav wê lehiya kulîlkên beybûnan de diyar bûn, tozdar mîna bayê Cizîrê, ewan serbazan sixêfên giran diavêtin hev ku pê sawa şevê û zirziya şevbuhêrkan dibirin. Erê, ewan çeperan sînorên laşên wan resm dikirin û qêrînê ew dikirin yek.

Li pişt baxçeyê min kortek hebû, di wê hêla dûr li başûrê wê çola ku ez dipêm. Korteke hinekî veşartî. Yekşeman çend serbaz dihatin û ew kontrol dikirin, çivîk ji dora wan xefkên ku min vedabûn difiriyan. Mesele ne bi hacetî zîrekiyê bû ku ez binasim ew çi dikin: ewan dixwestin bizanibin bê ka ew kort bi kêrî topeke Mortar dibe an na. Ewan top datanîn û bi destên xwe, yan jî bi darin di destên xwe de nîşanî cihan dikirin, paşê dîsa ew top radikirin û li jîpekê bardikirin û diçûn. Ew kort di rojên mayî di heftiyê de dima kortek ku zarok dadiketin kûraniya wê ya germ û paşê jî bi zikxişkê jê derdiketin piştî ku ew tijî qerebalix dikirin.

Ez ji wê malzaroka nîvveşartî û wisa li wê çolê hetikî hêrs dibûm, mîna ku ew di serî de vexwendineke vekirî be ji bo nerihetkirina xefkên min, mîna ku xwetêwerdanek bêwate be


Ücretsiz PDF Kitap Arşivi - https://rantey.org

ji bêdengiya ku divê hawîrdora gora min, a ku ez hêvî dikim li wir be, kilît bike.

Bi min xweş tê ku ez di wê çola beyar de binax bibim, du metreyan dûrtir ji baxçeyê min ê piştmalê, di bin wî qaşilê qûmê de ku teyrikên biçûk li ser datînin, bi lez û hêdî, qelew û zeîf, tewş û haydar, ji qumrîkan, ji şalûlan û ji çivîkan. Kêfa min tê ku tarîbûna qaşilê erdê ji min re be û jora wî qaşilî ji xefkan re be: ez ji bin de û hesinê sar yê mişt dilbijîna madenî jî, li jor.

Min çar xefk kirîn piştî ku min hêvî ji kirrîna silahekî din birrî. Ji min re hate gotin: Mirovê Mezin ê her tiştî safî bike. Lê ez ji bendewariya ku dê ji min re ruxseta tivingeke nêçîrê peyda bike westiyam, rabûm min xefkin bêdeng kirrîn ku dê niştecihên avahiyên li dora wê çola vekirî bêzariyan jê nekin.

Ezê di bin qaşilê qûmê de bêtir şareza bim, heta ku ez bi xefkên xwe tu nêçîran negrim jî. Ji xwe ezê tu nêçîran negrim, min guman dikir ku ew çivîkên çillek ên ku kurmikan, mûriyan, dendikan, qûmê û şijikên li ser rêya asfeltê jî nikil dikin, ji ber taya birçîbûnê a di berkurkên xwe de wisa dikin, loma jî min xefkên xwe vedan û dilê min li vê xapa min rihet bû. Lê ez herifîm. Erê ez herifîm. Min bihîst bê çawa şaneyên min, yek di ser ya din re, dişemitin û kerînekên min dikin teqeteq, hestî jî dixeniqin dema ku mûskilan ji dora xwe bi bêhêvîbûn dûr dixin da ku bayê ku ji goşt derdikeve qezenc bikin: ew henekpêkirina çivîkan tiştekî tehmûl nedibû bû.

Min xefkên xwe ji mêj veşartibûn. Bi wê şarezayiya min î ji wî cihê ku ez jê hatime vê girava li ser axeke herikî ku navê wê av e, min ew xefk veşartibûn. Min hîç nehişt ku hesinê xefkan ji tu qulan re xuya bibe, paşê min hinek giyayê ku min bi destê xwe qusandibû bi ser de weşand da ku erd mîna berê rast xuya bibe. Ez fikirîbûm jî ku bêhna wî cihî jê bibim da ku wisa bakire û hîn tu kesekî biyanî mîna min pê lê nekiribe xuya be, lê ez keniyam: “Ev cûreyek ji çivîkan in ku di bin perikên wan


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

de cewrik xwe vedişêrin.” Tu li vê henekê! Gelek pê her roj ji ser vî cihî re dibuhurin, çivîk jî ne xema wan bêhna wan pêyan e, ê de çima wê bêhna min tenê wan bicefilîne? Dibe ku bêhna fikreyan hebe. Dibe ev xefk bi bêh bin. Dibe ku dilbijîna bi sikura min girtiye, mîna yekî ku gefan li yekî din dixwe, bêhneke wê hebe.

Ez herifîm. Min bihîst ku şaneyên min diherifin dema çivîk nêzîkî xefkên min dibûn, paşê jî li dora wan dizivirîn û bi qerfeke ku efû nabe temaşe dikirin. Lê min bi her halî tu nêçîr nedipan, di gel ku ew hestê ku bîna têkçûneke naskirî jê difûriya hestekî diltezîn bû jî, lê min, bêguman, gora xwe ya li wir dipa ne ku lingên çivîkan, û min bi şevreşiya di endamên laşê xwe de, tarîtiya di bin qaşilê qûmê de dipeland, ku li wir ez dê ji bêgumaniya xwe jî firehtir bim. Bîna min ji her tiştê li ser wî qaşilê herifonekî tê, çiku ez bi keleboxa xoyê xwe yê kovî hildikişim jor piştî ku min nameya tîrbûnê gihande tîrbûnê û bi şaneyên xwe yên heliyayî re dawerivîm jêr.

Gora min li wir e. Li hinda beybûn û serxes û giyayekî fedyok î ji ber zirziya erda qûmî westiyayî ye. Lê hawîrdora min şil e ji ber wê barana sivik î ku danasînek zivir ji buhara hafizewinda re pêşkêş kir. Û herdu destên min şil in: min şemsiya xwe rakir ku herdu teyran biparêzim, ew rabûn firiyan û ez jî vegeriyame hindir ku şemsiyê bi mîxekî li ser dîwarê metbexê ve daliqînim. Paşê ez li ser xirtepirta têwerbûna teyrekî -tenê min perikekeke wî dît- di şaxên dara leymûnê de, careke din derketim. Loma destên min şil in, ez jî şil im ji ber ehmeqiya xwe ya ku dihêle ez bi pey tiştin ku naqedin bikevim, ew ehmeqiya ku bi min girtiye ji dema ku min sibehê biryara xwekujiyê daye heta vê hingura êvarê ku êdî bi lez tarî dibe mîna ku dem bi xwe jî ji hafizeya buharê direve.

Gora min li wir e. Lê divê ez bi êvarê re, êvara kirêkirî û berî dema xwe hatî re vegerim hindir, ne ji ber ku ez dil dikim bi hinek hûrgiliyan rabim da ku xwekujiya xwe bedew bikim


Ücretsiz PDF Kitap Arşivi - https://rantey.org

da ku ez mîna mêvanekî ber bi termê xwe ve diçe bim û wî termî di kamiltirîn rewşê de bibînim: aram, dilovan û belkî devliken jî, di rewşeke ku hîç zirzî têde nebe. Serî bi ser mil de xwarbûyî. Herdu çîm ramediyayî. Por şekirî, tayek bi ser eniyê de berdayî. Herdu çav nîvgirtî, berê awiran li karoyên şîn û temîz e ku kaxeza spî li ser wan e û li ser wê kaxezê peyvin sersaxiyê ji miriyekî bo zindiyan têde ne: "Nearam nebin. Qeder heyiriye."

Na. Ez hîç dil nakim ku bi karekî rabim da ku xwekujiya xwe bedew bikim, lê ezê wê hema wisa pêşkêş bikim, xwekujiyeke xwerû, xeşmgîn li gel dilbijîna kamiliya lal a ku bi du bostan li pê laş e, yan jî kamiliya ku di laş de şiyar e dema ku pirrbêjiya xwînê hinekî radiweste. Ez dê xwîna xwe li her koşeyekî malê bireşînim, ez cilên xwe yên di çente de jî ji bîr nakim. Ezê wan cilan, kinc bi kinc bi xwînê werkim da ku mîrasê min giran be û bi hacetî yan şûştineke xurt yan jî telefkirinê be. Ezê bi birîna xwe ya xwînrêj re ji odeya razanê biçim ya rûniştinê, ji wir berê xwe bidim korîdorê, herim ba guldankan û ezê dîwaran jî ji bîr nekim. Ezê, hema ku mista destê min tijî xwîn bibe, bavêjim ser dîwaran. Ezê pifî dilopên xwînê bikim ta ku ew belawela bibin û bikevin formên nêzîkî formên kevjalan. Me li murekebê wisa dikir dema ku dilopek jê li ser defterên me diket û me bi pifa devê xwe wêneyên pîrebokan, extebûtan û şaneyan diristin.

Dema ku murekeb bi ser defterên min ên dibistanê de diket min nedihişt ew zuha bibe. Min pif dikire wê dilopa şîn ku kûraniya xwe ya mişt formên ecêb radestî min dikir. Min bi wê dilopê û wê jî bi min dilîst. Min hêdî pif dikirê, wê jî hêdî. Ku min bi sertî pif bikirayê, ewê jî weha bikira: ez form didimê û ew jî formên ku min vediciniqînin saz dike. Lê ciyawaziya ku aramiyê têk dibe ew bû ku her pifeke min ne cuda bû ji yeka din (ya xurt xurt bû û ya hêdî jî hêdî bû) lê formên ku piştî pifdanê dihatin sazkirin hîç ne mîna hev bûn.


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Ez dê xwîna xwe rizgar bikim, nexwe, û nehêlim ku ew tenê tayin li ser dîwaran herikî bin, yan jî tenê golin biçûk bin li vî koşeyî û wî koşeyê din. Ezê pifî xwîna xwe bikim di wê kêlîkê de ku ez dişemitim jihişçûna ku min digihîne skandaleke bêtir luks. Lê ezê, berî ku bi wî karî rabim, qerebalixeke ku êdî nema layiqî mala min î bêdeng e bipêm, qerebalixa ku bi taybetî ji hêla bakur tê, ji hêla wê mala ku ew herdu kesên di paltoyan de windayî tê. Bi qehreke veşartî ez ber bi pencereya mezin ve çûm ku perdeyên wê bedewiyek didane baxçeyê pêş malê û kolanê û stûna ku şewqeke purteqalî ku kenê mirov pê tê li jora wî hebû. Min komeke xerîb ji mirovan û heywanan dît ku li ber wê mala ew herdu kes berî kêlîkekê lê bi cih bûne rawestiyane. Min hinekî perde da alî da ku bêtir bibînim, paşê min felqeyekî pencereyê vekir û nermebayekî li min da, nermebayekî têkel bi bêhna ax û gulan re, têkel bi pistepista ku tevgera laşên wan mirovan saz dikir re, na bi ya devên wan re, li min da.

Komeke weha, hêja bû ku hatina wê bi qerebalixeke mezin bihata ragihandin, lê ew ji nişkê ve li wir bû, li ber pehnava malê. Tiştê ku xwe li bêdengiya min da ne dengê wan heywanan yan wan mirovan bû, lê firtefirt û firefira baskên di hindirê rikehan de bû ku wan mirovan ew ji destekî digihandin destekî din heta ku di tariya malê de winda dibûn.

Gelek rikeh bûn. Dengê balindeyin ku cûreyên wan nayên nasîn dihat. Mirovin lal di qapûtin giran de û ebayên mîna yên jinên xweparêz li ser serên wan bûn û heywanin ku di bin şewqa purteqalî de weha xerîb xuya dibûn, lê ew têkel ji ga û kerên belek î girs bûn. Dema ku ewan mirovan barên xwe daxistin, heywan ber bi pehnava paş malê ve ajotin. Ew pehnava ku bûbû garaja erebeyekê û depoya hûremûran, û banê wê hema ji hesîr û keblên hesinî durust kiribûn. Paşê ew hemî winda bûn, yek li pê yekî ketin wê mala ku min hîç şewq têde nedît.


Ücretsiz PDF Kitap Arşivi - https://rantey.org

Min pencere negirt. Dîmen dişibihî dîmenê bavê min û hin hevalên wî ku eba li ser serê wan bûn û zivistanekê pehnava malê qut kirin û ber bi odeya mêvanan ve çûn ku ji malê cihê bû. Wê demê min deriyê odeya malê vekir, roniyeke kêm ji derve herikî, min dixwest binasim ka ew kî ne, bavê min li min zivirî, eba hinekî ji ser porê xwe yê gij î dirêj rakir û kire pistepist: "çaydanek çayê amade bike."

Ez wê hîngê bîstûyeksalî bûm, gihiştibûm temenekî ku bavê min dixwest bi bêdengiyek alozker pêşeroja min dûrî ziyanên ku êdî roj bi roj bêhna wan dihate me, ava bike. Ewî çêra wê zingîniya ku xwe li wî û li me jî bi wî re dida nedikir, mîna ku ew bêhnkirina bayê xwînrêj ê ku ji Kurdistanê dihat ji bêvilên me yên girtî re dihêle.

Rewş belawela dibe. Lihevkirinin gewre têne lidarxistin li dijî milletekî ku dixwaze cihekî aram ji bo çêlekên xwe, bizinên xwe û hestiyên xwe jî bibîne. Û bavê min - ê ku navê Mem li min kiribû û hêsrên lal bi ser lehengê xwe Mem de dibarandin, Memê ku gewretirîn helbestvanê Kurdan Ehmedê Xanî çi şêweyê êş û azarên ji ber evîna Zînê hebûn anîne serê wî heta ku hêzdaran goştê ser herdu milên wî rakiribûn, du kortik çêkiribûn û mûm têde vêxistibûn- li gel wan mêvanên di bin ebayan de dadiwerivî kalbûneke kor, û ewan bi qelşikên rûyên xwe navçeyên Kurdî yên ku bi derbên artêşên mezin re dihatin xwarê, resim dikirin, ew artêşên ku ji herêmên ciyawaz bûn û tu tiştî, ji bilî ku xewna bavê min têk bibin, ew nedigihande hev.

Hergav ew qeherî bû, mîna ku em kelem bin di rêya wî de û sûcê me be ku ew nikare zora wêranê bibe. Hêrsa wî zêde dibû dema ku ji desthilanîn diket. Lê ew her êvar dihat, ew li gel kesin nediyar û naskirî dihat, ku di bin ebayan de bûn, li min diziviri û bi pistepist digot: "çaydanek çayê amade bike", min jî ji wan re çay li ser paporê amade dikir bêyî ku mijangên min ji agirê ku hêdî dibû û ji nişkê ve mîna gulekê geş dibû, bifilitin.


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Ziyana ku mûyê destên min jî didît, ew mûyê ku li qevdika destê min û çermê pêçiyan şîn hatibû û min xwe pê paye dikir, ziyaneke girantir bû, çiku ew delîlê mêraniya min bû ji cîhanekê re ku min paşê nas kir zêde guh li mûyan nake.

Heta roja îro jî ez nizanim bavê min li gel wan mirovên razdar û eşkere, çi amade dikir, lê ewî rojekê ji rojan giraniya xwe û ya wan avête ser min û got: "Em dê te bişînin giravê da ku Mirovê Mezin guh bide te." Min jî, ji xwe, derbarî forma komê "Em" di axaftina bavê xwe de bi xwe re xeber neda, lê peyva "giravê" bala min kişand. Çi girav e gelo? Navê "Cezîre/girav" li herêma bakurê Sûrî dikin, ji ber ku ew sêgoşeyeke bi her sê çemên Dicle, Firat û Xabûrê dorpêçkirî ye, lê tîpên lêvandina bavê min qet destnîşanî cizîra Sûrî nedikir. Ew dikare her navçeyekê cuda bi nav bike, lê ji heremê hemûyî re bibêje "Cezîre/girav"! Em hîç hogirî vê yekê nebûbûn, tenê kesên ku ne ji bakur bûn re me digot: "Em ji Cezîrê ne." Em ji rojhilat de ji gundê "Tirbespiyê" heta rojava dûrtir ji "Serê kaniyê" ne. Em ji wan gundan in ku bê nav li binaniya çiyayê Toros heta sînorên çiyayê Ebdilezîzê û Şengalê rêz bûne. Em ji sêkoşeyekê ku navên Kurdî têde roj bi roj bi hikmeteke ku em ne bi xêra wê ne û ew jî ne bi xêra me ye, têne guhertin.

Çend meh ji ser biryara bavê min re derbas bûn nebûn, ez êdî li vê girava ku bi Yûnanî diaxive û navê wê Qibris e, bûm. Ji kenarê Sûrî li ser pişta gemiyekê ez derketim. Li gel min bûn gelek temîn û wesyet û soz û nimreyên mal û kolanan, û nameyin ji Mirovê Mezin re ku ewê bi her kar û barê min ve rabe, çiku armanca hatina min ne zelal bû. Li benderê, li aliyê din î deryayê çar mêr li hêviya min bûn ku derbasbûna min hêsan kirin piştî ku ez li ber karmendên dewletê û ji ber pirsên wan ên derbarî armanca min ji serdanê û cihê iqameta min, wisa lihevketî xuyabûm. Ewan mêran bersiva hemû pirsên wan bi yek cumleyê dan: "Em kefîlên wî ne." Û ew bûne kefîlên min î şeş salan, heta niha. Wan ez birim ba jineke şeytanokî ku


Ücretsiz PDF Kitap Arşivi - https://rantey.org

sergeriya bîroyeke kirêkirina malan dikir. Ewê jinê ev mal şanî min kir, min ew kirê kir û xelas.

Şeş sal in ku zilamên Mirovê Mezin bi karûbarên rûniştina min û xerciya min rabûn, ewan xwaringeheke nêzîkî malê şanî min kirin ku muşteriyên wê bi zimanê min diaxivin, "Ewê sebrek be ji te re" wan gote min. Û nema xuyabûn. Min jî di şeş salan de bi wan muşteriyên xwaringehê yên ku bi zimanê min diaxivîn re behsa baharatan û xwarinên ku bi baharatan re dihetikin, cengên baharatan, baweriya baharatan û pêşeroja ku li benda mirovayetiyê ye eger baharat ji holê rabin, û qiyameta ku dê têde pirsa baharatên bijarte ji mirovî bibe dema ku berê wî didin bihiştê yan dojehê, dikir. Lê min qet xwarin li malê çênedikir, min hema li wê xwaringehê dixwar û vedigeriyam wan odeyên xir û xalî û bêhûde li hêviya zilamên Mirovê Mezin dimam ku min bibin ba wî, ez çarmêrkî nêzkî derî rûdiniştim da ku qet li min neçe -ezê tim şiyar- teqteqa li ser textê stûr î ku min ji hêla din a pêşeroja min vediqetîne.

Gelek caran hate bala min ku ez nameyekê ji bavê xwe re binivîsim: "Min dostê te nedît bavo.." lê ez ji biryara xwe vedigeriyam dema ku min digot belkî ew bihesibîne ku ez nikarim bi karûbarên xwe ve rabim: "Xem nake. Te ew nedît, xwe bibîne." Erê. Ezê li hêviyê bim da ku ji bavê xwe nebihîzim yan jî nexwînim: "çavpêketina wî çareser bike. Ev êdî karê te ye niha." Ma ezê çawa dîtina yekî ku ez wî nas nakim çareser bikim? Min nameyên ku li gel min bûn û divabû Mirovê Mezin wan bixwîne vekirin û dît ku vala ne ji bilî çend hevokên dubarekirî: "Zêde guhdariya wî neke. Hinekî hay jê hebe heta em wî vedigerînin."

"Guhdariya wî neke...." Xwedêyo. Ma temîna wan hemî ev e? Naxwe çima ez hatime? Lê min bendewariya surprîzekê kir ku vê temînê serobinî bike. Eger ez Mirovê Mezin bibînim ezê bihêlim ku ew li min guhdarî bike bila ez xwîngiran jî xuya bibim, ezê bihêlim ew carekê li min guhdarî bike heta ku ji min


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

bê. Wê çaxê, dibe ku ez bê dudilî ji bavê xwe re binivîsim: "Ewî li min guhdarî kir bavo. Ez çavpêketinê çawa ji te re wesif bikim? Ew çi mêr e. Çar zilamên wî ez di pîkabekê de birim mala wî ya muhteşem a li derveyî bajêr, ku li dora wê hevşiyên mezin ji darên mîmosa yên bi formin hendesî qusandî bûn, her weha darên sewliyê û yên laurusê jî." Na. Ez bawer im ku "pîkab" ne layiqî meqamê Mirovê Mezin e, û dilê min heye ez wê biguherim: "çar mirovan ez di otomobîlekê de ku mirov dikare têde nigê xwe dirêj bike bêyî ku bigihîjin kursiyê pêşiyê. Û dema ku em gihiştin mala wî ya muhteşem, yabo... min di serî de mal nedît çiku em di ber hevşiyekî bilind re ku gelek darên behîvan û çinarê çandîbûn meşiyan, dergehê ku em ber bi wî ve zivirîn derbasgeha pehn ya ku tenê layiqî maleke muhteşem e, şanî min kir. Û dema ku me bax û gulzarên lihevgeriyayî derbas kirin, pêşiya malê ya pehn û bi stûnên mermer ji me ve xuyabûn û hin avrêjên biçûk jî... mêrik li wê bû..."

Ma divê ez ji bavê xwe re şirove bikim bê ka min ew çawa dît? Ezê bibêjim: "Ew li wir bû, dimizicî." Dibe ku ne ew bû, lê cîgirekî wî bû. Ne xem e. "Ew li wê bû bavo. Dema ku ewî hemêza xwe bi qasî ku dikaribû vekir, min ew nas kir. Ewî serê xwe jî bi aliyê milê xwe yê rastê ve xwar kir mîna yekî ku lêborîna derengmayîneke bêhemd dixwaze." Gelo evê bavê min iqna bike? Çima na? Ew mêrek e. Mirovê Mezin mêrek e, eger ne weha ba bavê min ew nav lê nedikir. Ez jî di nameya xwe de dibêjim ku ew di rûyê min de dibişirî, mêr hin caran dibişirin. Yanî nameya min mentiqî ye, lê wesifkirina malê ne bi dilê min e, ji ber ku bavê min qala tu tiştekî taybet di mala Mirovê Mezin de nekiriye ku ez jî bikim destpêka wesifkirina xwe. Ne bes weha, min nebihîstiye ku ewî ew mal dîtiye yan jî çûye welatekî din ji bilî welatê xwe yan jî tew sînorên herêma ku bi çemê Firat û Xabûrê dorpêçkirî derbas kiriye.

"Em li tu otomobîlan siwar nebûn da ku herin civana Mirovê Mezin bavo. Ez mat mam dema wan mirovên ku


Ücretsiz PDF Kitap Arşivi - https://rantey.org

hatibûn min bibin ba wî gotin ku, mala wî nêzîkî ya min e. Şeş salan ez weha nêzîkî wî bûm bavo. Û min êvarekê mildaketî da pey wan", ezê weha binivîsim. Û ezê wisa pêde herim: "Me berê xwe da sûrê meydana cirîda hespan li aliyê rojava piştî çend metreyan, paşê em di qulekê re -ku toreke qetiyayî ji têlên tenik li dorê bû da ku rojên yekşeman rê li ber wan kesên ku bi dizî temaşe dikin û dikevin rêya hespan bigre- derbas bûn. Min gote wan: Ecêb e. Ma divê ku ez bi vî awayî herim civana Mirovê Mezin; di nav vê dehlê re, li nava vê xeleka mezin î ku ji helkehelka heywanên tenbel pêve tiştekî din nizane? Min rasterast ji wan nepirsî, lê min pirs bi xwe bi xwe kir dema ku li pey wan dimeşiyam û berê me li meydana mezin a ku giyayekî kovî ku di bin lingan de diqurifî ew veşartibû."

Berî ku ez vê ji bavê xwe re binivîsim, ez di wateya gotina wî ya ku ji Mirovê Mezin re nivîsiye "Hay jê hebe heta em wî vedigerînin" de difikirim. Ew qonaxeke biçûk e û qet ne lêgerîna pêşerojekê ye mîna ya ku bav ji zarokên xwe re plan dikin, bavê min mîna emanetekê min radestî Mirovê Mezin dike bêyî daxwazeke naskirî ji bilî perwerdekirina min a li ser vegerandina min a ji bavê min re.

Ê de çima bavê min ez şandime da ku min dîsa vegerîne? Ma gelo ew hin derbeyan li dijî hikûmetan ji Anadolê heta Ermenistanê plan dike û paşê dê min vegerîne imperatoriya xwe ya azad? Ma qey ew nizane ku ev hikûmetên ku dilê wî yê Kurd li hev parve kirine, ev hikûmetên ku çemên wan ava xwe vala dikin deryayê başûr û Xelîc û behra Qazwînê, termên Kurdan nadin xwediyên wan meger ku ew xwedî "Mesrefên idamê" nedin? Dibe ku bavê min naxwaze ez "Mesrefên idama" wî bidim û wî vegerînim, çiku ew şêtekî mîr Bedirxan e, şêtê ewî mîrê ku di biçûkaniya xwe de li destpêka sedsala nozdan bûbû mîrê Botan û Cizîrê û hewl dabû ku asoyên li derûdora xwe bidize û giyanê mirovê Kurd vegerîne firehiya berê, bavê min jî her di wê qonaxê de rawestiyaye û ji wê nalive.


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Ez derbarî “Mîrê” bavê xwe de, ewê ku wek ku diyar e di erdnigariya Kurdî de qenc belav bûye û yekemîn kes e ku mîrên Kurdan kirine yek, tiştekî zêde nizanim. Lê min henek bi bavê xwe dikirin bêyî ku niyeta min ew be ez wî biêşînim: “Bavo herku mîrek ji mîrên te sed cengawerên wî peyda bibûn ew diketin cengên giran li dijî Eşkaniyan, Asûriyan û heta li dijî Bab-i Alî jî, ma qey nedikarîn sebir bikin heta ku artêşên wan bibin du sed nefer?” A wê demê bavê min simbêlên xwe yên mezin bi mista destê xwe vedişart û digot: “Dibe, dibe.”

Mîrin lezok û bi pele ne li wê xaka ku ecelê li serencaman dike lê di bidestxistina wan de şaş dibe, bavê min jî ê ku li ber kêlîka mentiqî a ku reqeman bi lêv dike dibêje: “Dibe.” Ew jî rast e: du sed ji sedekî qenctir in. Hezar ji du sedan. Bîst hezar ji hezarî çêtir in: “Divê ku bi hijmarin bêtir bicivin bavo. Dijmin gelek in vêca divê mîrên te xwediyên gelek lek û alay bin da ku bi van hikûmetên ku sînorin ne layiqî rûhê Kurdan dikişînin re qutûbirê li dar bixin.” Bavê min jî dibêje: “Dibe.”

Bavê min, ewê ku guh li mentiqê dike, dê guh li nameya min jî bike, ez dikarim ji wî re behsa hin tiştan bikim ku ew bi kûranî wan dizane: “êvarekê em derbasî meydana cirîdê bûn, ewa nêzîkî malê bavo, di ser wî giyayê bejî re em dimeşiyan û bêyî ku em pistepistê bikin me dengê qurifandina tayên wî giyayî dikir, yek caran min bi matmayin digot: ma ev e rêya ku dê me bigihîne Mirovê Mezin? Vêca wan mirovên ku bi min re bûn digotin: ma tu rê nas dikî?

Ez yekî pirrbêj bûm û ewan her çar mêran ji pirsan hez nedikir bavo. Lê min bi zimanê xwe nikaribû, xasma piştî ku min ji nişkê ve nas kir ku Mirovê Mezin li cihekî weha li nêzîkî mala min dimîne. !! tu jî neveciniqiyî bavo?? Şeş sal in û ew li wê bû, li pişt hevşiyê ku ez her sibe di ser re dibînim bê çawa hinek kurik hespan perwerde dikin. Tew min dengê simên wan jî dikir dema ez hîn di nav nivînan de bûm û êdî ez tê


Ücretsiz PDF Kitap Arşivi - https://rantey.org

digihîştim ku berbang destûra şevê dixwaze da ku derbasî xaka ku sezayî berbangê ye bibe.

Pirsên min ne girîng in bavo di wê gava ku ez li pê wan her çar mêran dimeşim de. Ew bêguman rêya xwe di wê erda nezan de nas dikin, wê erda ku qerebalixa kesên ku li ser wan hespên tenbel bi şertan dilîzin ew cotkiriye, ji yekşemê heta yekşemeke din, heta ku êdî mirov di rojên heftiyê yên mayî de jî dikare wê qerebalixê bibihîze, ew qerebalix ku mîna helezonên (saylangozên) ku xwe bi pincaran ve- û bi dîwaran ve û bi roja giran ve jî, ew roja ku li dijî xwe radibe çiku ew mehkûma bêzariya heta hatina şevê ye, dizeliqînin. Şev jî jixwe bi xwe rizgar û bê qeyd û bend e çiku ew jî mehkûma xewê ye, lê em -bavê mino- di meydana cirîdê de ber bi veşargehekê ve bi pêş de diçin û ji nişkê ve yek ji wan her çaran dike pistînî: "pişta xwe xwar bike", mîna ku em di baxekî pasdar lê hebin de bin. Min jî -bavê mino- pişta xwe di tariyê de xwar kir bêyî ku ez tiştekî hêjayî wê haydariyê hebe bibînim. Lê di wê kêlîkê de gullebaranek dest pê bû û agir bi wî giyayê hişk ket mîna ku li ser eniya me nivîsandî be ku divê em bi lingên şewitî herin huzûra Mirovê Mezin. Me xwe bi erdê ve zeliqand û em mîna maran xuşiyan. Yanî ew di pêşiya min de bûn, ez jî li pey wan dixuşiyam. Ew bixwebawer bûn, dibe ku ew tew hogirî rewşên weha bûbin.

Bavo ma kesin din hene ku mîna min, çûne ba Mirovê mezin? Her tişt xuyabû ku ji berê de plankirî ye, loma ez ji te dipirsim."

Ma divê ez xwe bixim meydana gullebaranê dema ez nameyekê ji bavê xwe re binivîsînim? Ez ne bawer im ku dê biwara milk û malên Mirovê Mezin û koşka wî di nav meydaneke cirîda hespan de be. Ez dibînim ku berê min li çîrokeke hevnegirtî ye. Lê, ma çi di jiyana bavê min de hevgirtî hebû heta ku ez nameyeke hevgirtî jêre rê bikim? Ew li wê ye ez lêre me. Ez ne li hêviya nameyekê me ji wî û ew jî ne li hêviya yekê ye ji min. Ew bawer e ku dê min li xwe vegerîne, û


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

ez jî bi guman im ku Mirovê Mezin ê min li bavê min vegerîne çiku ew Mirovê Mezin li cihekî di navbera mala min û meydana cirîdê de winda ye. Ez jî lê nagerim, lê bendewariya wî dikim. Şeş sal in ku ez li hêviya wî me heta ku min bi rastî guman kir ku ew li min digere da ku pêşeroj derbeke ne tekûz li min bide.

Lê divê ez ji bavê xwe û ji xwe re jî tiştekî binivîsim. Divê ez ji wî re tekîd bikim ku ew herdu teyrikên ku firiyan, pêjna hinek lingên nedîtî li deviyê pişt baxçeyê paşiya mala min kirin. Divê ez hema tiştekî tekîd bikim bavo. Ez tekîd bikim ku Mirovê Mezin bi karûbarê min ve radibe û destê wî di destê dara gulan de ye, ew dara rûtirş î di baxçeyê pêşiya malê de. Divê ez behaneyekê ji xwekujiya xwe re bibînim bavê mino.

Eger ez ji te re binivîsînim, ezê tiştekî ku te razî bike binivîsînim bavo. Evên ku derbasî mala me dibin -piştî şeş sal ji dûriya min a ji te, ez wisa dibînim ku ew niha derbas dibin-bi wan kofiyên li serê wan ku mîna şaşikan bûn û bi ebayên ku dawên wan li zendên xwe digerandin, ew dê di dawiya şevê de venegerin malên xwe bêyî ku ji te bibihîzin tiştê ku divê tu qise bikî: “Kurd têknaçin.” Bavo vê ji wan re bibêje û li cigareya xwe ya vêketî temaşe bike ku tu pif li ariya wê dikî heta bi ser kefa destê te yê vekirî de dikeve: “Arî.” Wê peyvê bibêje û paşê ariyê bi zimanê xwe bialîse. Çêja wê şêrîn e. Çêja ariyê şêrîn e bavo: tirşahiyeke sivik î ku zuhabûnekê di zimên de dihêle û di pey re girîz bi devê mirov dikeve. Û bibêje: “Kurd têknaçin ji ber ku ew xwediyê jana xwe ne.”

Peyva “arî” bêşirove dubare bike bavo, mêvanên te ariyê nas dikin. Kî ji me ku birîndar bûye birîna wî bi ariyê girtine. Cawekî dişewitînin û bi ariya wî cawî devê birînan digrin. Biçûk û mezin, nifşek li pê yê din. Û tu jî bavo peyvê şirove neke, tenê wê bilêv bike û li cigareya xwe ya vêketî binêre. Mele Selîmê Bedlîsî jî li qunsulxaneya Rûsî weha dikir dema ku têkçûyî xwe avêtibû bextê wê qunsulxaneyê di destpêka sedsala bîstan de.


Ücretsiz PDF Kitap Arşivi - https://rantey.org

Tu ji mêvanên xwe re dibêjî bê têkçûn çiqasî mezin bû dema ku li wilayeta Bedlîsê cebilxane û leşker têra vî meleyê nebûn ku serxwebûna ji Tirkan îlan bike, û tu didî xuyakirin bê tu çiqasî li ber dikevî û diêşî ji ber ku ew li meydana bajêr hate xeniqandin piştî ku Tirkan êrişî qonsulxaneya Rûsî kirin. Lê ewî -bavê mino- di wan rojên ku li qonsulxaneyê penaber bû de, berî ku êriş were ser, qonsulus fêrî sêdên ariyê dikir.

Qonsulusê Rûs gelek qedr da Mele Selîmê ku xwe avêtibû bextê wî, çawa ku layiqî qonsulusekî be ku qedrê kesekî li têkçûneke mezin rast hatibe bigre. Her gava ku ew diciviyan -hema bibêje ew di wan rojên ku Mele Selîm li Qonsulxaneyê bû de her saetekê diciviyan- qonsulus leymûnduza di avê de helandî û şekirkirî pêşkêşî wî dikir, Mele Selîm jî ku çawa ew peyala tirş bi sê qurtan re li gor sunneta pêxemberî vedixwar, destê xwe li ser mîdeya xwe ya ku dişewitî datanî û bi peyvin Kurdî spasiya mazûvanê xwe dikir.

Navê wî berî wî gihabû qonsulusî loma jî pêşwaziya wî mîna penaberekî hate kirin. Gelek roj derbas bûn lê ew li gel hev nedipeyivîn, lew rastî hev dihatin mîna yekî têkçûyî ku spasdariya qonsulusekî dike ku dilê wî dibêjê: dê karesatek biqewime. Ewî didît bê çawa Tirk li dora qonsulxaneyê bi demançeyên xwe diçin û tên û di bin çavan re li avahiyê dinêrin. Lê ka çawa Mele Selîm ew qonsulus fêrî faideyên ariyê dikir! Ez vê nizanim, ewî teqez ew bi lalkî fêr dikir.

“Destê xwe veke” Mele ji qonsulê ku rûyê wî mîna yê qirxîziyan bû re digot û bi destê wî digirt, ewî jî mista destê xwe vedikir û di bin berçavka xwe ya girover î biçûk re seh dikir û dibeşişî, jina wî jî, a ku li ser kursiyekî destik text î bi mexmerekî şîn rûkirî rûniştîbû, bêdeng temaşe dikir. Çaxa ku kefa destê qonsulus rast dibû, mele tayek ji şalika xwe dibirrî, dişewitand, dema ku vedimirî, ewî arî bi ser kefa destê qonsulusê Rûs ê ku hîn jî dibeşişî de dixist, qonsulus li ariya di destê xwe de paşê li rûyê Mele Selîm dinêrî bêyî ku pirsekê


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

bavêje yan jî têbigihîje bê mesele çi ye, paşê li jina xwe ya di kursiyê de windabûyî dinêrî mîna ku pirsa tiştekî ku ew nizane dike, ew jina pirr spî bi bêaramî li cihê xwe dima lê bêyî ku ew nearamî li ser rûyê wê were der, û bi şehekî hestiyî mezin pûrta heywanekî şeh dikir.

Hevde mêran Mele Selîm derbasî qonsulxaneya Rûsî ya li Bedlîsê kirin, ewan ew bi tivingên xwe heta ber sûrên qonsulxaneyê ji Tirkên Turanî parastin -piştî ku êdî têkçûn diyar bû- û paşê jî li wê çola dirêj î li pêşiya qonsulxaneyê man heta ku hatin kuştin.

Mela Selîm jî wek mîrên te yên din bû bavo. Bi komikek ji Kurdan xwest bi karekî rabe ku kesên bi hêz jî nikarin pê rabin. Ewî li Bedlîsê, Erzerûmê, Diyarbekirê û heta Botan û Cizîrê û rêjgehên çemên ku ji bakurê çiyayê Torosê tên jî temaşe dikir, eynî mîna Mîr Bedirxanê ku beriya wî bi kêmî sedsalekî bû.

Wê carê bavo, Frensiyên Galî -her weha zarokên King Arthur ê Ingilîz ê ku hinek wan ji zurriyeta Lancelot ku yarikê jina wî bû, dihesibînin- li dijî Mele Selîm ranebûn her wekî ku anîne serê bûriyê wî Bedirxan Paşa bi behaneya parastina Nestûriyên herêma Botanê. Mele Selîm kesek neditirsand, loma jî ji qonsulusê aram re faideyên ariyê şirove dikirin, mîna ku dê birîna xwe ya mezin bi ariya şewatên erdê tijî bike, ew dizane ku mirovê li pêşiya wî rûniştî, ê bi berçavka girover î biçûk, ji peyvên wî yên Kurdî tiştekî fêm nake û tenê işaretên destên wî fêm dike, ne zimanê wî. Mele Selîm dixwest ku bi qasî bikaribe işaretên destê xwe jî kêmtir bike, ewî dixwest bêtir berê xwe bide çavên qonsulusê Rûs ên ku jana wî didîtin. Ewî dikire pistepist: "Arî. Hema çi ta be ji qutikê xwe bibirre û bişewitîne, dê arî peyda bibe. Binêre!" û destnîşanî qutikê xwe yê qesebkirî dike ku bi ser xeftanê wî yê Zaxoyî de berdayî ye, şaşika xwe ya ku kumekî ne dirêj û şaleke zer î qesebkirî lê gerandiye dike û dibêje: "Hema çi ta be, ji kîjan deverê bibe,


Ücretsiz PDF Kitap Arşivi - https://rantey.org

bikişîne û bişewitîne”, li jina qonsulus, a ku di bin birhên xwe yên spiyê kal de dinêre, dizivire û dibêjê: “Jinikê! Pûrta vî heywanî zêde şeh neke, kêç zû hêrs dibin” û dibeşişe. Paşê beşişîna wî, ya ku tenê şiroveyek bû li ser lihevketina wî ya veşartî di hindirê wê qonsulxaneyê de, sivik dibe.

Mela Selîm çi dike? Ew diponije bavê mino. Bi tasikekê ji satila sifir desmêj digre. Li ser qutikê xwe nimêj dike, çiku ew li pakiya xaliyên qonsulxaneyê ewle nabe. Bi fedî û lêborîn li jinikê dinêre, ew jî mîna yeka ku serencama hetikî bîn bike bi lêborîn li wî dinêre. Di gel vê yekê jî dev ji henekan bernedida, radibû carcaran hawê Mele dikir, destên xwe dibirin pişt guhên xwe û xwe xwar û rast dikir mîna ku Mela nimêj dike, paşê xwe vediparixand weke ku wan hereketên pehlewanî ew westandibin, û penaberê dîl dibeşişî.

Vaye tu jî dibeşişî bavo, dema ku tu nameya min ji mêvanên xwe re dixwînî di êvara zirz de ku li malên bakur tê rapêçan, tu çavên xwe radikî û li wan rûyên mişt karesat dinêrî: “Me ew şande ba Mirovê Mezin ku fêr bibe, rabû di serî de ehmeqiyeke nivîsandî şand, li wî bibûrin.” Û tu dikenî û berdewam dikî: “Mela Selîm! Çima weha bi hûrgiliyan ve behsa wî dike? Ew dixwaze min razî bike.” Û tu hêrs dibî. Ez dibînim ku tu hêrs dibî: “Ew min razî nake, û gera wî ya li Mirovê Mezin ne hewce ye ku ew behsa mala Mirovê Mezin bike.”

Ez lêborînê dixwazim bavo. Ez niha ji te re nanivîsim. Kî dizane? Dibe ku paşê ez tiştekî hêjayî êşa te û êşa mêvanên te binivîsim. Lê ev meleyê ku bêyî şewatên pirr, bêyî hêviyên pirr û bêyî hûrgiliyên pirr li Bedlîsê şoreşek li darxist, min mijûl dike: çi têkiliya wî bi Rûsan re hebû? Heta wergêrek jî li gel wî nebû. Ez vê dizanim. Lê wî bi taybetî û bi bêhêvîbûneke ku diqîriya berê xwe da qonsulxaneya Rûsî û hivde tivingên kevnare ew diparastin. Du nobedaran ji hindir ve dergeha sûrê avahiyê vekirin û li hêviyê man ku ên din jî li pê Mele Selîm derbas bibin, lê hinekan ji wan işaretî nobedaran kir ku,


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

dergehî bigrin, ewan jî dergeh girtin û çavên wan li hinek komik bûn ku li ber koşeyên avahiyên ku çolek di navbera wan û qonsulxaneyê de ye bûn, ew çola ji axê ku hinek darên gwîzê yên belawela têde bilind bûbûn.

Ew her hivde mêr derbasî qonsulxaneyê nebûn, û ew herdu nobedarên ku Mele Selîm bi bazdan gihandin zêrzemînekê, pirr ketibûn hev û bi qevaztinên xwe re li piştâ xwe dizivirîn mîna ku kuştiyan dihejimêrin. Di kêlîkekê ji wan kêlîkên birûskî de yek ji wan herduyan rawestiya, qevda destê xwe avête sînga xwe û qêriya: "Na."

Tivingên kevnare li nêzîkî şaşikin gindirî ketin, destin vekirî bûn ku bayê li derve têra wan nedikir, li hindirê qonsulxaneyê jî Mela li ser kenebeyeke bi neqş çavgirtî hate xwarê û bûbû helkehelka wî. Dema ku çavên xwe vekirin, dît waye jina qonsulus, a pirr spî, peyalek ava zer li ser sêniyeke zîvîn pêşkêşî wî dike, ewî bi destekî lerizî ew av rakir, hinek jê vexwar û peyal danî.

Ewî milên xwe ji wan kargerên qonsulxaneyê ên hindik re ku kesên meraqdar bûn, vedikir. Ew têkçûbû. Hîç behaneyên wî nebûn. Mele têk çû. Ewî dixwest ku Kurdistanê bike yek lê têk çû. Di gel têkçûna xwe jî ew di rûyên wan de yek bi yek beşişî, û lêborîn xwest ku wî şêlû kir aramiya çermê wan û aramiya îkonên wan ên pîroz ên ku xwe sipartibûn textê kolayî ê dolapeke reş û di nêvî de gelek xelekên ronahiyê hebûn. Du caran Mele Selîm "Subhanellah" got dema ku li wan bercestekirinên ku nuhêniyê bi awayekî sert eşkere dikin nihêrî, ew yek jî ne ji rê û resmên ola wî bû, ola wî pîroziyê ji hiş re dihêle ne ji çavan re û hestiyên mirovan jî -bi movikan, bi qehfan, bi sêlên kabokan, bi parsûyan, bi cênîkan, bi lûleyên çîman, bi çengan û bi qevdikan- ji pifkirina Israfîl a ji borîzanê re dihêle.

Lê divê Mele hurmeta razên wî mekanî di çavên xwe de biparêze, loma jî dema ku çavê wî li tiştekî ku ne bi dilê wî be


Ücretsiz PDF Kitap Arşivi - https://rantey.org

dikeve, li qonsulus yan jî li jina wî dizivire da ku nîşanên di rûyên wan de bibîne û li ser rûdêmê xwe resim bike wan nîşanan. Lê gumanên wî di xwarinan de cuda ne, di gel ku dema karmendên qonsulxaneyê li ser maseya qonsulusî xwarinê dixun û rihetiyê li ser rûyan dibîne jî ew bi guman e. Bîna tûj a masiyê hişkkirî wî hêrs dike, qetikên goşt wî ne aram dikin, ewî dizanîbû ku Rûs ji goştê berazan hez dikin û dixwun loma jî wî ji xwe re mirîşk hildibijart, yan jî tenê merge hildibijart û nanê xwe yê reş diçinî nav de. Mirîşk mirîşk e bi her halî, lê ew pirr nefikirî bû ku merge çi ji hestên wî re vedişêre.

Ew hindik diaxivî, bi peyvin hindik û nîşanin hindik. Dema ku bêdeng dibû jî bi xeyalê xwe derdikete derveyî qonsulxaneyê cihê ku Tirkan hevalbendên wî komkiribûn û ew bi darên gwîzê ve daliqandibûn. Lê hêviya wî her hebû ku şandiyek ji cihekî were ku bi Kurdî û Rûsî bizanibe û peyvên wî bêtir bi ringînî bin ji wan işaretên wî yên perîşan. Ewî bi guh û dilê xwe guhdariya her tevgerekê dikir ku ji pişt dîwarên qonsulxaneyê dihat, heta dikir ku pistepistên qonsulus û jina wî ya ku çavên wê yên hingivîn ne layiqî spîbûna wê ya bi qerebalix bûn, bi destên xwe rawestîne, lê xwe digirt û di ber xwe de digot "La îlahe îllellah."

Xeberên diltezîn, piştî ku Mele Selîm xwe avêtibû bextê qonsulxaneyê, ji bêrîkên kesên ku derbasî wê dibûn, digindirîn bêyî ku ew mirovê ser bi şaşik tê bigihîje. Dema ku dihate pêşberî qonsulusî û bi destên xwe dixwest fêm bike ka çi diqewime, qonsulusî eniya xwe dixiste nav tiliyên xwe, paşê peyveke dilxweşkirinê tenê dubare dikir da ku şiroveyeke ku dê bi her halî tu fêdê neke, kurt bike.

Ma çi li ba wî heye ku ji Melê re şirove bike? Ew bi xwe roj bi roj dibe dîlê qonsulxaneya xwe, bêyî ku hêviya wî di mûcizeyekê de hebe ku şer rawestîne, lê ew ji ber comerdiya bêhêvî wê nîvroyê biryar dide ku ji xwediyê şaşikê re xwarinekê çêbike, radibe sêniyên tijî birinc rêz dike, girên mirîşkan û


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

kevokan bilind dike û berxikekî ku hîn serî bi laş ve ye- daku dilê mêvanê wî rûne- li ser sifrê datîne. Rûyê mêvanê wî jî bi rastî, di nav wan rûyên çilmisî li dora wê maseya lal de, geş bû, paşê wî destekî xwe bilind kir û işaretî rêza sêniyên birincî kir û dema ku qedand li wan nihêrî da ku şopekê ji wê hevoka xwe ya lal re bibîne, ew hemî bêdeng bûn. Li qonsulusî nihêrî, paşê awirên xwe dagerandin jina wî, paşê jî wî girê biçûk ê ji goştê di nîvê maseyê de, ji ser kursiyê xwe rabû, sêniya li ber jinikê rakir û parçeyek ji binê wî girê goşt kişand, parçeyên ku li ser hev rêzkirî bûn bi aliyekî de şemitîn û li ser sifreyê ketin û keleboxa xwe ya dilovan weşandin.

Kêlîkekê, di nav bêdengiya civatê de, Mele Selîm bêdeng bû, lê ewî parçeyê goşt xiste sêniyê û bi destê xwe çengek birincî rakir û kire gulokek û li ber wî parçegoştî danî û paşê sênî dirêjî jinikê girt, wê jî ji dest girt.

Ew nerûnişt û awirên xwe jî ji sêniya jinikê qut nekirin heta ku wê kevçiyê yekem rakire ber devê xwe. Wê hingê wî jî destê xwe dirêjî parçeyê goşt kir, û çawa ku xiste nav tiliyên xwe yên biçûk, qonsulsus û yên bi wî re bi dengê bilind keniyan û paşê destên xwe bê kevçî dirêjî birinc û goştî kirin. Wê çaxê kenekî dirêj bi jinika spî û bêdeng jî girt, lê kenê wê yê di bin desmala li ser devê wê de wisa hêdî bû, Mele Selîm ji pê ma û awirên xwe li civatê gerandin: “Hûn bi lez fêr dibin” bi ken got û zêde kir: “Ez jî zû fêr bûm” û bi awirên xwe di ser wan rûyên tijî pirs de geriya: “şeqraqê[2] ku min da pey wî, di firra xwe de lawaz bû” û bi destên xwe haweyê baskên balindeyî kir: “Ew jar bû. Ez nizanim ji ber ku ew biçûk bû yan jî derbek lê ketibû. Lê ew jar bû.” Û bi destekî xwe riya xwe ya pirr sivik misda û ponijî: “Ez ne zarok bûm ku wê demê bi wî bixapiyama. Ez di temenekî de bûm ku min êdî xap û hîleyên teyran nas dikir. Min bi bazdan da pey wî, hema hema dikim bigrim lê ewî xwe ji ber destê min bi wan baskên xwe yên ku hema bi erdê dibûn, difilitand”, ewî

2. Navê balindeyekî ye baskên wî şîn in, bi Tirkî dibêjinê gökkuzgun. (J. Dost)


Ücretsiz PDF Kitap Arşivi - https://rantey.org

herdu peyvên dawî dubare kirin û destê xwe di ser maseyê re xijiqandin, paşê çavên xwe dîsa rakirin û yek bi yek li wan rûyên pirsdar nihêrî: "gelo hûn texmîn dikin minê çiqasî dabe pey wî şeqraqî? Ha? Fersengekê, duduyan, sê fersengan? Ha?", û bi qerf ji bersiveke ku dê negihîje guhên wî yên Kurd, bişirî, yên ku li dora sifreyê rûniştî bûn jî bişirîn.

"Ez", û Mele Selîm bi tiliya xwe ya şehadetê nîşanî cênîka xwe kir: "Ez ne ew kesê ku şeqraq wî bixapîne me", sêniya xwe hinekî pêş de da: "tu şeqraq nikarin min bi firra xwe bixapînin. Başiq jî nikarin. Ma hûn dizanin?" û bi herdu çavên xwe yên bêhêvî û ji her hewldanekê ku kesên rûniştî iqnaa bikin vala bûn, ew dorpêç kirin: "Hûnê nizanibin" li xwe zivirî û got, şaşika serê xwe ya ku li cihê xwe bû ediland heta ku ew xwar kir: "Min kir.." û ji aramiyeke bavane re teslîm bû ku bi wê li kûraniya xwe û kûraniya wan mazûvanên ku axaftina wî fêm nakin binêre. Paşê destê xwe bi nermî bilind kirin û berê mista herduyan da jêr: "Ez weha bilind bûm." Dema ku nas kir ev şiroveya wî bêhavil e destê xwe daxistin û got: "Ez bi baskên xwe bi ser şeqraqî ketim da ku lê neqelibim, min dît bê çawa siya min ew daye ber xwe, lê ez jê derbas bûm çiku nêzîkiya min jê bi wan baskên min î xurt, tevgera baskên wî yên lawaz gelekî giran dikir." Û li ser kursiyê xwe bi giranî rûnişt û li valahiyekê nihêrî: "Min hîç xeyal nedikir ku dê siya min wê çendê dirêj be dema ku ez difirrim."

Mele Selîm di pêketina şeqraqî de firiya. Du baskên hêzdar ji mûskil û hestiyan û perikên belek vedan û firiya. Ne di hesabê wî yê mirovane de bû ku bifire. Ewî dida pê teyrê xwe yê ku di gel jariya xwe ya diyar de jî teslîm nedibû, rabû ew bi xwe firiya. Ewî biryara vê yekê da dema ku xwîn hilkişiya cênîkên wî ku xuyabû lîstik ne adil e: du bask beramber du çaqên mirovan.

"Edalet" Mele Selîm qêriya yan jî dikira biqîriya, paşê bişirî da ku veciniqîna mazûvanên xwe yên di navbera guhdan û


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

kêfeke ne di cî de heyirî ne, belawela bike. Sêniya xwe nêzîk kir, parçeyê goşt anî ber devê xwe lê gez nekir, hema bi kûranî lê nihêrî: "Edalet e ya ku baskan li kesên bêhêvî digerîne." Û zêde kir: "Ez ne bêhêvî bûm. Min zanibû ku ezê bikevim pêşiya şeqraqî bi herdu baskên xwe yên ku min berê hay ji wan nebû. Kurtedemê ez fêr kirim; kurtedema ku hêrsa min û xesareta min anîne himberî baskên şeqraqekî da ku piştgiriya skandala xwe ya muhtemel bike." Û keniya: "Ez li rex skandala ku du bask dane min bûm, û ez rabûm firiyam û min şeqraqê basksist derbas kir. Haaaa", û ji ser kursiya xwe rabû, bi hêrs destnîşanî sifreyê ji serî heta dawî kir mîna yekî ku fikreyekê komî serhev dike da ku li ser sînorên wê sifrê bibêje: "Erd di bin min de, wisa nêzîk bû, wisa zelal bû: gêrik, giya, ax, herdu baskên şeqraq û siya min a ji vê sifreyê mezintir." Hedu destên xwe vekirin ku tiştekî rave bike, tiştekî ku peyvên wî têrê nakin, lê ji nişkêve qerbalixekê êrîş kir, ji wî deriyê dûr î di korîdorê de, qerebalixek hat ku da ser her tiştî.

Di navbera Tirkiyê û Rûsyayê de şer îlan bû, rabû Tirkan êrîşî qonsulxaneya Rûsî kirin. Xwe li dergehê qelibandin, çend nobedarên li wê dane aliyekî û di buhêrekê de ku çend derenceyan ji erdê nizimtir e, li pîra xwarinpêj qelibîn û ew bi işaretan dane kerrkirin heta ku gihiştin deriyê ku li pişt wî korîdorek digihîje salonê ye, ew bi destan dehfandin û dîtin ku bi kesên li dora maseyê û di nava wan de mele Selîm re, rû bi rû bûn.

Qonsulus ji ser kursiyê xwe rabû ku hîn gepa birinc û goşt di devê wî de bû. Ew di wê kêlîkê de şok bû lê di kûraniya xwe de sozê wî bi lîstikeke weha re hebû. Berçavka xwe danî û ji xwe re kûr li wan dêwan mêze kir, ewan dêwên ku satûr û tiving hilgirtibûn berê xwe dane wî zilamê ser bi şaşik û ew kişkişandin. Qonsulus destê xwe bi nerazîbûneke bêhêvî bilind kir, dengê hereketa destê wî da ser qerebalixa li ser maseyê dema ku karmendên qonsulxaneyê bi tirs ji dor sifrê rabûn.


Ücretsiz PDF Kitap Arşivi - https://rantey.org

Yekî ji wan Tirkên êrîşker bi wî destê bilindbûyî girt û ew daxist heta ku gihande maseyê, yên din jî mele Selîm kişkişandin derveyî sînorên qonsulxaneyê û meydana wê ku li wir darên gwîzan ên xurt hene, bi yekê ji wan daran ve mele Selîm daliqandin, destên wan çend caran çîmên wî berjêr kişandin da ku dilê xwe bixin cih ku nefesa dawî jê hatiye kişandin.

Evî meleyê ku ezê derbarî wî de tiştekî ji te re nenivîsim, ez mijûl kirim bavo. Baskên wî yên ku ewî qutikê xwe ji ser wan neda alî da ku bifire ez mijûl kirim. Ewî dikaribû lêborîna xwe ji mazûvanên xwe bixwesta: "Biborin" bigota û li wan rûyên li hawîrdorê binêriya û qutikê xwe yê dirêj ji xwe bikira da ku baskên xwe rizgar bikira û bi wan bilind biba. Ew bi xurtî li hev bida di ser maseyê re bifiriya ku birinc belawela biba û yên rûniştî jî mat bimana. Lê ew nefiriya bavo, tenê wî li rûyê qonsulusî nihêrî dema ku wan destên qeherî ew ji milê wî girtin, ew destên ku hinek jê li şaşika wî jî ketin û ew gindirandin ku porê wî yên xelekî û dirêj di bin de xuya bû. Ew bi razîbûn di rûyê mazûvanê xwe yê dorpêçkirî de dibişirî paşê bi efûxwestin li jinika pirr spî dizivirî ku wê jî bi şala xwe ya kinik çavên xwe vedişartin û kevçiyê xwe bi qehir davêt û lêborîn dixwest.

Tu jî min mijûl dikî bavo. Xesara te li wir û xesara te li vir herdu jî min mijûl dikin. Herêmên te yên li "Erzerûm" li "Botan" li "Bedlîs" li "Diyarbekir" li "Cizîrê" û li "Kirmanşah" û "Behra Wanê" û çiyayên ku jêdera çemên mezin in heta kaşên Rûsî, hemî min mijûl dikin bavo. Lê tu ji mêvanên xwe yên şevê re çi dibêjî, niha, piştî şeş salan? Ma tu ji wan re qala mana min a li cem Mirovê Mezin dikî? Ezê wî bibînim, çi ez xwe bikujim û çi xwe nekujim ezê wî ji sibe de bibînim. Eger ez xwe bikujim, bavo, mesele hêsantir e, çiku ezê nema bidim pê wan herçar mirovên ku bi rêkûpêk têne serdana min û ji min re piştrast dikin ku amadeyiyên dîtina Mirovê Mezin li dar in.


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Ez ji wan dipirsim: "Ma gelo dîtina Mirovê Mezin vê çendê bi hacetî van amadeyiyên dirêj e", ew bersivê weha didin:

"Çi amadeyiyên dirêj xoşewîsto? Hevdîtin gelekî hesan e, lê peydakirina cihê wî, her carekê, divê di rêyeke nû re be ku dema me û dema te dixwe. Ew li hêviya te ye. Ji roja ku tu gihiştiyî ew bendewarê te ye û lomeyan li me dike li ser vê derengmayinê." Êdî ez dipirsim:

"Min li gel xwe bibin û em dê bi hev re rê bibînin, weha qenctir e ji dîtina we ya rê û dîsa windakirina wê." Ew dibêjin:

"Dema em rê bibînin, emê vegerin û te bibin", ez dipirsim:

"Ma hûn çi dikin dema hûn dev ji min berdidin? Ma hûn naçine ba wî û xeberê nadinê ku ez bendewar im?" ew serên xwe dihejînin:

"Em naçine ba wî" ez diqîrim:

"De hûn li kê vedigerin dema ku hûn pişta xwe didin min?", ew bi aramî bersivê didin:

"Em diçin û dişêwirin ku divê em li te vegerin." Ez dîsa diqîrim:

"Ji bo Xwedê îca hûn çima li min vedigerin madam ku bersivek li ba we nîne û hûn rêya ku me bigihîne Mirovê Mezin nas nakin?" ew radibin birhên xwe bi nerazîbûn bilind dikin:

Divê em li te vegerin çiku tu takedelîlê me yî ku ewî em şandine meqsedekê.

A rewş ev e bavo, lê ku ez xwe bikujim dê nekevim pey wan di kolanên ku ez nas dikim de -dê nedim ser şopa wan di çûna ba Mirovê Mezin de, baweriya min bi wan nayê, bi gotûbêja li gel wan ya ku min nerihet dike nayê- lê ezê kurt bibirrim çiku bendewariya min dê bendewariya wî nîşanî min bide, ew bi hacet e ku sihra xwe ji alî min de piştrast bike. Û eger ku ez wî bibînim ezê ne westiyayî bim ku li gel wî suhbetê bikim. Yên westiyayî pirr diaxivin bavo, lê ezê ne westiyayî bim. Dê her yek ji me di rûyê yê din de bibişire. Dê ew koşeyekî mala xwe şanî min bide ku ezê têde hin Kurdên din jî bibînim ku ewê ji


Ücretsiz PDF Kitap Arşivi - https://rantey.org

min re piştrast bikin ku tiştê tu ji bo min dikî divê tu bikî, lê nameya te ya ji Mirovê Mezin re min girênade, ji ber ku divê ez ji wî re sebebên hebûna xwe ya li vir diyar bikim ku te nekirine; ev e ya ku dê ew ji min re bibêjin.

Ezê sibe wî peyda bikim bavo, ez vê êvara ku li gel bîna giyayê dadikeve, bêzar im, ha va ye ez derî vedikim û çend gavan ber bi baxçeyê pêşderî ve diçim, ew baxçeyê ku di bin şewqa purteqalî ya lempeya kolanê de teng xuya dike, ez radibim bi ser dareke gulê de xwar dibim û dikime pistepist: "şev baş", û bi ser ya din de jî xwar dibim û bi pistepist dibêjimê: "şev baş", û bi ser ya sêyemîn de jî, ku kinik û koka wê stûr e, xwar dibim û bi pistepist dibêjimê: "şev baş", lê di navbera min û dara bîberê ya tazî de tiştekî mîna gazinan heye. Min ew di baxçeyê pêş malê de çand da ku ez xwe paye bikim, hevalên wê li baxçeyê paş malê mezin dibûn, lê ewê hêviyên min şikandin. Weha. Hêviyên min şikandin. Gelo sûcê axê bû ku jêre nebû arîkar? Min hinek zibil li ser erdê reşand piştî ku min ew vekoland, min guh lê kir û hin caran avda û carên din ji baranê re hiştin lê darkok mezin nebû. Ez bi wê re peyivîm lê ew mezin nebû. Min jêre behsa henûniya ku di pelikên wê de veşartiye kir, henûniya wê ya ji xwediyê malê re dema ku ew pel dide, di gel ku ew çandina darkokeke bîberê li pêşiya malê weke bêyomiyekê dibîne jî: "Bîber ji bo baxçeyê pişt malê ye hevalo" ewî got: "Baxçeyê pêşiya malê dîmenek ji dîmenên dewamiya malê ye. De îcar tiştê ku didome biçîne", ewî li axaftina xwe zêde kir û di ber re jî bi xemgînî li darkoka çilmisî dinêrî.

Min urf û adetên baxçeyan derbas kirin jî lê dîsa darkoka lal mezin nebû. Loma jî ez ji hindirê xwe de pê dihesim ku divê gazinek were gotin, dema ez di bin şewqa purteqalî de ku dewletê ew bexşandiye kolana me, nêzîkî wê bûm min pirsî: "çima tu mezin nabî?"

"Ez sergerdan û lihevketî me" ewê bersiv da.

"Ma darkokên bîberê sergerdan dibin?", min pirsî.


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

“Ne sergerdanî bi xwe ye, mebesta min ku ez heyirî me”, ewê got.

“Tu heyirî yî? Çi tu heyirandiye?”, min ji wê pirsî.

“Tu çima dixwazî ez li ber te keşif bibim?”, ewê bersiva min da.

“Tu keşif bibî?” min birhên xwe bilind kirin, û li peyva xwe zêde kir “Ma niha ku tu ji min re behsa heyirîna xwe bikî tu keşif dibî?”

“Bê heyirandin dar keşif dibin”, ewê got.

“Em gelekî diheyirin û dîsa jî girtî dimînin, û hin tiştên me hene ku tu kes nikare xwe berde navê”, min bersiva wê da.

“Hûn kî ne?”, ewê pirsî.

“Em”, min bersiv da. Û bi piştrastkirineke qêrînker lê zêde kir: “Em. Em. Ma tu me nas nakî?”

“Ha. Hûn. Erê. Hûn bê reh dimeşin. Ez we nas dikim”, ewê bersiv da.

“Rehên me û te ne mîna hev in”, min tiştê ku dê darkoka bîberê tê negihîje şirove kir: “Rehên me bêrîkirin e.. ew..” min got û li peyvekê ku layiqî gotûbêjeke di navbera mirov û giyahan de be geriyam, peyveke ku xwedan hikmetekê be û ew hikmet di xwe de çi axaftina derbarî “rehan” de bi kurtî derbibire, lê ewê peyva min qutkir:

“Loma ez heyirî me.”

“Ez dixwazim bi qasî ku tu tê digihîjî, rave bikim.” min got.

“Ez peyvê jî pirr kin dibirrim ku tu tê bigihîjî” ewê bersiv da.

Ne min ew li ber xist û iqna kir û ne jî wê darkoka bîberê ya şil di vê êvara buharî ya herifî de ez li ber xistim. Eynî weke ku çawa Hesen Xeyrî nikaribû dadmendên Mehkemeya Istiqlalê ku Ataturk ew sazkiribû iqna bike û hukmê idamê lê hate birrîn. Hesen Xeyrî yê Kurd jî alîgirê Tirkên kemalî bû û hewl dida ku Kurdan aram bike û rakişîne dema serhildana mezin a Şêx Seîd di sala 1925an de ku armanca wê azadkirina Kurdistanê bû. Gunehê wî mirovê ku dixwest hêrsa Kurdan


Ücretsiz PDF Kitap Arşivi - https://rantey.org

dorpêç bike piştî ku hefsar ji destê Ataturk ketibû, çi bû? "Tu li Enqerê bi cilûbergên Kurdî diçûyî civatên Meclisê."

Tirkan li Enqerê encumenek lezgîn li darxistin da ku çi encamên li pê bidarvekirina Şêx Seîd mabin kontrol bikin, ji wan encaman jî ku serhildana Kurdan berdewam bû, rabûn kesên maqûl û bi tesîr ji bo vê misyonê bi kar anîn, ji wan kesan Hesen Xeyrî bû, tiştekî asayî bû ku ew bi cilûbergên Kurdî beşdarî civînên wê encumenê bibe, lê dadgehê ev ji wî re kire sûc! Ewî di dadgehê de destnîşanî cilên xwe kir û bi qiriktehlî got: "tu behsa van dikî?", dadmend got: "Erê." Hesen Xeyrî êdî hêrs bû: "Ataturk negotibû ku ev cilên min qedexe ne." Ê dadmend lêva xwe ya jêrîn xwar kir. "Dema tu bi van cilan dihatî meclisa Enqerê, te propagandaya Kurdan dikir." Hesen Xeyrî qêriya: "Ataturk hay ji min û kincên min bi hebû, û hedef ji wan ew bû ku tiştê hûn bi cilên we nikarin rawestînin ez bikim."

Li gel wê jî dadgehê biryara sêdarkirina wî da, ewî stûyê xwe bi şikestin xwar kir û got: "A niha ez jî tev li we dibim ey goriyên Kurdistanê." Wê nîvroya bidarvekirina mirovê ku heyirî bû di navbera baweriya xwe ya Kurdî û şikestina xwe ya wek hevalbendekî Ataturk û dilxwazê aramkirina gelê xwe de -heta ku ewî name hinartibûn Lozanê û kesên ku li wê civiyayî agahdar kirin ku Kurd serxwebûnê naxwazin- hin beytar jî hatin bidarvekirin.

Gelo Ataturkciyan dixwestin zêdebûna keriyên mî û bizinan li wan herêman rawestînin? Beytarin idam kirin ku li gundên Kurdan di gel hevringan û avên kibrîtî û hinek siûda ku Xwedê û bayê ew daye wan digeriyan. Pez, eger ku di qedera wan de ba rihet bibin rihet dibûn, û eger ku mirin qedera wan ba dimirin. Di wê hingê de jî helkehelka beytaran tev li ya nexweşên wan î bi mû û hirî dibû, yan jî beytaran nefesa xwe digirtin dema ku mû û hiriya pez dibirrîn û avên kibrîtî yên tûj di çermê wan didan. Dibe jî ewana kulmên xwe yên xurt li


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

eniyên ajelan didan heta ku kurm ji pozên wan diketin, yan jî ku mî dinepixîn ewan bi hevringên xwe kêlekên wan qul dikirin da ku ba ji laşê wan berdana.

Ew beytar bûn, serqot li gundan digeriyan mîna ku ilana pîşeyekê dikin ku divê xwediyê wê serqot be, lê tavilê wan desmalin bi ser porê xwe yê kurkirî de berdidan da ku xwe ji toz û tavê biparêzin. Ew di gundên xwe de hogirî wê yekê bûbûn bêguman, lê xwe ji gundên din re serqot didane xuyakirin mîna ku -di xwenîşandaneke şêrîn de- bibêjin ku ewan zanistên xwe yên mezin li bajarên mezin bidest xistine. Lê ewan di pîşeya xwe de ji qesdî ve mirov û heywan tev li hev kiribûn, ew li gel ajalên nexweş diaxivîn da ku xwediyên wan bibihîzin, û dema ku kibrît di çermên wan didan, li xelkê dizivirîn û bi dizî digotin: “Ev tenê destpêk e.”

Û ew destpêk, a ku beytaran mizgîniya wê dan, Ermen û Çerkez û Aşûrî jî hembêz kirin da ku (herêmên din tev li milletên xwe bi Kurdistana mezin re bikin yek), her wekî ku Ataturkciyan digot. Lê hêviyên wan milletan jî bi bidarvekirina Şêx Seîd re bi dar ve bûn, Şêx Seîdê ku nikaribû pêşberiya hîlebazî û qurnaziya Ataturk bike ku li gel alayên duyemîn, sêyemîn, heştemîn, dwazdemîn û hivdemîn û alayên siwarî yên yekemîn û çardemîn, û herdu ketîbeyên sêyemîn û çaremîn yên hêzên cendirmeyan, û leqa heftemîn a artêşê, û hin beş ji alayên peyadeyan ên heftemîn û çilûyekemîn li Edenê, Melatya, û hin beş ji leka nehemîn li Diyarbekrê, û dwazde firoke (ev li gor agahiyên Ismaîl Heqiyê ku beşdarî serhildana Kurdî bûbû), her weha dused hezar leşkerên Tirk li dijî çil hezar şervanên Kurd.

Êlên Dêrsimê jî bi hewara şêx ve neçûn, hin ji serokeşîrên Mûşê, Sêrtê, Swêrekê jî, lê ewê serhildanê pêncî milyon lîre li xezîneya dewletê kirin xesar, di sala 1925an de ew ribê budceya salane a Tirkiyê bû.

Ew erd erda bayê bû: dar dihejin û giya dihejin. Giyan di nav peşkên sûlavan de dihejin. Bawerî diheje, hikûmet, eşîr,

hevpeymanî, cegermendî, westabûn û kundirên hişkirî jî, lê pirçeke mîna pirça ne'nayê digre ser êşê. Ha va ye bayên nermik peyapeya digihîjin baxçeyê min, êdî darkokên gulan dihejin û bi wan re silava min a êvarî jî diheje, ez dengê xwe dibihîzim ku ji cihekî li min vedigere:

"Çima hûn firiyan?", min ji herdu teyrikên ku li wê çola hemsînora baxçeyê pişt malê danîn, pirsî.

"Da ku tu bidî pey me" wan bersiv da.

"Hûn dizanin ez vê yekê nikarim." min ji wan re got.

"Em difirin da ku hema kî be bide pey me", herdu teyran gotin.

"Ma hûn çi ji min re vedişêrin ku ez bidim pey we?" min pirsî.

"Firandina me", ewan bersiv da.

"Min jî ji bo we tiştek veşartibû", min got.

"Firandina te?" ewan pirsîn, ez keniyam û min got: "Meşa min."

"Meşa te?" bi qerf dubare kirin "Meşa te?", û zêde kirin: "Ma çi hewceya me bi meşa te heye?"

"Ew problema we ye", min bersiv da.

"Em jî dimeşin" wan got.

"Ez jî difirim" min got, nerazîbûnek mezin li wan peyda bû ku di bin perikên wan de derket:

"Ma tu henekên xwe bi me dikî?" ewan pirsî.

"Ma hûn dixwazin baskên min bibînin?" min ji wan pirsî, ewan bi tirs xwe komî ser hev kirin.

"Çima we wisa xwe komî ser hev kir?"

"Me wisa nekiriye, lê em guhdarî dikin"

"Hûn guhdariya çi dikin?" min devliken pirsî.

"Em guhdariya dilê te dikin" ewan bersiv da.

"Dilê min" min peyv bi henekî got û destê xwe nîşanî dilê xwe kir: "Ev? Hûn guhdariya vî dikin?", min ji wan pirsî û li

hêviya tu bersivan nemam, lê min li axaftina xwe zêde kir: “Ev tiştek e ku guhdariya wî nayê kirin”, ewan herduyan gotina min birrîn: “Ma divê em li çi guhdarî bikin?”, min bersiv da: “Li dilê min.”

“Li dilê te?”, herdu ji bersiva min mat man û bi hev re gotin: “Me ev ji te re gotibû. Me got ku em li dilê te guhdarî dikin”, min devliken ji wan pirsî: ”hûn li çiyê wî guhdarî dikin?”

“Li gupegupên wî”, bersiva min dan.

“Tu ji xwe re li vê xefkê!” min got. Ew matmayî qêriyan: “Kîjan xefk?”

“Gupegup”, min bersiva wan da.

“Û divê em di te de li çi guhdarî bikin, eger ne dilê te be?”, herdu teyran got, min bersiv da: “Li firandina wî guhdarî bikin”, dîsa bi tirs xwe komî ser hev kirin.

Û ez jî, vê êvarê ku ber bi wê erda rast de diçim, ku li bin şewqa şil î purteqalî ye, dengê firîna baxçe jî dibihîzim. Ez dengê firîna darkoka bîberê ya çilmisî dibihîzim. Lê qerebalixa ku ji aliyê wê mala ku ew du kesên di qapûtên xwe de winda, têde bi cih bûbûn dihat, guhdarkirina min diherimîne û ez bêtir pêşde diçim ber bi sûrê nizmik î hesinî ê ku baxçeyê pêşiya mala min ji dîwarê wê malê dibirre diçe û ez dîwêr bi gavekê re derbas dikim û li ber pencereyên di dirêjiya wî de radiwestim.

Deng niha zelal e lê mereqdariya min deng derbas dike, ez hewl didim ku di nav textikên pencereyan re ku li gor hendeseyeke kevn sazbûne, binêrim, êdî ez formin parçebûyî, qetqetî dibînim ku xuya dibin û winda dibin bêyî ku ez bikaribim wan nas bikim. Di wî halî de jî divê ez li aliyê garajê, li rastî xwe binêrim ku ji wir bîna nearamiya heywanên di tariyê de rûniştî tê min.

Naxwe divê mirov li pencereyekê bigere ku ji bîr bûbe were girtin. Ha va ye ez jî li pişt malê bi alî rojhilat de dizivirim, li

wir kulîlkên darên purteqalan bi şerm bişkiftine, ez pencereyan dibînim ku bi temamî girtîne, ez ji bêgavî bi alî rojava de dizivirim, yanî ji aliyê dergeha ku kulîlkên yasemînan bi ser sûrê wê ketine û bûne çelîpanî li gel dareke boganfîliyê ku mîna kevanekî ji erdê heta binbanê malê kişiyaye, herdu pencereyên pêşiyê jî girtîne, lê qerebalixek tê guhê min mîna ku kesên li hindir peyvên hevdû dibirrin, û pirtepirteke bilind jî ji baskin tirsiyayî tê ku li bin guhê hev dikevin û yekcaran jî bêdeng dibin û êdî ji nikilin nîvgirtî dengên teyran tê.

Hîç deverek nebû ku ez têre bi zelalî tiştan seh bikim, loma ez qeherîm. Min çavê xwe yê rastê li ser qulika kilîtê danî paşê jî li ser qelşa di navbera herdu felqeyan de û paşê min rûyê xwe bi erdê ve zeliqand û di bin derî re temaşe kir. Dawî jî ez li himber derî ji pê sekinîm mîna ku ez dikim lê bidim, lê bavê min hate bîra min. Ew di kêlîkeke birûskî de hate bîra min: ji civata wî jî qerebalixeke weha dihat bêyî ku kesek were û nerazîbûna xwe nîşan bide. Mêvanên wî yên dengbilind -tevî ku bi aramî ji dergehê derbas dibûn- piştî çend peyal çayê, waqieyeke dîrokî tev li ya din dikirin, ya bi belge tev li ya çêkirî dikirin:

“Bavê Mem, Tirk nikarin bikevin çiyayê Sasonê” berê xwe didin bavê min û dibêjin. Bavê min jî derbarî vê waqieya salên siyî de ji vê sedsalê bi bawerî li wan vedigerîne: “Jixwe nikarin” û di bin wê desmala xwe ya ku rûyê wî di tariya wê de winda dibe weha berdewam dike: “Tirk nikarin bikevin çiyayê Sasonê.” Lê ew tu belgeyan nayine holê, tiştê ku dibêje belge bi xwe ye. “Nakevinê.” Lê Tirk ketin Sasonê, keleha Kurd û Ermenan, û serên jêkirî li meydana bajarê Ercîşê ku li bakurî behra Wanê dikeve bilind kirin.

Sedsal ketibû heftêsaliya xwe, piştî salin dirêj ji heriftina serhildana “Xadim’ul Mucahidîn Muhemmed Seîd El-Neqşebendî” (herwekî wî bi xwe nav li xwe kiribû) yanî ya Şêx Seîd di sala 1925an de. Lê divabû bavê min bi xwe dîrokê bi

sînorin “plankirî” saz bike: “Ew çawa dikarin bikevin Sasûnê? Ba nahêle”, mêvanên wî jî serê xwe dihejînin: “Na. Ba nahêle.” Lê berî wan agahiyên bavê min bi dehan salan Tirk ketibûn çiyayê Sasûnê.

Ez jî, ev qelşên deriyê mala pêşberî mala min nahêlin ku tiştên têde diqewimin bibînim, ez têm ku lê bidim, lê derî ji nişkê ve vedibe, ez vediciniqim mîna ku ezê ji ber wê vewestana xwe lêborînê ji kesekî bixwazim, nîvê min di siya serbanê çemento yê li pehnava wê malê de ye û nîvê min ê din di bin ronahiya purteqalî ya lempeya kolanê de ye. Û berî ku ez xwe li ber şoka veciniqînê ragirim, ez destê xwe hema çawa be bilind dikim da ku piştgiriya hebûna xwe ya li pişt derî bikim, lê ez dibînim ku ew kesê derî ji min re vedike, dibêje min: “Mem Azad fermo derbas be.”

Tiştê ku tevliheviya di serê min de zêdetir kir ew bû ku, tu kesekî ji van navê min nizanîbû, bi baweriya min, de îca çawa bi navê min bang li min bû? Tîpên navê min hişk in. Weha hate bala min dema ku min derîzanka malê buhurand û derbasî korîdora kêmronahî bûm. Navê min kovî ye. Dema ku yek bang li min dike ez dibêjim qey ji pişt sedsalan de bang dike; ji paşdema dûr di kûraniya min de ku xemgîniyeke tenik û ziyaneke tenik her di navbera min û dîrokê de heye.

“Fermo” ew kes dibêje û ez jî derbas dibim. Ronahî kêm e. Korîdoreke fireh li pêşiya min e ku li herdu aliyên wê qefesên mezin in û xelkin hema çawa be li himber hev di du rêzên dirêj de ne. Serê hemûyan bi şalikan nuxumandiye, jin û mêr in, deng ji siyên ku rû têde pêl didin derdikevin. Ez li wî kesê ku ez derbas kirime dizivirim, ez tevliheviya xwe jêre radigihînim, û ez dixwazim bibêjimê ka divê ez çi bikim, tew çima ez derbas bûme û ew çawa navê min dizane, hew ez dibînim ku yê li himber min ew mêrê bi jina xwe re bi wî qapûtê giran hatî bi xwe ye. Ew qapût hîn lê bû û destê wî yê rastê di berîka wî de bû.

Ez kawikane bişirîm, ewî di bin du birhên stûr de ku porekî gij î li ser eniyê belavbûyî bi ser wan de bû, li min nihêrî û paşê awirên xwe daxistin aliyê solên xwe yên giran, dîsa awirên xwe berdan û destê xwe yê çepê dirêjî wan kesên rûniştî, ên ku guh li derbasbûna min nekirin, kir û bi hêdî got: “Ev in yên ku bendewariya xwe temam kirine.”

Min wisa fêm kir ku ew behsa Mirovê Mezin dike yan jî hewl dide ku behs bike, ez bendewarê wî me, û wan jî bendewarî temam kirine, yanî li gel wî civiyane. Mentiq weha dibêje. Dema xwediyê qapûtê giran dît ku ez mîna kesê têgihiştibe ka wî çi got guhdarî dikim, berê xwe da min û pirsî:

“Tu dizanî ewan çawa bendewariya xwe temam kirine?” min bi bawerî got:

- Ewan Mirovê Mezin dîtine.

“Kîjan Mirovê Mezin?” Wî pirsî, û min bersiv da:

“Ewê ku bavê min ez şandime ba wî”, ewî hinekî serê xwe daxist û bi pistepist got:

“Bavê te tu şandiyî ba kesekî ku muhtacî dîtina te ye”, rabû min matmayî pirsî:

“Kî muhtacî dîtina min e? Mebesta te Mirovê Mezin e?” ewî bersiv da:

- Erê.

“De ka çima ez vê çendê li hêviya wî mame?” min pirsî û wî bersiv da:

“Çiku tu ji wî bêtir dikarî bendewar bimînî.” Rabû min dîsa jê pirsî:

“Hikmet ji vê gêjeniyê hemûyî çiye îcar?”

“Qey tu li hikmetê digerî? Li teyrekî bigere.” Min milên xwe bi pirsdarî bilind kirin:

“Mebesta te kîjan teyr e?”, ewî got:

“Ewê ku bi te re perikên xwe diguhere bi....”, û rawestiya û bi kûranî li min nihêrî, rabû min ew kêlîk bi pirsekê şikand:

“Perikên xwe bi çiyê min re biguhere?” ewî got:

- Bi tiştê ku tu dikarî pêre biguherî.

“Ma mirov çi bi perikên teyran re diguhere?” min pirsî û wî bersiv da:

Tiştê ku ew dê bi perikên teyrên ku wan nêçîr kirine re biguherin.

“Wan teyrên xwe li ku nêçîr kirine?” min bi qerfî pirsî, wî bersiv da:

- Li vir.

Min lêva xwe ya jêrîn bi qerf gez kir û got:

“Û çima li vir? Ez dibînim ku ew ji devereke din hatine?” ewî bersiv weha da:

- Her kesek teyrê xwe ji cihê ku divê nêçîr bike, dike.

“De îca wê paşê çi bikin?”, min pirsî, wî bersiv da:

- Tu yê bibînî.

Li vir henekek diqewime, ez dikarim teyrikên di qefesan de li nêzîkî kesên rûniştî bibînim, lê girêdana wan î bi axaftina di navbera min û vî mirovî de hinekî zor e. Lê çîroka Mirovê Mezin û min û bavê min bi temamî tevlihev e. Û tew navê min?! Ewî çawa navê min nas kir?

“Tu çawa navê min nas dikî?” min ji xwediyê qapût pirsî, ewî bersiv da:

- Herkes navê xwe heye.

“Ha” min got û bi henekî lê zêde kir:

“Ê min navê min nîne.” Ewî got:

Ê de bila hema navê te Mem Azad be.

- Ez Mem Azad im, erê, lê ka navê vî kesê ku ji xwe re dilîze çiye:

“Navê te çiye?” min jê pirsî, wî bersiv da:

- Ji Mirovê Mezin bipirse.

Diyaloga ku wisa lidardikeve ehmeqî ye, loma jî min biryar da ku dev ji wî cihî berdim di gel ku gelek pirs hene min mijûl

dikin û diheyirînin, mîna ku ez dixwazim ji xefkekê derkevim. Her kes carekê wisa hest dike ku xefkek jêre hatiye vedan. Wan herdu teyrikan jî wisa hest kiribû. Gora ku ez dixwazim a li çola pişt baxçeyê piştmalê ye wisa hest kiribû. Û ez jî, ji xwe, tê digihîjim ku ew herdu teyrik dê bêhna lîstikekê ji min bikin û bifirin, lê ez tu sebeban ji vedana xefkan ji wê qaşo gora xwe re nabînim: hîç kesek nikare xefkekê ji gorekê re vede.

Û gora ku ez li wê çola hanê dixwazim, qûma wî bi hev ve dizeliqe heta ku dibe mîna keviran, û ew pehnava qûmî ya pişt baxçeyê li pişt malê dibe zeviyekî ji kevirê çeqmaqê, ez bi tefşoyê xwe lêdanekê lê didim ku hestiyên destê min ji ber dihejin û pirîsk dipengizin lê nayê kolan. Careke din jî ez bi tefşoyê xwe xurttir lê didim, belê nayê kolan. Ez pehînekê bi kerb lê didim, nayê kolan. Êdî ez jidesthilanînketî bi ser wî erdî de xwar dibim û ji nav diranên xwe yên zû kurisîne bi pistînî dibêjim:

"Ji bo Xwedê gorekê bide min", erda hişk dibêje:

"Ma çi pêdiviya te bi gorekê heye?" Ez bêtir diqeherim:

"Tuyê çawa pêdiviyên min nas bikî?", ew bersivê dide:

"Bi qasî ku tu jî pêdiviyên min nas dikî." Ez bi qerf dibêjimê:

"Tu bendewar î, ezê jî pêdiviyên te paşê ji te re bibêjim" dipirse:

"Ez bendewariya çi dikim?" ez dibêjim:

"Mirina min", ew dibêje:

"Na. Ez bendewariya gera te ya li gorekê dikim", ez bersivê didim:

"Ha va ye ez li gorekê digerim. Ma tu nabînî?" ew dibêje:

"Na tu li şehweta xwe digerî" erd dibêje, ez mat dimînim:

"Ew çi şehwet e ku ezê di gorekê de bibînim?", ez jê dipirsim, ew bersivê dide:

"Şehwet ew e ku tu bidî pey gorekê", ez hêrs dibim:

"Ev çi ehmeqî ye....", ew peyva min qut dike:

"Erê...tu li vê ehmeqiyê", û zêde dike: "A ku li te digere gora te bi xwe ye, ewê te di xaçerêyeke biçûk de bibîne ku li wir tu

xwe ji şehweta gera li gorekê dadiweşînî", ez ji xilmaşiyeke ku hîn bi min negirtiye dibawişkim, û bi pistînî dibêjim:

"Gor xweperest e", ew jî dibawişke û dibêje:

Tu jî weha yî.

Na. Ez tiştekî weha nema ji erdê dipirsim, û ez nema ji vî mirovê ku destê wî yê rastê di berîka wî de ye dipirsim ka ewî çawa navê min zanî, lê ezê di derî re derkevim, belê ew li ehmeqiya di navbera min û xwe de digihîje û radibe dikeve pêşiya derketina min heta ku hindik dimîne bêvila min li qapûtê wî bikeve, ez êdî çavên xwe dikim rûyê wî yê ku bostekê yan kêmtir bi ser min ketiye, û li wê rawestîna wî ya di rêya min de mat dimînim, ew jî dike pistepist:

"Niha dernekeve", ez dipirsim:

"Ferq çi ye?", ew bersivê dide:

"Ezê herdu teyrên ku firiyan û tu hêrs kirin şanî te bikim." A wê demê ez pê dihisim ku zimanê min zuha û giran e, û li gel ku veciniqîneke weha bi henekan dagirtî ye jî, ez bi cidiyet jê dipirsim:

"Ma tu ji kû dizanî ku ew herdu teyr bi xwe ne?", ew bersivê dide:

"Ewê jî te nas bikin. Ez berê bi wan re peyivîme", lêva min a jêr dilerize ku ez li wî kesê ji nearamiyekê hatiye dinêrim:

"Tu henekan dikî?", ez dibêjim mîna ku giraniya hizrekariya ku zêde dibe ji ser xwe vedidim, ewê di qapûtê xwe de winda dibêje:

"Ma tu bi wan re nepeyiviyî?", ez hêrs dibim:

"Mebesta te ew herdu teyr in? Ma kî bi teyran re dipeyive?", û ez li dora xwe dizivirim û hema çi be xwe davêjim bextê wî, û zêde dikim: "tu henekê xwe bi min dikî?", ew dibişire heta ku ez ronahiyeke sivik di navbera lêvên wî de dibînim, destê xwe dirêjî min dike û kaxezeke qermiçî dide min û dibêje:

- Naxwe vê ji me re kopî bike, eger dema te hebe.

Ew cidî xuya bû, min kaxez ji dest wî girt bi baweriya ku ew dizane çi dibêje, di gel wan gotûbêjên me ên berê ên ku mubalexe dikirin di rêzkirina gumanên ku em newêrin zêde wan pûç bikin. Gava min haxez vekir hinek ji kenarên wê kurisî bû lê herfên qeto qeto yên çapeke zêde kevnare neçûbûn:

"Ev Almanên Protestant derewan li we dikin."

Min du caran kaxez xwend bêyî ku ji wî kesê ku di qapûtê xwe de winda bûye bipirsim ka armanc jê çiye û çi wateya kaxezeke weha heye ji bilî haydarkirina ji wan gewezên bi rî ên ku kovara *Kurdistan*ê berî şerê cîhanê yê yekem bi çend mehan derxistibûn. Di rêya wê kovarê re berê xwe bi zimanekî Kurdiyî şikestî dabûn Kurdên Îranê da ku wan bikin alîgirên hevpeymaniya Tirk û Almanan "Ji bo pêwistiyên ku yekbûna nijadê Arî wan îcab dike?" Belê ez, bêyî meraqeke mezin ji wî dipirsim ka nivîskar kiye, û ewê di qapûtê xwe de winda dibêje:

- Ew Hecî Simko ye.

Ez dikime birebir: "tu çend nusxeyan dixwazî?", ew dibêje:

"Heştê hezarî....", ez vediciniqim:

"Tu henekan dikî?", ew dipirse: "Ma tu dikarî?"

"Erê. Ez dikarim", ez dibêjim û lê zêde dikim:

"Lê ev gelek e." Ez bendewariya şiroveyekê ji wî nakim, lê peyva xwe temam dikim:

"Hûn dikarin bi rêya kopîkerekî bi asanî kopî bikin", ew gotina min bi zivirandineke bal bi wan herdu rêzên mirovan, qut dike:

"Em xeta destê te qenctir dibînin", ez mat dimînim:

"Tîprêzî vê hevokê waye bi aletekê bûye, ma wê çi bibe ku hûn bi aletekê jî kopî bikin?" ew bersivê dide:

"Husên Mukriyanî hişt ku Protistantên Alman bi rihetî zimanê me li ser aletan binivîsin", ez dibêjim: "çi min û Mukriyanî?" ew bersivê dide:

"Îşê wî ji te nîne, lê ji vê kaxezê heye", ez jê dipirsim: "Ma wî ev çap kiriye?", serê xwe bi nîşana erê dihejîne.

Bêguman, çawa ku hîç têkiliya Husên Mukriyanî bi min nîne, wisa jî têkiliya wî bi misyonerên Alman yên Protestant jî nîne. Ewî hinek dirav komkiribûn, ku ne bêtirî dused lîreyên Tirkan bûn, da ku bi sed û bîstan ji wan makîneyeke çapê yî biçûk ji Almanyayê bikirre û paşê bigihîne Helebê di dawiya sala 1915an de, ewî hin fontên nû ji tîpên dengdar re hilbijartin ku di Farisî de hene û di Erebî de nînin, paşê dîsa vegeriya Almanyayê ku qalibê wan fontan durust bike û paşê jî vegeriya Helebê û yekemîn pirtûk çap kir ku ew jî *Mem û Zîn* bû. *Mem û Zîn* jî destana ku helbestvanê gewre Ehmedê Xanî nivîsiye û mijara wê evînek di sedala çardehên zayînî de ye ku bi sedê salan hêsir bi çavên Kurdan xistibû. Ez jî -piştî ku bavê min jî hêsir rijandin- ji wê yekê nefilitîm ku navê evîndarê di destana Xanî de bi min ve bizeliqe. Lê heta niha jî ez tênagihîjim bê ka evê di qapûtê xwe de winda çima çêtir dibîne ku ez bi xeta destê xwe wan peyvên li ser wê pelika kevn binivîsim!

"Mukriyanî protestanên Alman fêrî zimanê Kurdî nekirin", min ji wî kesî re got, ewî milên xwe hejandin:

"Ma ferq çi ye? Ew ji tîpên makîneya wî fêr bûn", min jî milên xwe bilind kirin:

- Bi her halî ewê ji kesekî fêr bibana.

Bêguman ewê ji kesekî fêrbibana, çiku ew misyoner berî misyonerên din hatin Kurdistanê. Mukriyaniyê ku zimanên Hindî, Erebî, Farsî, Tirkî tevî zimanê xwe yê Kurdî baş dizanî ne sûcdarê derbasbûna milletan a xaka Kurdistanê bû, ne sûcê çapxaneya wî bû, lê hîn berî wê çapxaneyê û piştî wê jî çavên wan milletan li tixûbên hestiyên Kurdan î "Bextewer" bûn. Husên Mukriyanî ku Rûsî jî fêr bûbû ne sûcdarê penaberiya serekên Kurdan ên mezin li Rûsyayê bû, ewan serekan berî wê makîneya biçûk î ku hibra wê pirr e, serkeftinên "Imperatoriya qeşayê" li rojhilatê "Imperatoriya Bab-i Alî" mîna motîvasyonekê ji hevpeymaniyên nû re dîtin.

Herweha guman nîne ku tu sûcê çapxaneya Husên Mukriyanî sala 1915an di şoreşa Mele Selîmê Bedlîsî de û şoreşên din ên li Sêrtê, Xerzan, Botan, Şêrwan, Xerpût, Mêrdîn, Nisêbîn, Midyat, Cizîrê, Diyarbekir, Zaxo, Silêmanî, Kerkûk û Wanê jî nîne. Van bajaran sê salan berî ku çapxaneya Mukriyanî were serî hildabûn û herwekî ku propagandaya Tirkan digot: "plankirî bû" ku ew tev li Rûsyayê bibin.

Makîneyeke mîna yên din bû, gelek berhemên Kurdî çap kirin, gelek hevok, gelek leqeb û nasnav, gelek ayetên Qur'anê, medhiye, helbestên tesewwufê, tarîxên guhlênebûyî, name, û serpêhatiyên serhildana Şêx Seîd jî bi Kurdî û Ingilîzî çap kirin. Piştî ku Mukriyanî wefat kir jî, çapxaneya wî -a ku giyanê wî bi hibreke ku bîna risasa hilandî jê difûriya şûşt- çû Hewlêrê. Paşê çapxane jî mir, ji xemgîniya li ser hibreke ku nema têrê dikir mir.

Lê divê ez heştê hezar nusxeyî ji wê hevoka ku wî mirovî daye min bi destan binivîsim, bêyî ku ez jê bipirsim bê ka kê navê min daye wî, bi rastî jî ez ne meraqdar im. Hema ku ez li wan herdu rêzên mirovan dinêrim di wê korîdora mezin de, bêdengiyeke ehmeq digre ser min, ji ber ku ew teyrên di qefesên li dirêjiya korîdorê de ew jî mîna min xwe teslîmî bêdengiyeke ehmeq dikin li ber munaqeşeyên bilind ên wan lêvên ku di roniya kêm de nayên dîtin. Mirovê li ber min rawestiyayî jî, yê ku di qapûtê xwe de winda ye, qet min li rûniştina li cihekî yan jî li derketina ji malê germ nake: ew dibişire her ku ez lê dinêrim. Ez jî -jixwe- awiran jê dadigerînime her aliyekî bi sebebê lihevketineke sivik ku ji kêlîka min xwe li himber vî kesê ecêb dîtiye ve li min peydabûye. Lê dema ku ez bi alî rastê de dinêrim, tavilê vedigerim û li wî dinêrim. Ku li aliyê çepê jî dinêrim, tavilê li wî dizivirim. Ku li erdê dinêrim tavilê li wî vedigerim, herweha dema ez li binê banê malê yan jî li kûraniya xwe dinêrim.

Ew di wê nêzîkbûna herdu rûyên me de rawestgeha awirên min e. Ew -bi wê bişirîna xwe ya ku tiştekî ji kurtedema min

didoşe- asoyekî ku ne yê min, yê wî ye, ji çavên min re derbas dike, çavên min ên ku xwe teslîmî wî dikin di roniya zeîf ya wî cihî de. Ez jî naxwazim, bi şikestineke nenas, naxwazim rê li ber firehbûna wî bigrim, mîna ku ez li gel wî dişemitim bilindiyeke dûr û bi du bîbîkên xurt li tevgera sivik a erdê ku xwe teslîmî henekên bayê dike û tîqetîqan belav dike, dinêrim. Yan jî mîna ku ez li gel wî me di bayekî de ku pelên daran, reşreşka avê û qefesên teyran difirin, û ez jî xwe ji ber didim alî, bişkokên gumlekê xwe yê vekirî ku pê derbasî vê malê bûme digrim, û ez êvara wê buhara berbad herdu nigên xwe bêtir di solên xwe de bi cih dikim.

Ew nêzîkî min e, ewê di qapûtê xwe de winda, ez jî bi wî gumlekê xwe yê vekirî û bi wî pantelonê xwe yê ku herdu kabokên wî nepixî ne û bi wan herdu solên ji qumaşê buharî û şil nêzîkî derî me. Û ji ber ku ezê pirsa hûrgilyên ku bi israr têne bala min di vê çavpêketina henekpêker de nekim, ez dê bê destûrxwestin ji malê derkevim û berî bidim wî asoyê ku di şewqa purteqalî ya lempeya kolanê de xerqbûyî, ew şewqa parvekirî di navbera baxçeyê ber mala min û baxçeyê mala ku ez ketimê de. Ezê ji nû ve silavê li hersê darkokên gulan bidim û xatir ji wan bixwazim: "şev baş." Paşê ezê li darkoka çilmisî a bîberê bizivirim û bibêjim:

"Xeweke xweş ji min re hêvî bike", darkoka bîberê ê bibêje:

"Îşev tu dê nikaribû binivî." Ezê bipirsim:

"Çima?", darkoka bîberê ê bi devliken bibêje:

"Çiku tu dê xwe bikujî", ezê jî bikenim:

- Ma tu nabînî ku min xwe kuşt û her tişt qediya?

Lê ew mirovê di qapûtê xwe de winda hîn jî nêzîkî min e û ez jî hîn nêzîkî derî me û divê ez lêborîneke sivik bixwazim ku derkevim bêyî ku ji wî pirsa hûrgilyên ku min di vê çavpêketina henekpêker de nearam dikin, bikim. Mîna ku ew mirov bêhna xwestina derketinê ji min dike, ew dipirse:

- Ha Mem, tu ne mecbûr î ku bimînî.

A wê çaxê ez destê xwe yê rastê, ê ku ji destdanê re amade ye, bilind dikim û bi pistîniyek şermawer dibêjim:

"Dîtina te ji min re rûmetek bû", êdî ew mirovê di qapût de winda, destê xwe yê rastê ji berîka xwe derdixe û dest dide min, ez vediciniqim û bi şûn de diçim, destê wî yê ku dirêjî min dike ne ji goşt e, ew dişibihe baskekî biçûk, mîna mista destekî ye ku bi perikên spî nuxumandî be.

# Para Duyem

Vegotineke pêwist daku afirandina
Mem a mîna çeqelekî temam bibe.

Dengê çeqelan şev dikire baxçeyekî ronîkirî bi camên reş. Û Memê ku hîn nerazayî di nav nivînên xwe yên li ser banê malê de diqulipî ji ber fikra ku dibe ew îşev jî bi mêrdewanê dakeve jêr. Ewî çavên xwe bi hemû firehiya wan vekirin û li wî ezmanê havînî temaşe kir, wî ezmanê ku şêniyên bakurê Sûrî bost bi bost nas dikin, çaxa ku li hewşên xwe yan jî li ser banan di wê tariyê de radikevin û cihên wan nayên naskirin ku ne ew namûsiyên spî bin ku kelmêşan dûr dixin, yan jî cihên wan tê naskirin bi roniya cigareyên ku ew dikişînin û dema ku vedimirînin pirîsk mîna kêzikên şewqê di hişê wê şeva li ser niga de belawela dibin.

Stêrkin li jor. Qonaxin veşartî di navbera stêrikan de li jor. Valahiyin ku gamêş têre derbas dibin aliyê din î ku gerdûna herî dûr li wir e, gerdûna ku ji du quloçên mezin dawerivîne li pişta erşê Xwedê ya bi ser avê de daliqandî. Lê Mem ditirse ku şeva buhurî dubare bibe loma jî di nivîna xwe de diqilqile. Şeva buhurî jî, her wekî ku divê were zelalkirin, şeva ku Mem têde li ser ban di nav nivînan de bû û dît ku ew guhdariya zûrîniya çeqelan dike, ew zûrîniya ku ji zeviyên bakur ên bajarê Qamişlo

dihat, ewî guhdariya wê zûrîniyê dikir bi kûraniyên ku hîç berê ne weha sihirbaz bûn. Ya asayî ew bû ku dengê heywanên êvarê bi mirov nexweş were yek caran, û hin caran jî bi wens be, li gor xulqê kesên di şevbuhêrkan de, lê ku yek ji nav nivînên xwe, mîna Mem, rabe û berê xwe bide jêdera wan dengan, ev hîç ne di hesaban de bû.

Mem pile bi pile bi mêrdewana text ji serê ban daket, çawa ku nigên wî bi erda hewşê bûn, guh li bavê xwe û hevalên wî yên ku pêre şev li ser kulavên dirêjkirî li ser erdê dibuhurandin nekir, lê belê ewî berê xwe da dergehê sûrê hesinî û derkete derve û berê xwe da rojavayê bajêr ku werzên avî û yên bejî li rex hev in û xwe dane dora bermayê ava ku tirimpeyan ew kişandibû. Ew tirimpeyên ku şopa wan li bazaran nema piştî çend salan ji têkçûna Ereban di cengekê de ku bêyî çi razên leşkerî sala 1967an beşdarî wê bûbûn, ew sal di hesabên Hemdî Azadê bavê Mem de ji zêr bû: "Kurdistana mezin ji vî agirê di serê cigareya di devê min de nêzîktir e.", ew weha dibêje dema ku dû dikişîne kûraniya pişik û hestiyên xwe. Lê "Kurdistan"a Hemdî roj bi roj dûrî tiliyên wî yên zivir çû, di demên piştre, dema ku gelek dewletên têkçûyî ji çol û beyabanên bakurê Efrîqa heta Xorasanê kom bûn da ku Hemdî Azad bi tenê têk bibin, ewê winda di nav nijadên êlên ku wî ew amade dikirin ji bo ku rêberiya pêşeroja Kurdî bikin.

Bi cilên xwe yên xetxetî yên xewê, bi porê xwe yê gij, Mem berê xwe da zeviyên rojava, hinek sikak di nav malên nizmik re buhurandin û bi çola mezin re rû bi rû bû, çoleke ku sînorên wê tenê ev bûn: girê Hilêliyê û deviyekî biçûk ku hew kokên darên jêkirî têde mane û erdeke kûr ku zemanekî rûbar bû berî ku Tirk berê wî biguherin ji bo ku bazara parzemîna Erebî li ser kaniyek du kanî ji ava çiyayên Torosê bikin, ew parzemîna ku bi diravên xwe, bi artêşên xwe, bi ebayên xwe, bi qitî û tirûziyên xwe, bi ewrên xwe, bi bayên xwe, bi zimanên herêmên

xwe, û bi kêfxweşiyên xwe yên vediguherin avrêjin din diwerive zuwabûnê.

Mem her ku di deviyê berbad re dûrtir diçû, xwe mîna kevanekî xwar dikir û şehwetekê ew dajot ku bi çarlepikê bimeşe û erda di bin pelên hişk ên daran de bîn bike. Ew bi cihê ku berê tarî bû dihisiya bê çawa ji hisên wî re vedibin îcar nas dikir kîjan kok zindî kîjan mirî ye, xweliya hişk û zuha ji ya şil î ku sî wê bi rewa dike nas dikir. Ewî dikarîbû di nav xelekên ji kakivîlkên (kîvarkên) bejî de ku li dora kokên jêkirî diyar in, yan jî di tilmên bin pelan de veşartî ne, yan jî kîvarkên ku li hêviyêne qaşilê erdê yê ku tesadufên bayê ew ristine biqelişe.

Mem bi çarlepikê siviktir dimeşe. Û ew cihê tarî jî di wê şevê de ji çavên wî yên kûrbîn re hêdî hêdî zelal dibe. Mem -ku hîç hisekî weha berê lê peyda nebûbû- hemû aliyan bi hesasiyetek ku bînên têkel ji hev vedirêse, bîn dike: ev bîna sapên genimî ne; ev jî bîna zeviyê qernebîtan e; û ev coyek av e; ev bîna mirovin e ku di rêyên axî re ku deviyê digihînin girê bilind meşiyane; ev jî bîna erdekî qerac e; û ev ya erdekî avî ye; ev bîna qitikên di hêlînên xwe yên di bin mitên xernûfê de veşartî ye; ev bîna pîna mirîşkan e û ev jî bîna kûçikan e.

Mesele ne tenê di bînan de ye, lê liv û tevgerên dûr û nêzîk jî, çi liva pelên daran be, çi ya firefira baskên di şevê de be, çi ya cirdiyên zeviyan be, çi jî ya şînhatina giyayekî be yan buhurîna bayê di nav kokên zuha yên darkokên çolê de be û çi jî ya hestiyên ku nalîna wan di goristanên dûr de her û her bilind dibe.

Fezayekî hendesî yê laşê Mem heye, mîna ku ew û bayê li gel hev dimeşin bi eynî harmoniya di çîp û lingên wî de. Di navbera wî û aliyan de jî balansek kemilîtir heye, ew wan dibîne dema ku niha qirika xwe ya zêde nerm xwar dike û her aliyî bi pozê xwe yên bi du firnikên fireh bîn dike û dikare cihê livandin û tevgeran bi du guhên bi movik ku mîna çavên sûsmaran e, binase.

Ew bi çavên xwe nêzî xeşûpeşên erdê ye, û dema ku ew serê xwe yê dirêjikî hildide nêzîkî asoyê ye jî. Jûjiyên ku di bin şewqa hindik a şevê de dimeşin xwe ji ber wî didin alî û ew jî xwe ji ber wan dide alî. Kêzikên şewqdar xwe ji ber didin alî û ew jî xwe ji ber wan. Pirçeke wî ya sivik heye pê tevgera bayê dişopîne, pencên wî ên ku xwe pê bi tilmikên erdê ve digire, bêguman ji lingên wî yên ku ji dema ew bi çarlepikê dimeşe de windabûne, zîrektir in.

Her tişt li derûdora Mem sivik e, du pişikên wî xurt in û şev jî xurt e. Ew jî, bi xoyê xwe yê ku ji bilî nasîna hisên xwe ji her nasînê vala maye, ji xwe re bi haydarî derbasgehan ji şevê re di çav xwe ra dike, şeva ku ew niha jê pêve tiştekî nas nake mîna ku ewî berê qet şewqa rojê nedîtibe. Mîna ku rêajoya bînê şehwet û jêder û tundî û pîvanên forman sînor dike. Ew jî di wê pêşdeçûna xwe ya sivik mîna giyanekî ku tê dikoşe firehiya xwe durist bike de, bi aliyê rastiyê yê astengdar re destkîsiyê dike çiku ew ji yeqîna ku mirov pê zanîna xwe û serencama xwe û ziyana xwe pesin dike, bêzar bûye. Niha jî di vê rewşê de ku Mem wergeriyaye afrîdeyekî şevê, mirov nikare çavnêrî pêvajoyeke mentiqî be, jixwe mirov nikare jî xeta ku ew dê têre berê xwe bide werzên bakur bizanibe, piştî ku ewî destpêkê berê xwe dabû rojava û ketibû pey banga derûnê xwe da ku xwe bigihîne komên çeqelan.

Mem Azad, di wê meydana ku tenê reşikên şevê radigre de, mîna reşikekî şevê sivik e. Bêdengiya ku mîna mijeke tenik li wê çolê raxistiye, sensorên xwe yên isfincî ji her tiştê ku dikare pistepistê yan jî qerebalixê bixuliqîne re amade dike.

Û cihê ku mîna têlekê şidiyayî di navbera mala Hemdî Azad a li rojavayê bajêr, û girê Hilêliyê de, ta bi xwe ye. Tayeke ku eger sar be qenctir e behsa miriyan neyê kirin, çiku ew wê çaxê ji wilayeta Bedlîsê ya Kurdî li Kurdistana Tirkiyê berê xwe didin cihekî ku tu kes guh nade çarenûsa milletan, ji ber ku

zagona pêncê Gulanê ya sala 1932an dibêje ku, li gor bernameyin berê plankirî: hikûmet mafê guhertina cîwarên milletan li gor pêwendiyên wan î bi çanda Tirkî re dide wezareta hindir, Kurd jî ne girêdayî wê çandê bûn loma divabû ku miriyên wan aware bibin û gorên xwe ji goristanên li wilayeta Bedlîsê rakin û bar bikin.

Lê taya germ bê tebîet û xo ye, ew bê haydarî ji nîvê sedsala me û heta roja îro erdên li Mêrdînê, Nisêbînê, û Cizîra Botan digre xwe, êdî pêwist e ku Kurdên niştecihên çemê Cexcex, û sêkoşeyê bi ava Dicle û Xabûrê û beşekî ji Firatê dorpêçkirî, zimanên xwe bixwun, di wê hingamê de ku li dibistanên serban ji qirmîd, birebira Aşûrî, Suryanî û Ermenî ye. Qedexe jî qedexeyeke naskirî ye bi her halî, çiku di xala yazdan de ji zagoneke Tirkî di sala 1934an de hatiye: her kesê ku zimanê Tirkî wek zimanê dayikê nehesibîne, qedexe ye ku ew gundan yan taxên nû ava bike, yan jî bibe endamê sendîkayên pîşekar û karkiran. Cîranên Tirkan jî piştî çend salan şopa wan meşandin, lê ewan hin netewe, ji bilî Kurdan. Bi qudreta Xwedê nexistin lîsteya qedexeyan, peymanên ku berê imzebûyî bi peymanin paşê imzebûyî re têkel bûn. Sala 1934an peymanek di navbera hikûmeta Tirkî û ya Îranî de li darket, mijar biryardayina derbarê pirsa Kurdî bû, êdî herdu dewletan jî sînorên xwe kilîtkirin da ku "çete" penaberî Sûrî û Iraqê nebin. Di salên pişt re de hin kes ji bakurê Efrîqayê tev lê bûn û derba herî giran li giyanê Hemdî Azad dan, Hemdî Azadê ku niha bi mêvanên xwe re şevê dibuhurîne. Paşê jî her tişt bi awayekî gêjkarî tev li hev bû mîna ku çawa sala 1930 qewimî bû; di wê salê de Îraniyan destûra Tirkan dabû ku xaka wan derbas bikin da ku li "Serhildêran" bidin. Niha her kes dikare derbasî xaka yê din bibe, li rojhilat, rojava, bakur û li başûr, di gel cihêrengiya zimanên xwe, da ku bikevin pey "Kurdê jirêderketî" li gor peymanên nivîskî û nenivîskî.

Lê Mem kurê Hemdî Azad niha ji van hemû tiştan rizgar bûye: ew mîrasgirê bayê ye, û şev milkê wî ye. Ew bi pozê xwe yê berî li bakur di rojavayê bajêr re deviyê ku bi ketûberê talan bûye derbas dike (kî bikaribe kokên daran hilgire, radihêje wan û diçe), li bakur jî bîna xurt ya komeke kêfxweş a heywanan tê, dema ku ew digihîje têlên rêsayî ên ku ji Sûrî û Tirkî re nîşaneyên ku ne yên wan in resim dikin, dibîne ku ew li nav komek çeqelan e, di nav werzekî tirûziyan de ku hevşiyekî ji darkokên bacanan li dorê ye.

Rewş xweş û geş e: henekek mezin di tariyê de bilind dibe, di nav heywanin ku yek bi yê din henekan dike û wî gez dike, xwe tê dide û dizûre. Û Mem Azad jî di wê rewşê de xwe radestî şahiya ku giyanê wî girtiye dike, ew jî xwe davêje nav wan heywanan, bi qîlên xwe henekan bi çîmikên wan û newqên wan û qirikên wan dike, paşê li hewayê hildiçene û li xwe dizivire û xwe ji êrîşa wan diparêze, qîlên xwe di hev dide mîna ku şevê dikevêje.

Û şev jî bi rastî amade ye ku were kevajtin. Şev dilfereh e û ji afrîdeyên xwe re zarotiyekê ku ne mîna her zarotiyê ye pêşkêş dike, loma jî Mem Azad zûrîna xwe heta ku dikare mîna heywanên din bilind dike bêyî ku astengiyek peyda bibe, yan kesek bi ser de rabe. Ew bi zûrîna xwe hemû dengên derdorê belawela dike, mîna ku ew baweriya axa bêdeng, ava bêdeng, giyayê bêdeng, û ba û Xwedayê bêdeng jî ji hev dixîne.

Tirûzî jî, çêjeke xwe yî ciyawaz heye ku Mem Azad bi qîlên xwe parçe dike bêyî ku daqurtîne, çiku ew her ku ji lîstina bi lemekê re ku diqede berî dide yeke din bi eynî şêweyî, mîna ku derdê wî tenê ew be sebzewatan û pelên wan ên tarî tarûmar bike. Dema ku ew li darkokên bacanan dilikume, wan hilnakişîne û naşikîne, lê ew bîn dike wan bacanên reş î daliqiyayî ku xwe di ber şevê û razên şevê re radikin û rojê bi

şehweta di reşiya xwe ya tenik de ezmûn dikin. Lê ew bi wê darkoka ku teyrikekî Bûka Mişk ku şev bi ser de hatibe û rabûbe li ser şaxên wê veniştibe hîç nalîze.

"Bûka Mişk e" dê ew ji xwe re bibêje. Çûkeke mîna serpêçiyekê, perikên wî kesk î arîrengî ne, ew çûk ji çavên wî yên birqokî ditirse lê ji ser şaxê ku gupûna dilê wê û herikîna ava di wî şaxî de bûne yek hingî xwe pêve zeliqandiye, nafire. Mem Azad awirên xwe yên heywanî jê dadigerîne û hêvî dike ku ew qaz ba, eynî qazek.

Ew xwesteka Mem Azad jî, ku çûk qazek ba, vedigere dijmintiya wî û kûçikan. "Qaz kûçik e" ji xwe re dibêje û dipirse: "çawa teyrek dikare xoyên kûçikan bi vî rengî hilgire, Xwedêyo?" Ew fêr nebûye ku ji werzekî dorvekirî yan girtî dagere illa ku meger segek hukumdariya xwe li wan deran bike. Lê ew, dema ku bûbû ciwanek û bêtir karîbû xwe bisipêre xwe û hogirî wê yekê bûbû ku bermayên kevokên bejî yan mirîşkan yan jî kundiran yan çêlîkên kundan ku dêbavên wî jêre dianîne qulikê bixwe, teyrek nas kir ku xwe radestî şevxûnên wî nake.

Awirek ji wî li mirîşkeke di pînê de bes bû ku ew mirîşk jidesthilanînketî qirika xwe radestî qîlên wî bike, mîna ku ew wan sihir dike yan jî di xew radike. Her weha elok û werdek û kevokên malan ên di qutîkên nizim de razayî, û keroşk jî. Lê qaz segekî har e û eger ew nêzîkî wê dibe, qaz bi dilêriyeke nêzîktirî ehmeqiyeke kor êrîşî wî dike.

"Qîlên qazê nînin", Mem ji xwe re dibêje. "Pencên wê yên birînker nînin" lê zêde dike, di gel wê jî ew xwe ji ber qajewaja wê û êrîşa wê ya parêzxwaz dide alî. Ew ji bîna perikên wê yên ku donekî sivik li ser wan e, aciz e, ew bîneke nêzîkî bîna kevokan e. Lê gewdeyê kevokê don dernaxîne, belê ew gewde bercestkirina xap û hîleyê ye, ne ew xap bi xwe ye: pozbilind e xwe disipêre baweriya mirovê hîlebaz da ku cihekî xwe di nav teyran de çêbike. Fayizcî ye ew, bayê genî yê li dora malan dide

çivîkan û yê pak ji xwe re dibe. Hogirî kesekî nabe illa meger sadediliya wî nas bike êdî bi dilnermiya xwe wî didize.

“Kevok jî kûçik e”, Mem Azad di dilê xwe de dibêje û şeva mîna postekî nerm bîn dike, di wê kêlîkê de jî bi diqdiqandineke sivik li ser newqa xwe paşê qirika xwe û teriya xwe dihise, lê ji xwe napirse ka jêder çiye, paşê jî ji her aliyî guvînek xwe lê dipêçe mîna ku baweşînkin mezin li bayê didin, ew tê ku çavên xwe bigre lê di nav palikên nîvgirtî re baskin arîrengî dibîne ku li her cihî ne û di nav darkokên bîberê re, werzên qernebît û xes û kundir û lehane û deviyên sewliyê re li ba dibin û li dora wan babelîskên biçûk î ji xwelî û pelan rabûne ku şahidiya firîna wan baskan dikin, ew baskên ku ne girêdayî tu laşan bûn lê hema ji xwe re mîna destên qutkirî li hev didan.

Di wê tariyê de, di çaxa ku bayê serhildêr wergeriya bablîsokan li dora Mem, Hemdî Azad li pêşiya wan mêvanên xwe yên rûniştî li ser du rêz kulavên zivir î ku keviran ji bin de ew hildipekand û kabok û gwîzek û kulêmek diêşandin,hêrs dibû: “Kesek ji min nepirse, ez jî mîna we nizanim ka çi li wir diqewime”, û destê xwe dirêjî tariya mezin a li rojhilatê dikir û dihat ku tiliyên wî bigihin ava Dicleyê û quntara başûr a çiyayê Torosê û bilindiyên li rex hev ên Kirmaşan û Hemedana li welatê Farisan û tixûbên Ermenistanê, li wir zimanê Kurdî belav bûbû di nav Kurmanc û Goran û Lur û Kelhoran de û zora zimanên Arî yên din biribû û nav lê bûbû zimanê pehlewanan yanî zimanê şervanan.

Li wir, bê guman hinek hene ji bilî Hemdî Azad dizanin bê çi li herêmên ji Hemdî Azad dûr, lê gelekî nêzîkî xwîna wî ne, diqewime. Ji werzan nayê veşartin bê mirov çi ji mirovî re amade dike, her weha ji deviyan jî nayê veşartin, ew deviyên li rex hev yan jî ji hev dûr ku yek serencama ya din dike nefesa xwe, dar bi dar, ji Kardokiya li nava Asyayê heta bi Mîdya û Aşûr û ta bi Erezerûmê cihê êlên ku Hemdî Azad li ser tiliyên

xwe yên zivir dijimêre bêyî ku wan tiliyan bipêçe mîna ku ditirse wan êlên ku di bin zirxê dîroka xwe de di xew ve çûne hişyar bike, ew bêtir behsa Goran dike ku ji nijadê Guhderzê kurê Gêw in, ewê ku navê kurekî wî Reham bû û Behmenê Keyanî ew şandibû daku Qudsê hilweşîne û ewî rast jî ew hilweşand.

Mêvanên Hemdî Azad, di nav agirê hişyar yê cigareyên xwe de, serê xwe bi hurmet dihejînin, êdî Hemdî jêdera gotina xwe piştrast dike: "Mele Ceger di pirtûkên xwe de ew agahî xwendine." Hemêza xwe heta ku dikare vedike û dibêje: "pirtûkin ku tu hemêz nikarin wan bidin ber xwe, di wan de Hirdo gelek agahiyan derbarî Kurdan de dibêje", mebesta wî ji Hirdo jî Herodotê Grîkî yê mêjûnûs e. Ew paşê vedigere behsa Reham û bi girnijîn dibêje: "Bextes" û dikene: "Navê wî li cem Ereban Bextes e", mebesta wî Buxtnesser e[1].

Û bûyerên ku wê şevê li wir, li wan herêmên dûr ji civata Hemdî Azad, diqewimin dengên heywanî ku tariyê li hev parvedikin wan herêm bi herêm dinasin dema ku çeqel bi wê zûrîniya şilbûyî ji girîza zengelokan stûyên xwe ber bi goristana mezin ve ku stêrik xwe têde dixemilînin, xwar dikin.

Zûrîniyek pir e, giran e, hendesiye heta radeya tirsê, ji çenteyê qul yê namebirekî nedîtî dikeve dema ku di zeviyên Kurdistanê re bi solên kevirî di lingan de bi giranî derbas dibe, zûrîniyek ku mîna hindibayê yan tirşoka li kenarê çeman yan jî naneya bejî, yan beqleyan yan jî bayê dilketiyê hûrhûrîkirina cinsên xwe ye, êdî çeqel wî bayî dadiqurtînin da ku careke din û bi ciwaniyeke bêtir ji zengelokên xwe derînin mîna ku ew jiyanê dikişînin ber bi tevliheviya ku bi kirasê xwe yê hevirmêş bendewariyê dike.

Mem Azad jî di nav hemcinsên xwe de dizûre, stûyê xwe mîna kevanekî şidiyayî bilind dike, zimanê wî yê dirêj di nav

1. Romannivîs çêr li Nebukadnezar dike. (J. Dost)

herdu çenên wî yên bi firehî vekirî de bi hişkî diheje. Paşê dengê xwe qut dike û di nav komên çeqelan de berî dide bakur, werzên bamiyê ku pencên wî dixurînin derbas dike heta ku digihê sînorên Tirkiye û Sûriye û di nav tilmikên bê bombe re diçe, tûdirkê bîn dike, ew tûdirka ku dilê qaçaxçiyan jî lê rûdine çiku bombe nikarin di bin şaxikên wê de werin veşartin, eger şaxên wê werin jêkirin yan jî darkok bi xwe werin hilkişandin, bîneke mîna bîna heriyê dema ku zuha dibe derdixîne.

Liva herdu nigên Mem yên li pişt, ku ew niha çeqel e, dişibihin liva lingên wî dema ew zarokek bû û ji werzekî ta yekî din dida pey bavê xwe yê ecele. "Bavo" bang dikir û baz dida, bavê wî lê diziviri û dixeyidî: "Tê kengî fêrî lalbûnê bibî?" Û her ev bû halê wan her ku du metran dimeşiyan, ew haydar in: bav û kur bi hev re. Yek tivingeke 12 mm radike û yê din jî xefkin ku dem pê re nîne wan vede ji ber lezandina bavê xwe.

Eger Mem li pişt bavê xwe bimîne, wê bavê wî yê xwediyê riya nekurkirî ji bin desmala bi ser eniyê de werivî bang lê bike. Û eger Mem bikeve pêşiya bavê xwe, ewê pê re bixeyide mîna ku dixwaze ew beşek ji siya wî be û ji tevgera siya wî be û ji bayê ku ew belawela dike bi wî laşê xwe yê meyldarê karesateke muhtemel e be.

Mem di pantelonekî fireh de ye, di gumlekekî fireh de ye mîna ku ew ji bavê xwe stendibin, porê wî jî hema çawa be qusandiye. Bavê wî Hemdî jî di pantelonekî fireh de ye, qutikekî xakî berîkmezin lê ye, desmaleke hema telomelo li serî ye tê ku rûyê wî yê ciddî ê nekurkirî veşêre. Tivingek ku textê qundaxa wê yê qehwehiyê tarî çûye û di gelek deveran de wergeriyaye zer di dest de ye. Xefkin ku axeke şil bi wan ve ye di dest kur de ye, ew di destpêka payîzê de ne ku ew jî demsala ku bav her li bendê ye da ku hesabên xwe bi werzên vekirî mîna hinavên ji çivîkan re pêşkêşkirî re bibîne û safî bike.

Bavek û kurek û tivingek û xefk û helkehelk û bendewarî û bayekî hênik û awirên mirovan, ên giyayan û hinek ewr li jor û hinek teyr li rewşê hûr dibin:

"Çima bav doza lezandinê li kurê xwe dike?" Pepû[2] ji hevbeşê xwe Dûmeqesê ku hindik maye bifire dipirse, êdî ew teyrê nazik î dûv dubeşî dibêje:

- Bav tim ecele ne.

Pepû qirika xwe ber bi Dûmeqesê ve dibe, kumika wî ya bedew xwar bûye:

"Ez ji vê ne bawer im, va ye kurik bi xwe dilezîne", Dûmeqes dibişire:

- Dema ku bav bilezîne, kur bi bazdan dide pey wî.

"Ku du baskên wî hebana...." Pepû dibêje, Dûmeqes vedigerîne:

- Çima du bask? Ewê astengiyan çê bikin.

"Ma tu nabînî ew dixwaze xwe bigihîne bavê xwe? Wê bask bi kêrî wî bên", Pepû ji dil dibêje, dûmeqes lê vedigerîne:

- Ev kurik nade pey bavê xwe, ew dide pey xwe bi xwe da ku bibe bav.

Pepû bêdeng dimîne lê ji bersiva Dûmeqesê nerazî ye û bi baskên xwe giroverekê saz dike, Dûmeqes bêdengiya wî qut dike:

- Kalkê te yê pêşîn guman kir ku wî padşahek biriye ser avê, lê ewî padşahî dilezand da ku xwe bigihîne bavê xwe.

"Mebesta te kîjan padşah e?", Pepû jê pirsî, teyrê terîşad got:

- Silêman, ewê ku Belqîsê ew li ber mêvanên xwe afirand.

"Kalkê min Silêman bi hacet bû ku ew jî çîroka xwe biafiarîne", Pepûyê nevî bersiv da û lê zêde kir: "Ewî padşahek ji xewna Belqîsê anî da ku avê nîşanî wî bide."

"Na, lê Silêman di xewna Pepûyê kalkê te de dida pey bavê xwe, û ev çîrok bi min nexweş hat", dûmeqesê got.

---

**2.** Pepû: Silêmanê Dunikil yan Hophop e, min navê Pepû siviktir û minasibtir dît. (J. Dost)

“Bi her halî tu ji çîrokan hez nakî, kêfa te tenê ji fira te re tê”, Pepûyî kire pistînî ji pişt wan baskên xwe yên ku bi êsîrkirina bayê biliya bûn, paşê berê xwe da kevokekê ku di ber re derbas bû û bi şerm silav lê da, dûmeqesê jê pirsî:

- Ev kî ye?

- Kevoka Nûh e.

Dûmeqes keniya: “Ew gemiya wî ya aware ber bi bavê wî de dajo..çi kevok e....”, û bi ken li dora xwe zivirî. Pepû hêrs bû:

“Bav, bav. Ma tu ji bavan pêve nabînî?” dûmeqesê got:

- Erê. Em bi hacetî wan in da ku em xwe biafirînin.

“Ma me xwe afirandiye? Li perikên min ên nêzîkî qirika min temaşe bike. Li şahperên min binêre. Ma ez bi hacetî van hûrgiliyan im jî?” pepû pirsî, Dûmeqesê bi henekî çav dayê: “Erê. Ev hûrgilî hebûna te piştrast dikin, ew wê rastiyê piştrast dikin ku tu bawer bî tu nema afirandinek î.”

Êdî Pepû ji wê axaftinê bêzar bûbû, loma jî herdu baskên wî lêdan û hendeseya neqşên ku berê di bayê nermik de kolabûn belawela kirin, lê dilê wî û çend gotinên dawiyê hebû:

“Tu dibêjî vê kevokê xwe afiarndiye?” Pepû ji hemsayê xwe dûmeqesê ku Kurd dibêjinê “Hechecîk” pirsî:

“Çawa ev kawika hanê -ku ne wê xwe afirandibe- dikare xelqên Xwedê cotecot ber bi aliyê ku Xwedê navê wî nedabû Nûh de bajo? Ewana li ser tofanê li hevkiribûn lê beşê din ji fikreyê ji bîrkiribûn.”

Pepû êdî bi mukrî -mîna ku lawaziyek di axaftina Dûmeqesê de dîtibe- got:

“Ma beşê duyem ji fikreyê bavê Nûh bû?” Dûmeqesê vegerand:

- Kevokê ew nedajote ba bavê wî, lê ew dajote bal xwe ve da ku di kûraniyên Nûh de Xwedê ezmûn bike.

Pepû du caran li dora Dûmeqesê bi hêrs zivirî:

De îca ji bo çi tu bavan dixî her şiroveyê?

Dûmeqesê bi dilxweşkirin çav kirê:

Peyvên min zêde ciddî negire.

Li jêr jî, li wê devera ku axaftina teyran nagihîjê û tenê çav dikarin forman hêce bikin[3], tevger eynî tevger bû di wê qonaxa di navbera Mem û bavê wî de, Memê ku gelek xefk bi navbenda wî ve daliqiyane û şingeşingê dikin, û bavê wî yê xwediyê du çavên hişyar mîna ku werzan û bayê dorpêç dike li wê veşargeha herî nazik di herduyan de, yanî di lêdana ku perik pê ferqa gewre ya di navbera pêwistiyan de dixuliqîne, di rewanbêjiyê de jî: ku tu bifirî!! Çi xap e ev.

Xap jî, bêguman, teyr in, loma jî Hemdî bi haydarî ber bi pêş de diçe, Mem jî zêde guh li qerebalixa bazdana xwe nake, bav her çend metran mecbûrî rawestandinê dibe: "Hey tajîtol" û milên wî dadikevin: "tu kî yî?", peyvên xwe yên nediyar ji nekesekî re dibêje. Kurik çavên xwe fireh dike û dibêje: "Ez Mem im", bav diqîre:

Ez te nas dikim hey kêzik, ez diya te jî nas dikim. Tu ferenda nêçîrkirina kerekî jî nadî min bi vê qerebalixa xwe.

Kurik dibêje: "Bavo hîn jî me tu teyr nedîtine", Hemdî zêde hêrs dibe:

"Ezê çawan teyran bibînim û tu bi min re yî? Ma tu wan haydar dikî? Xefkên xwe di nav lingên xwe de veşêre û hêdî bimeşe. Weha" û ew mîna yekî ku xwe ji ber kevirekî ji jora sûrekî de avêtinê dimeşe "weha, weha", peyv bi tinazî dubare kir paşê rûnişt û mîna qijikê meşiya, tivinga xwe xistibû hemêza xwe û milên xwe bi herdû rexên xwe de vekiribûn: "weha, weha."

Kurik bi haydarî û şahî li tevegera bavê xwe nihêrî û kire birebir:

- Ma ezê çawa xwe bigihînim te eger tu weha bimeşî bavo?

"Xwe negihîne min" bav qîriya. "Xwe negihîne min" di nav diranên xwe de dubare kir û zêde kir: "Li cihê ku tu lêyî bimîne.

---

**3.** Hêcekirin: xwendina peyvan bi naskirina herfên wan. (J. Dost)

Mîna dewlekê bêdeng bimîne. Biqeşite. Winda bibe." Û rûyê xwe ber bi ezmanan ve bilind kir û kire birebir û dîsa bi haydarî meşiya, Mem jî lezand ku xwe bigihîne bavê xwe, xefkên bi herdu kêlekên wî ve her dikirin şingeşing.

Bi her halî Hemdî ne segvan bû. Pêla tivingên ku li Kurdistanê belav dibin (navên wan bi dizî digihane guhên wî) dihişt ku ew jî tivingekê peyda bike, çîrokên Ehmed Kelîmê cîranê wî yê birûqalind li ser nêçîrvaniya li deşta Horanê ji bin ve dihişt ku tivingê peyda bike. Kêfa Hemdî ji şêweyê vegotina Ehmed ji raz û sihr û fasiqiya xwe re mîna zalimekî ku pê li her çolekê dike re dihat: "teyr nizanin xwe li kû veşêrin" di bin birhên xwe yên stûr de dibêje, ew birhên ku Hemdî dibêje qey xêra wan jî di bidestxistina nêçîran de heye, ew lê zêde dike: "Heywanên din jî dixwazin xwe di çermên mirovan de veşêrin da ku xwe ji min xelas bikin." Hinekî bêdeng dibe paşê bi kesereke diyar dibêje: "Ew xezal.. ewê xezala hanê", û çavên xwe ber bi veşargeheke nediyar di kûraniya xwe de radike: "Hişt ez bi Jîpê gelekî bikevim pey wî", piştre bêdeng dibe, dike kufekuf: "Ez bawer dikim ku hemû teker qul bûn. Ewê otombîlê hinavê min keyand dema ku ez li pê wê xezalê bûm", û pêde çû: "Jîp ji hev ket. Bawer bike. Serbanê wê yê çadir firiya. Teker gindirîn dûr û serpoşa motor çeng bû. Şewqên cam ketin, direksyon di destê min de vebû û ez qêriyam û min got: ya sitar." Awireke bi dizî di Hemdiyê mîna başiqekê bêdeng vedide, bi zimanê xwe herdu serên simêlê xwe dialîse: "Otombîlê xwe bi xwe ajot û kete pey wê xezalê heta gihişte şikeftekê di zinarekî reş de. Min ji nişkê ve dît ku ez ketime golek ava sar ku kevirên wê şayik û ciwan bûn. Dema ku ez rabûme ser piyan av heta navika min hatibû, min dît xezal li pêşiya min e dibişire. Ehmed Kelîm jî dibişire: "Ji min bawer bike ew dibişirî, min jî nema zanibû ka ez çi bikim, tivinga min ne bi min re bû loma min mista

herdu destên xwe tijî av kirin û avête xezalê. Ewê bi kêf teriya xwe hejand. Min xwest ji wê golê derkevim lê nigên min li ser wan kevirên demûşî şemitîn. Min careke din hewl da lê min nikaribû. Min ji xwe re got de ka ez solên xwe ji xwe bikim dibe ku ez bikaribim bi xwasî di ser wî kevirê şayik re bimeşim, çaxa ku min destê xwe da lingê xwe yê çepê min dît ew bûye simekî qelişî, ez veciniqîm mîna ku min xewnek dîtibe. Dema min destê xwe da lingê rastê ew jî mîna yê çepê bû, bûbû simekî qelişî."

Jixwe Hemdî bêhemdî xwe li herdu lingên Ehmed Kelîmê li ser cilikê rûniştî dinêre, û dibîne ku lingên mirovan in, dema ku Ehmed dibîne bê çawa Hemdî bala xwe daye lingên wî, ew wan dihejîne û bi qerfî dibêje: "Ew ne wisa bûn.. du sim di dawiya wan de bûn", Hemdî bi masûmiyet jê dipirse:

Kanîn ew?

Ehmed Kelîm rûyê xwe tirş dike, mîna ku birîndar bûbe, û bi dizî dibêje: "Ez ne Behramê Gûr im ku li wir bimînim", û bi birihên xwe dilîze mîna ku mêr bi simêlên xwe dilîzin. Behramê Gûr jî ew mîrê efsaneyên Kurdên Îranê, tev hespa xwe di şikeftekê de winda bûbû piştî ku dabû pey xezaleke sihirbaz û nema ji wir derketibû. Lê Kelîmê ku behsa Behramî kirî derketina ji wî cihî qenctir dîtibû:

"Ma ezê li wir çi bikim ku bimînim?", ji ewê li himber xwe rûniştî dipirse, mîna ku ew di kûraniya xwe de xapîneke ku ew ne layiqî wê bû belawela dike: "Ew sim giran bûn, û ew xezal jî ne hêjayî cefakêşiya ji bo wê bû, loma ez vegeriyam."

"Mebesta min tu çawa ji simên xwe xelas bûyî?" Hemdî dipirse û Ehmed Kelîm bersivê dide:

- Ez ji wan xelas nebûm. Min xap û hîle li ber deriyê şikeftê nas kir. Ez derbas nebûm.

Hemdî lêvên xwe dizemîne mîna ku tênegihîştibe û dîsa dipirse: "Kanîn simên te?", êdî Kelîm cira xwe li rûniştinê xweş

dike û bi giraniya birûyên xwe berî dide Hemdî: “Simên min tunebûn, ji ber ku ez derbasî şikeftê nebûm.”

“Ê de çîroka wan simên te ya ku te ji min re got çi bû?” dîsa Hemdî dipirse, îcar xwediyê birûyên qalind bersivê dide:

- Ew ne çîroka min e, ew çîroka Behramê Gûr e.

“Behram kete pey xezala xwe li derdora Şahpesend û te jî da pey xezala xwe li derdora Horanê”, Hemdî bi matmayîn dibêje, Kelîm bersiva wî dide:

- Berhram dakete golê.

Dîsa Hemdî vedigere pirsên xwe: “Te çawa zanîbû ku Behram dakete gola avê?”, xwediyê birhên stûr bersivê dide:

- Ji ber ku ew hîç ji şikeftê derneket.

“Û herdu sim?”, Hemdî ji nûve bi xemgînî pirsî, Kelîm bersiv da:

- Ew kesê ku heta şikeftekê bide pey xezalê du sim di nigê wî de şîn têrı û êdî nema derdikeve.

Divabû Hemdî Azad bêdeng bibe, eynî mîna ku çawa Memê kurê wî bêdeng dibe û bi bazdan dide ser şopa wî, bi wan xefkên bi şingeşing û Hemdî jî her du gavan gefan lê dixwe, gefin ku tirsê naxuliqînin: “Tê van xefkan li malê bixwî, ezê bihêlim ku tu wan bixwî.”

Lê Memê kurê Hemdî Azad, Memê ku bi wî laşê xwe yê heywanî û ziravik niha di nav koma çeqelan de ye li zeviyên êvarê yên li bakur vedengeke giran ji gefdana bavê wî tê bîra wî. Bêhna kergoşkan a ku tev li bêhna tûdirkê ye wî dibilîne û gêjomêjo dike, êdî pozê xwe nêzîkî erdê dike mîna ku bi kûraniyên wê yên tarî re diaxive, li wî cihê ku reh xwe ji vepijiqîneke re amade dikin, li wir avên li kaniyên xwe belav bûne hene ku tenê piştî qaşilê erdê derbas dikin dibin yek, li wir ku qul û kortên mîna çavên kor belavbûyî ne û çavdêriya ronahiya îlankirî a ku her cudahiyê vedişêre dikin.

Dibe ku Mem pozê xwe dirêjî qulekê yan veşargehekê kiribe bêyî ku bigihîje wan afrîdeyên ku xwe bi tariya şil ve zeliqandine,

ew tariya ku dike gupegup mîna dilekî ku tirsê ew gindirandibe labîrenteke aram. Êdî ew berê xwe dide hin qul û veşargehên din ku xwe parastine bi eynî wan pîvanên ku pê afrîdeykî tirsiyayî xwe ji afrîdeyî tirsiyayî diparêze. Dema ku bîna nêçîrên veşartî di firnikên pozê Mem de giran dibe, ew bilind dike rûyê xwe yê dirêjikî ê ku du guhên hişyar bi pirçeke zivir li jorê ne, ber bi korayiya bilind a ku xwe dispêre darê xwe yê ezelî li wê bilindiya ku stêrikên sadedil têde peymaneke sadedil li gel nemiriya xwe ve lidardixin, a wê demê ew zûrîna xwe ya ebedî dertîne.

Niha û di vî gewdeyê heywanî de hafizeyeke Mem nîne, lê şehweteke wî ya mîna bakurnasê[4] heye. Loma jî tişt jêre parçeparçe xuya dibin, matmayîneke zêde li pey xwe dihêlin, karîbûna wî ku ewan tiştan careke din bîne ser hev dibe beşek ji ezmûna qedera wî ya heywanî.

Lê ew bi hêzeke ku ew nikare rave bike dide pey tevgera baskên teyran bêtir ji heywanên din. Şeqeşeqên sivik yan jî giran ên hestiyên bi perikan nuxumandî digihîjin cihekî veşartî di kûraniyên wî yên kor û mişt valahiyên hendesî yên mîna hev de. Ew jî ji wan ditirse mîna ku ew bask dikarin wî ji siya wî ya li ser erdê resimbûyî hilkişînin û wî dûrî siyê bikin û bibin bilindiyên ku ne werz têde hene ne jî tiketika meşa teyran guhên wî yên bel hişyar dikin.

Mem di wê forma xwe ya mîna çeqelan de, li siya xwe mat maye. Ew dixwaze ku siya wî nêzîkî wî be, pê ve be, ew dixwaze ku sî mîna destekî nermik be tiştê ku ew bi laşê xwe nagihîjê, mist bide. Ew xwe dispêre siya xwe da ku xwe têde veşêre, ku tu kes nikare dest bide siyê. Loma jî awirên xwe dabeş dike dema ku di cihan re derbas dibe, awiran di navbera siya xwe û tişt û aliyan de dabeş dike da ku bi cih bike ku ew û siya xwe – heta di tarîtirîn dema şevê de- hevdû bernadin, heqîqeta

4. Bakurnas: qiblename, pusula. (J. Dost)

heywanî di wî de cih nagire ku ew û siyê hev temam nekin. Lê firandin rastiyê têk dibe dema ku sî nikare xwe bigihîne esl û koka xwe, esl û kok jî nikare piştrast bike ku ew gewdeye bêyî siyê… Memê ku bûye çeqel wisa ji xwe re dibêje.

Lê rastiyeke din heye divê ew jî hebûna xwe piştrast bike dûr ji baweriya Mem a heywanî a ji baskan û tinaziyên wan tirsiyayî. Bask ew in delîlê ku erd xwe pê pêşkêşî rastiyê dike, ew rastiya matmayî û ji tu kesî delîlan qebûl nake. Rastî jî, her wekî Mem dixwaze tebîeta xwe ya sergerm iqna bike, ji nêrîna li hebûnan a ji bilindiyan ditirse, çiku ew wisa xuliqiye: tirsiyayî ji xwedîtina bi vî awayî dûrî lîstikê.

Gelo Mem hewl dide ku xwe bike hemtayê rastiyê di tirsa ji baskan de? Ew pirseke ku wî hinekî mijûl dike, lê di nav baweriya xwe de ku ew di sêkoşeya hebûnê ya du baskî de berî perikan hebû, wê pirsê ji bîr dike.

Ew mîna çeqelekî hevtayê tariyê û xapên tariyê ye, hîn ku ronahiyê destûra derketina ber bi memleketa Xwedê ve, bi wan hestiyên xwe yên tenik, nexwestibû. Ew hevtayê avê ye jî di giraniyê de dema ku hebûn kêfxweşiyeke ji avê bû û ji kefê her û her peyda dibû heta bêdawiyê, paşê divabû Mem mîna afrîdeyekî şevê, li jidayikbûna ronahiya ku tarîtiya wê kor e miqate be, divabû ku ew şevê bi delîlekî heywanî piştrast bike, delîlekî ku şewqê mîna tomareke pir li veşartina razên ronahiyê miqate dibîne. Ewî di ser van tiştan re jî tevgera bi çarlepikê bi dest xistibû ku hevtayên wî yên din ên ne aram mîna keviran, bayê, avê deng û bêdengiyê ew bi dest nexistibûn.

Çar lep: danîna formekê çêtir e ji nedanînê. Mem jî ew form e dema ku av bê form be, ba bê form be, deng bê form be û ciyawaziya di navbera afrîdeyan de jî bê form be; loma jî Mem ji xwe re rewa dibîne ku ew bibe wefadartirîn hevpeymanê baweriya ku ew raza cihê xwe nabêje.

Ma wê çima Mem hebûna xwe û hebûna perikê bide ber hev? Gêjenekê ew afirandiye bi pifekê ji devê xwe yê ku ê herî nemirtir jî dikeve tora wî, lê perik! Ew afrîdeyekî ji pozbilindiya ziyanê peyda bûye dema ku ji ziyanbûna xwe vediqete.

Di navbera kesê ku gêjenî wî diafirîne û rastî xwe di naskirina wî de tune dike û kesê ku pozbilindiya ziyana ku ji bilî perikê tu rûpoşan nas nake wî diafirîne de, mesafeyeke mezin heye.

Mem di wê gera xwe ya şevê de nêzîkî çemê Cexcex ê ziravik dibû. Ew çemê ku Tirk geh wî qut dikin geh jî ava wî berdidin bêyî ku kes muhtacî berdana wî be. Ew çemekî ne bi hacetî aveke mezin e da ku bibêje ez çem im, rêya wî heta ku av nebe jî wî dide nasîn. Çem jî çi zuha be çi bi av be civangeha çeqelan e. Nêçîr pirr dibin dema ew tijî av e, dema ku hişk dibe jî zûrîna çeqelan di nav de gelekî tirsnak e. Lê ew wek çemekî ku ji bin pireke Tirkî dikeve xaka Sûrî, her dilovan e. Mem jî dema ku bi hevalan re diçû avjeniyê û zebeşên qelişî hingî ku ji dest wan bikevin bi xwe re dibirin, ew pira hanê mîna civangeheke sihrî a du cîhanên tirsiyayî didît. Yên ji wî alî reviyayî roj bi roj zêde dibin tev ku çavdêriya herdu aliyan zêde ye jî. Ew bi gulleyên serbazan û li ber çavên seyrangeran ku havînê li herdu rexên çem geştê dikin li vir yan li wir têne kuştin, ew seyrangerên ku zuhabûna ji kûraniya çem difûre bîn dikin, hinekî xemgîn dibin û pistepistên xwe berdewam dikin.

Her kes her kesî dipê, li vî alî û wî alî: ên ku ji aliyê Sûriyê direvin aliyê Tirkiyê berevajî şepêl û herikîna çem diçin, lê berî ku bigihîjin tunela di bin pirê de diwestin û fetisî vedigerin, ji xwe serbazên Tirk jî dibişirin. Lê ewên ku cilên xwe xistine buxçeyan û li milên xwe girêdane, dema ku ji nişkê ve ji aliyê Tirkî ji ser pirê xwe davêjin aliyê Sûriyê serbaz bi hev re dikevin pêşbaziyê û gulleyan berdidin wan û wan dihingêvin, tenê hinek bi pişikin mîna yên mişkê avê xwe noqî binaniya celaqiya

çem dikin û difilitin lê tavilê li sûka hembalan dibin nêçîra polîsên Sûrî ên ku kesên bi qaçaxî derbasî welêt bûne ji zimanê wan nas dikin.

Lê ew çemê bêdeng, ku tenê xuşexuşa wî ya tenik tê, yê ku Mem li derdora wî naneyê û tirşokê niha bi wê şeklê xwe yê çeqelî bîn dike, berê gelek caran ji bêdengiya xwe derketibû û pêşiyê li gel xwe peyivîbû heta ku westiyabû:

- Ma ez dişibihim her çemî?
- Erê.
- Çima herdu rexên min firehtir nabin?
- Çiku ez di vir re dibuhurim.
- Û wê çi bibe dema ez di cihekî din re biherikim?
- Ezê mîna xwe bimînim.

Çemê Cexcexê ji xwe dipirsî û bi bêzarî bersiva xwe dida, loma jî pirsên wî ne zêdeyî giliyê ji tengbûna herdu rexên wî bû, yan jî ji zuhabûna wî, yan jî ji heriya pirr a ku tev kurmên sor î dirêj dadiwerive ava wî. Lê ewî carekê pirsên xwe ji Xwedê kirin:

- Xwedayê min te çima ez wek çemekî afirandim? (çem got).
  Ji ber ku ez ji çeman hez dikim. (Xwedê got).
  Te ji min hez kir û te ez afirandim? (çem got).
- Na. (Xwedê got).
- Min ji te fêm nekir. (çem got).
  Te bi xwe xwest ku tu bibî çem. (Xwedê got).
- Nayê bîra min. (çem got).
- Ew sebeb e. (Xwedê got).
- Sebebê çi ye? (çem got).
  Ku tu bibî çem. (Xwedê got).
- Ma te ew hemû kirin çem? (çem got).
  Kî? (Xwedê got).
  Yên ku nayê bîra wan? (çem got).
- Na. (Xwedê got).

- Lê çima ez? (çem got).
- Ji ber ku te weha xwest. (Xwedê got).
- Min hîç weha nexwestibû. (çem got).
- Ê wê çaxê te dijberiya min dikir, rabûm min tu wek çemekî afirandî. (Xwedê got).
- Û wê çi biba eger min dijberiya te nekira? (çem got).
Wê demê te xwestibû ku tu bibî tu. (Xwedê got).
- Tu dizanî min dixwest ez bibim afrîdeyekî ku bikaribim çi bikim, Xwedayê min. (çem got).
- Erê. (Xwedê got).
- Min dixwest ku min kariba çem biafirandana. (çem got).
- Loma min hişt ku tu li gel min xeber bidî. (Xwedê got).
Ma her kesê ku dixwaze çeman biafirîne dikare li gel te xeber bide? (çem got).
- Erê, çiku ew di korbûna xwe de dirame. (Xwedê got).
- Ma çi çem be kor e qey? (çem got).
- Ji bilî heriyê nabîne. (Xwedê got).
- De korbûna vê çiye? (çem got).
- Bexteweriya wî zêde dibe. (Xwedê got).
- Mebesta te bexteweriya çem e? (çem got).
- Erê. (Xwedê got).
- Ma yê ku bextewer e kor dibe? (çem got).
- Na. (Xwedê got).
- Ez nema têdigihîjim. (çem got).
- Çiku tu çem î, tu di heriyê de difikirî. (Xwedê got).
- Eyba vê çiye? (çem got).
- Herî. (Xwedê got).
- Ez bawer dikim ku te hemî zindî û tişt ji heriyê afirandine? (çem got).
- Loma tu kor î, çem kor in. (Xwedê got).

Mem wê şevê li dirûvê xwe yê heywanî temaşe dike, di eynî katê de bavê wî Hemdî ji mêvanên xwe yên li ser kulavan re berî ku şev dagere tiştin tevlihev dibêje:

“Me wê nîvroyê birhên xwe kur kirin”, Hemdî got û destê xwe avête birhên xwe, li peyva xwe zêde kir: “Min fêda kurkirina birhan ji wan pirsî, rêber got ku ew dihêle em hemî wek hev xuya bibin.” Rêber jî jixwe, her wekî ku Hemdî berdewam dike, dê wî û komek hevalên wî bigihîne çiyayên Kurdistanê. Û ji bo ku bihêle mereqdarî di çîroka wî de zêdetir bibe dibêje ku çîrokê berî zewaca wî bi rojekê dest pê kir, ku ew zewaceke berdêlî bû. Jina Hemdî xweha yê ku bi xweha Hemdî re zewicî ye. Ev berdêlî jî li bakur gelekî heye ji ber ku qelen hin caran zêde giran e, Hemdî dikene û dibêje: “Jina min pêşiyê ez nas nekirim, min gotê: keçê ez Hemdî me. Û min jê re behsa kurkirina birhan kir, lê wê hikmeta ku divê em herdu mîna hev bin pirsî.“

Wê got: Fêde çi ye?

Min got: Rêber pisporê van karûbaran e.

Wê got: Eger hûn bişibihin hev, jimara we kêm yan zêde dibe?

Min got: ez nizanim, rêber dizane.

Wê got: ma rêber birhên xwe kurkirine?

Min got: na.

Wê got: ji wî re bibêje bila ew jî birhên xwe kur bike”, Hemdî cihê xwe li ser erda kelûkortî xweş dike û berdewam dike: “şeva me ya pêşî bû, û mîna şeva pêşî ya her bûkekê min got ewê bitirse, lê wê bi israr xwest ku rêber birhên xwe kur bike. Dema min sebebê israra wê pirsî, got:

Çima hûn birhên xwe kur dikin?

Min got: da ku em bişibihin hev.

Wê got: ê de çima rêber jî birhên xwe kur nake?

Min got: ez nizanim.

Wê got: tu nabî mêrê min eger tu sibe vegerî û nebêjî ka rêber çi ji te re gotiye.” Û Hemdî keniya:

“Min jê pirsî: û emê îşev çi bikin?

Wê got: ezê ji te re du birhan bi kilê resim bikim, da ku ez te nas bikim."

Jixwe nedivabû ku Hemdî roja din ji rêber bipirse bê çima divê birh werin kurkirin û hemû bişibihin hev, ji ber ku rêber di gel wan zêr û diravên ku kesên niyeta serdana Kurdistanê kiribûn dabûnê de winda bûbû, di nav de neh xilxalên zîvîn hebûn ku Hemdî ji diya xwe stendibûn û soza ku wan bike zêr dabûyê bêyî ku zêde şiroveyan bike.

Mem jî, Memê ku piyên wî bi qasî piyên şeva ku di werzên wî de digere ne, di mijûliyên mirovan de nedifikirî, lê heywaneke ziravik di nav koma wî de bêtir ew ber bi xwe ve dikişand, Mem xwe li ber gezên mê ên wê heywanê kerr dikir û paşê çirvîtikin ehmeq didan û zûrîneke ku zebeşên li nav werzên Nisêbînê ji ber diteqiyan, ji xwe berdida.

Ew cara yekem bû ku ew mîna heywanekî nêzîkî heywana xwe ya mê dibû. Ji ber ku Mem wek mirov jî nêzîkayî li mêyeke mirovan nekiribû, nikaribû muqayese bike. Li gel ku sûretê Memî yê heywanî temam bûye jî, her weha xeyala wî û şiyariya wî jî, lê pirîskin tewş ji xeyala mirovayî xwe li kûraniyên wî didan, ew di xweradestkirina ji gezên çeqela mê re, ewa ku gelek pirça wê bi pirça wî ve mabû, rastî du çavên ademî, kenok dibû ku xwe tê didan, bi zimanekî dihisiya ku li stûyê wî digeriya, bi tiliyin ku pirça wî mis didin û bi pistînekê ku digihîje mûskilên wî ne guhên wî, êdî laşê xwe mîna segekî şil dihejîne da ku vê hişyariyê dûr bixe. Wêneyên ku xwe li xeyalê wî yê ligamkirî didin, cesûriya şahiya wî sivik dikin, şermek digre ser ku ne ji xoyên hemcinsên wî yên di zeviyên bakur de ye. Lê mêya wî ya mîna bayekî bi kêf li dora wî bi gezên xwe yên tûj qerfbaziya wî ya nazik lê vedigerîne (her heywanek qerfbaziyeke nazik e), ew êdî mezin dibe, û bi şehwet û zûrîna xwe dirêj dibe mîna ku erd û şev du mûskil in di herdu ranên de, ranên ku dê xwe bi wan biqevêze valahiya rastiyê.

Û bi gezekê li dû ya din ve Mem çirvîtkan dide xwe û kêfeke hêdî dike û dikeve pey mêya xwe, teriya wê bîn dike, wê veşargeha tekane ku heywan têde wêneyê pêşeroja xwe ya di dirûvê wî bi xwe de ye: çar pê, pirç, rûyekî dirêjikî û teriyek û zûrîneke ku ew jî dihêle jiyan spasdar be ku ew ji cûreyekî ta yekî din ferq dike.

Ma gelo Hemdî Azad wê êvarê difikirî ku kurê wî Mem ji bo cara yekem xwe davêje ser mêyekê? "Mem ê bibe tiştek" bav dibêje û li serbanê tarî dinêre, cihê ku divê kurê wî li wir di xew de be, û li peyva xwe zêde dike: "Ezê wî bişînim ba Mirovê Mezin dûrî vî welatî da ku karekî bavêje ser milê wî." Ne pêwist e ku ew peyva "Kar" ji wanên ku pala xwe dane palgehan re şirove bike. Kar li wir e, li wî cihê sext ji baweriya wî, lê aliyê ne sext ji baweriya wî, ê ku mîna wî xwe sipartiye palgeheke nedîtî, ew e tiştê ku ew her roj -li ser qiyameteke ku berbanga xwe ya li ser qatên bêjimar ji hestiyan rêzkirî bi dest naxîne- ji kesên rûniştî re dibêje. Di nav wan hestiyan de bêguman hestiyin hene yên teyran in ku ew ji jor de tiştên ku kesên li ser axê dimeşin nabînin, dibînin.

Sî, gewde, mesafe ji jor de mîna valahiyan in, valahiyên ku bi aliyê kûraniya cih de xuya dibin ne jora wî. Ew valahî di hestiyên teyran de awazeke taybet dihêlin. Loma jî dibe ku qiyamet dudilî ye ku berbanga xwe pêk bîne, ew qiyameta di pêşdeçûna xwe de li hestiyên teyrekî di nav yên mirovan û lawiran de dilikume.

Kesên rûniştî li civata Hemdî Azad wan jî mîna Hemdî nizanibû ku Mem wê şevê diyariya xwe ya herî nirxgiran -wek çeqelekî- pêşkêşî werzên Kurdistanê dike, ewî bazdaye ser mêya xwe û du çîpên wî ji şehwetê dilerizin, sînga wî dilerize, qîlên wî bi dilovanî di stûyê heywana di bin wî de çikandî ne, mîna ku ew dihêle jiyan bi jana di hevala wî de û bi rehtiya di wî de bi destên xwe yên zivir pêşwaziya diyariyê bike, mist bi

mist ji wê avika ku her tişt sûretê xwe têde dibîne, sûretên sîqalkirî bi qasî bêrîkirina jibîrbûnê ya têde.

Ew verêjtina yekem bû ku hişt Mem bêjimar pirr bibe, êdî ji ser pişta mêya xwe daket, westiyayî ji pêşeroja şehweta xwe a ku zuriyeta wî yek bi yek jê re bi ringîniyeke qerfokî dijimêre, paşê ewî rûyê xwe yê ziravikî bilind kir û zûrîniyek têr şikestin berda.

Mem jî, her ku bavê wî li sûka bajêr yan jî li nav werzan wî li lezandinê germ dike, hogirî vê şikestina xwe bûye. Li nav werzan şikestina wî xurttir bû çiku bavê wî yê ecele bi wê tivinga xwe ya hêvîşikestî a ku ji Mem pêve tu nêçîran nabîne bi kerb dibêje: “Ezê rojekê te bihingêvim, te bikim nêçîra xwe”, Mem bi rûkenîn dibêje: “tê li kîjan devera min bidî bavo?”, bav awirek tûj tê vedide: “Ezê hilbijêrim... ez”, û bi gavên xwe yên nearam dilezîne, kurê wî xwe digihînê û dipirse: “çima tu li teyran nadî”, bav radiweste, li kurê xwe dizivire mîna ku tiştekî hîç ew têde nefikirîbe ew veciniqandibe: “Ma çima ezê li teyran bidim?”, dîsa Mem jê dipirse: “Ma ne em hatine nêçîra teyran?” Hemdî bi hêrs di rûyê kurê xwe de diqîre: “Na”, kurik xwe di wî gumlekê fireh î têr bêrîk de ê ku gelek xefkên şingeşingê dikin bi navbenda wî ve daliqiyayî ne dikemişîne. Lê bi bersiva bavê xwe iqna nabe, êdî dike pistepist:

- Ê de çima tu gulleyan berdidî?

“Da ku ez dengê tivingê bibihîzim” bav bi qerf vedigerîne, Mem dipirse:

Û çima tu ji şingeşinga xefkên min û xirtepirta bazdana min a li pey xwe zivêr dibî?

Hemdî bêvila xwe bilind dike mîna yekî ku şoxiyekê bîn dike, û bi pistînî dibêje: “Em nehatine nêçîrê hey ehmeq, em hatine da ku ez te nearam bikim”, û berê xwe dide kurik û dîqîre: “çima ewqase bêrîkên te hene? Perikan bide hev. Perikên ku tu wan dibînî bide hev”, kêfa Mem ji wê yekê re tê û êdî baz

dide û wan perikên hindik yên ku li wê çolê belawela bûne berhev dike û dixe berîkên xwe.

Ew ne cara yekem bû ku Mem perik didane hev, berê ji wî qevdek perikên rengîn ji teriya dîkê Hemkê Pîrê jêkiribû, dîkê ku di qezayekê de ketibû bin tekerê yekemîn pîkaba ku derbasî kolana teng bûbû, ew kolana ji axê a ku tenê erbaneyên qûmkêşan têre derbas dibûn ku qûm ji ber çem dianîn û difirotin avakeran. Ew dîkekî xwebîn bû, bijiya wî dirêj û bi ser çavê wî yê çepê de xwarbûyî, teriya wî ya perdirêj tim gij bû û şewqa rojê lê diket û pirîskên şîn û binefşî û purteqalî û reş diçirîsîn. Ewî dîkî di meşa xwe de awirin qerfokî û kûrbîn hildibijartin, xasma ku bi çavê xwe yê rastê tenê dinêrî û bêgav dibû ku stûyê xwe xwar bike da ku derdora xwe bibîne, bijiya wî ya bi ser çavê çepê de çûyî jî dihejiya û dihişt ku çavê wî yê çepê bi lez wan zarokên ku dilîzin bibîne, ew zarokên ku bi keysebazî êrîşî wî dikirin dema ku wî dixwest xwe bavêje ser mirîşkeke ehmeq û ewê ji şehweta xwe ya ji nişkê ve têr bike.

Lê ew dîk guh nade têkçûnên xwe. Piştî her mirîşkekê bêguman yeke din heye. Lê vê carê hesabên wî ne serrast bûn, mirîşka ku ji dest çû ya dawî bû, ji ber ku pîkaba frênriziyayî lê qelibî bi awayekî ku wî hîç bawer nedikir dê pêre hestiyên wî, çermê wî, goştê wî û perikên wî jî herin. Lê giyanê wî ji cih neleqiya, giyanê wî bi kerb dinêrî bê Mem çawa perikên herî ciwan ji teriya wî jê dike.

Iskeletê dîkî bi erdê ve zeliqî bû û bi awayekî kirêt perçiqî bû, pîkab di ser re çûbû bêyî ku ew li ber xwe bide yan jî xwe hema bide alî. Ne layiqî dîkekî ye ku xwe ji ber aletekê ku nizane danikan ji erdê berhev bike, bide alî. Loma jî ewî demeke dirêj bi çavê xwe yê rastê bi tinazî li wê pîkabê nihêrî ku çawa ber bi wî ve tê, paşê her tişt tev li hev bû, piştî janekê ku saniyeyekê dirêj nekir, dema xwe dît bi erdê ve zeliqiye û

bîna xwîneke taze di nikilê wî de ye, xwîna mirîşkên ku wî bazda bû ser wan anî bîra wî.

Tenê terî wek xwe mabû, Mem jî ew per bi per xiste bêrîka xwe, pîkab jî di nav seywaneke ji tozê de dûr diket bêyî ku guh bide giyanê şikestî yê dîkî, giyanê ku xwest tiştekî bibêje, tiştekî ku bê guman dê dijûnek ba.

Lê Mem ê di dirûvê çeqelan de -wê şeva ku bû şahidê yekemcar a şehweta wî ya lihevketî ku laş ji tiştê ku mirov nikare xwe li ber bigre haydar dike- guh li perikan nake. Ew wan kêlîkên paş daketina ji ser pişta mêya xwe, ku behetiye ji ber wê giraniya ku hestiyên wî û goştê wî bi melkeseke mezin berhev dike, dengê teqîna hin gulleyan dike ku ji hêla Tirkî tên paşê jî dengê qêrînan û ketina laşan a di çemê nizim de. Êdî wî û koma xwe xwe çeng kirin, bi çavên xwe yên şewqdar reşên mirovan dîtin ku bi xirecir in û tiving di dest wan de sînor derbas dikin û li pêşiya wan komek mirovên tirsiyayî li ser kerên tirsiyayî direvin. Ew koma heywanan ranewestiya heta gihişte tixûbên bajarokê El-Qubûr El-Bîd ê ku berî Erebkirinê navê wî Tirbespî bû, erebkirinê jî gaz bi gaz bakur dabû ber xwe û êdî jiyan bi awayekî ku kenê mirov dianî hatibû dabeşkirin.

Lê Mem nekeniya, pişikên wî têra zûrîneke hêdî jî nedikirin piştî wê dema dirêj ku têde reviya, lê ew wisa pê hisiya ku gulleyek di ranekî wî de lêket bêyî ku ji tu aliyan de ew gulle were, ew êdî kuliya. Wê kêlîkê, tevî ku mîna heywanekî jê re zor bû bîne bîra xwe, roja ku têde di gel wan xefkan dabû pey bavê xwe Hemdî Azad, anî bîra wî. Bavê wî teyrên çolê nedigirtin, gulleyên wî vala diçûn mîna ku perdeyek di navbera wî û wan de hebe, lê wî çeqelek hingaft.

Ew çeqel aware bû li wê çola mişt ronahî awarebûneke ne layiqî çeqelan bû ew. Li dora xwe bi matmayîn dinêrî û ji xwe dipirsî ku çi ew wisa avêtiye nav şewqa rojê. Ewî tu caran bi şaşî ba jî, dev ji şevê bernedida berî ku şev têk biçe. Lê kenê mirovan

pê dihat dema ku ew wê çendê li dora xwe dizivirî û wisa mat mabû ku êdî di meşa wî de dudilîbûn diyar bû, loma jî Hemdî Azad bi destê çepê ji kurê xwe xwest ku xwe bi erdê ve bizeliqîne û di bin simêlan re keniya û rûnişt.

Mem jî li pey bavê xwe mîna qeşmerekî biçûk rûnişt. Bavê wî tivinga xwe bilind dikir ku ji xwe re nîşanê bigre û di lûleya tivingê re lîstika xwe ya kujer bibîne. Lê ew heywanê matmayî yê ku di bin wê ronahiya ku xwe mîna hevşiyekî li giyanê wî pêça bû diloqiya, ji nişkê ve rawestiya û berê xwe da Hemdî û kurê wî mîna ku wan nabîne yan jî dixwaze sebra xwe wê navrojê bi wan bîne, ew veciniqîn.

Hemdî tivinga xwe ya amade hinekî daxist da ku bi çavê xwe derdorê bipê, kurê wî Memê li pişt wî jî rabû û bi hêdîka got: “Bavo wî nekuje.” Lê bavê çare nedît û nîşan ji nû ve li wî heywanê zirav û biçûk girt, wa diyar bû ku ewê raneweste û wî rasterast berê xwe daye wan herduyan. Piştî kurtedemek giran ji matmayîna bav û kurî bi hev re, gulleyeke bi dûman kire teqînî û dengê wê tev li zûrîna wî çeqelî û qarewara Mem bû. Hemdî li hev herbilî û di navbera kurê xwe yê ku rûnişt û kire qêrîn ji ber êşeke nenas, û wî heywanê ku ji ber derbê hinekî bi hewa ve pekiya û paşê daket de, meşiya û kuliya mîna ku derb li nigekî wî bi xwe ketibe. Dema Hemdî hate ser kurê xwe, dît ku ew nîşanî ranê xwe dike lê tu sebeb ji êşa kurê xwe re nedît. Çend caran xwest ku wî aram bike lê bû îskeiska wî û bav bêgav bû ku wî bavêje ser pişta xwe û vegere, bi rê de jî her carê bêhna xwe vedida û li ranê wî dinêrî heta ku gihiştin mala xwe ya ku Hemdî bala xwe dayê ku dîwarên wî yên li derve hatine qeşartin, di dilê xwe de got ku ewê wan spî bike, û kurê xwe ji ser pişta xwe danî û pê de xeyidî: “Ma tu têr zûrîn nebûyî?”

Memê ku ji ser pişta bavê xwe peya bû û bê sebebekî naskirî dikuliya, berê xwe da hêlînên dûmeqesan ku mîna serê garisan di bin dîregên malê yên di derve re derketî daliqiyayî bûn.

Kurik bi wan herdu çavên xwe yên sorbûyî nihêrî da ku cihên hêlînan nas bike, û bi lez çû nêrdewana text kişkişand û bi kîn siparte dîwêr, di wê kêlîkê de bav derbasî malê bû bêyî ku guh bide kiryara kurê xwe. Lê qêrîna cêwiyê Mem -ku nav lê kiribû Dîno bêyî ku diya wî razî bibe wî navê dîntiyê li kurê wê yê aram bikin- ew di nîvê nêrdewanê de rawestand, Mem lê zivirî û gef lê xwarin: "tu hiş be hela." Bavê wî nîvê xwe ji derî derxist û got: "ê te tu hiş be û dakeve."

"Çima ezê dakevim?", Mem bi qehr ji bavê xwe pirsî û ji cihê xwe neleqiya. Bavê wî gotê: "Birê te dixwaze ku tu dakevî", Mem bi qerf got:

Ji kengî de Dîno fermanan li min dike?

"Ji niha de", bavê got, Mem bi qiriktehlî bersiv da:

"Wî ji min nexwestiye ku ez dakevim", û li birayê xwe zivirî: "Ma te ji min xwestiye ku ez dakevim?", birayê wî rasterast bersiva wî neda lê stûyê xwe bi alî bavê xwe de tewand û pirsî:

- Ew li wir çi dike? Wê hêlînên dûmeqesan hilweşîne bavo.

Bav pêşde hat û bi nêrdewanê girt, bi awazeke ku aramiyek çêkirî têde ye got:

Mem! Dûmeqesan çi bi te kirine ku tu hêlînên wan hildiweşînî?

"Ji ber ku ew ne balinde ne", Mem li bavê xwe vegerand, bav behetî û ji bersiva tinazîker a kurê xwe mat ma:

- Ma qey ew ker in?

"Na", Mem bi bawerî got: "Ew keçên te ne."

"Keçên min?" bavê got û kenekî mezin kir û ji nişkê ve bang kir: "Hêvîn, Welat, Eyşanê, Rehîme, Rohat, Hêlîn", îcar şeş keçik, bi kirasên bê navbend, ku bi ser newqên xwe yên zirav de berdane ji deriyê odeyekê derketin, Hemdî hema gote wan: "Hûn dûmeqes in", hin ji wan bişirîn, hinekan jî bêdeng bendewariya bavê xwe kirin ku wan peyvên xwe yên xerîb şirove bike. Mêrik simêlên xwe mis dan û li rûyê wan nihêrî:

“Hûn dûmeqes in”, û destên xwe bilind kirin mîna ku dixwaze tiştekî zehmet rave bike:

“Vê yekê bipejirînin keçikno. Hûn dûmeqes in”, û berê xwe da Memê di nîvê nêrdewanê de rawestiyayî:

“Ji birayê xwe bipirsin”, û ji kurê xwe re got:

“Mem. ji wan re şirove bike ku ew dûmeqes in” Mem bi baweriyeke mikum got:

“Hûn dûmeqes in”, ew keniyan, kurik jî xwe ji wê bilindiyê avête xwarê û ji pê sekinî û bi qêrîn pirsî:

“Çima hûn dikenin?”, rabû bavê wî bi sikura wî girt û bi dizî gotê:

“Ma tu bi xwe çi yî?”

Ne pêwist e Memê ku bûye bîst û yek salî, niha bersiva bavê xwe bide, yanî şeva ku ew têde qonaxin ji werzên bakur di dirûvê çeqelekî de derbas dike û dema ku dengê teqîna gulleyan ji aliyê sînorên Tirkî dibihîze bi janekê di ranê xwe yê ne birîndar de dihese. Lê bi rastî Mem kî bû wê çaxê? Ew ew bi xwe bû, ew kurikê ku mezinê xwehên xwe û birayê xwe yê cêwî bû, Mem berî cêwiyê xwe bi nîv saetê hatibû dinyayê û hevalzaroka xwe bi xwe re anîbû. Di berbangekê de, berbangeke zivistanê û tarî de û li ber şewqa çirayê Mem di nav destên dayeyê de xuyakir, ew daliqiyayî bû. Dema ku ew di teştê de danîn diya wî got ku hîn di malzaroka wê de tiştek dilebite, nîv saet derbas nebû cêwiyê wî Dîno jî hat û di bin şewqa çirê ya zêrîn de dibiriqî, ji xwîna li ser laşê xwe ew purteqalî xuya dibû. Dema ku Hemdî Azad piştî derdora saetekê hat û li wan nihêrî tiştek negot, li jina xwe Kesbo xwediya çar guliyên kin bi koşeyê çavan nihêrî, lê tavilê bala xwe dayê ku ew herdu cêwî dibişirin, ew jî bişirî û kire pistepist: “Melaîket zû derbasî mala me bûn.”

Her zarokek melaîketekî wî heye wî didiqdiqîne û dihêle ku ew bigirnije. Guman di vê de tune, bi delîlê ku ew melaiketên ku derbasî mala Hemdî bûn û hiştin ew cêwî bigirnijin, dema

xwestin paşê derkevin ew herdu zarok giriyan, bavê li deriyê girtî nihêrî û ji bo derketina wan xemgîn bû û hêvî kir ku xwezî bikariba her qelşek biçûk di malê de bigirta da ku ew melaiket di de bimana, çiku melaiket gelek in û Xwedê dikare dev ji hinekan berde. Hemdî Azad, dema ku kurên wî mezin bûn, ji wan dipirsî ka ew melaiketên ku wê berbanga çilmisî hatibûn serdana wan çawa bûn (serdana wan jî tiştekî kêmpeda ye, tenê dema ku zarok di kêlîkên destpêkê de piştî jidayikbûna xwe bigirnijin, diqewime), herdu zarok jî pêde diçûn û di vegotinên xwe de li hev nedikirin, yekî ê din derewîn dikir, yan jî lê zêde dikir yan peyva wî piştrast dikir:

"Ew wek mirîşkan in", Dîno dibêje, Mem wî qut dike:

"Mirîşk! Perikên melaiketan nînin ehmeqo", û li bavê xwe dizivire û dibêje:

"Min baskên wan nedîtin." Bav dipirse:

"De ka ew çawa ji derî derketin?", Mem bersivê dide:

"Ew derneketin."

"Bavo min dît ew derdikevin", Dîno diqîre û lê zêde dike:

"Qabqabk di destên wan de bûn." Bav dipirse:

"Ma wê çi bikin ji qabqabkan?", Mem wî qut dike:

"Jê bawer neke bavo. Hîç qabqabk bi wan re nebûn", û li destê xwe dinêre mîna ku li delîlekî bigere:

- Destên wan nebûn bavo.

Lê bavê wan pirsa xwe ya ku ji Dîno kiribû bi şahî dubare dike:

"Çima dema ew derdikevin qabqabkan radikin?", kurik bersivê dide:

"Li derve herî heye", Hemdî dikene û çav dike Dîno:

"Melaîket difirin, pêdiviya wan bi sol û qabqabkan nîne."

Mem yê ku li ber soba daran dikene, destên xwe li ber germiya hesinê wê di hev dide û li dijî axaftina bav û cêwiyê xwe dibêje: "Bavo ew ne bi hacetî qabqabkan in û nafirin jî."

“Ê de ew çawa ji malê derketin?”, Hemdî dipirse, Mem jî bi uftekuft bersivê dide:

- Ew dernektin bavo. Melaiket ji cihên girtî dernakevin.

“De îca melaiket çawa derbasî cihên girtî dibin?” bav dipirse, kurik jî milê xwe yê çepê bi qerf radike:

- Ew li wir in bavo, li wir in.

“Û çima ew di cihên girtî de ne?”, bav dipirse di nav matmayîneke sivik de, kurik bersivê dide: “Di cihên vekirî de haceta melaiketan bi per û baskan nîne bavo.”

“Û çima ew derbasî mala me ya girtî bûn dema hûn jidayik bûn? Ma em bi hacetî wan bûn?”, Hemdî bi mukrî ji kurê xwe dipirse, kurik bersivê dide: “Ew derbas nebûn bavo. Ew berê di malê de hebûn. Ji çaxa ku te mal ava kiriye de ew hene”, lê dengê Dîno yê hişk ji nişkê ve bilind dibe û hevpeyvînê qut dike: “Min dît ew derbas dibin, min dît ew derdikevin jî”, û sond dixwe:

“Min dît derbas dibin û derdikevin”, Mem bi du çavên nîvgirtî jê dipirse: “Ew ji kû derbas bûn û di kû re derketin?” cêwiyê wî bi hesanî bersivê dide: “Di derî re.”

Mem li bavê xwe dizivire û bi tinazî dibêje: “Bavo derî girtî bû”, Dîno wî qut dike:

- Bavo qet derî tunebûn.

“Dema hûn ji dayik bûn derî girtî bû”, bav dibêje û ahenga henekan di axaftina wî de sivik dibe, Mem peyva bavê xwe piştrast dike: “Derî girtî bû Dîno.” Dîno hêrs dibe: “Derî nebûn”, Mem jê dipirse: “Ma çawa derbas bûne? Te got di derî re”, bi bişirîn vê dibêje, Dîno lê vedigerîne: “Ez nabêjim deriyê malê, lê mebesta min ew deriyê ku bavê min ji bîr kir wî bigre, ewê li dîwarê rojhilat.”

“Dîwarê rojhilat?” bav ji xwe û kurê xwe bi hev re dipirse û li wî dîwarê qalind î girtî dinêre, dike pistepist: “Yanî ev dîwar?”, kur bersivê dide: “Erê. Te ji bîr kir ku tu deriyê wî bigrî.”

Mem xwe li ber henekpêkirina di wan gotûbêjan de nagre, birayê xwe yê cêwî ji kirasê wî dikişîne û diqîre: “Were were, were em di vî deriyê negirtî re derbas bibin”, û birayê xwe dikişîne ber bi dîwarê qalind ve heta ku bi qesdî xwe û wî lê dide, Mem du gavan vedigere û dubare dike: “Pêşde here Dîno. Pêşde here”, û destnîşanî spîbûna lal a geca (kilsa) li ser dîwarê lal dike. “Pêşde here” dîsa dibêje û bi milê birayê xwe digre û wî didehfîne, Dîno li bavê xwe yê ku li wan temaşe dike, bi mereq dinêre û dibêje: “vî kurê te qet melaiket nedîtine.”

“Ma çi dihêle ku tu wisa piştrast bî ku te ew dîtine Dîno?”, bav dipirse, kurê wî yê guh bel dibêje: “Ji ber ku ew di vê derê re derbas bûn”, û mista destê xwe dide dîwêr.

“Xem nake” bav dibêje mîna ku cidaleke ku êdî nema xweş e bi dawî dike, û lê zêde dike: “Xem nake. Melaiket bi her halî ne bi hacetî deriyan in ku derbas bibin û derkevin”, Mem wî qut dike:

- Bavo ew derbas nabin û dernakevin.

“Erê” bav dibêje û radibe ser xwe: “Ew derbas nabin û dernakevin.” Li wan herdu kurên xwe dinêre û dawiyê li wê civîna şad tîne: “Hûnê wesfê melaiketan di rojeke din de bidin.”

Lê ew herdu kur dê tiştekî ji wê çavpêketina dema zayînê a li gel wî cûre afrîdeyê baldar û nedîtî ku ew îddia dikin, wesif nekin, çiku ew -dema ku afrîdeyên xwedê yên nazik roja jidayikbûna wan derbasî ba wan bûn- ji qerebalixa melaiketan westiya bûn, dema melaiketekî ji yê din dipirsî:

- Ma divabû em bihatana vir?

- Em li vir in.

Qerebalix di guhên wan kurikên nûzayî de zêde dibû, tev li peyvên dayikê, dayeyê û bavê ku li bişirandina herduyan dinêrî, dibû. Ewan cêwiyan bêguman xirecira wan afrîdeyên nedîtî dibihîstin ku çawa sebeban ji hebûna xwe ya li wê odeya girtî û bi sobeyeke ku hesinê wê sinciriye re, dibînin. Lê

melaiketan ew pirbêjiya xwe ya zarokane derbarê pirsa cih de ji bîr dikirin da ku formin nû û nearam ji bersivin ku kesekî nexwestine re bibînin:

"Bask giran in. Ev benîadem jî ji kêlîka jidayikbûna xwe de jîr in, çiku ew bê bask ji dayik dibin", yek dibêje û yê din lê vedigerîne: "Yên ku hildibijêrin bask bi xwe ne", yê ku li aliyê wî yê rastê rawestiyaye peyva wî dibirre: "Na. Çîrok e ya ku baskan ji vî re yan ji wî re hildibijêre."

"Lê ew ji ademiyan re hilnabijêre", yek ji wan dibêje, yê li rex wî dike pistepist: "çîrok baskan ji çu kesî re hilnabijêre, çiku çîrok bi xwe xwe hilnabijêre." Melaîketekî din dikene: "tenê teyr baskên xwe hildibijêrin", hevalê wî lê vedigerîne: "Baskên teyran nînin."

"Ê de çawa difirin?" yek ji wan ji bo cara yekem bi kêf dipirse, melaiketek vedigerîne: "Ew nafirin."

-"Û em?!" eynî wî melaiketî ji yê din dipirse û zêde dike: "Ma em çawa difirin?!", ê din lê vedigerîne: "Em nafirin."

Bi vê bersiva serkêş re, melaiket bi awirin tijî qerf li hev dinêrin paşê yek li yê din seh dike da ku cihê baskên xwe nîşan bide lê nabîne û êdî mîna çeqelan dizûrin.

Jixwe ne tenê melaîketan nebûna baskan li ba afrîdeyan keşif kiribûn, Ismaîl Axayê Simko jî, xwediyê desthilata hêzdar a li bajarên Şino û Maku û Qutûra li Îranê, carekê dijûn kirin -li gel ku ew yekî aqilmend î giran bû- ku çima Xwedê bask ji afrîdeyan re çênekirine da ku bifirin. Û dema ku hinan ji peyrewên wî bi fedî gotinê ku baskên teyran hene, Simkoyê xwediyê kolosê rêşîdirêj got: "Baskên tu kesî nînin madam ku bavê min nikaribû ji hebsa xwe bifiriya."

Lîstika janan pêwistkiribû ku bavê Simko ji zindana xwe ya li Trablusa bakurê Efrîqayê dernekeve. Ew û Ebdurrezaq Bedirxan sirgûn bûbûn piştî ku ew li gel gelek maqûlên Kurdan bi kuştina Ridwan Paşayê serekpolîsê Stembolê gumanbar

kiribûn. Bavê Simko di bin işkenceyê de mir, lê vê yekê rê li ber Elî Şamil paşa negirt ku Necmeddînê dozger bixeniqîne, Necmeddîn bi taybetî şandibûn Trablusê da ku lêpirsînan li gel wan girtiyên bi idamê mehkûmbûyî lidarbixîne.

Ebdurrezaq Bedirxan têkiliya xwe bi kuştina serekpolîs re inkar kir, lê bê fayde bû. Berpirsên Tirkan ew di rêya bavê wî re qanih kiribûn ku ji welatê mijê Ingiltere- ku li wir têkiliyên xurt bi rêxistinên Kurdî û Ermenî re li darxistibûn- vegere. Ebdurrezaq bû qurbana neserketina polîsan di naskirina kujerê serekê xwe de, êdî ew berguman kirin ku destê wî li gel Elî Şamil û bavê Simko di kuştina Ridwan Paşa de heye, û rabûn hemî şandin Trablusê. Lê bergumanî bû bi awayekî din dema ku Tirkan nerazîbûn li herêmên Kurdan his kirin, ewan êdî gotin ku evên sirgûnbûyî plankiribûn ku ne tenê serpolîs bikujin lê bi alîkariya warisê text Yûsif Izzedîn li Stembol û Kurdistanê li dijî sultên jî xirabî plankiribûn.

Tuhmet û bergumaniyan hin kes ketûber dane ber xwe ku hîç ne li Stembolê yan li Kurdistanê bûn; Kamil Beg li Heyfayê, Mihemed Beg û Elî Beg li Beyrûtê hatin girtin, her weha Salih beg û Husên begê pîr sirgûnî Rodosê bûn, gelek ji wan venegeriyan ne bi bask û ne bê bask.

Lê çawa bavê Simko bi işkenceyê mir û nikaribû bifiriya? Ev pirseke melaiketin ku li wê derê bûn bersivê didin bêyî ji Simkoxan re bibêjin ku du baskên bavê wî hebûn lê ewî baskên bi quncikê cigareyên xwe xwe per bi per şewitandin daku nefire. Lê dibe ku ew melaiket wêneyê kuştina Ridwan Paşa bikişînin, Ridwan Paşayê serpolîsê Stembolê ê ku hewl dabû rêyekê heta mala Ebdurrezaq Paşa veke.

Ridwan Paşa li gel hinek siwaran ber bi mala Ebdurrezaq Paşayê Kurd de diçû, ew di paytoneke ban serban ji çerm de bû û tenê du hespan ew diajot. Diyar bû armanc girtineke nazik bû, wan dixwest mêrikê ku piştî ji Ingiltere vegeriyabû û bûbû

serokê teşrîfata koşka Siltan Ebdulhemîd bigrin. Sebebên rasteqîn jî vedigerin demeke dûrtir ji vegera wî ya Tirkiyê piştî sozên sultanî û daxwazên bavê xwe. Ew di destpêka salên nodî ji sedsala nozdan de di balozxaneya Tirkî ya li Petersburgê sekreterê duyem bû. Dema ku paşgoyî derheqê wî de pirr bûn û hate gotin ku têkiliyên wî bi muxalifên Bab-i Alî -mîna Kurdan û Ermen û Yûnan- re hene, ewî bazda û çû Bedlîsê bi hêviya ku ji wir berê xwe bide Yêrîvanê û nêzîkî qerargehên Kurdan yên li Qafqasyayê be, lê têkiliya Qeyserê Rûsî û sultanê Osmanî jî nikaribû mehderiya Ebdurrezaq bike rabû berê xwe da Ingiltere û piştî çend salan bêdilî xwe vegeriya.

Bi her halî Ridwan Paşa ber bi mala Ebdurrezaq beg de çû, ewê hevalê Rûsan û xelatgirê xelata Stanislav ji bo têkiliyên wî ên bi Bilarûsya re, lê di wî ciyê xwe yê xweş de ji nişkê ve sist bû, kumê wî bi ser palgeka paytonê de xwar bû, herdu hesp li hev ketin, kirin hîrehîr û hinekî bi şûn de çûn paşê rawestiyan, yên li gel Ridwan Paşa bûn di nav tirsê de man û bi xirecir xwe ji ser hespên xwe avêtin.

Ridwan Paşayê nehezkirî hema hate kuştin bêyî ku amîra kuştinê were nasîn, di nav tiqetiqa melaiketên ku çîrok vedigotin re, û Ebdurrezaq Paşa û Elî Şamil Paşa hatin sûcdarkirin û ew herdu di gel bavê Simko şandin Trablusê ku hêzeke parastinê a eksentrîk li wê bû û ji cihnuşînin tenbel bêzar bûbû.

Sebebê eksentrîkiya wan jî ew bû ku hîç tu kesî li wî bajarê tozgirtî di xwe re nedidît karekî bi serî bike, heta muheqiqê ku fermana tesfiyekirina bavê Simko Axa da jî, bi tenbelî ew ferman da:

- Ma tu axa yî?, ewî pirsî, mirovê pozbilind jî bersiv da:

“Ma ê te eslê te çi ye?” ê muheqiq mat ma, û bêdeng bû paşê şîv ji xwe re xwest, jê re gotin ku xwarinpêjî beroş li ser agirekî vemirî daniye û ketiye xew loma jî şîv dereng bûye, rabû wî

fermana işkencekirina bavê Simko da û got ku lê bidin heta şîv amade dibe, bavê Simko mir ji ber ku ranê gayê ku dikeliya, heta berbangê jî neherijî.

"Hîç baskên kesekî nînin" Simkoxanê serencama bavê xwe dizanîbû dubare kir ku bavê wî nikaribû ji zindana xwe ya Trablusê bifire. Ji wê demê de wî û Ebdurrezaq Bedirxan têkiliyên xurt li gel Rûsan danîn, Rûsên ku Qafqasya ya Tirkî di şerê 1828 an de tev li welatê xwe kiribûn, ew herêmên ku tevgera Kurdan herî geş bû li wir, herdu mirovan jî ji wan deran dest pêkirin bi ramanin germ ku hêviya çandeke girêdayî ya Rûsan ji bo gelê Kurd dikirin. Ji bajarê Xoy li rojavayê Îranê ku xwedî sî hezar niştecih bû komeleyeke zanistê hate damezrandin ku armanca wê vekirina dibistanan û belavkirina rojnameyan bi alîkariya hin maldarên Kurdan bû. Paşê Ebdurrezaq Bedirxan di sala 1913an de xwe gihande cîgirê qunsulusê Rûsyayê û alîkariya imperatoriyê jê xwest ku komeleyê biparêze. Qunsulus ji berpirsên welatê xwe re nivîsî ku çi fayedeyeke rastîn a projeyeke weha heye, projeyeke ku ne tenê "Nêzîkiya rûhî a Kurd û Rûsan" armanca wê bû lê afirandina alfabeyeke Kurdiya nû ku xwe disipêre alfabeya Rûsî/Krîlî. Li gel wê jî Ebdurrezaq bi israr bû ku enstîtuyeke zimanê Kurdî li Petersburgê jî hebe.

Simko bi xwe idareya komelê dikir, ku ew karê wî bûbû cihê nerazîbûna karmendên Belcîkî û gumrika Îranî a li bajêr, êdî wan rabûn bi dizî ji xelkê xwestin ku zekata xwe nedin komelê ji ber ku Simko hewl dide "Dînê Mesîhî di nav Kurdan de belav bike." Simko gelek caran bi vê yekê keniyabû û gotibû: "Ez xîreta Îraniyan li ser dînê me fêm dikim, lê a van Belcîkiyan!" Di vekirina yekemîn dibistana li Xoyê de, Simko bîst û yek zarok anîbûn, taxim li wan kiribûn û kumên qafqasî yên spî li serê wan danîbûn, çil şervanan ew diparastin û ji serê bajêr heta dawiya bajêr ew meşandin, Farisên ku di du

rêzan de rawestiya bûn bi awirên ecibandinê li wan dinêrîn, ew Farisên ku fêr bûbûn navê (çêlîkên gurên çiyan) li Kurdan bikin.

Simko hevoka xwe "Baskên kesî nînin" her di beşekî ji kûraniyên Hemdî Azad de dubare dike, Hemdî Azadê niha li ser xaliya hişk paldaye û xwe sipartiye enîşka xwe, kurê wî Mem jî ê ku xwe vediziye û bi dirûvê çeqelekî ketiye nav Zeviyên Tirbespiyê ên dûr hinekî zûrîna xwe radiwestîne û li stêrika bakur a ku dadiwerive şikefta xwe dinêre, mîna ku ew stêrik agahiya hatina berbangekê dide Memê ku di wî halî de nikare bêexlaqî û xapên wê berbangê ragire, êdî Mem vedicinîqe.

Guregura trêna berbangê ya ku ji Qamişlo bi vagonên nîv vala derdiket, erda li dûr didiqdiqand, erda ku Mem jê bi çar lingan derket û bazda, werzekî li pey yekî din ew êdî pê dihisiya ku giraniyek lê peyda dibe û nahêle qevaztinên wî mîna berê rewan bin, ewî êdî di wî giyayê bejî de ku pê lê dikir, astengî didîtin ku xwe li lingên wî didin û bi stiriyên xwe diçelitînin. Bi tayên pêşî ji teşiya berbangê ku ezmanê melûl ew bi nenûkên xwe yên stêrikî dirist qelsiyek kete mûskilên herdu lingên wî yên pêşiyê, ew êdî pê dihisiya ku ew kin dibin lê herdu yên paşî xwe amade dikirin ku rast bibin.

Di nav wî deviyê biçûk ê darên çinar û selwiyê de Mem vegeriya bi aliyê malê ve, li ser herdu lingên xwe yên westiyayî, milê xwe dihejandin ku nerm bibin, çena xwe ya jêr jî dilivand mîna ku xwe li ser axaftinê perwerde dike, piştî ku ew çene tenê ji zûrîna wî ya çeqelan re mabû. Dema ku ew gihişte deriyê hesinî ê di sûrê bilind de, ew gêr kir, derî vebû ji ber ku bavê wî yê diçe li mizgeftê nimêja sibê dike ew vekirî hiştibû. Û çawa ku ew kete hewşa malê berê xwe da nêrdewanê û hilkişiya serê ban ku nivîna wî ya sar li wê bû, xwe li ser dirêj kir û raza di bin wî ezmanê ku êdî ji ber gefên sibehê bêtir dihetikî.

Şeva din Mem daneket, di gel ku zûrîna çeqelan a bilind î ku ji werzên rojava dihat zêde kişîner bû jî ew daneket. Ew ditirsiya ku hafizeya wî têkbiçe û êdî nema vegere malê, bavê wî jêre gotibû ku divê ew piştî çend rojan biçe girava Qibrisê. Ewî şev li dû şevê fikra xwe bire ba Mirovê Mezin ê ku dê ew li gel wî di werzên mukemmeltir de bicive û dê Mirovê Mezin wî ji xewna bavê wî Hemdî re amade bike mîna ku çawa neccar dolaba avê amade dike.

Ew ezmûneke rasteqîn bû ku Mem di wan her çar şevan de ji serê ban danekeve jêr, û xwe bi nivînan ve bigre û zûrîna çeqelan di gewriya xwe de veşêre ew zûrîna ku divê hemahenga zûrîna hevalên wî be, ew hevalên di koma çeqelan de li werzên rojava, ku dê berê xwe bidin rojhilat, di nav deviyên ku herdu aliyên têlên rêsayî ên di navbera sînorên Tirkiye û Sûriyê de ne, lê tirh û şax û tel û tûdirkên wan deviyan û avrêjên rûbaran bi awayekî ku qerf têde heye xwe li hev pêçane. Teqîna gulleyên leşkerên sînorparêz jî ku hertim ji hêla Tirkiyê tên, hema tavilê bayê ku ew parçe dikin, di xelekan de komî ser hev dibin mîna ku qeder gumlekê qetiyayî yê mirinê didirû.

Mem bi tu kesî re, di wan rojên berî rêwitiya xwe de, neaxivî. Ew xemgîn û sergerdan bû. Di ber xwe de dikire himehim: "çima ez û ne Dîno?" Dînoyê xwediyê devê henekpêker jî, sivikdîtina birayê xwe yê cêwî venedişart her ku ew li wê odeya cuda didît, ew ode dûrî odeyên din bû ku bav û dê û her şeş xwehên wan têde dinivistin.

Hûrgiliyên pişt re ne ewqase girîng in. Mem gihişte wê girava ku bi Yûnaniyeke giran û tenbel diaxive. Kesên ku dê karûbarên rûniştina wî çareser bikin jî ji hêla Mirovê Mezin hatibûn pêşiya wî, ew bi karûbarên wî rabûn heta ku Mirovê Mezin vala bibe ji bo pêşwazîkirina şandiyekî bîst û yek salî ku tiştekî nizane ji bilî nivîsnadina nameyên bêzariyê ji bavê xwe re û paşê jî berî ku wan bişîne diqetîne.

Şeş salên wî derbas bûn li wê giravê di wê bendewariya mezin de berî ku Mem pîşeya xwe mîna segvanekî bi nav bike, mîna ku çivîkan ew hişyar kiribin, çivîkên ku li wê çola li başûrê mala wan datanîn ew li qêrîna bavê wî hişyar dikirin dema wî dida pey bavê xwe bi wan xefkan: "Hey ehmeq em nehatine nêçîrê, ez hatime da ku te nearam bikim."

Mem jî bi her halî ne bi hewce ye ku zêdetir nearam bibe. Cih bi tevayî nearam e heta radeyekê ku mirov nikare di nearamiyê de birame: darkokên bîberê mezin dibin. Dara okaliptusê mezin dibe. Dara maziyê mezin dibe. Mendab (roka) a kenokî mezin dibe. Buganfîl û geranium mezin dibin. Darên akasyayê li alî rojava bûne cîwarên kundan. Dara hejîrê ya dilovan mala ku li hêla rojhilatî mala Mem dikeve vedişêre ku roj bi roj mezin dibe. Laleyên demsalî şoxiyên xwe ji bo mehekê dubare dikin paşê bi ser milê baxçe de xwar dibin mîna barekê pîvayî. Dêliya tirî xwe rût dike û xwe bi cil dike bi bêzarî û neguhdan, weke ku ew rola xwe nebaş dilîze. Zeytûnên li her aliyî çandî -bi awayekî hişk ku guh nade hemahengiya ku mumkin e di nav cûreyên giyayê li dora malê de hebe- ji xwe re desthilateke aram û mukum dadmezirîne û dest dide ser darên leymûn û purteqalan yên li pişt odeya razanê ketine nava hev.

Weha, bi asayî, her tişt nearam xuya dike bi qasî gewreyiya ku jiyan li demsalên xwe belav dike. Tiştê ku meselê bêtir qewîn dike ew e ku ew herdu teyr, ên ku Mem xapên ku qet bi ser nakevin ji wan re amade dike, li eynî cihî li aliyê başûr ji pişt malê vedinin, di destpêka buhareke nearam de ku nizane çawa tuxmên qewanan ji yên hindibayê veqetîne. Mem êdî wisa difikire ku hevtênegihiştinek di navbera aliyê başûr û wî de peyda bûye, mîna hevtênegihiştina di navbera wan herdu teyran de ye, ew her çax bê kêfeke layiqî balindeyan li wir vedinin, ew ne mîna wan tevdigerin, ew erdê zêde nikil nakin

yan jî perikên xwe ji şilahiyê dadiweşînin, ew her carê li nêzîkî hev in, sîngên xwe datînine ser qûma şil û li mala Mem dinêrin û bi hev re dikin pistepist:

"Ew me dibîne" teyrek dibêje, yê duyem lê vedigerîne:

- Erê.

"Ew ehmeq e", teyrê yekem dibêje, yê duyem vedigerîne:

- Ehmeq ehmeqan dibînin.

"Ma tu dibêjî qey em ehmeq in?", yê yekem dipirse, yê duyem dibêje:

- Na. Cih ehmeq e, em jî şirove dikin...

"Em çi şirove dikin?" teyrê yekem ji hevalê xwe dipirse, yê din dibêje:

- Tiştê ku ev xort dikare ji xwe re şirove bike.

"Naxwe em herdu ehmeq in" yê yekem dibêje, yê duyem vedigerîne:

- Erê, ji ber ku tu her sal eynî lîstikê dubare dikî.

"Ez??" yê yekem bi mirûzekî tirş dipirse, yê duyem vedigerîne:

- Min gote te, em ji awayên nêçîrkirina teyran yên vî xortî têr bûne. Min got...

"Awayên nêçîrê li ba wî hîn neqediyane", yê yekem dibêje, yê duyem bersivê dide:

- Ma divê em şêweyekî kêrhatî şanî wî bikin ku ew me nêçîr bike?"

"Bi her halî ewî em nêçîr kirine", yê yekem bi bêzarî dibêje, yê duyem vedigerîne:

Wî tu tenê nêçîr kiriyî.

"Ê de ka çima tu hevaltiya min dikî, her sal, madam ku vî xortî ez nêçîr kirime?", yê yekem ji hevalê xwe dipirse, yê duyem vedigerîne:

- Da ku ez te xelas bikim.

"Tu min xelas bikî?", yê yekem bi nerazîbûn dibêje, lê Mem axaftina wan dibirre û ber bi aliyê başûr yê wê çolê de tê,

radihêje wê perika ku di binê çenteyê xwe de dîtibû û di ber xwe de dibêje: “Li hêviya min bin” û destnîşanî herdu teyran dike. Herdu teyr jî ne li hêviyê ne ku Mem ji wan re bibêje ku wî perikek di nav cilên xwe de dîtiye, ew dixwaze bipirse ka ev perika kê ji wan e. Ew herdu bi çeqeçeqeke sivik ji baskên xwe, wê valahiya ku wan dike du siyên berevajî ji erdê ber bi ezmên ve, parvedikin û difirin.

Mem gelekî li wan, di wê bilindbûna wan de, nanêre, lê ew li cihê ku lê veniştibûn dinêre. Û dema ku digihîje wir kulma destê xwe bilind dike û vedike, ew per dikeve, libabûyî tê xwarê, ku digihîje erdê jî ranaweste lêbelê di kûraniya qaşilê qûmê re diçe û diwerive wî cihê ku Mem her hêvî dikir ew bibe gora wî, mîna ku ew perik berê xwe dide laşê wî yê dirêjkirî û têre bibuhure û kûrtir biçe, li ba dibe û ber bi ava rawestiyayî ya di bin erşa Xwedê de diçe, di nav himehima firişteyên tirsiyayî de ku komên wan belawela dibin dema wê perika arîrengî ya biçûk dibînin ku ji jor tê xwarê û hinek qûma hûrik ji gora Mem pêve ye.

Lê Memê ku hîn nemiriye vedigere malê piştî ku ew perik ji destê xwe berda çolê, û pêre dipirsî: “çima ew difirin.”

# Para Sêyem

Gerrek ji şoxiyê ji bo piştrastkirina gelek
serencamên ku cihê wan di vê parê de nîne, yan:
misyona Mem a ne muhtemel.

"Ev protestantên Alman derewan li we dikin." Ew bû hevoka ku min çend caran ji ber girtî. Ew hevok di wê pela giran de bû ya ku hemsayê min î di qapûtê xwe de winda û kefa destê wî baskekî biçûk î bi per bû. Ewî heştê hezar rûnivîs ji min xwestibûn lê mijûliya min a wan pênc rojên piştî hevdîtina min û wî li wê mala bakurî baxçeyê pêş malê, nehişt ku ez gelekî guh li wê hevoka nîv xerîb bikim.

Na. Ez ne mijûlê mijûl bûm lê ez xemgîn bûm û min çîroka wê hevoka di berîkeke pantelonê xwe yê li dera hanê avêtî ji bîr kiribû. Êvara roja çaran ew hate bîra min, rabû min ew çend caran nesix kir heta ku ez bêzar bûm. Çaxa ku min xwest wan çend hevokên hindik ên nesxkirî hilgirim û ji hemsayên xwe re bibim, sibeha roja pêncan, ez him li lêborîneke layiq digeriyam him jî li goreyên xwe, ringîniya xeniqî ya zengilê derî hat, min bi ferek sola di lingekî de derî vekir ku binêrim wa li ber derîzankê çar mirovên ku dê qaşo min bi Mirovê Mezin re bicivînin, destên wan di germiya berîkên wan de ne û li ser lêvên wan bişirînin nayên veşartin hene, min berê xwe bi rûkenîn da wan:

“Xeberek xweş e?”, wan serê xwe hejandin:

- Ew li hêviya te ye.

Min bêhna xwe kûr kişand û berda, lerizîneke sivik kete hestiyên min lê negihişt goşt, çiku dema ez bi hestin veşartî fera solê ya din jî dikim piyê xwe dibînim ku hevdîtina ez şeş salan li hêviyê mame nema ji min re xem e, mîna ku bendewariya min bi xwe hevdîtineke dirêj be û mişt bêzarî be. Lê ez nikarim berê çîrokê bi aliyekî din ve biguherim, hema ku ez karibim eşkere li gel wan her çar mirovên li ber derî xeber bidim û bibêjim ku dilê min û devjêberdana hevdîtina Mirovê Mezin heye, ma ezê çi bikim? Ezê çi bikim eger wan daxwaza min wek daxwazeke cidî fêm kirin û bi bişirîn çûn mîna ku hatibûn? Ezê ji bendewariya xwe rizgar bibim. Ez vê dizanim. Lê heta hetayê ezê bibêjim ku min meraqa xwe bi serî nekir, meraqa ku ez şeş salan li bendê bûm û tenê dê bi hevdîtinekê re biqede û bavê min pê rihet bibe û mêvanên wî her ku çîrokê ji bin simêlên wî yên stûr bibihîzin, aferînan bibêjin û “tew” bibêjin.

Min derî li pişt xwe girt û ketim pê wan her çaran, min li kolana kevanî nihêrî bi hêviya ku erebeyekê ji bo em lê siwarbin bibînim, lê min piskilêtek jî nedît, min got de mala Mirovê Mezin nêzîk e. Lê dîsa jî ez xemgîn bûm. Ji ber ku navekî bi vê giraniyê ku bavê min tim behsê dikir ji xwediyê xwe dixwaze ku xwe li ber mêvanên xwe bibîne, ne ku bihêle ew heta kîlometrekê bimeşin yan tew çend metran di navbera du derîzankan de. Lê ez li kêleka rêza wan çar mirovan meşiyam û min jî weke wan destên xwe xistin berîkên pantelonê xwe yê daketî.

Ez nizanim çawa ew kolanên kin î ku ez di wan re buhurîm wisa xerîb xuya dikirin! Ez di wan şeş salan de gelek caran têre derbas bûbûm, lê ew vê carê teng xuya bûn û her deh metran kaosa çiqlên dara xernûfê yên gijikî, dara hingîdinya ya

guhlênebûyî, hinar û hinek darên gizê yên li herdu aliyê asfaltê şîn hatibûn. Hema darên zeytûnê bi kokên xwe yên xûz, şaxên xwe berdabûn erdê û di bin lingên peyadeyan yan jî tekerên giran de perçiqî bûn û zeyt ji wan herikîbû û leke li asfaltê belav kiribûn.

Dema em ji koşeyekî ketin yekî din çavê me bi tu kesî neketin, em neaxivîn jî. Sibeheke gewravî û germ bû û bêdengî bi ser malan de daketibû. Hinek qumriyan li ser asfaltê danîn û paşê dîsa firiyan û çûn li ser qirmîdê malan veniştin. Hindek çivîk jî di ser têlên karebayê re firiyan, dûmeqesekê jî xwe daxist heta ku xwe bi golek ava baranê kir li nêzîkî kenarê rê û dîsa bi du baskên lezok ber bi jor de firiya mîna ku ew wî bayê qeşmer li dora xwe ezmûn dike.

Her çar mirovan mîna min qutikin sivik li xwe kiribûn, lê wan ji koşeyekî ta yekî din aramiya ku li rûyê wan peyda bû dema li deriyê min dan êdî winda dikirin. Êdî daneyên xwîdanê ji nav qermîçokên eniyên wan û ji dora pozên wan dipekiyan û dibiriqîn bêyî ku ew damalin. Ê min jî tenê destên min ku di berîka pantelonê min de bûn xwîdan didan, li dora me jî her ku me kolanek diborî firefira baskin nedîtî bû bêyî ku em jêderê nas bikin, mîna ku ew li pey me ne û ferman li wan bûye ku aciziya me nekin yan jî gumanan bi me re çênekin.

Mal bêdeng bûn, ez jî fér bûbûm ku ev girav bi tevayî bêdeng be, dibêjin ku tenê kenarên deryayê bi qerebalix in dema ku havînan gerrok ji welatên qeşayê tên û buxçeyên mezin li milên wan in, ew qonax bi qonax dimeşin û heta ucreta xewa xwe jî nadin çiku ew qûma kenaran ji xwe re dikin cihê xewê û eger hilkişin çiyayên rût jî konên xwe yên biçûk li gel xwe dibin. Di gel vî awayî jî dewleta giravê ji wan hez dike, ev dewleta ku jinên wê bi çermekî esmer û porekî xernûbî yan reş jidayik dibin lê hema ku dibin sî salî te hew nihêrî ku bi qudreta Xwedê porê wan zêrîn û gewez dibe.

Giraveke ku ji xwediyên çermê mîna mûman hez dike, dil dikeve wan, lê paytexta wê ya ku ez lê dimînim, ne derya ne çem ne masî ne meraq ne qerbalix ne nêçîr ne jinên ku porê wan bi ser cênîkên wan de berdayî bin jî lê hene, ez wê giravê jî her bêdeng dibînim, bi wan niştecihên xwe yên mîna peleke kopîkirî ku bi eynî navan in.

Ku min ew didîtin bêtir ez kovî dibûm heta min got dibe ku ev girav xalî be. Bi her halî ew xalî ye. A va ye em kolanan derbas dikin û tenê firefira baskan û dengê henasên me tê bihîstin. Lê ez dibêm ku em di labîrentekê de dimeşin, libên xwîdanê ên ku li ser eniyên wan herçar mirovan dibiriqîn niha diherikin heta bin yaxeyên gumlekên wan ên şil, tavilê tevgera wan mirovan giran dibe û ez têm ku bikevim pêşiya wan lê dîsa jî li rêza wan vedigerim çiku ne ez rêberê wan im.

Mal jî dişibihin hev di gel ku ew ji hev cuda ne û her yek li halê xwe ye. Malin kabikî û ne zêdetir. Êdî meraqa min nemaye ku ez li wan binêrim, di du mehan de, piştî ku ez gihiştim vê giravê, min têr li wan nihêrî. Lê ez dihatim ku bi matmayînê bimrim dema min didît yek derbas dibe yan ji wan malan derdikeve bêyî ku min ew berê dîtibe. Ew matmayîna min a tekane bû ku êdî roj bi roj bû mîna demnasîneke mirî ji sozekî mirî re. Yên derbas dibin her ew in, yên derdikevin jî, ez jî vedigeriyam ka ezê çi ji bavê xwe re binivîsim, min ilham ji wan deriyên text yên ku min ew şeş salan girtî hiştin distend.

Ez nizanim çima hate bala min dema ez bi wan herçar mirovan re dimeşiyam ku ezê kesekî kin î bi yelegekî di bin sakoyekî de ku bi ser pantelonekî fireh de berdaye bibînim. Kêfa min tê dema ez xeyal dikim ku her kesê ezê rastî wan werim bi yelek in, û jin jî di nav de di gel ku ez nizanim ewê çi bikin ji wan çar berîkên rastî hev li hêla çepê û ya rastê ku mêr saetên xwe yên bi zincîr, diravên hesinî ku piştî xerckirina yên kaxezî dimînin her weha pelên cigareyan dixinê, û hinek jî

sîwakên ku pê diranên xwe paqij dikin û devê xwe ji çi peyva pûç î ku gotibe tahir dikin berî bikevin huzûra Xwedê, dixin wan berîkan.

Bavê min jî yelekê xwe hebû, û dema ku heriya tev li xwê û kayê distira bi wî şerwelê xwe yê kitanî yê dirêj ji bo ku dîwarên malê yên derve pê siwax bike, zincîra saeta wî ya ji bişkokekê heta berîkê dihat, direqisî li gor tevgera lingên wî yên di nav heriyê de ku mîna lingên hecîleglegekî xwe ji firê re amade dike bûn. Kêfa min zêde ji wê saeta bi zincîr re dihat, loma jî dema ez hinekî dirêjtir bûm min gumlekê bavê xwe dianî li xwe dikir û zincîreke stûr bi qaşilekî zêrîn î qeşartî bi bişkokekê ve dikir û dawiya wê dixiste berîka xwe bêyî ku çi saet pêve hebin.

Ez mezin dibûm û êdî min cilên bavê xwe bêtirê caran jê qer dikirin[1], me herduyan jî bi payebûneke sivik li hevdû dinêrî. Paşê min solên wî jî jê werdigirtin û dawiya dawî, ku ez bûme çarde salî, min qutiyeke zîvîn ji wan qutiyên ku wî tûtina xwe ya şil têde diparast jê xwest, ewî yeke hinekî kevn da min bêyî ku tiştekî bibêje. Paşê me êdî cigareyên pêçayî pêşkêşî hev dikirin, yan jî yekî ji me ji yê din re cigare vêdixist. Lê min qet gustîlkek jî ji gustîlkên wî yên pirrjimar jê nexwest, ew gustîlkên ku wî xwe bi qaşên wan û bi neqşên zîvê wan û bi cihê sazkirina wan paye dikir. Ew hemî ji zîv bûn çiku bavê min zêr ji mêran re layiq nedi dît. Ewî gustîlên xwe di desmaleke mûsilî ku xweşik pêçayî bû de vedişartin, wî ew desmal yekcaran li ber mêvanên xwe yê daimî vedikir û gustîlek ji nav derdixsit û dida dest mêvanê herî nêzîk, û wî jî dida yê li kêlekê heta ku gustîl li civatê digeriya û li bavê min vedigeriya. Êdî bavê min gustîleke din ji nav wê desmalê derdixist û dîsa gera gustîlkê di civatê de destpêdikir.

---

1. Qer (qerz): Wek deyn e, lê di teksta Erebî de ne deyn bi xwe heye, mirov tiştekî ji yekî din distîne û paşê lê vedigerîne, mîna firaxekê yan cilekî. (J. Dost)

Lê niha, ku ez bi van her çar mirovan re di kolanên girover de dimeşim, tiştê ku min guh lê nedikir tê bîra min: wê êvarê ku ez têde bi cîranê xwe yê di qapûtê xwe de winda re rû bi rû bûm, mebest ew cîranê min î nû ku li gel jina xwe hatiye mala li rex baxçeyê pêş mala min ji hêla bakur de û paşê hin kesan dabû pey wî û dewarên xwe li garaja mezin danîn û di du rêzan de li korîdora malê sekinîn, min jî ew di nava ronahiyeke melûl de ku ji lemepeyên melûl î li koşeyan danîbûn, dîtin.

Erê. Dema ku wî mirovê di qapûtê xwe de winda bi xatirxwestinê re destê xwe yê rastê ku di dawiyê de baskekî biçûk hebû dirêjî min kir, min di destê wî yê çepê de di bin şewqa purteqalî ya lempeya stûnê bilind ê kolanê de gustîlkek ku qaşa wê kesk î şikestî bû dît.

Ma gelo qaş bi rastî kesk bû? Dibe ku wê şewqa purteqalî li ber çavên min wisa kiribe, lê ew bi rengekî balkêş dişibihî qaşeke kesk î gustîlkeke bavê min. Lê tiştê ku nehişt ez zêde bala xwe bidim wê gustîlkê, destê wî mirovî bû ku hişt ez bilerizim û biçim bêyî ku pirsa wê ecêbê bikim.

Û va ye niha jî, piştî pênc rojan ji hevdîtina min û wî mirovê di qapûtê xwe de windayî, ez dilerizim, ne ji ber destê wî yê ecêb tenê lê ji ber wê gustîla ku dişibihî gustîla bavê min jî. Di her koşeyekî ji koşeyên kolanên ku ez li gel wan çar mirovan têre dibuhurim pirsek tê bala min ku berê ne wê çendê li ser bala min bû, mîna ku lebikandina sivik a jivana li gel Mirovê Mezin min ji ramandina di bavê min û birayê min de dûr dixe ku heta niha ez nizanim çima ez li şûna wî hatim hilbijartin ji bo vê rêwitiya bêzarker.

Birayê min çavkesk bû, diya min dema ku kêfa wê li cî bû xwe bi wan çavan didît, lê wê ew çav mîna bêyomiyê didîtin dema ew ku lihevketî dibû yan belak ji bistanê wê yê ecêb re dihat, bistanê ku şitlên kundiran, xesan, qernebîtan, cercîran, bacanan, îsotan têde li rex hev bûn û pelên wan tev li hev

bûbûn û êdî ew giya xeniqî bûn lê giyayê ku rêya xwe dîtibû mabû. Wê guh nedida mûsimê çandiniyê, giya di axê de têne çandin û av ji wan re divê: diya min hew ev dizanibû.

Lê cîranên me û xizmên me jî çavên birayê min dişibihandin çavên cinan û xwe bi ayetên Qur'anê jê diparastin bêyî ku bibêjin ew bêyom in, mîna ku ew bêalîbûna xwe li ber vê afirandina Xwedê radigihînin. Û çavên birayê min yên ku ji ber firehbûna keskiya wan êdî hema spîbûna wan xuya nedibû, ku awirên wan rastî yekî dibûn ew kes li hev diherbilandin.

Ew du çav bûn ku kî çav li wan diket, dikete xefkeke demûşî ji matmayînê. Lê ji min re ew ne mîna çavên cinan bûn çiku min berê cin nedîtibûn. Hema cîranên me û xizmên me cin dîtibûn: wan ev bi dengekî hêdî digot. Diya min a ku di nav re ew gotin dibihîstin, her ku peleke mendabê çilmisî didît yan jî her ku kulîlkeke îsotan î ku helezonê nîvê wê keritandiye didît herdu çavên kurê xwe sûcdar didîtin. Lê ku şitlek ji şitlên kafûrê biçilmisiya, diya min radibû bavê min xewle dikir û xwe ji awirên me vedidizîn û ji wî re şirove dikir ku êdî divê mirov Dîno bipê çiku ew gelekî li bistanê wê dinêre bêyî ku guh li şerma giyayan bike, bavê min jî serê xwe dihejand û dilê wî ne bi bistanê diya min, lê bi wî dişewitî.

Lê cinan bistanê diya min dane ber xwe bêyî ku em yan jî cîranên me -yên ku dizanin bê cin xwe dixin kîjan dirûvan, ji bizinan heta kêzikan, û ji fikandinên ku jêdera wan çi be heta bi hejîna pelên daran dema ku hîç ba nebe cinan nas dikin- wan bibînin.

Em ne bi hewceyî belgeyan bûn ku hebûna wan afrîdeyên ku di siyên me de bi cih bûne piştrast bikin, ew afrîdeyên ku Xwedê peyman li gel wan daniye da ku bala me bikişînin ku em ne giraniya rasteqîn ya qederê ne. Ew jî di me de diramin û ji bo me bi hev dikevin heta radeyekê ku hin ji wan dev ji milletê xwe berdidin û tev li mirovan dibin, dibe ku birayê min

jî weha kiribe, ev jî çîrokeke ku zelalkirinê dixwaze. Lê ya diyar û bêguman ew e ku cinan bistanê diya min dane ber xwe.

Her şeş xwehên min jî gumanên diya min parvedikirin, min hîç nedît ku ew bi Dîno re dilîzin yan henekan pê re dikin mîna ku bi min re jî henekan dikin. Dema ku yekê ji wan xwe bi tenê li gel Dîno didît tavilê radibû diçû. Dîno jî roj bi roj bi ser xwe de bêtir dipûnijî û jartir û zeîftir û bêtir bêdeng dibû. Tê bîra min dema min xatir ji malbatê xwest ewî, di ser milên xwehên min û bav û diya min re awirên xwe bi alî min de bilind kirin, hêsir bi çavên wî ketibûn.

Gelo ez jî jê ditirsiyam? Na. Ez hîç bi tiştekî weha nehisiyam mîna ku diya min û xwehên min pê dihisiyan. Lê ez mîna birayekî zêde nêzîkî wî nedibûm, û her ku min lê dinêrî yan jî li gel wî li ser nigan diaxivîm min xwe di wî de didît; xwe yê zirav î xewlêherimî lê bi du çavên kesk î ku mîna kabûsekî sivik in. Tiştê ku bêtir ez dûrî wî dikirim bişirîna wî bû. Gelek caran ez bi ser de radibûm û min digotê: "Tu çima dibişirî?", wî çavên xwe digirtin û bi pistînî digot: "Ma tu westiyayî?"

Çima ew difikire ku ez diwestim dema ew dibişire? Ez nizanim. Lê janek digihîje min mîna ku quloçên helezonekî bi mi bibin her ku ew wê peyva xwe bi hêdî dibêje. Min di jêdûrketina xwe ya ji wî de pir lê dinêrî ku ew bi giranî ji cihekî diçû yekî din, yan jî wisa bi çavên xwe yên nîvgirtî mendehoş dinihêrî, ku çavên xwe radikirin jî cih pê dibuhurandin ber bi newaleke ku di kûraniyên wî de bû û nedihate dîtin. Gelek caran ew ji min ve xuya bû mîna ku ew bi wê aramiya xwe û jarbûna xwe xwe amade dike ku min veciniqîne yan jî malbatê tevde bi tiştekî ku dê mirov biheyirîne veciniqîne. Lê hîç nîşanek jî jê peyda nebû ku me li ber dawiyekê ku me dipa yan nedipa deyne.

Tenê bavê min di tikiliyên xwe yên bi çavkesko re ne mîna me bû: wan herduya bi hev re dikire pistepist. Çavên xwe

berdidane erdê û dibişirîn. Li çavên hevdû kurt kurt dinêrîn. Ez bawer dikim ku bavê min hinekî ji birayê min Dîno şerm dikir, sebeb çi bû ez nizanim lê her ku ew radiwestiyan ji bo ku xeber bidin bavê min li hawîrdora xwe dinêrî yan jî simêlên xwe mis didan û li cêwiyê min guhdarî dikir bêtir ji axaftinê, hal ew e ku bavê min bi hedîsên xwe yên dirêj navdar e heta li gel xwehên min ên ku nikarin li kesekî ji bêtirî du peyvan guhdarî bikin. Jixwe ku bavê min bi diya min re xeber dida ew radiza, kengî ba çi saet ba ji rojê ew di xew re diçû.

Gelo wî cêwiyê min ê ziravik ewqase sal ji zarotiya me de heta destpêka xortaniya me çi ji bavê min re digot? Ez ji xwe tenê dipirsim çiku diya min û xwehên min guh li wê yekê nedikirin. Cayra yekem ku ez pê hisiyam deskîsiyek di navbera herduyan de heye, ew bû dema ku bavê min ji mêvanên xwe re behsa Feqiyê Teyran kir, ku leqeba Kurdekî di sedsala hivdeyê zayînî de jiyaye û navê wî Mihemed bû. Ewî destanek bi navê "Qewlê Hespê Reş" nivîsîbû ku behsa Buraqê şerîf dikir ku Pêxember pê ji cizîra Erebî çûbû Qudsê. Feqiyê Teyran li gor ku bavê min digot, xwestibû wî hespî hinekî bêzar bide nîşan dan, lê serhişk be di hilkişîna neh pileyên bayê de ku pileya yekemîn heyirîn e, ya duyemîn mendehşî ye, ya sêyemîn nêrîn e, ya çaremîn tirs e, ya pêncemîn pistepist e, ya şeşemîn girî ye, ya heftemîn matmayîn e, ya heştemîn razîbûn e û ya nehemîn jî pirbêjî ye. Li gor ku bavê min digot, Feqiyê Teyran li cem pirbêjiyê gelekî mabû mîna ku nedixwest çîrok biqede. Ew hespê reş ê bi rûyê mirovan û stûyê şêran û baskên sîperan her ku di wê mîraca xwe de kundekî dibîne radiweste. Ji ber ku dem şev bû fersenda kundî hebû ku li wî hespê qedirgiran rast were, ewê ku kund ji ber wî rûyê dûz dişibihand ademiyan.

"Tu kî yî?" buraq ji kund dipirse -li gor vegotina bavê min-, teyrê şevê bersivê dide:

- Ez zêr im.

Hespê Reş dikene: “Û çima tu wisa tarî yî?”, kund bersivê dide:

- Ji ber ku şev min nabîne.

Hesp dubare dikene: “Wê çi bibe eger şev te bibîne?”, teyrê bixwebawer dibêje:

Wê demê ê şev bixesire.

Êdî hesp bi xebîsî dibêje: “Û tuyê çi qezenc bikî eger şev bixesire?”, teyr vedigerîne:

- Ezê rojê qezenc bikim?

Hespê Reş dike himehim: “Bênahiya te bi roj kêm e, tuyê tu tiştî di nav ronahiya ku dê te kor bike de qezenc nekî”, kund vedigerîne:

- Roj peyamnêrê min ê ku cihên nêçîran bi çavên xwe yên pir ji min re dipê ye, ez jî divê bendewar bimînim heta ku şev dakeve da ku nêçîrê bikim.

Bavê min li çîrokê zêde dike û dibêje ku Buraq li Pêxemberî ziviriye û kiriye pistînî: “Çima ev teyr henekê xwe bi min dike?”, êdî Pêxember destê xwe li stûyê wî dixe: “Her ku tu pêde biçî û pirsan ji teyr bikî, ewê zora te bibe, çiku hîleya wî ji bersivekê ku tu dixwazî biçûktir e, û îcar tu li hev dikevî.”

Hesp jî -li gor vegotina bavê min- ji Pêxember re dike pistepist: “Çima ev teyr dişibihe min?”, Pêxmeber bersivê dide: “Ji ber ku berê we herduyan jî li yek ezmûnê ye”, Buraq dike hîrehîr: “Ezmûna çi?”, û bavê min vegotinê radiwestîne û pêşiyê li mêvanên xwe dinêre û guhdariya tesîra çîrokê di rûyên wan de dike, paşê jî dizivire bi alî Dîno ve û bang dikê: “Dîno... Tu temam bike..” êdî cêwiyê min cênîka xwe difirkîne mîna ku li hêviya dora xwe ya vegotinê bû “Divê ew veşartî bin. Ev e ezmûna kund û Buraqî. Û bêdeng dimîne, bavê min jî simêlê xwe difirkîne û di bersiva kurê xwe de dirame berî ku bibişire û piştrast bike: “Erê. Mebest ew bû”, û li mêvanên xwe dinêre bi awirin ku wan li pejirandina peyvên wî germ dikin,

ew jî dibişirin û dibêjin: “Naxwe wisa ye.” Lê hin ji wan ji bavê min dipirsin: “Çima kundî got ku ew zêr e?”, bavê min li Dîno dinêre, ew jî ser di ber de vedigerîne: “Kund xwest Buraqî ezmûn bike.”

“Ma kî dikare Buraqî ezmûn bike?”, yekî ji wanên rûniştî li bersiva Dîno ecêb dimîne û dipirse, cêwiyê min jî bersivê dide: “Ez.”

“Tu?” mêvan mat dimîne, destê xwe bilind dike û dipirse, paşê li bavê min dinêre û xwe davêje bextê wî ji ber wan pûçepeyvên kurê wî, bavê min li Dîno dizivire û dipirse: “tu?”, cêwiyê min bê dudilî dibêje: “Ez”, û berî ku ew kûr di pirsên xwe de biçin, dibêje: “Kanî Buraq şeva ku berî tev li siwarê xwe bifire li kû bû?” Dema ku dibîne ew di bersivê de heyirîne, pirseke din davêje holê: “Û piştî wê şevê bi kû ve çû?”

Bavê min dike himehim: “Dîno... Ez bawer dikim ku tu sînorên xwe derbas dikî”, cêwiyê min vedigerîne: “Ma Buraq jî sînorên xwe derbas nekirin bavo dema ku ew pirsên xwe ji kundî kirin?”, bavê min birhên xwe bilind dike: “ê çi pê ve ye?”, birayê min bersivê dide: “Ne ji mafê teyrekî tirsiyayî ye ku teyrekî din rawestîn û pirsan jê bike.” Bavê min hinekî bi hêrs peyva wî qut dike: “Mebesta te Buraqê şerîf e?”, Dîno dibêje: “Ew tirsiyayî bû bavo, ew ji teyrekî ku şev heta hetayê ji xwe tenê re biriye ditirsiya, lê karê buraq jî tenê ji bo şevekê bû.”

Yek ji wanên rûniştî xwe davêje nav axaftinê û lomeyan dike: “Û tu çawa dikarî hespê Xwedê ezmûn bikî?” Dîno dibêje: “Ez wî ezmûn dikim dema ku bersivekê derbarê cihê wî de nabihîzim.” Yekî rûniştî zivêr dibe: “Ew li wê ye.” Dîno dipirse: “Li kû?”, mêvan dibêje: “Li nêzîkî erşa Xwedê”, cêwiyê min hinekî dimîne û tavilê dibêje: “tu dibêjî ku tu bêzar î?” Yê mêvan mat dimîne: “çima tu min tev li çîrokê dikî?”, birayê min bersivê dide: “Ji ber ku Buraq piştî wî karê xwe li hêviya tiştekî din namîne.”

Axaftineke weha û hin helbestên nîvco ku cêwiyê min Dîno ji bavê min re temam dikirin, bala min kişandin ser deskîsiyeke veşartî di navbera zanînan herduyan de, ne bes weha lê ewan bala min kişandin wê yekê ku her carê Dîno xwe dixiste navê û pêvajoya çîrokên bavê min û axaftinên wî rast dikir. Lê ez dibişirim, niha, li gel hisreteke sivik: min qet xwe neavête nav wê pêvajoya tund ya ku bavê min û cêwiyê min digihandin hev, mîna ku ez lal bim. Ez jî ji xwe ne lal bûm lê birayê min ê ku min lê dinêrî, hişê min dibir bi wan tiliyên xwe yên nazik û dirêj ên ku dema diaxivî bilind dikirin û li ber rûyê xwe datanîn mîna ku wan ji tayên konikê pîrê rizgar dike. Lê ku ewî di hingama axaftina xwe ya li gel mêvanên bavê min de rasterast li min dinêrî, min xwe mîna cihê gumanan didît ta radeya ku çermê min dihat ku bi perik bibin û xwesteka firê li min peyda dibû. Çendîn car min xwe -di bin wan awirên kesk ên birayê xwe de- xwe mîna teyrekî his dikir lê bêyî ku bikaribim bêtirî bostekê ji erdê bifirim.

Dilê min, bi her halî, nebû ku ez bêtirî bostekê bi ser erdê bikevim. Ez sergerdanê wê yekê me ku her bimînim dîl li ber awirên birayê xwe dema ku bifirim bi du baskên kin ku bigihin giyayê di bin min de û li ser terhikê ku lê rast werim bikevin, mîna ku ez û Dîno di pêketineke bi kêf de ne: ew çeqel e û ez jî bi du baskên qulingan î jar û gewdeyê qazekê me.

Lê diqewime ku birayê min di wê beza xwe ya xurt de nêzîkî min dibe û êdî tirseke giran piştî wê kêfê digre ser min, ez bi helkehelka wî ya germ li ser perikên xwe dihisim û bi pencên wî yên ku bayê li dora me birîndar dikin jî dihisim, êdî ez dihejim û giraniya baskên xwe yên lawaz davêjim ser tirsa xwe ya ku wan hildide jor mîna ku valahî min bi her teqeteqê re dûrtir davêje, her wekî dilekî tirsiyayî ku bi gokên xwe yê sivik dilîze.

Birayê min nedigihişte min, û ez jî nedifilitîm: tenê werz û bistan li vê hevpêketina kor ecêb diman.

Û va ye ez niha ku li gel van her çar mirovan di kolanên paytexta xalî de dimeşim, û xwêdana wan di binçengên wan re derketiye û dehşet mîna xunavê li ser birhan xuya dibe, hindik maye ez bêhna birayê xwe jî bikim ku bi hêrseke heywanan nêzîkî min dibe, lê vê carê ew naxwaze min nêçîr bike, ew tenê dixwaze di labîrenta biçûk de bilîze ku nagihîje mala Mirovê Mezin. Gelek caran hate bala min ku ez wan rawestînim û bipirsim ev çi gêjeniya girover e ku me dike hevparê hev, lê ez bêdeng dimam dema ku min didît ew di xemgîniyeke diyar de ne.

Kolan hemî xwe dubare dikin, bi malên xwe bi sûrên xwe û bi darên xwe jî, mîna ku di neynikekê de ne, dem jî her ew dem e bêyî ku em bi hacetî nêrîna li saetên xwe bin, çiku sî nalivin û ew her li cihên xwe ne, tenê firefira baskan e ku ji me qut nebûye bêyî ku em jêderê binasin, ew firefir her û her bilind dibû û tenberî û porê me yê bi ser eniyên me de dihejand. Ew, bi baweriya min a ku xwe nasipêre zanîneke xurt, firefireke têkel bû ji baskên silêmanê dunikil û leglegê û dûmeqesê û bûka mişk û gabelekan. Sebebê ku dihêle ez tenê texmîna wan teyran bikim jî vedigere mûzîka navên wan ên bi Kurdî di xeyalê min a aware de.

Her çar mirov bi mista destên xwe û tiliyên xwe, mîna min, pêşenîkên xwe yên gij rast dikin her ku bayê baskan wan belawela dike. Yek caran ew tên ku li ber hinek mal rawestin lê tavilê bi şaşiya xwe dihisin û berdewam dikin, êdî rûyên wan bêtir tirş dibin û bêtir tevlihev dibin bêyî ku çi lêborînê ji min bixwazin û pêde diçin û derin mîna ku qumarciyekî hîle li wan kiribe. Bi wî awayî em li hinek qonaxan meşiyan ku ne bi saetan lê bi heyretê têne pîvan. Her ku wan bêhna xwe hinekî berdidan û destnîşanî malekê dikirin, di pê kurtedemekê de vedikişiyan heta ku em di gera xwe de li dergeheke tex di sûrekî de rast hatin, şaxên yasemînan ku gelek kulîlkên wan weşiyabûn bi ser ketibûn, di valahiyên nav textên çelîpanî ên

dergehê de jî çiqliyên mazîdareke biçûk dirêj bûbûn, ew her çar mirov êdî bixwebawer xuya dikirin, rûyên wan geş bûbûn û işaretî min kirin ku ez bidim pey wan.

Pêşiya pêşî ew li zîlê derî geriyan lê tiştek nedîtin. Li dora xwe zivirîn û xwe nêzîkî hev kirin û bi dizî bi hev re şêwirîn paşê bi hêdîka li textê dergehê dan, pêjna hin gavan nêzîk dibû, ku min di çarkoşeyên textê dergehê re nihêrî min jineke di qutikekî sivik de dît, mîna ku bi lez li xwe kiribe ew qutik, ewê dixwest zeqata derî hilde jor, lê çavên wê di qelîştekeke dergehê re awirên xwe yek bi yek li me vedan, paşê bû tiqetiqa wê û dergeh vekir.

Jineke derdora çilsalî bû, porê wê bi boyaxê zerkirî bû, aliyê çepê jê melisî bû mîna ku serê wê li ser palgehekê mabe, li aliyê rastê jî porê wê bi tayên belawela gij mabû mîna têlên sifir ên zer û ziravik ku ji bobîna otombîlekê filitî bin. Dema wê dergeh vekir, hinekî tiqetiqa kenê xwe daxist û hate rastî min. Dema ku wê bi çavên xwe yên hûrik li min nihêrî, çav kire min û paşê awirên xwe badan ser wan her çar mirovan û dîsa bû tiqetiqa kenê wê yê bilind.

Min jî li rûyê wan mirovan nihêrî da ku sebebekî ji kenînê re bibînim, min dît ku rûyên wan di ber wan de ne, paşê dema ku jinikê ji nişkê ve bi Yûnanî got: “Ma hûn Mirovê Mezin dixwazin?”, rûyên wan geş bûn.

Her çaran mîna zarokan serên xwe bi erêkirin hejandin û hatin ku derbas bin lê jinika hîn bi kêf ew rawestandin, û bi wan herdu çavên xwe yên hûrik pirsî: “Ma çima hûn wî dixwazin?”, min bi xwe bi Ingilîzî lê vegerand: “Ew li hêviya me ye.” Wê jî bi ingilîzî got: “Ha. Ez ji zû ve dizanim. Lê tu...”, û ji nû ve bala xwe da min û pêde çû: “Tu berê ne bi wan re bûyî.”

“Na”, min bersiva jinikê da û ez beşişîm ew jî beşişî berî ku ez temam bikim: “Ev cara yekem e ku ez tême ba we”, ewê serê xwe hejand û got:

"Tu yê hogirî wê yekê bibî", min jê pirsî: "Mebesta te çi ye?", ewê bersiv da: "Anku her car wê cara yekem be."

Min tiştek fêm nekir. Jixwe min jêre got jî "Min fêm nekir", ewê jî bersiv da: "Ji kengî ve tu bi van re yî?" û bi awireke çavê xwe işaretî her çar mirovan kir, ez li pirsa wê ecêb mam lê min bersiv da: "Ji îro de." Dîsa bû tiqetiqa kenê wê û di nav lêvên xwe yên tenik î qerfpêker de pif kir: "Nexwe tu yê hogirî vê bibî. Tu yê bibî."

"Ezê hogirî çi bibim?" min bi dilekî bêzar pirsî û li wan her çar mirovên bêdeng ku mîna zarokên li hêviya işaretekê bin nihêrî, wê got: "tu yê hogirî wê yeka ku hevalên te hogirî wê bûne bibî", min işareta wê dîsa fêm nekir. Ku wê dît ez di naveroka gotina wê ya qerfpêker nagihîjim dîsa çav kire min û li wan her çar mirovan zivirî, destê xwe ne ji ber rojê lê ji ber ewran da ser çavên xwe û pirsî:

"Hûn Mirovê Mezin dixwazin?", her çaran serê xwe bi erêkirin hejandin, jinika çavhûrik keniya: "Û çima hûn wî dixwazin?", wan ji xweber berê xwe dane min, min jî di cih de bersiva wê da: "Ji ber ku ew li hêviya me ye." Jinikê cara sisêyan bi qerfpêkirineke eşkere çav da min û pirsa xwe ji wan herçaran kir mîna ku min ji derveyî pirsê dihêle: "Çima hûn wî dixwazin?", ewan dîsa berê xwe dane min da ku min li bersivdanê germ bikin lê ez nepeyivîm. Dema ku bêdengiya min dirêj kir ew li jinikê zivirîn û tiştê ku min gotibû dubarekirin: "Ji ber ku ew li hêviya me ye." Jinikê bi xebîsî got: "Ew derketiye" û ji bo cara çaran çav da min, her çar mirov ecêb man û pirsîn: "Bi kû ve çû?", ewê bersiv da: "Ew çû devera ku hûn nas dikin."

Min êdî bawer kir ku hişkiyekê dest daye ser wê sibeha ne bi kêf ya ku tayên xwe di nav wan her çar mirovan û wê jinika porzer re belav dike û ez jî xwe bêtir xwar dikim da ku tiştek jê bi min nebe. Lê divabû ku ez zelalkirinê ji hemiyan bixwazim, xemgînî û bêzariyeke têkel di min geriya bûn, min ji her çar

mirovan pirsî û hêrsa xwe radigirt: “Mesele çi ye?”, yekî ne li min lê li jinikê nihêrî û got: “Xeman nexwe...” Jinikê gotina wî birrî: “Wê Mirovê Mezin xeman bixwe”, ewî ew qut kir: “Weha derbarî wî de neaxive.” Jinikê hinek ji porê xwe bi mista destê xwe rast kir û got: “Bibore” û kenê xwe berdewam kir.

Ez jî keniyam. Min pişta xwe da dergehê û jinikê û her çar mirovan, paşê ez sivik keniyam lê demeke dirêj dom kir û min li wî aliyê din î ku hevşiyekî nizm î dirêj ji gîraniuma tozgirtî hebû û berê min lê nenihêrî bû nihêrî. Di ser wî hevşiyê dirêj re û rastî wî li jor bahozekê ji şalûlan li ser têlên elektrîkê danî bû. Çavên min li giravê hîn bi şalûlan neketibûn. Lê wî dîmenê wan î ku têde xwe bi wan perikê xwe yên reş kemişandibûn aramiyek peyda dikir. Ez nêzîkî aliyê din bûm heta ku min destê xwe da hevşiyê gîraniumê û min berjor dinêrî, min dît ku ew şalûl li hev nakin: hin ji wan dixwazin ji ser ristê dakevin baxçeyê wê mala xalî û hin jî dixwazin li cihê xwe bimînin da ku kûrtir biramin ka çima derbasî wê herêmê bûne.

“Ev cih xalî ye” yek ji şalûlan dibêje, yekî din li wî vedigerîne:

- Cihên şên ji me re ne mereq e.

Ewê pêşî dîsa dibêje: “Ew xalî ye û şên e. Ev me bêzar dike.” Yê din dibêje: “Bifikire ka ji herduyan kêfa te ji kîjan rewşê re tê.” Yê pêşî hêrs dibe: “Dema ku tişt tevlihev dibin ez nafikirim”, yê din lê vedigerîne: “De naxwe em herin.”

Lê çawa ku çavên girover ên wan şalûlan li min ket, hinekan ji hinên din re kire pistepist: “Ew guhdariya me dike” û di dilê xwe de keniyan.

Ez jî di dilê xwe de keniyam û min awirên xwe di navbera rista bilind û dergehê ku ew çar mirov li ber rawestiyabûn de birin û anîn, ew her çar mirov hîn li gel jinikê bûn û diaxivîn, diyar bû ku westiyane loma jî xwe kemişandibûn mîna ku dixwazin ji suhbeta jinikê xelas bin, lê wê jinê pirsin ji wan dikirin ku ne li hêviya bersivên wan bû:

“Mirovê Mezin... Ha... Hûn Mirovê Mezin dixwazin” û çavên xwe yên hûrik digire, wan çar mirovên ku nepeyivîbûn dibirre û weha pêde diçe: “Bihêlin ez texmîn bikim ka çima hûn wî dixwazin”, ew mirov dikin himehim û bi şerm dibêjin: “Mebesta me...”, jinik çavê xwe heta dawî vedike: “Hûn wî dixwazin ji ber ku hûn...”, tiliyên xwe dixe nav hev û li rûyê wan dinêre, ew dibêjin “Ewî xwestibû ku bi vî xortî re bicive”, û destnîşanî min dikin. Jinik bi serê xwe yê dirêjikî hinekî bi alî min de dizivire: “Sebebê vê hemûyî tu yî”, ez ji aliyê din bersivê didimê: “Ez sebebek im ji sebeban”, belasebeb dibe tiqetiqa wê û dibêje: “Ma çima Mirovê Mezin te dixwaze?”, ez vedigerînim: “çiku ew bêzar bûye.”

Hindik mabû jinika ku xwe bi mista destê xwe sipartibû dergehê dar ji kenan re ji ser hişê xwe çûba, ewê dema ku hinekî xwe girt du gavan çû derveyî hevşiyê, bi destê xwe yê rastê nîşanî maleke pencereşîn li başûr û di eynî kolanê de kir û got: “A li wir hûnê bibînin Mirov..”, piştî kurtedemekê pê de çû û got: “Mirovê Mezin” û vegeriya û bi hêdîka dergeh girt. Dema ku êdî tenê nîvê rûyê wê xuya dikir berî ku dergehê dar bi ser stûna çemento de gêr bike, dîsa çav da min: “Eger te ew îro nedît sibe were”, û di pişt qulikên çarkoşe yên dergehî de bi ken winda bû.

Em jî ji xwe ber bi wê mala ku jinikê ew nîşanî me dabû de çûn, firefira heman baskan li gel me bû, lê pêjna xeyalê birayê min Dîno nehat mîna ku wî dev ji me berdabe çaxa ku em bi jinika çavhûrik re diaxivîn. Min paşê ew ji bîr kir û kûraniyên xwe jî ji bîr kirin dema ku em hatin rasta sûrê wê mala bi hevşiyê hesinî yê gelekî nizmik û dergehê vekirî.

Ji bo derbasbûna me ya baxçeyê wî yê tevlihev jî çi destûr ne lazim bûn ji ber ku kalemêrek li wê bû bi ser giyayekî de xwar bûbû hildikişand, em nêzîkî wî bûn û min bi xwe bi ingilîzî jê pirsî: “Tu dikarî ji kerema xwe ji Mirovê Mezin re

bibêjî ku em li vir in?", kalemêrê ku qutikê rîs lê bû û di bin re binaniya gumlekê wî yê xetxetî xuyabû xwe rast kir, li min nihêrî, li her çar mirovan jî, bişirî û milekî xwe bilind kir: "Ne Ingilîzî", anku ew ingilîzî nizane, rabûn herçar mirovan bi Yûnaniya ku ew dizanin jêre gotin: "Mirovê Mezin li hêviya me ye", wî got: "Kîjan mirovê mezin?", dema ewan destê xwe dirêjî mala jinika çavhûrik kirin ku wê ew şandine vir, kalemêr keniya heta ku diranên wî yên kurisandî xuyabûn, paşê bi hinek peyv kire birebir ku yekî ji wan her çar mirovan birebira wî ji min re weha wergerand: "Ew her kesî dişîne vir. Ez bawer dikim ku ew Mirovê Mezin di dolapa xwe ya cilan de vedişêre."

Ez mat mam, lê her çar mirov, di gel aciziya wan a diyar, bêtir sar û xwegirtî xuyabûn. Dema me kir ku em vegerin wê giroverîka vala li kolanê kalemêr çend peyv ji wan re gotin ku wan jî bersiva wî bi "Erê" dan. Min pirsa wan peyvên wî kir ewan gote min ku wî ji wan pirsiye: "Ma hûn berê jî nehatibûn serdana min?" Min meşa xwe rawestand û ji wan pirsî:

"Hûn çima berê çûbûn serdana wî?", wan got:

- Da ku em pirsa Mirovê Mezin jê bikin.

"Hûn di carên berê de li gel kê hatibûn?", min careke din ji wan pirsî û lerizîneke sivik ez zeft kirim, wan bersiv neda û xwe li bêdengiyeke giran danîn, min bi hêrs ew haydar kirin:

"Ez ji cihê xwe naleqim eger hûn bersivê nedin", yekî ji wan bi westabûn got:

- Pirsên xwe kêm bike.

"Ma divê ez li ser we sivik bikim? Ev çi lîstik e?", min got û yekî din bersiva min da:

- Guhdar be. Tiştê ku em dikin Mirovê Mezin ji me xwestiye da ku em bikin. Mesele hinekî zor e.

Min got: "Ma di carên berê de we ew li malekê ji malên vê kolanê dît?", wan got:

Ewê me bibîne dema ku em xwesteka wî bi temamî pêk bînin.

Ez qîriyam: “De ka xwesteka wî çi ye?”, wan jî bi hêrs got:

“Ev tiştê ku tu niha dibînî, ev tiştê ku tu dibînî.”

Di bêdengiyeke giran de, di nav gereke giran de li kolanên giran me bi awirin melûl xatir ji hev xwest. Her ku çend gavan ez ji wan dûr diketim ez li wan dizivirîm û ew jî li min dizivirîn mîna ku em kenekî ku divabû me berê biqedanda vedişêrin û nema diwêrin bikenin, destê me hemûyan jî di berîkên me de bûn.

Ez gihame mal hîn sibe bû. Dema ku ez di baxçe re derbas bûm û berê min kete derî, ez li darkoka bîberê ya ku bê pel bi ser xwe de kombûbû zivirîm, paşê min li hersê darkokên gulan nihêrî û lêborîn ji tiştekî ku ez nas nakim ka çi ye xwest û min derî vekir û derbasî tariya sivik î sar bûm.

Dema ku ez ketim hundir û min derî li pê xwe dada bîna min ecêb teng bû. Min digot qey ezê dawiya dawî ji bendewariya xwe rizgar bibim, lê ez dîsa li bendewariya xwe vegeriyam û fersenda rizgarbûna min a ji wê kêmtir bû ji fersenda rizgarbûna darkoka bîberê a ku di kûraniya rehên xwe de parçeparçe bûye. Dema ku ez bi behaneya peydakirina kursiyekî ku ez li ser rûnim li odeyan geriyam min dît ku min berê xwe daye deriyê metbexa ku bi ser baxçeyê piştmalê de vekiriye, min ew vekir û çavên min bi wê çola ku piştî çend gavan bû ketin, ewr nêzîktir xuya dibûn, tazî xuya dibûn mîna ku dikin xwe bişon.

Min awirin lezok li dîmenê li pêşiya xwe xistin: li başûr darên kajê ji mala dûr ya li pişt erda rût re bûne dîwar, li rojhilat ku hevşiyê dirêj yê dibistana seretayî ku sibeha her şemiyê dengekî ketî yê sirûdan jê bilind dibe, dengê ketî jî bi sebeba mikrofonên xerabe ye. Li aliyê rojava jî sûrê meydana cirîda hespan e ku darên akasyayê ku kundan ber êvarê li xwe

vedihewînin, ew winda kirine. Dema ku min awirên xwe daxistin wê çola li pêşiya min ramediyayî, min di nav şijik û qûma cûnikê de ku hinek giyayê serhişk di nav de xuya dibe, herdu teyr dîtin bi wan kumikên xwe yên gij erdê nikil dikin, eynî li wî cihê ku min her hêvî dikir ez têde werim veşartin.

Ez nizanim çawa yek dikare du teyran ku dişibihin hezaran teyrên din nas bike lê min ew nas kirin, (her ku ew li wê çolê datînin ez wan nas dikim), ji ber ku çawa ew datînin hema sist dibin û sîngên xwe didin erdê û li min dinêrin û bêrîkirina min dihêvojin, bêrîkirina min a ji şiklekî mîna şiklê wan re ku divabû ez biketimayê bi du baskên bêtir bixwebawer û perikin lihevgeriyayî mîna xapînekê dema ku ez ber bi xeyalê bavê xwe yê li rex xeyalê Behram Gûr ve diçim, Behram gûrê mîrê ku li ser hespa xwe heta şikeftekê di çiyê de da pey xezalekê û paşê nema derket.

Bêguman, min ê di dirûvê teyrekî de qet guman bi wan re (yanî bi bavê xwe û mîr re) çênekiriba, dema ew li ser du keviran li bin dara tuyê rûniştî û di bêdengiya wî cihî de dengê pirsên bavê min ên ku naqedin bilind dibe. Xortê bi kofî û berdilka nêçîrê ya çerm jî serê xwe bi bişirîn berdaye jêr û bi hefsarê hespê xwe girtiye.

Min pêşî li ser darê danî, paşê bi wan baskên xwe yên nazik daketim ber simên wî hespê aram, û piştre ez bi qevizandinên mîna ên çûkekî bi pêş de çûm heta ku hatim rastî wan, bavê min bi serê xwe işaretî min kir:

- Ev balindeyekî gewî ye.

Behram li min nihêrî, û serê xwe bi nepejirandin hejand û got:

- Ez bawer nakim.

"Ê de ka çima vî qasî nêzîk dibe?", bavê min pirsî, xort bi awirin şikestî bersiv da:

- Da ku guhdariya me bike.

Bû tiqetiqa bavê min û hindik mabû ez vegeriyama şaxên dara tûyê, lê wî kenê xwe rawestand û di min de ramiya û got:

"Ew dişibihe.....", rawestiya û di tiştekî de fikirî ku ez bişibihimê, Behram Gûr ew qut kir û got:

"Ew dişibihe teyrên din", û li bavê min ê ku diyar bû ew ji bersiva wî razî ye nihêrî, paşê herduyan jî kenekî sivik û şermokî kirin û bi hev re li min nihêrîn, na ne li min lê wan li şahiya xwe ya sivik nihêrîn. Lê xezalek ji cihekî di deviyê nêzîk de reviya û çû li ser erda hişk î rût rawestiya û pê hisiya ku ew şaş bûye. Dema li wan herdu mirovên rûniştî nihêrî, berê xwe careke din neda deviyê nêzîk lê berê xwe bi lez da cihekî rût ji erdê ku digihîje koka rût ya çiyayekî, wê ez veciniqandim û rabû min xwe siparte bayê baskên xwe û ez firiyam şaxê dara tuyê, Behram jî rabû û beziya hespê xwe.

Bavê min ê ku ew jî rabû ser xwe tirsek di nav çavên xwe de vedişart. "Na" ew pêşiyê qêriya û destê xwe nîşanî Behram kir, Behram lingê xwe xiste rikêbê, lê zivirî û destê xwe danî ser devê xwe mîna ku ji bavê min dixwaze ew bêdeng be.

Min xeyalê herduyan ji cihê xwe yê li ser dara bilind didît: xeyalê bavê minê heyirî, ê di nearamiyeke ku bêdengiyê ew serpoş kiriye de xerq bûye, xeyalê Behram jî xuya dikir ku bi hespê xwe ketiye pey xezalê. Bi hoyê mereqa min a ku bihîstina çîroka wî ya ecêb di zarotî û xortaniya min de ew gurr dikir, min da pey hespê di wê pêketina ku mîna xeyalên çîrokbêjan hendesî ye, min dît ku ew kevirên di bin simên hesp de eynî keviran in ku min ew nas dikirin, toza sivik î ku li dû xezalê ye eynî tozê ye, helkehelka Behram jî eynî wê helkehelka ku di çîroka ku gelek devan ew vedigot de bi ber guhê min diket bû. Bayê qelişî li dora wê nêçîra bazdayî jî eynî ew bayê bêdeng î di hewşa mala me de bû. Dema ku xezal kete şikefteke çiyê û Behram jî bi hespa li pê wê çû, min qenctir dît ku vegerim cihê ku bavê min lê maye li cem dara tûyê, ez bi nazikiya ku

layiqî teyrekî ye zivirîm, min di perrên baskên xwe de ew sihra dûriyê dixapîne heta ku ew êdî nêzîk dibe, komî ser hev kir û min dît ku va ye li pê piçek bajenî ez gihiştime cihê bavê xwe û dibînim ku ew li ser eynî kevirî rûniştiye û di mista destê xwe de hin pelgên kesk pêşkêşî xezaleke nazik dike ku xezala Behram bû.

Ez li ser şaxê herî nêzîk li ser dara tuyê veniştim bêyî ku çi pirs xwe li kûraniyên min bidin, mîna ku divabû dîmen weha be û bavê min xezalê ji çîrokê vegerîne û Behram di şikeftê de bimîne. Lê bêzariyekê ez dame ber xwe û ez li quntara çiyayê nêzîk ê ku şikeft têde ye zivirîm û bi hemû hêza xwe min berê xwe dayê lê ez li şaxekî stûr ketim ku nabe teyrek lê bikeve, ez hatim xwarê û mîna perikekê li ba bûm û çawa ku ez gihiştim erdê li ber dara leymûnê ya li pişt malê, Mem Azad -ku ez bi xwe me- bi tiliyên xwe ez girtim û ji nû ve li wan teyrên ku ew wan dinase nihêrî, ewan li cihê ku min her dixwest têde werim veşartin danîbûn.

Perika cûnikî di nav tiliyên destê min î çepê de bû û min li wan herdu balindeyan dinêrî ku erda rût nikil dikirin, ewan kunek di bin qaşilê erdê yê derve de vekiribûn û dadiketinê û paşê yekî xwe bi yê din ve dizeliqand û diketin pêşberî wî bayê ku kumikên wan dimelisand û perikên wan belawela dikir. Dema ku ew daketin qatê duyem ê qaşilê diyar ê erdê -piştî nikilandineke pirr- di golek av de wer bûn û hinekî xwe daweşandin, paşê noqî nav heriyê bûn, ji heriyê jî derbasî qatê sêyem ê qaşilê diyar ê erdê bûn û dawerivîn tariya mîna mûyê bizinekê, ji wê tariyê jî ketin tîrbûna mezeloqî ku kûrtir e û divê bask bêtir haydar bin ku li rehên kor î ku axê xwedî dikin nekevin. Ji axa ku mîna berkurkekê kombûye jî herdu teyr dawerivîn ber bi qatê şeşan ê qaşilê erdê ku mîna pirrbêjiyekê ye û li wir laşê min li ser sekoyekî kevirî dirêjkiriye, êdî wan teyran li wir danîn û dest pêkirin ew seko nikil kirin.

Hindik mabû ez ji ber rikeberiya wan a nikilandina kevirê hişk bikeniyama lê min dît ku ew qulekê ji laşê min re vedikin û ez di valahiyeke zêrîn werdibim û ew jî bi baskên xwe yên bêcirr didin pey min, bi min re baxçe jî, çol jî û hinek ewr û xefkên ku min di qûmê de vedayî hiştibûn û qûm jî û kolana asfalt a li pişt baxçe û melaiketên ku xwe radestî serpêhatiyên duh kiribûn û meydana cirîda hespan û her weha çenteyê min ê jî ku perikek di binê wê de bû û piştî şeş salan min vekiribû li gel min hatin xwarê.

Ez ber bi mala xwe ve diçûme xwarê û eynî li wî cihê ku min jê herdu teyr dipan ketim, yanî li baxçeyê pişt mala xwe ê ku bi ser çolekê de vedibe ku li başûrê wê kajedarên gijikî ne. Ji ber ku ez hîn nemiribûm jî divabû ez vegerim hindirê malê -piştî wê gera sibehê ya li gel herçar mirovên ku ez di labîrenta bêdeng ya bajêr de gerandim- û li ber çenteyê xwe yê vekirî rûnim û li cilên xwe yên ku li ser nivîna min belav in parçe bi parçe binêrim.

Wê kêlîkê ez tenê li nivîsîna nameyeke dirêj ji bavê xwe re fikirîm. Dibe ku ew gelekî kurt be ji ber bîr û ramanên pir ên ku di serê min de li bin guhê hev dikevin, û çîrokên şeş salên li giravekê ku ew bi xwe jî nizane çawa bûye giravek di nav avê de û tûristên ku naşibin tûristan têne serdana wê.

“Bavo, ez li gel nameyeke ji Mirovê Mezin vedigerim ba te.” Min biryar da ku weha dest bi nameya xwe bikim û pêde biçim: “Wî ez nas nekirim. Eşkere ji te re dibêjim wî ez nas nekirim tevî ku min behsa te jêre kir, lê ew li ber israra min a zirz ku hema peyvekê ji te re binivîse piştî wan şeş sal bendewariya min, dest hilanîn û bi qelema risas li ser pelikekê ku ji pakêta cigareyên xwe birrî weha nivîsî: “Em ne li hêviya kesekî ne.” Ewî weha nivîsî bavo.”

“Ew ne li hêviya kesekî ye”, ezê weha binivîsim û gelekî bi van peyvên xwe bikenim û rûyê bavê xwe bînim ber çavên xwe

ku nameya kinik dixwîne û paşê dipêçe û dîsa li ber çavên xwe vedireşîne û li tîpên wê yên ku bi hibreke şîn hatine nivîsîn kûr mêze dike û dike birebir: “De ka îcar min çima Mem şand?”

Dibe ku bavê min ne eynî wan gotinan bibêje, lê ewê di cihekî ji kûraniyên xwe de wan dubare bike û li wan mêvanên xwe binêre, li wê odeya dirêjik ku ji bo şevbuhêrkên li ber sobeya mazotê ye. Dibe jî ku hinekî wan biguhere û bibêje: “Mirovê Mezin li hêviya kurê min Mem bû, lê ji nişkê ve mir.” Mêvanên wî dê jê bipirsin: “Kî mir?”, bavê min ê bibêje: “Mem mir.”

“Na” ezê ji hêla din a nameyê de biqîrim: “Çawa yanî ez mirim bavo?” bavê min ê bersivê bide: “Yanî tu mirî. Ne kêm ne zêde.”

“Ev çi henek e?” ezê ji bavê xwe re bibêjim, ewê bersivê bide:

- Ma delîlê ku tu sax î çi ye?

“Ev name ye bavê min”, bi bêzariyeke mezin ezê biqîrim, ewê di bin simêlan re bike pistepist:

“Kîjan name?”

“Ev name bavo, yanî ew nameya ku ez têde dibêjime te ku Mirovê Mezin bendewariya tu kesekî nake”, bavê min ê biqîre: “Min tu şandî ba wî ji ber ku ew ne li hêviya tu kesî ye hey ehmeq, de ji min re nema binivîse.”

Jixwe min nameya xwe ji bavê xwe re nenivîsî da ku ez rastî rewşeke weha nebim, tevî ku ez fikirîbûm ku nameyeke dirêj jêre binivîsim dema min li cilên xwe yên li ser nivîna xwe dinêrî, wê demê hate bala min ku divê ez wê hevoka ku behsa protestantên ku derew li milletekî kiribûn a ku min çend caran nivîsî bû bibim ji cîranên xwe re yên ku li malekê bakurî baxçeyê mala min bi cih bûbûn. Min destê xwe li berîkên xwe peland û dît wa ye pelik di herdu berîkên pantelon û herduyên qutikê min de ne û hinekî qermiçî ne.

Ji odeya xewê min pêşiyê berê xwe da metbexê û cigareyek kişand û bi nefesa pêşî re çend caran kuxiyam, rabû min ew vemirand bêyî ku ez hêsirên xwe damalim, min berê xwe da hêwanê û li pêş neynika ku kenarê wê ji sifrekî sor e rawestiyam û min bi çavên xwe de nihêrî, min bi rûyê xwe yê nekurkirî de jî nihêrî û ez bişirîm.

Her ku hêsir bi çavên min dikevin-dema dikuxum yan dibawişkim yan jî digirîm- tê bala min ku ez di neynikê re li çavên xwe binêrim da ku serê tayê ku çavên min û yên bavê min ên ku dema dikene hêsran dikin dişibihîne hev, bigrim. Min û Dîno di zarotiyê de her ku me çavên bavê xwe bi hêsir didît me çavên xwe dixurandin da ku hêsir pê bikevin. Ew adet heta bi min re heta ez bûme xort jî ma lê jixwe ez nizanim ka Dîno jî wek min e yan na.

Çavên min bi her halî naşibihin çavên bavê min ê ku di kortikên xwe yên kûr de bi razan pêçayî ne. Çavên min hinekî beloq in û kenê mirov tîne dema ku ziq li tiştekî dinêrin ku kêfa min bi xwe ji wan re nayê. Lê ez dibînim ku ew bi kêf in û kûr diramin dema ku hêsran dikin û li wir ez şibihandina xwe ya bi bavê xwe re zeft dikim, bavê min ê ku hevoka xwe: “Ev heykelê xwar” dubare dike her cara ku behsa demê dike û li saeta xwe dinêre, yan jî ku îşaretî demê di çîrokên xwe yên li ser Kurdistanê dike. Û çima zeman û dem heykelekî xwar e ez nizanim, ez nizanim jî ku mebesta wî ji peyva heykel, heykelê mirovekî yan yê lawirekî yan jî yê avahiyekê ye.

Hingî ku wî ew hevoka xwe dubare dikir êdî ne hewce bû mirov kûr têde bifikiriya. Lê niha divê ez li çavên xwe mêze bikim ku çavên bavê xwe yên di paş hêsrên min de veşartîne nas bikim, ne seba tiştekî tenê lê da ku ji wan re eşkere bikim ku ez ji nav qatên gora xwe de dibînim bê çawa du teyr bi kêf dadikevin binê gora min û her tiştî dinikilînin: bayê, avê, tariyê, tiqetiqên pirr, rojan û kevza kesk a ku li ser hestiyên min î lerizî şîn tê jî.

Dibe ku bavê min bêtir bikene dema ku bibîne ez weha pêde çûme da ku şibihandinekê di navbera me de bibînim, ez bi xwe jî dikira bikeniyama dema min di wê neynika kenarsifir de li rûyê xwe nihêrî lê ji ber birçîbûneke ji nişkê ve careke din min berê xwe da metbexê û keriyek nan bi hinek xwarina sar re ku ji ber şîveke berê mabû xwar. Paşê ez li ser kursiyekî destik hesinî rûniştim û min li pelekê ji wan pelên ku min "Xapandina protestanên Alman" ên ku carekê hatibûn rojhilata Kurdî li ser nivîsî bû nihêrî, weke ku ez piştî pênc rojan xwe ji hevdîtina wî cîranê xwe yê bi raz û dest bi bask re amade dikim.

Ez her di wanên ku ji nişkê ve li gel dewarên xwe û qefesên xwe hatibûn wê mala li bakurî baxçeyê pêşmalê diramiyam, bi taybetî piştî jivana min a li gel wî mirovê di qapûtê xwe de winda şeva ku navê min hilda û bi fedî ji min xwest ez jê re wê cumleya bêzarker binivîsim, hevoka derbarî protestantên porzer ên ku li bin sîwana nijadê arî di veşartokan de li peymanan digerin.

Ez her di wan de diramiyam lê bawer bûm ku di maweya pênc rojan de hin tişt hene hindik maye dawiyê li bendewariya min werînin loma jî ez ji mal derneketim, ez tenê diçûm dikana piçûk a li nêzîkî malê û min xwarin û vexwarin û cigare jê dikirîn. Sibeha roja pêncan tiştê ku ez li hêviyê bûm qewimî, ew herçar mirovên ku ji min lihevketîtir bûbûn piştî wê gera lal ya li Mirovê Mezin di kolanên lal de dîsa hatin serdana min.

Roja pêncan jî, yanî piştî vegera min a ji wê gera behsêbûyî, xwesteka cîranê min hate bîra min, rabû min biryar da ku ez wan pelikên min nivîsîne ji wan re bibim, dema min deriyê bi ser baxçeyê pêş malê de vedibe vekir min dît ku bûye nêzîkî esrê, di gel ku min texmîn dikir ew gera min a li gel wan çar mirovan ne bêtirî nîv yan sêribê sibehê domandibû. Çaxa min baxçe û sûrê wê derbas kirin ku xwe ber bi dîwarê mala cîranên

nû de babidim min dît li bakur nêzîkî meydana cirîda hespan wa ye her çar mirov li ser axa sor a li dora sûrê meydanê rûniştine û berê rûyên wan li min e.

Ez di rûyê wan de bişirîm û di çavên min de lêborînek ji wan û ji min jî hebû ku em di seyrana wê sibeha em ne li bendê de winda bûn û me û cihan xwe ji ber hev vedişart bêyî ku em yan ew cih pê bizanibin.

Gelo çima ew vegeriyan ku çend metreyan dûrî mala min bi vî awayê ku kenê mirov pê tê rûnin? Ev hate bala min dema ku ez ber bi wan ve diçûm û belasebeb dibişirîm, û di eynî demê de jî ji veciniqînê lihevketî bûbûm. Eger tiştek heba ku ew bibêjin dê li deriyê min bidana. Ku ez nêzîkî wan bûm û berê min kete wan darên akasyayê yên bilind li pişt wî sûrê ku wan pişta xwe dabûyê, min destên xwe xistin berîkên pantelonê xwe. Di rawestandina min a li ber wan yek gotina hevgirtî jî bi min re derneket, hema çi hate ser zimanê min, min got:

- Ji kengî ve hûn li vir in.

Herçaran di bin birhan re bi awirin sist û aram li min nihêrîn û ziq bala xwe dane min mîna ku çi bersiv ne xema wan e, ez bêtir li hev ketim û hema li ber wan mîna wan çarmêrkî rûniştim û min li mala xwe nihêrî ku min guman kir ew jî lê dinêrin. Paşê ez li yê nêzîkî xwe zivirîm û min gotê: “Çima hûn li min vegeriyan?”, mîna ku min ew bi pirsa xwe veciniqandibe birhê xwe yê çepê bi destê xwe malişt û got: “Em ne li te vegeriyane”, bersiva wî ez çelqandim loma min xwest pirseke kêfdar bikim: “Ma hûn li ser hespan bi şert dilîzin?” Mêrik li her sê hevalên xwe nihêrî û çend gotin di guhê wan de kirin û ew keniyan. Paşê mêrik li min zivirî û got: “Em ji hespan hez nakin.”

“Kesek ji hespan hez nake” min gotê û wî bi bişirîneke şêrîn li min guhdarî kir paşê li hevalê xwe zivirî û kire pistepist û dîsa ew kenandin, dîsa li min zivirî û got:

- Me digot qey hinek hene ji hespan hez dikin.

“Na” min piştrast got, û pêde çûm: “Hîç çi kes ji hespan hez nake.”

Mêrik li min nenihêrî, lê li mala min nihêrî û beşişî, min guman kir ku ewê pirsa min a hevoka dawî ku ez jê piştrast bûm bike, lê nekir, rabû min ew kişande axaftinê û dubare gotê:

“Hîç tu kes ji hespan hez nake”, ew û hersêyên din bi aramiyeke bê mereq li min zivirîn. Dema min di rûyê wan de hinek bêzarî dît ez li pirsa xwe ya pêşîn vegeriyam:

- Eger hûn ne ji bo min li vir in de ka çima hûn rûniştîne û li mala min dinêrin?

“Em ne li mala te dinêrin”, mirovê li rex min got û zêde kir: “Em li wir dinêrin”, û tiliya xwe dirêjî mala ku cîranên min ên nû ketibûnê kir, bi rastî jî nêzîkbûna herdu malan ji hev hişt ez semta ku wan lê dinêrî nizanibim, lê wê bersiva wî ez veciniqandim, rabû min matmayî pirsî:

“Evana? Hûn çi ji wan dixwazin?”, yê li rex min got: “Em li hêviyê ne ku ew herin.” Min herdu aliyên qutikê xwe bi ser sînga xwe de komî hev kirin mîna ku xwe ji bayekî diparêzim û got: “Herin?”, û min lê zêde kir: “Û çima wê herin?”

“Peymana kirê ya malê qediya”, yê ku li rex min rûniştî got, min gotê: “Kîjan peyman? Ev nebûne çend roj ew li vir in”, mêrik bi bawerî got: “peymana wan bi dawî hat.”

Min nikaribû matmayîna xwe serpoş bikim, rabû min jê pirsî: “Eger peymanek bi dawî tê mirov dikare nû bike, ma ev jî nikarin?”

Mêrik destê xwe danî ser milê min û tepand mîna ku dixwaze ez pirsên xwe kêm bikim, lê ez nesekinîm:

- Çi têkiliya we bi peymana van re heye?

“Têkiliya me?” got û birhên xwe bilind kirin û zêde kir: “Tu têkiliya me bi peymana wan re nîne.”

Ez rabûme ser piyan, min dîsa destên xwe xistin berîkên pantelonê xwe û geh li wan herçar mirovên rûniştî û geh jî li mala li rex baxçeyê mala min nihêrî, nediyarbûna ku li wî cihî giraniya xwe danîbû ez li bin guhê hev xistim.

"Lê ewê maleke din bi peymaneke din kirê bikin", min bi dengekî bihîstî ji xwe re got û stûyê xwe bi alî wan her çaran de zivirand, û li gotina xwe zêde kir: "Ma hûn jî wisa nabînin?", û paşê min pişta xwe da wan û bi gavin aram ber bi malê de çûm, dema ku ez nêzîkî mal bûm hate bala min ku ez bi wan pelikên di berîka xwe de dagerim ba cîranên xwe yên nû, lê min ji nişkê ve biryar da ku derbasî mala xwe bibim çiku pencereya pêş malê ê bihêle ku ez mereqa xwe ji naskirineka dawiyekê ku ew li bendê ne têr bikim.

Dema ez ketim min kursiyek û maseyek biçûk anîn û ew li ber pencereyê danîn ku ji wir kenarê sûrê meydana cirîda hespan xuya dikir û du mirov ji wan herçaran jî xuya dibûn çiku stûna berendeya pêş malê yên din vedişartin, min qedehek ava meyweyan li ber xwe danî û cigareyek sor kir û bi dilxweşî rûniştim mîna ku dem hemû ya min be.

Her tişt aram e di hindirê wê mala ku niştecihên nû hatinê, ronahî jî têde ne xuya ne, çiku hemû pencere baş hatine girtin. Cigareya min şewq da destê min û di camê re xuya bû. Piştî pêlek raman, ronahiya spî û melûl ya serê stûnê bala min kişand. Ew weha destpê dike: spî û melûl û paşê hin bi hin zêde dibe û zer dibe heta ku dikemile û baxçeyê min tijî ronahiyeke purteqalî dibe û ji wir jî bi ser asfalta kolanan de diherike û heta bi çola qûmê ya ku li rojava diçe bêyî ku bigihîje sêrê meydana cirîda hespan. Loma jî ew herdu mirovên ku min ew didîtin nema ketin ber awirên min û sûr jî winda bû mîna ku darên akasyayê ew daqurtandibin, ew darên ku di ronahiya risasî ya ezmanê berêvarê de dihatin dîtin.

Min digot dê bi êvarê re tevgerek hebe, lê ew her çar mirov ji wê veşargeha xwe ya tarî neleqiyan û mala li rex min jî di aramiya xwe de ma. Ez jî di navbera kursiyê û metbexê de diçûm û dihatim ku qedeha xwe dagirim bêyî ku di odeyê de ronahiyê geş bikim, şewqa purteqalî ya lempeya stûna li kolanê têra min dikir, ew şewqa ku ji pencereyê herikîbû û hinek jê bi ser sêniyeke sifir î neqişandî de ketibû ku min ew mîna xemlekê li quncekî danî bû.

Hindik hindik, ku tariyê stûnên xwe yên xurt danîn û desthilata xwe bi zanebûn û wekhevî belav kir, dengê serbazên di paş çeperan de ji her du aliyên xeta ku girav parçe kiribû bilind dibû: ev dijûnan dibêjin û ew jî dijûnan dibêjin, wek her şevê ji xwe re zengelokên xwe heta destê sibê ezmûn dikirin.

Bi dorê diqîriyan ew, li pişt darên akasyayê û sûrê rojava yê meydana cirîda hespan a ku wê bi tenê sebra min di wê tariya giran de dianî. Di gel ku lerizîneke sivik ji sermayê kete navbera çermê min û cawê qutikê min, pêre jî bêsebriyeke hefsarkirî derbas bû, min qenctir dît ku li cihê xwe bimînim tevî ku hindik mabû ez di ronahiya purteqalî de bihelim. Çiku min kursiyê xwe hinekî bi şûn de biribû û ew ronahî mîna sûlavekê bi ser min de hatibû xwarê. Lê piştî çend deqeyan ez pê hisiyam ku bi rastî jî endamên laşê min dihelin û dibin toz û di cama pencereyê re bi wê şewqê re dertên û diçin li dora wê lempeya bi stûnê kolanê ve mîna seywanekê kom dibin, ewê tîrtir bibana eger ne reşêşa sivik ya ku ji kûraniya şevê hatî toza endamên min da ber xwe û hin jê li ser şaxên darhinara mala li kêleka mala min û hinekî jî li ser darika buganfîlî danî, hinekî jî çû li ser darkokên gulan û pelên laleyên li dora herdu darxurmeyên biçûk î li ber hevşiyê malê danî.

Ez bi hin dilopan re li ser pelan belav dibûm, paşê dilopên din dihatin û ez gêrî erda hişk dikirim, min xwe bi giyayê digirt

yan jî bi qûm û çementoyê da ku ez neşemitim kûraniyên sar, eynî wek ku çawa min xwe bi kursiyê girtibû, di halê nîvxewiyê de, da ku bi şewqa purteqalî re di pencereyê re dernekevim derve.

Ez nizanim çiqas dem di ser min re derbas bûbû, lê min xwelîdanka cigareyan çar caran vala kir, yanî ew çar caran tijî qûnikên cigareyan bûbû di wê rûniştina min de, êdî ez ji ser kursiyê xwe rabûm û min xwe veparimand û hinek awir di derdorê vedan û rûyê xwe bi cama pencereyê ve zeliqand heta ku keleboxa henasên min lê girt. Û ji dema ku ew kes li wê mala li rex min bi cî bûbûn ew cara yekem bû ez di heywanên wan de difikirîm, ew heywan hin kerên bilind bûn û hinek ga bûn ku ew ajotibûn pehnava pişt malê ya ku bi cawekî stûr û werîsên ji madenî bû serpoşkirî bû.

Dengê wan heywanan di rojên borî de nedihate min, min jî qet ji xwe nepirsî bû ka çima ew anîne nava vî bajarî, min ya qenc dît ku ez derkevim û ji bin dêliya tirî de awirekê li wê pehnavê bixim.

Ez ji derî derketim û du derenceyan peya bûm, paşê min xwe bi alî rastê de bada û milên min bi peleke xurmedarê bû û piştî çend gavan ez ketim bin dêliya tirî ya rût î ku şaxên wê li jor mîna maran li hev geriyane. Paşê ez ber bi sûrê zengarî de çûm û min tiliyên xwe pê kirin û di ser re li tariya pehnava pişt malê ku gara jek bû nihêrî. Di gel ku dîwarê başûr yê wê malê û dêliya wê ya tirî ku li pêşber dêliya min e nedihiştin şewqa purteqalî biherike pehnavê jî lê tişt diyar bûn: tekerê otombîlekê, depên text, neynikeke mezin di kenarekî girover de û hinek werîsên qutkirî hema çawa be li erdê avêtî û hin pelên şil î bi ser hev de kombûyî ku bûne çend meh kesekî ew nemaliştine.

Dema min ew venêrîna xwe ya biçûk qedand ez dîsa bi alî şewqa purteqalî de vegeriyam, ku çawa gihame ber stûna

lempeyê min destê xwe da ser çavên xwe ku kesekî ji wan her çar mirovan bibînim lê min di tariyê de tiştek nedît, min destê xwe daxist û li daketina wê nihêrî mîna ku destê kesekî din be.

Gelo birayê min Dîno jî destê xwe dida ber çavên xwe di wê demê de? Wek birûskekê ew yek hate bala min. Ez bawer dikim ku wî, li aliyê din ji deryayê, hewl dida cihê min nas bike, û ew li gel mêvanên bavê min rûniştiye û bi durûtiyeke şahîger pesnê nanê ku Şêro Baban berî şeş salan ji min re bi boneya derketina min çêkiribû dida.

Ewî mirovî xwestibû qedrekî ji xwe re çêbike, rabû ji bavê min û hevalên wî re sêsed û çil qutiyên serdînan vekiribûn, qutiyên vala mîna pîramîdan bilbind bûbûn û zeyt û bînê li her tiştî girt ta radeyekê eger ku ez îro destên xwe bîn bikim ezê di hestiyên mofirkan de pêjna bermayê bîna wî nanê Baban bikim. Birayê min Dîno her şev pesnê wê zeytê dida mîna ku dê vexwe, pesnê bînê dida mîna ku dê dîwarên malê li ser bigre. Ew bi vî halî ma heta ez derketim, lê hîn jî ez dengê wî yê hinekî ketî dikim: pêşî dengê wî tê, paşê sûretê wî. Dengê wî jî li ba min girêdayî wê pistepista wî ya bi her du kerên ku patosa Şêro Baban a tirtire dikişandin bû, dema ku di roja pêşî de xera bû piştî ku derbasî nav zadê Elî Zêrî bûbû.

Bextê Baban reş bû. Wî û hostayên wî yên bi rî mehekê di binê konê li ber patoza John Deere de vedayî derbas kirin, parçeyên kevn nû dikirin û deverên wê rûn û zeyt dikirin heta ku wê aletê dengên xwe yên destpêkê yên xeniqî derxistin ku nîşana vejandina giyanê wê yê hesinî bûn. Di wê mijûliya xwe ya li gel wî dêwê kesk de çinîna şeş zadên mezin girte ser milê xwe lê di ezmûna yekem de patoza wî rawestiya, ewê tenê du çewal çinîbûn ku terzî bi şûjin û qinebê devê wan dirûtibû. Dema ku li trektorekê geriyan da ku patozê bibin garaja temîrê çav li wan herdu keran ketin ku cêwiyê min Dîno ew birin hinda Babanê qeherî yê ku soz dabû birayê min ku wî bike

şofêrê pîkabê dema ku were temîrkirin, ji bo ku ew jî çewalên genim bibe hingarên li çolê. Karê şofêrtiyê jî asantirîn kar e di mûsimê çinînê de ku ne zêdetirî du mehan dom dike.

Ewan patoz bi herdu keran ve girêdan û Dîno ajotina wan avête ser milê xwe. Dema ez li çola nêzîkî mala Baban î ku ne dûrî mala me ye pêrgî wî hatim, ewî ji keran re dikire pistepist ku min tiştek jê fêm nekir. Em herdu keniyan û bû tiqetiqa me lê kerên ku pistepistê ew iqna kiribûn hîç guh li me û qerfpêkirin û kenê me nekirin. Êvarê dema Baban hate civata bavê min li hewşa malê û bihîst ku berê min li seferê ye, xwest, di gel ku ew mijûlî derdekî giran e jî, nanekî ji me hemûyan re bike. Ew nan sêsed û çel qutiyên serdînan bû, ez nizanim çima ne kêm ne zêde.

Bi her halî ker li vê giravê ji jiyaneke luks ne bêpar in. Çiku dema ez gihiştim giravê û diçûme xwaringeheke biçûk ku hin muşteriyên wê bi zimanê min diaxivin, me dest bi çîrokên keran kir çi eşkere çi jî veşartî, heta di nav dijûn û sixêfên me de jî ker hebûn. Lê me ew heywanên ku navûdengê wan bêtirî her berhemekê belav bûbû nedîtin, ewan heta reqabeta heykelê Afrodîtê ê şikestî ku wêneyên wî di her posterên tûrîstîk de hebûn dikirin. Reqabeta hinek stûnên ku mêjûyê ew bi bêzariyeke eşkere pejirandibûn li wê girava ku rojên tatîlan li gor salnameya zayînî wek avê diherikin: tatîlên navan, weliyan, avê, serxwebûnan, hemleyan, zayînê, paskalyayê, cejna qurbanê û ya rojiyê jî û hin cejnên ku ji nişkê ve behsa wan dibe (yan wisa ji me ve xuya dibe). Paşê xeleka tatîlan fireh dibe ku cejnên Yûnaniyê cîran jî bikevin nav de heta dereceya ku tûrîst mîna gêjan li dora xwe dizivirin û li xwaringehehekê digerin lê nabînin û bi taybetî jî di meha tebaxê de ku bêhnvedana tevayî ya temamê milletekî ye, îcar ew tûrîst tên ku ji bîrçîbûnan re nexşeyên di destê xwe de bixwun.

Cara yekem piştî hatina min a giravê ku min ker têde dîtin, ew bû dema ku ew xelk hatin û li mala di rex mala min de bi cih bûn, lê niha ku min li meydana pişt malê nihêrî min şopa heywanan nekir. Çaxa ku min destê xwe li ser çavê xwe danî jî ji bo ku di tariyê de li xeyalê yekî ji wan her çar mirovan bibînim ku li ber sûrê meydana cirîda hespan rûniştibûn, ez gihame wê baweriyê ku divê dev ji serpêhatiyên wê rojê hemûyî berdim û vegerim hindir, rabû min berê xwe da peyarêya çemento ya ku di nav darkokên gulan û wan herdu xurmedaran re derbas dibe. Lê dema ez gihiştim darkokên gulan ez rawestiyam û piçekî bi ser de xwar bûm û min li nebza wan î jar û xilmaşiya wan guhdarî kir. Ez jî, kêfa min tê ku di aramiya şevê de li darkokên gulan guhdarî bikim çiku ez bawer im ku şeytan di bin wan de paldide piştî her gereke xwe ya ku têde delîlan pêşkêş dike ku xwedê kesî ji deriyê xwe venagerîne. Şeytan bi taybetî darkokên gulan di baxçeyê min de hildibijêre ji ber ku ez bêzar im, ew jî halek e ku şeytan têde teseliya xwe dibîne.

Jixwe min di wê aramiyê de dengê henasan yan xiştexişta cilan di bin darên gulan de nebihîst, bi her halî ez fêrî wê rewşê bûbûm. Ê min besî min e ez guhdarî bikim û besî şeytên e ew piştrast bike ku ew ne li wê derê ye. Ew dizane ku ez guhdarî dikim û ez jî dizanim ew li wê derê ye. Hema darkokên gulan bêdeng dimînin û di ber zayîna dijwar a peleke nû re ku dê heta werandina xwe bêdeng bimîne, pelên xwe yên kevn gez dike.

Ku ez nêzîkî darkokên gulan bûm, bi wan herdu derenceyên mermer yên digihîjin sekoyê pêş deriyê malê, min dît ku derenceya duyem diheje, dîsa peya bûm û ji nûve hilkişiyam min dît ya duyem xir û leq bûye. Min bi destê xwe ew leqand heta ku ew dikira bihata hilkişandin. Min ji xwe re got ku ezê xeberê bidim xwediyê malê ku wê çemento bike ji ber ku hilkişîna wê êdî mirov dilteng dike.

Min deriyê malê vekirî hiştibû bêyî ku lempeyan geş bikim, ew mal wisa mîna çenteyekî xuya bû. Na, lê ew mîna qelşeke fireh di perdeyekê de bû ez têre derbas bûm û li bişkoka geşkirina lempeya elektrîkê li ser dîwêr geriyam, korîdora dirêj di roniyê de ma. Min derî li pê xwe girt û çûme odeya xewê ku ew bûbûn çend roj cilên min li ser nivînan bûn. Ez nîv carê li dora xwe zivirîm da ku bibînim ka çente hîn li cih e yan na, min dît va ye li cihê berê ye, rabû min ew rakir û bi ser de xwar bûm min dît ku ew perik nema di binî de ye.

Min ew perika ku di nav cilên min de bû bi tiliyên xwe rakiribû lê nayê bîra min gelo min ew li binê çente vegerandibû yan li baxçeyê pişt malê ji min ketibû dema ku min ji xwe re li wan herdu teyran dinêrî.

Ew perikeke ku tiştekî nayne bîra min, lê hebûna wê ya di nav cilên min de min li hev dixe tevî ku ez dikarim guh li hebûna wê ya di çenteyê xwe de nekim, ji xwe divê weha be gava yek perekê di çenteyê xwe yê rêwîtiyê de bibîne. Çîrok hemû ev e ku perikek ji cihekî ji cihan, bi şêweyekî ji şêweyan, bi qest yan bê qest ketibû nav cilên min, divabû dema ku min ew di tariya çente de dît jî ew li wir bihişta yan jî rakira û bibira di xwelîdankê de daniya û ji xwe re sebra xwe bi kizirandina wê bi agirê cigareya xwe bianiya û bîna sotinê bikira û bidîta bê çawa hêdî hêdî di eynî demê de bi jan û razîbûn dicivile. Lê ew -di pêvajoya hesabkirî ya wî çenteyê ku şeş salan girtî mabû û cilin ku ez parçe bi parçe wan nas dikim û hin hûremûrên din têde bûn- tiştekî ne di hesaban de bû. Loma jî ez dibêjim ku ewê perikê ez veciniqandim bi awayekî ku ne heqê wê bû, di kêlîkekê de ku min biryareke tenbel dabû ku xwe ez bikujim.

Ez nikarim cihê ku wê kêlîkê jê li min temaşe dikir destnîşan bikim, lê ez dikarim texmîn bikim ku hinekî ji asta nivîna min bilindtir bû da ku bikaribe baş dirûvê min bibîne; lêva min a jêr bi ser çena min a tûjik de daliqiyaye, hinarkên rûyê min kûr

çûne, pozê min ê teyrikî, mijangên dirêj û birhên ku dihiştin çavên min di bin siya wan de nearam bin, û ew eniya min a ku temberiya min bi ser de hatiye guvaştin û ta bi ta belav bûye.

Berî ku kêlîk dawerive karesatê, ewê bi çavin tijî mereqeke şêt û serxweş li min dinêrî, ez bi çenteyê xwe yê vala mijûl bûbûm. Ew mijûlî jî dîmenekî rawestiyayî bû çiku ez ji derveyî kêlîkê bûm, ew kêlîka ku bi tenê bi qudreta xwe ya demê dikare dîmenî bileqîne. Û ji ber ku ew li derveyî min e û ji mekanê ez lê me veqetiyaye, ew mat mabû ku ew matmayîna wê dergehê afirandina hafizeyekê ji xwe re bû, ez jî ji bêdengiyê mat mabûm, bêdengiya ku hafizeya min wisa kurt kir mîna tîrbûneke bi sînor ku dişibihe dengvedana ji cameke dûr. Lê ez sax bûm, ew kêlîk jî sax bû, û perikeke cûnikî biçûk dikare di navbera me de cihekî bibîne û bi hejandineke aram aram dawerive çîroka ku hemêza xwe ji bavê min re vedike li cihekî ji cihan dûrî çend metreyan ji şeva ku min têde çente venêrî û ew perik têde nedît.

Çaxa ku min çente danî erdê ez ji odeya xewê derketim korîdora ku bi dîwarekî wê ve du lavlav ji guldankeke bi binê banê korîdorê ve daliqiyayî bûn daketibûn. Ji wir min berê xwe da salona fireh ku hindek mobîlya lê hebû û min careke din ji pencereya wê li mala di rex min de nihêrî û ji xwe re got: “Bavo çima ez û ne Dîno?”

Ew jî pirseke ku min her ji xwe dikir tevî ku min şerm dikir ji birayê xwe re ezmûneke weha hêvî bikim. Lê gelo wê çi biba eger Dîno bi min re ba? Bêguman minê ew bişanda da ku binêre ka ew herçar mirov hîn li ber sûrê meydana cirîda hespan rûniştî ne yan na, wî dê ji min xwestiba ku ez bi xwe herim. Ev halê me bû, qet yekî bi ya yê din nedikir ku ne piştî xirecirekê ba: ew ji min dixwaze û ez ji wî. Me bi hev re jî ji bîr kiribû ka kî berî yê din jidayik bûye, yan jî me ê ew deqeyên ku ketibûn navbera herdu zayînan ji xwe re bikirana behane ku

divê birayê biçûk guh li yê mezin bike. Lê di mala me de hîç kesekî guh li yê din nedikir: em hemû, ez û birayê xwe û xwehên xwe û berî me jî bav û diya me hema serhişk jidayik bûne. Û eger piştî van şeş salan Dîno bi min re ba dê mal parçe biba, deriyên malê parçe bibana, herdu baxçeyên malê û şewqa purteqalî ya lempeya kolanê, û bayê kawik ê semta ku ez lê bi cih bûme li bajêr hemû parçe bibana. Lê kî dizane, dibe ku me herduyan li hev jî bikira. Wek mînak wî ê bigota:

- Hebûna me li vir nema pêwist e, ka em vegerin.

Minê bipirsiya: "Bi kû ve?" Wî dê bigota:

- Em vegerin mala xwe.

Minê bipirsiya: "Û niha divê em çi bikin?", wî dê bigota:

- Alavên me bixe çenteyan.

Ji ber ku ez jî guhlêker im -li gor wê xeyalê- ezê her tiştî bidim hev, cil û firaxên sifir ên ku me dîwarên kifikî pê xemilandibûn, xwelîdank, sênîk, peyal û çaydanên ku ji ber pehînên me yên dema bihevçûnan pelixîne jî. Ji xwe ezê palgehan, çarşefên ser nivînan, herdu qutiyên kibrîtê û mûma mezin a ku dibe me du caran ew geş kiribe jî bidim hev. Wê hindik mabe ku ez kîsê nan jî bixim çenteyekî lê Dîno ê bi koşeyê çavan awireke nerazîbûnê di min vede û ezê wisa nekim. Dema ku ez ji girêdana wan buxçeyên çermîn ên ku nepixîne biqedim ezê wan yek bi yek bikişînim sekoya mermer a derveyî malê û li hêviya gava duyemîn a ku dê birayê min wê bavêje bimînim. Birayê min işaretî min dike ku ez bidim pey wî heta ber bi dêliya tirî de, ez jî dikevim pey wî.

Hêdî hêdî Dîno li dora xwe dizivire û hûrik hûrik li dêliyê dinêre paşê li dara hejîrê a ku pelikin hûrik û nazik li ser şaxên wê bişkivîbûn. Ew di navbera herduyan de diçe û tê û destên xwe bilind dike da ku cihên ba jê tê binase, xwe xwar dike ku binêre ka kîjan quncik bêtir bi rewa û bi sî ye û kîjan bêtir li ber tavê û zuha ye. Dema ku ji wan pîvan û texmînan diqede, di

guhê min de dike pistînî: “Li vir” û destê xwe dirêjî cihekî biçûk di navbera herdu daran de dike ku li pişt wî cihî hinek darên giraniumê çelîpanîn in, û ew pêde diçe: “Çenteyan li vir deyne.” Ez jî diçim çenteyan tînim bêyî ku jê bipirsim ka hikmet çi ye em çenteyan ji ser sekoya pak tînin û li nav wî giyayê şil î tijî kurmik datînin. Ez wan yek bi yek tînim cihê ku cêwiyê min gotî û di bin wan de xuh didim, heta ku ez her neh çenteyên bi wan qelafetên wan î ecêb di xelekeke ne lihevhatî de rêz dikim. Piştî ku ez wî karî diqedînim bêhna xwe berdidim, Dîno min vediciniqîne: “çavê te li çenteyan be heta ez têm”, dibêje û diçe, ez bang lê dikim:

- Dîno... Tuyê kengî vegerî?

“Ezê vegerim... Çavên te li çenteyan be Mem”, û destê wî li pişt wî diçe, ez careke din bang dikimê:

Û mobîlya? Em çi ji mobîlyayê bikin? Ma em ji xwediyê malê re nebêjin ku va ye em diçin?

Dîno li min venagerîne, li min nazivire jî, ez radibim şeş salên din li ser çenteyekî nêzîkî xwe rûdinim, di wan şeş salan de gelek pelên dêliyê û pelên hejîran bi ser min de têne xwarê, gelek toz li min digre, kulîlkên hişk ji darên giraniumê, zelqa teyran, konikên pîrê û helezonin mirî ku hişk bi por û kincên min ve zeliqiye, ez û çenteyan di bin pîramîdên xeş û peşan de mane.

Piştî şeş salan ji wê mana min a di wê tariya giran û şiliyê de, di navbera dêliya tirî û dara hejîrê de, deyaxa min nema tê, ez hinekî ji cihê xwe dileqim û rûyê xwe di ser komên pelg û tozê re hildidim himber bayê, nikanim çavên xwe vekim, dibihîzim bê çawa Dîno mîna çêlekan dike orînî û sixêfan ji her tiştî re dibêje. Dema ku ez çavên xwe vedikim dibînim ku ez ji hêrsan re dilerizim, ez dikim kuxtekuxt seba ku bala wî bikişînim, ew li min dizivire û destên xwe vedike mîna ku axaftineke ku me berê dest pêkiribû temam dike:

Tu nabînî? Ew dê meydana cirîda hespan ji vir rakin.

“Çima?” ez jê dipirsim û hinek pelg ji nav porê xwe û tayên konikên pîrê ji ser birhên xwe dadiweşînim, Dîno dibêje:

Ew dibêjin ku meydan nêzîkî xeta ku herdu parçeyên giravê vediqetîne ye, hesp ji ber maniwerên leşkerî yên herdu aliyan vediciniqin.

“Ma çiyê me jê ye meydanê rakin yan bihêlin?”, ez ji Dîno re dibêjim, ew bi hêrs vedigerîne:

- Ma emê çawa ji vir herin ku ew meydanê rakin?

“Ez ji te fêm nakim” ez jê re dibêjim, ew awireke sivkatiyê di min wer dike û pistepistê dike:

- Ma tu nizanî gêjo eger ew ciyan biguhezin, êdî em nikarin herin?

“Ew meydanê diguhezin ne cih hemûyî” ez ji Dîno re dibêjim, ew jî diqîre:

Vegere çenteyan biparêze Mem.

Ez jî vedigerim û xwe li bin pîramîdê pelên ku wan şeş salan ew bi ser min de weşandibûn vedişêrim û nema devereke min xuya dibe.

Ev e tiştê ku dê biqewimiya, bi texmîna min, eger ez kesê baqil û guhlêker bama di wê têkiliya di navbera min û Dîno de dema ku ew li vir ba. Lê wê rewş çiba eger Dîno ew kesê guhlêker ba? Dibe ku ez, mesela, jê re bibêjim :

“Dîno tu çima nazewicî?”, ew bersivê dide:

Û tu?

“Çi îşê te ji min e? Ez ji te dipirsim tu çima nazewicî” ez dibêjim û Dino vedigerîne:

Tu kesekê nas dikî?

“Hûûûû” ez bi çavqurçandin dibêjim û pêde diçim: “Xwediya sola leşkerî”, di rûyê Dîno de him mereq û him jî razîbûn xuya dibe. Xwediya sola leşkerî jî keçeke bi erebî dipeyive û tê xwaringeha ku biyaniyên mîna me têde dicivin. Her car jî ji sêniyê yan ji qedehê tiştekî bi ser maseyê yan bi ser

pantelonê xwe de dirijîne, em jî desmalkan radikin û ber bi wê ve diçin. Ew xemgîn e. Rûyê wê xemgîn û dirêjikî ye. Çavên wê biçûk û hingivîn in û porê wê xernûbiyekî xelek xelekî ye ku çi şeh nikarin wî bişkinin. Hinekî dirêj e. Pantelonan bi ser solên bi qirik de li xwe dike, ku ji pêşî de telomelo ne ew sol mîna cizmeyên leşkeran. Tiliyên wê gelekî dirêj in tim dikevin nav zeyt û mergeyê, ew jî wan bi pantelonên xwe pak dike. Peyivandina wê pifkirin e, yanî dengê wê ji nav diranên wê yên kinik bi dehfandina zimanê wê re derdikeve û li lêvên wê yên zemmandî dikeve. Bêtirî gotinên wê li ser Buda û Kreşna û navên Rojhilatê yên din in ku nîşana aramiyekê "Di hindirê wê" de didin. Ew ji sariyên Hindî hez dike: "Çi xweşik e. Hindistan çi xweşik e", em şîretan lê dikin ku biçe li wê bijî, ew jî di cî de dibêje ku ew bi rastî jî têde difikire, em tînin bîra wê ku divê ew rêzê ji çêlekan re bigre û ji çemê Ganj vexwe û di firaxên sifir de xwarinê bipeje û gelek zarokan bîne: "Bi feqîrekî re bizewice, xêra te têde heye." Çima na? Ne xema wê ye ka ew bi kê re dizewice, tenê ku mêrê wê xwe ji motorsîklê wê aciz neke. Xwediya solên leşkerî vê dawiyê ji bêgavî motorsîklê xwe firot lê kumê xwe yê hesinî li gel xwe hişt ku hema dixe bin çengê xwe û li gel xwe tîne xwaringehê. Destpêkê ez henekan bi xwediya solên leşkerî re dikim:

- Tu çi dibêjî ku ez ji te re motorsîklekî bikirrim?

Keçik li min mêze dike, na li peyvên min mêze dike: "Û çima tê ji min re motorsîklekî bikirrî?"

"Eger tu bi birayê min Dîno re bizewicî." Ez bi ken dibêjim lê bi piştraskirinek bêhenek di awirên çavên min de, ew li Dînoyê ku xwe di pişt çavên xwe yên kesk de veşartiye dizivire û dipirse:

"Û çima Dîno ji min naxwaze?", ez ji ser kursiya xwe radibim û işaretî Dîno dikim ku li şûna min rûne:

"Were Dîno. Li cem wê rûne û tu li gel wê biaxive", Dîno ji ser kursiya xwe radibe û em cihan bi hev re diguherin, lê ez

bejna xwe di ber birayê xwe yê dirêj pêş de didim ku keçikê bibînim çiku ew dikeve ber min û wê êdî, her weha ez dixwazim axaftina wê tenê li gel min be mîna ku ez baweriyê bi hêz û tewana iqnakirinê ya vî cêwiyê xwe yê çavkesk naynim:

"Motorsîklekî ne pirr buha hilbijêre keçê. Butçeya me destûrê nade", ez dibêjimê, ew jî hinekî dirame û bi pirtikên nanê li ser maseyê dilîze: "Û ezê çi ji mobîlyayê li ba xwe bikim?" Ez bersivê didimê: "Bi xwe re bîne."

Ew bi tena xwe di daireyekê de di jî û karekî ku me jê nepirsiye ew çi ye dike. Ew dûr e ji malbata xwe ya ku li welatekî din in li rojhilatî deryaya spî. Erê ji ber ku ew bi tenê ye êdî mobîlyeya malê maseyek biçûk û du kursiyên çerm, çenteyekî cilan, meqilkek, botogazeke yekserî, sobeyek elektrîkî û qetremîzek av ku masiyekî sor têde ye. Jixwe ew vê mobilyaya xwe tîne mala me û tev li mobîlyaya me ya hindik dike, masî û malika xwe ya cam jî dê li ber pencereya metbexê li ser dolapa firaxa bin: "Masî bi hacetî ronahiyê ne" keçik wisa sebebê hilbijartina wî cihî şirove dike. Ew cilên xwe tev li cilên birayê min li odeya wî ya xewê dike, nivîna xwe ya pembo jî li ber textê wî datîne eynî mîna ku li mala xwe ya bê text dikir. Dema ku Dîno jê re dibêje valahiyekê di navbera herdu nivînan de bihêle ji ber ku ewê jî li ser text binive ne li ser nivîna li erdê, ew dibêje ku ew naxwaze dema ji ser text peya bibe lingên xwe rasterast bi erdê bike. Dema ku Dîno dibêjiyê terlikekê bixe piyên xwe, ew dibêjê ku ji bo wê qenctir e dema ku ew di nav nivîna xwe ya erdê de sola xwe bike pê, û ji xwe ew ji terlikan hez nake. A wisa em hergav dengê sola wê ya giran li erda odeyan dibihîzin û her deh deqeyan jî em dengê ketina kumê wê yê hesinî dibihîzin ku mîna gogekê li ser erda hişk digindire û cênîkên me ji ber dilerizin. Em dibêjin ku divê ew wî kumî bide serê xwe ne ku bixe bin çengê xwe ji bo ku ew kumê reş î ku pêşiya wî lastîkekî parastinê heye bêtir neçelite, ew qebûl dike.

Ez yek caran, ji ber xwediya sola leşkerî ku ji serşokê yan jî bi cilên xewê ji odeyê bi wî kumê li serî derdikeve, vediciniqim. Ez tim ji Dîno dipirsim ku gelo ew keçik tev li wî kumî pê re radizê yan na, ew milên xwe hildide û dibêje: "Ne xem e ne xem e. Bi kum yan bê kum mirov dikare bikeve xew eger bixwaze", ez qehra xwe ji ber neguhdana wî dadiqurtînim. Dema xwediya sola leşkerî wek her car pirsa motorsîklê ku me soz dabûyê em jê re bikirrin dike, ez dibêjimê ku divê ew xwe ragire heta em maleke din kirê dikin ku odeyên wê yên razanê mezin bin ji bo ku motorsîklê xwe jî têde deyne, ew razî dibe. Dema ku ji Dîno re behaneya min a derengxistina kirrînê dibêje, birayê min gefan lê dixwe: "Motorsîklê te dê bi me re nekeve xew. Kum bes e.", êdî keçik lihevketî li min vedigere: "Ne xem e Mem. Motorsîklê bikirre hîn di vê malê de ne. Ez cihekî wê di bin dêliya tirî de peyda dikim."

Ezê çi motorsîklan nekirrim. Biryara min ev e. Bi taybetî jî ku axaftina wê êdî ji ser Hindistanê dageriya axaftina li ser Bolîvyayê û dirêj dirêj behsa heywanê lama dike û hindik maye em êdî lamayan bi palik û zengil, li gor wesfê wê, di odeyên malê de bibînin. Ez bi henekî yekcaran jê dipirsim ka çima ew behsa Perûyê nake? Ew dibêje ku navê Bolîvyayê nêzîktirî navê mêyan e. Tiştê ku dihêle bêtir ez jê dilteng bibim ew e ku ew karê xwe ji nişkêve berdide, ew bi dengê xwe yê ku mîna pifkirinê ye dibêje: "Ez nikarim kar û zewacê bi hev re bikim", û lê zêde dike: "Dîno di xew de dike xurexur û xewê li min diherimîne, ez dixwazim sibehan xewa xwe temam bikim." Jixwe ew heta nîvro di xew de dimîne û paşê jî, mîna ku her jinek di destpêka zewaca xwe de dike, dest bi xwarinên xwe dike; keskayiyên di nav gelek av de li ser êgir dike, makerona ne şorkirî, qutîkên kîvarkan, erdîşok[2], mergeya mirîşkan, nanê

2. Bi Tirkî enginar, bi Farisî dibêjinê kerengê firincî. Peyva bi xwe Erebî ye yanî stiriya erdê, wisa jî derbasî hin zimanên rojavayî bûye. (J. Dost)

qemirî, penêrê zer û gelek sênî ji avin din ku ariya cigareyên wê yên ji quncikê devê wê yê çepê dernakevin bi ser dikeve. Ew ku cigareyan dikişîne jî çavên xwe ji ber dûyê ku li rûyê wê dide digre, ariya cigareyên wê li her cihî ye: di nav nivînan de, li derdorê, li ser erda daşirê, di destşokê de, li ser maseya xwarinê, li ser kursiyan, di nav piyên kursiyan de û di herdu guldankên lavlavê de yên ku bi banê malê ve li alî korîdorê daliqiyayî ne.

Ez bawer dikim ku min ji pêşî de şaşî kir ku min mîdeyeke din jî anî ser maseya xwarinê. Va ye ez bi tena xwe Dîno yê ku naxebite û jina wî ya xwediya sola leşkerî bi xwarin dikim, hemî bi wî meaşê min ê hindik ê ku Mirovê Mezin ji min re bi rêk û pêk dişîne. Lê ez dixwazim rewşê durist bikim, ez radibim birayê xwe xewle dikim û dibêjimê:

- Halê te çi ye?

Dîno bi guman li min dinêre û dibêje: “Temam e.”

“Û jina te?”, ez jê dipirsim, ew bersivê dide: “Temam e.”

“Ez ne li gel te me”, ez dibêjimê, ew ecêb dimîne:

- Li ser çi?

“Ku her tişt temam e”, ez dibêjimê, ew dipirse:

- Ma te tiştekî ne di rê de dîtiye?

“Ev çîrok hemî ne di rê de ye”, ez dibêjim, ew dîsa dipirse:

- Kîjan çîrok?

“Ev zewaca te” ez dibêjimê, êdî milên wî ji ber westabûneke ji nişkê ve dadikevin û dibêje:

- Ma ne tu xwediyê vê fikrê bûyî?

“Erê” ez dibêjimê û li peyvin digerim ku iqnakirin tê de hebe: “Birayê min... Dîno... Tu ne amade yî...”, ew gotina min dibirre:

- Ez ji çi re ne amade me?

“Yanî..” ez wê peyvê dibêjim û dikime birebir: “Yanî em ne amade ne..”, êdî ew jî dike birebir:

- Zelaltir bike Mem.

“Ez çi zelaltir bikim Dîno?” ez di rûyê birayê xwe de diqîrim û pêde diçim: “Bila ev jinik ji ba me here”, cêwiyê min dibişire, mîna ku min aram dike destekî xwe bilind dike:

- Ma tu jê ditirsî?

“Ez ji kê ditirsim? Ji vê ya ku....”, ez bi dengekî xeniqî dibêjim, ew gotina min dibirre:

- Tu jê ditirsî. Ne şerm e.

“Ez jê ditirsim?” ez gotina xwe dubare dikim û tiştê ku dibihîzim bawer nakim. “Ma ez jê bitirsim?”, û ez li Dînoyê ku dibişire dinêrim: “Ka bêje min çima ezê jê bitirsim?”, ew bi herdu çavên xwe yen kesek li min dinêre:

Ji ber ku ew te nabîne.

“Ew min nabîne?”, ez bi tinaziya wî ya ku min hêrs dike dikenim: “Ew min nabîne? Eger ew min nebîne de ka ew çi dibîne?”, ez ji birayê xwe re, xwediyê çavên ku di hêrsa min de çikandîne dibêjim, ew jî bi rihetî bersiva min dide:

- Ew her tiştî dibîne tenê te nabîne.

Ez jî awirên xwe di rûyê Dîno de diçikînim. Ew dixwaze bi axaftineke pûç min lihevbixîne, loma jî ez êdî nema guh li berdewamkirina vî beşî ji axaftina me dikim û dibêjimê: “Guhdar be birayê min, ezê bilêteke rê ji te re bikirrim da ku tu vegerî cem dê û bavê xwe”, ew bêyî ku hêrs bibe bersivê dide:

Ji xwe re bilêtekê bikirre. Ezê li vir bimînim.

Bi van peyvên birayê xwe re ez dibînim ku berê min ketiye metbexê, metbexa ku ez bawer dikim xwediya sola leşkerî di nav sênikên wê de digere, lê ez wê nabînim û radibim ber bi wê goga cam a li ser stûnekî li ber pencereyê ye diçim û destekî xwe di devê wê gogê de dikim û wê masiya sor digrim, ew masiya ku belasebeb kêfxweş e, wê bilind dikim, ew vê carê bê kêf dilerize, ez çeqçeqê ji diranên xwe tînim mîna ku dikim bi saxî wê bixwum…

Ez keniyam, yan ji min ve we xuyabû ku ez keniyam dema ez gihame vê derê ji xeyalkirina ku Dîno bi min re ye û em

rolan bi hev re diguherin, ew bi xwe ez her li ber pencereya salonê rûniştî bûm û li mala cîranan dinêrîm, ew mala ku tev baxçeyê mala min di nav şewqa purteqalî de winda bûbûn.

Min bi hêdî pakêta xwe derxist û cigareyek pêxist, agirê cigareyê mîna min aram xuya dikir. Min di wan kêlîkan de dev ji hemû mereqên xwe berdida, di gel ku hîn ez mîna kesekî ku berê wî li şevbuhêrkekê be di cilên xwe yên derketinê de bûm. Dema min pakêt vegerande berîka xwe, xiştexişta wan pelên ku min hevoka derbarî protestantên Alman ku demekê derew li hin kesan kiribûn li ser wan nivîsî bû hat, di cî de hate bala min ku ez wan pelan rakim û bibim radestî wî mirovê destperikî bikim.

Bê dudilî min ew pel ji berîkên xwe derxistin û di mista destekî de kom kirin, hindik mabû tiliyên min li wan nehatana hev, min xwe amade kir ku hema kî derî ji min re veke ez bidim dest. Minê bigota: "Ev in pelên we, biborin ku min nikaribû nusxeyên zêdetir binivîsanda", û ezê vegeriyama û eger wan çiqasî bixwesta jî ez derbas nedibûm û minê lêborîna xwe bixwesta.

Min derî vekir û derketim bêyî ku li pê xwe bigrim, li ser wan herdu derenceyên ku yek ji wan leq bûbû daketim û di peyarêya çemento re, di nav darkokên gulan û xurmedarê re meşiyam heta ber dergeha nizmik, di wê re jî buhurîm û min berê xwe da dergeha mala cîranan a ku vekirî bû.

Ez guman dikim ku milê min li şaxekî dara hinarê, ku bi ser rêya di baxçeyê wê malê de xwarbûbû, ket lê ez jê derbas bûm û sê derenceyan hilkişiyam û gihame pêşber derîzanka deriyê ku li ber wî û bi ser stûneke çemento de ku lavlaveke hişk xwe lê pêçabû siya min şikestîbû. Min pê li bişkoka zengil kir û guhê xwe da ser textê tarî yê derî, çi ringînî nebû. Min dîsa pê lê kir û gepa xwe da ser derî, wek cara berê bû, çi ringînî nehat.

Min got de qey zengil xerabe ye, rabû min bi destê xwe li derî da û dîsa guhê xwe da ser textê sar ku belkî pêjna hin gavan bikim lê bêhavil bû.

Min êdî xurt li derî da lê ji nişkêve ez rawestiyam çiku zîqîniyek ji derî hat û wa diyar bû ku felqeyê ku min lê dida hinekî bi alî hindir de çûbû, yanî ew vekirî bû. Tiştê ku di serî de ji wê qelşa di navbera herdu felqeyan de xuyabû roniyeke melûl bû, ez li pişt xwe zivirîm ka bê kesek di kolanê de heye û min dibîne lê na, min dît va ye dara yasemînê ji min re bûye sitare. A wê çaxê min derî dehf da û herdu felqe vebûn.

Ez bi temamî nizanim ka gelo min xwe komî ser hev kir û rûyê xwe bi zendê xwe parast yan jî ez dûrî derî çûm û min xwe siparte dîwêr. Min tiştekî weha bêhemdî xwe kir ku xwe ji ber wê pêla giran a balindeyên ku bi refan ji hindir derketin û firefireke xeniqî ji baskên wan dihat û tariya melûl bi qelafetên xwe yên rengçûyî belawela dikirin berî ku di nav spîbûna tîr ya şevê de winda bibin, ew wisa derdiketin mîna ku xwe davêjin şewqa ku ji dîtina min dûrtir e.

Dilê min ji cî derket, tenê tiştê ku ez pê hisiyam di wê kêlîka ji nişkê ve de, herdu cênîkên min bûn ku di bin lêdana nebza min a tirsiyayî de radibûn û dadiketin. Du deqe buhurîn nebuhurîn û êdî xuyabû ku wê malê hinavê xwe ji teyran vala kir, ruh bi min ve hat û min stûyê xwe di derî re bi alî wê aramiya ku ronahiya hindir a xilmaş wê diguvêşe de dirêj kir û paşê min cesaret kir û gavekê bi pêş de çûme hindirê korîdorê û ji wê min berê xwe da hêwana mezin ku min berê têde du rêzên mirovan li himber hev dîtibûn. Lê kes li wir nebû, sênîkên xwarinê ên ku di rêzekê de li ser erdê bûn, xuyabûn ku nû di wan de hatibû xwarin. Li her aliyekî lihêfên li ser hev li ber dîwaran bûn, ebayên jinan û alavin pêçayî di buxçeyên çerm de, sicade, qefesên vala, qutiyên tûtinê yên bi neqş, teşî, sol, tasên avê, qapût, şehên hestî ku hinek porê dirêj

bi wan ve ye û di şewqa melûl a bi selikekê nuxumandî de dibiriqe, wek ku niştecihan hemû alavên xwe kiribûn pêşangehek.

Min di wê mala xalî de dirêj nekir û bi lez vegeriyam, dema ku hatim derve min nû bala xwe dayê ku destên min vala ne û ew pelên min li ser derîzankê, li ser derenceyan û li ber dara hinarê û dergehê malê belawela bûne, heta hinek jî gindirîbûn peyarêya li rex kolanê û tev li şewqa purteqalî ku êdî melûltir xuya bûbûn.

Ku çawa min rûyê xwe bi alî rojava de ku teyr têde winda bûn bilind kir, min texmîn kir ku ez dikarim hinek xeyalan di asoyê bi qurmên darên akasyayê veşartî ye de bibînim, min êdî destê xwe da ser eniya xwe ku xwe ji şewqa purteqalî biparêzim û bikaribim wan xeyalan bijimêrrim, min wisa zanî ku çar xeyal in û hêdî hêdî di ber sûrê meydana cirîda hespan re berê xwe dane başûr û diçin.

Beşa Duyem

# Para Yekem

Dîno rola xwe ya ku divabû bilîsta vedigerîne,
çîrok mekanê xwe careke din bi dest dixîne.

Berî çend rojan ji rêwîtiya iddiakirî ya Mem ber bi giraveke iddiakirî, sibeha ku ewî guman kir ku karibû xwe li ber zûrîniya çeqelan ragire û ji nav nivîna xwe dernekev û danekeve û berê xwe nede wan mîna şeva berê, Hemdî Azad bang li keça xwe Rohata porlawikî kir: “Hilkişe serê banî û birayê xwe ji xewê rake”, ew reviya mîna ku berê xwe bide lîstikekê, û bi nêrdewanê ve hilperikî, li jor hinekî rawestiya û li nivînê nihêrî ku vala xuya dikir, lê hîn jî hilkişiya û çû serê banî û ber bi nivîna birayê xwe de çû û lihêfa tenik rakir, Mem ne di nav nivîna xwe de bû, ewê palgeh jî rakir û venêrîna xwe qedand û reviya û zikê xwe bi derenceyên nêrdewanê ve xijiqand her wekî mîna ku hilkişiya û tavilê dakete jêr. Dema ku lingên wê bi erdê bûn berê xwe bi bazdan da bavê xwe û di nav re li şijikên hewşê dilikumî: “Ew ne li wir e”, keçika biçûk got û pozê xwe bi qevdika kirasê xwe paqij kir.

Hemdiyê di gumlekê xakî yê bi ser penteleonê wî yê xakî de berdayî û xwe ji derketinê re amade kiribû rûyê xwe tirş kir û bi mista destê xwe kefiya mîna şaşikekê li serî gerandî xwar kir, wek nîşana qehreke veşartî ku tavilê ji nav lêvên wî derket: “Ma

min negotê bila vê sibê li gel min were sûkê?” Paşê berê xwe da dergehê hesinî mîna ku kurê xwe ji bîr dike lê dîsa vegeriya û nîvê bedena xwe di derî re derbasî hindir kir, jina wî Kesboyê peyalên vala ên çayê didane hev, pirtikên nanê ji ber taştê mayî jî berev dikirin, ew taştêya ku zarok bi qerebalix û xirecir û hevacizkirin li dorê dicivin. Hêvînê şîr tev li çayê dike, Welat nan diçine nav mast û bi kevçî dixwe, Eyşan naxwaze di eynî sêniyê de li gel Welat bixwe, ew hinek helawa Hemayê di nav mastî de dixwaze. Rohat jî dixwast dimsê di nanê xwe bide û çend dilop jê diniqutin ser qevdika Rehîme ya ku diqîre û pêre jî Hêlan qedeha çayê dirijîne. Di wan kêlîkan de jî, bûye adet, dengê Mem yan yê Dîno bilind dibe ku wan bêdeng dikin, ew hinekî aram dibin lê tavilê vedigerin xirecira xwe. Mem û Dîno dûrî xwehên xwe rûdinin çiku ew sibehan dereng ji xew radibin û hinek rihetî ji wan re divê heta rojên ku têde diçûne dibistanê jî, lê ku ewan bi hev re lîse qedand kaxezên wan î ku pê derbasî zanîngehê bibana ne temam bûn, bavê wan ne hemwelatî bû, di nasnameya wî de li cihê hemwelatiyê “Ne temam e” danîne. Loma jî ewan dev ji xwendinê berdan û bi bavê xwe re di mexazeya mezin a cawan de xebitîn. Havînan jî karê mûsimî bi bazirganên ceh û genim re dikirin, yan jî dibûn muawinên patozan û hesabdarên wan. Mem jî sozek wergirtibû ku bibe şofêrê pîkabê li cem Şêro Babanê bêsiûd.

Mem jixwe wê sibê bi birayê xwe Dîno re xwehên xwe kerkirin neda, çiku nehat ser taştê. Dema ku Hemdî jî nîvê bedena xwe di derî re derbas kir û jina wî Kesbo hîn şopa şekir û dimsê ji ser şemedana wek sifrê ku li erdê bû bi keçeke xwe re paqij dikir, berê xwe da Dînoyê ku nû dest bi taştê kiribû û pirsî: “Ma te Mem nedîtiye?”, Dînoyê ku ji xewa li serê ban hez nake serê xwe bi îşareta na hejand.

“Ew li kû ye?” Hemdî peyvên xwe mîna pifan derxistin û li dora xwe zivirî bêyî ku awirên wî li tiştekî bisekinin: “Ma min

negote wî ku ewê îro bi min re were sûkê?", Dîno ji nişkê ve ji ser taştê rabû û hewl da ku hêrsa bavê xwe hinekî sivik bike û gotê: "Eger tu bixwazî ezê bi te re bêm", bavê wî serê xwe hejand yanî bide pey min û herdu derketin.

Hemdî heyranê radyoya xwe ya dupêlî bû, ew radyoya girs, ya textîn û rû ji cawekî bêc ku çavekî cam têde hebû ku piştî nîv deqeyê ji pêketinê kesk dibû. Li jêr lewheyeke cam î dirêj hebû ku li gor qonaxên xeyalî yên di navbera cîhanên ku derziya serpembo di wan re dibuhure reqemkirî bû. Ew ji modela Sierra ya bêqisûr bû. Bi delîlê ku Hemdî di yanzdeh salan de nefikirî bû ku yeke din ji bilî wê peyda bike, di gel ku bi her liveke derziyê re xijexij pê diket û zarokên wî destên xwe datanîn ser guhên xwe. Lê ewî dawiyê biryar da ku yeke din bi antên bikire ku bikaribe îzgehan baş bikişîne, û zimanên ku tev li hev dibin ji hev cuda bike. Ewî bi kurê xwe Mem re lihevkiribû ku sibehê bi hev re biçin, kur radioyê bîne malê û bav jî li mexazeya xwe bimîne.

Ji adeta Hemdî ye ku bi meşê ji malê here û were dikana xwe tevî ku rê demeke ne hindik dixwe, ew hin caran sêrib saetan didomîne ku gavên wî ne lezok bin. Lê bi her halî wê sibehê bav û kurê xwe nedilezandin. Silav li hin kesan kirin û dema rastî sûsfiroşê Helebî bûn du tasik ava sûsê vexwarin. Lê silavên wan zêdetir bûn dema ku derbasî qeyseriya cawan bûn, qeyseriya ku dikanên wê muqabilî hev in û firoşkarên wê ji xwe re li ser kursiyên qirşikî rûniştîne û xwe pelax kirine. Li dawiya qeyseriyê ji hêla başûr ve zêrzemînek heye mirov bi derenceyan dadikevê heta digihê deriyekî hesinî di nav siyeke tarî de xerq bûye, ku çawa Hemdî qufla wî vekir mexaze bi xêra çend qulikên di dîwaran de bêtir bi ronî bû, wan qulikên bi cameke stûr girtî dihişt ku ronahiya kolanê ya raserî qeraxa banê mexazeyê serbest bibe û bikeve hindirê wê mexazeya mezin ya ku tijî refik in û topên caw li ser wan hildayî ne û êdî

têra wan nakin û topên mayî jî li erdê û quncikan mîna xeyalan rêzkirî ne.

Hemdî destê xwe çend caran da musterên caw ên li ser maseya wî dirêjkirîbûn, paşê defterek bi pelên xêzdar vekir û çavek li rûpelan xist mîna ku nuqteyekê li dawiya rêzeke duhî datîne. Paşê ji Dîno re got ku bide pey wî û herdu hilkişiyan û çûne meydana qeyseriyê. Li wir çayfiroşekî zarok dîtin, Hemdî gotê: "Ezê pişt re vegerim.", kurikê ku ji karê wî ye ber bi dikançiyên ku sibehan ziringîniyê ji derabeyên dikanên xwe tînin de bazde, vegerand: "Tu emir dikî. Tu vegerî ezê bêm.", û nîv xelekekê zivirî û qedeha çayê ji yekî ku nû dihat re bir, Hemdî jî bangî cîranekî xwe kir: "Eger kesekî li min pirsî, ezê gaveke din vegerim", û ew û Dîno ji hênikiya sibehê ya qeyseriyê derketin kolana kifşbûyî li ber rojeke ku bi lez germiyeke lal dirêse.

Ew du kolanan zêdetir neçûn heta li ber camekanekê sekinîn ku li ser wê wêneyên betariyên reş î paşiya wan sor û çirûsk didin hebûn. Hemdî her ku ji nêrîna radyoyekê diçû yeke din bi bişirîn li kurê xwe dinêrî, kur jî serê xwe bi ecibandin dihejand. Dema ku ji xwe re ji derve de têr nihêrîn derbasî hindirê wê dikana cihazên elektrîkê bûn û kesekî qelew î porspî û sakoyekî şîn î tenik ku pê kincên xwe yên din paqij bihêle lêbû, hat xêrhatina wan kir û ew dawetî rûniştinê kirin, herdu li ser du kursiyên himber hev rûniştin ku bi maseyekê ve zeliqî bûn, maseyeke ku motorekî biçûk î vekirî li ser bû û hinek mifte û burxî jî. Mêrik malê xwe pêşkêş kir û destê xwe derejî refikan kir: "Ev him bi eliktrîkê him jî bi betariyan dixebite. Ev bê antên e lê di hindirê wî de cihazekî ku ji xijexijê diparêze heye. Ewê han du mikrofonên wî di bin caw de hene, du sal garantiya wî jî hene. Lê eger tu şîreta min bixwazî, birêz Hemdî, tuyê evê Almanî bibî", û destnîşanî wêneyê radyoyekî li ser qutiyeke dirêj î girtî kir: "Wê weşana îzgehên ku hîn çênebûne jî bîne", û ji ber vê hevoka xwe keniya heta girêkên don yên li

dora çena wî hejiyan., Hemdî û kurê xwe jî keniyan, piştî kurteşahiyekê vegeriya û gotina xwe piştrast kir: "Ev radyo dikare serê bajarekî biêşîne. Alman Alman in. Dema aletekê çêdikin dixwazin bi xwe re bibin gorê." Li vir Hemdî kurê xwe Dîno veciniqand û gotê: "Dîno tu çi dibêjî?", Dîno ji ber nepisporiya xwe ya di vî warî de kete hev û got: "Tiştê ku tu qenc bibînî wî hilbijêre bavo."

"Ka em Almaniya te biceribînin" Hemdî ji dikanciyê qelew re got, dikancî jî yekser rabû û bi lez ew sindoqa kaxezî ya dirêj anî û li ser maseyê danî, vekir û radyo derxist da ku razên wê şanî wan bike, paşê ew vegerande cihê wê û sindoq girt: "Ser xêrê be. Ser xêrê be", Hemdî çend peyvên spasiyê gotin û buhayê radyoyê bêyî ku bazar bike da.

Li derve, li ber deriyê dikana aletên bêjer Hemdî û kurê xwe ji hev qetiyan: Hemdî vegeriya mexazeya xwe ya cilan, û Dîno jî radio xiste bin çengê xwe û berî da malê. Di wê kêlîkê bi xwe de Kesboyê jî bendewariya radyoyê dikir, ew li ser derenceya tekane ya çemento ya pêş malê rûniştibû, piştî ku karên xwe yên malê qedandibû, keçên wê jî di hewşa malê ya dîwarkirî de mîna mirîşkan diçûn û dihatin û rûyên palgehan ji dest hev direvandin û gulokên tayên rengîn li erdê digindirîn, ewan xwe fêrî neqşên li ser wan rûyan dikirin.

Hêvîna ku dikete hijdesaliya xwe, li hindir bi tenê bû, dema ku pirtûka xwe ya biçûk a ku bûbû çend car xwendibû girt, bi kirasê xwe yê xetxetî û porê xwe yê hema çawabe hûnayî derkete ber derî û li ber diya xwe li ser wê derenceya çemento rûnişt, destê xwe yê tenbel dirêjî kîsê tûtinê yê ji mexmer û di nîvî de benekî kesk lêgeriyayî, kir. Kesboyê di bin çavan re lê nihêrî, lê qe tiştek nekir ku rê li ber wî destî û daxwaza wî bigire. Hêvînê giran giran cigareyek ji xwe re pêça bêyî ku li diya xwe mêze bike ji bo ku awirên wan nebin sebeba bihevçûnekê, paşê ewê cigareya xwe vêxist û vegeriya, dûrî

awirên xwehên xwe yên ku dibe yek ji wan fesadiya wê li cem bavo bike.

Kurtedemek çû her pênc keçikên Kesboyê westiyan hingî ku rûyê palgehan kişkişandin, yan jî bi textên razanê yên mezin û kenar bilind ve hilperikîn, ew textên ku ji odeya mêvanan û ji ya Mem û Dîno bêtir, nêzîktirî odeya malê bûn. Ew havînan van textan li hewşa malê datanîn û dibe lîzgeha keçikan dema ku siya mala başûr û ya herdu darên kafûrê yên mezin tê ser wan, ew keçikên biçûk: Rehîma ya dwazdesalî, Rohata nehsalî û Hêlîna pêncsalî bi tebeşîran çarkoşeyan dikişînin û xwe di ser re digevêzin, xûşka wan Eyşan ya ku derbasî çardesaliya xwe dibe, her êvar ji mecbûrî erda wan textan bi paçikekî şil dişo berî ku doşekên stûr li ser raxînin.

Her pênc keçik bi helkehelk ber bi diya xwe ve hatin û li dorê bûne xelekek bêdeng ji bilî Welat a ku di pey Hêvînê re çêbûye, ewê zendika fireh ya kirasê diya xwe kişand û got: “Kanî Mem?”, diya wê bi acizî vegerand: “Ma wê li kû be vê katê xanimê?”, keçikê kire birebir: “Min ew nedîtiye…”, xweha wê ya biçûk Hêlîna ku tiştek dicût gotina wê birrî: “Min ew dîtiye.” Lê Welat xweha xwe a pirrbêj bêdeng kir: “Te sola xwe jî nedîtiye”, Hêlîn aciz bû: “Ha va ye sola min” û destnîşanî nigê xwe kir. Wê çaxê xweha wê Rohat kirasê wê kişand û qîriya: “Rûne kêzikê”, êdî keçika pêncsalî hêrs bû: “Ez ne kêzik im”, îcar dêya ku ji keça xwe ya mezin Hêvîn ne mestir xuya dike xwe mecbûr dît ku xwe bavêje navê û got: “Rohat tu çima dixwazî Welat rûne?”, û destê keçikê bi dilovanî girt û gotê: “Were dilê min, were, tu ne kêzik î tu heyv î” û ew xiste himêza xwe.

Hêdî hêdî Dîno ber bi rojava de diçû, di wê kolana dirêj ya bi dar de ku ji rojhilat de bi meydaneke biçûk î ku gogeke çementoyî bi qul têde ye bi dawî dibe, ew goga çemento avê dipijiqîne û li dora wê hevşiyekî hesinî heye ku rimên sertûjik in da ku zarok pê nelîzin.

Her ku ew ciwanê çavkesk pêncî metrî dimeşiya, radyo ji bin çengekî xwe diguheste bin çengê din î ku xwêdan pê ketiye û di qumaşê gumlekê wî re derketiye. Ewî carekê xwe avête ber siya dareke kajê û rawestiya, sindoq li ser giyayê bejî danî û destên xwe dane nava xwe ya zirav û bêmereqdarî li çola ku rojekê lîzgeha pêgogê bû nerî. Darstûnên golê bi boyaxa xwe ya spî sekinî mabûn. Ew çol berê fireh bû berî ku ji rojava de sûrên baxekî giştî bilind bibin. Piştî çend salan blogeke hendesî li aliyê rojhilat hilpekiya, dîwarên wê zivir û ji derve de lempe wê bi awayekî xweş ronî dikin, nav lê kirin "Postxane" ku li şûna postxaneya kevn bû, qutiyên postê yên hindik jî, ku bi dîwarên qirtasiyeyan ve bûn têra xelkên ku fêrî şandin yan wergirtina nameyan nebûbûn, dikirin.

Dîno radyoya bavê xwe ji nû ve rakir û meşa xwe li gel mereqa windabûna Mem a wê sibehê berdewam kir. Ne ji adetên Memê tembel bû ku sibehê zû ji mal derkeve, bi taybetî jî bê taştê, çiku divê ew nerazîbûna xwe ya hergav ji Dîno re bibêje, awiran di diya xwe ya ku guh lê nake vede û bibêje: "Ma ev nan ji qinnebê çêkirine? Ka tu bi xwedê kî bi diranê xwe qut bike", û kulora nan dirêjî Dîno dike, Dîno şanî wî dike ku va ye eynî wî nanî li ba wî jî heye: "Bi min re heye Mem, ji vî nanê te bi min re jî heye", Mem radibe peyaleya çayê ya zelal tîne ber çavên xwe: "Dîno ma tu jî tiştê ez dibînim dibînî? Ew bi vê çayê re axê jî dikelînin." Lê Dîno dixwaze ber dilê wî bide: "Ne şêlû ye Mem, tu mubalexe dikî", û qedeha xwe dide ber şewqa ku ji derî tê: "Qedeha xwe bide ber şewqê, Mem. Tu dibînî? Ha? Ew zelal e.", Mem peyva wî dibirre: "Tu tehma devê xwe nizanî, çavên te jî kêm bûne.", Dîno dibişire û dike pistînî: "Wisa çêtir e, ezê bi kêmanî bê gilî û gazin bixwim."

Lê Dîno bi xwe jî hin sibehan ne li ser hev e, mereqa wî ne di cih de ye û malbat hemî bi wê êşê dikeve, malbata ku roja xwe bi hinek nearamî dest pê dike tevî ku sebebekî diyar nîne.

Her tişt bi giştî baş e, halê hazir ne xerab e lê pêşeroj di berîkan de ye, her kesek destê xwe dixe berîka xwe û hinekî derdixe: Hemdî, Mem, Dîno, Kesbo û Hêvîn, berê keçikên mayî jî li rewşeke weha ye. Dayikê pir caran tiştê ku bavê nedigot dubare dikir, lê hez dikir bibihîze: "Pir nekenin. Ken belayê tîne.", êdî Mem bi hêl dikeniya: "Were... were, û lîsansekê ji zanîngeha Helebê bîne", û destê xwe dirêjî valahiya ku bela dikare têre bi werîsekî ji mûyê bizinan dakeve jêr dikir.

Tiştê ku dê siberoj bi xwe re werîne, bêguman ewê ku divabû îro biqewime lê belê hatiye derengxistin: ew e haydana kûraniyên wan ên qerfpêker. Hemdî tiştekî din jî li nearamiya malbatê zêde dike: "Sê tişt hene mirov diheyirînin. Wellahî...", ji jina xwe re, ya ku tûtinê bi hêrs û di eynî demê de bi aramî jî dikişîne, dibêje, ji mêvanên xwe re jî dibêje û zêde dike: "Mirin, gerdûn, mirov." Dibe ku yek ji wanên hinek zanist li ber destê feqeyên bêsewad bi dest xistibin bibêje: "Ew mirov naheyirînin Hemdî: Mirin qedera Xwedê ye, gerdûn mûcizeya wî ye, û mirov jî -tu dizanî- dê heta mûyê dawî yê di qûna xwe de hesab bide", yên rûniştî dikenin, lê Hemdî dibêje: "tevî wisa jî ew min diheyirînin."

Dîno naxwaze zêde li radyoyê guhdarî bike, radyoya ku pêncî hebên din wek wê nikarin mereqa êvarekê tenê ji êvarên Hemdî têr bikin, ew her derziyê di nav numereyên îzgehan de dibe û tîne û ji ber kêmbûna bultenên nûçeyan dike uftekuft. Mem jî zêde guh li wê aleta bêjer ya bavê xwe nake. Lê Hêvîn... Dînoyê ku bi hêdî ber bi mal ve diçe dibişire. Xweha wî ya ku bê bêhnvedan çîroka Mem û Zînê ya ku berî bi sedê salan Ehmedê Xanî nivîsîbû dixwîne, alîkariya bavê xwe dike û li nûçexwanekî jibîrbûyî di nav wan reqemên biçûk yên îzgehan de digere. Hêvîn ranên xwe tîne ber sînga xwe û destê xwe li wan dipêçe, Hemdî jî eynî weha dike. Dibe ku yekcaran ew bavê xwe qut bike û bipirse: "Ma ew behsa Kurdistanê dikin

bavo?", bav dike birebir: "Hîn na, hîn na." Dîno nizane ka çima xweha wî wê pirsê dike, ew xweha ku hîn navê Kurdistanê di îzgehên bavê xwe de nebihîstiye. Lê Dîno ji wê bendewariya kedîbûyî ya di pirsa xweha xwe de hez dike, ew bendewariyeke ku Hêvînê temamiya roja xwe, dibe heta di xewê de jî, bi xwe re hildigire, her wekî ku Dîno xeyal dike. Dibe jî ku ew wê bendewariyê gurrtir dike dema cigareyan bi dizî pêşkêşî xweha xwe dike, di gel ku ew bi xwe nakişîne, êdî ew bendewariya kedîbûyî werdigere matmayîneke şermokî ku bi spasiyeke di çavên şil de pêçayiye. Dîno ji Memê ku ew jî mîna diya xwe cigareya pir dikişîne dilteng dibe çiku Mem bi ser xweha xwe de radibe dema cigareyekê di nav tiliyên wê de dibîne. Dîno tê ba wê û wê bi henekî li xwendina Mem û Zînê germ dike, ji ber ku derd û janên di çîrokê de têne serê Memo bes in ku dilê xweha wan rihet bikin. Dibe ku Dîno heneka xwe berdewam bike heta ku xweha wî ji kenan re lal bibe: "Spasiya bavê xwe bike ku navê wî kiriye Mem, ne wa ba dilê te ê rihet neba." Ew yekcaran jî bi lez berê xwe dide pirtûka biçûk û rûpelan sivik diqulibîne û bi awayekî qeşmerane dibêje: "Ka mûm li kû danîne?... ka... ka... he, va ye li vir", û Dîno destê xwe nîşanî milê Mem ê ku bê hêrs rûyê xwe hinekî tirş dike, dike: "Li vir. Erê. Di laşî de cihek ji bo mûmê kolan", û Mem ji milê wî dikişîne: "Ka bihêle ez bîna goştê şewitî bikim." Û bang dike: "Hêvîn were" xweha wan bêyî ku were dikene, Dîno jî lîstika xwe berdewam dike: "Ka cigareyekê bîne ku em ji vê mûmê vêxin berî ku vemire."

Jixwe Dîno di nav wan henekên xwe yên sivik de sebeban dibîne ku dihêlin ew pirsa xweha xwe Hêvînê bike ka çima ew vî qasî wê çîrokê dixwîne, çîroka ku ilham da Hemdî ku wî navî li kurê xwe bike: "Ma tu ji qehrê Memî dixwînî?", ew dipirse û xweh bersivê dide:

- Oh. Ez ji Memo hez dikim, lê ji navê wî na.

“Nexwe tu ji qehrê navê wî re dixwînî” Dîno bi bişirîn dipirse, Hêvîn vedigerîne:

- Ez gelek caran ji qehrê Zînê re dixwînim.

“Ji qehrê Zînê re?” Dîno destên xwe bi pirsyarî bilind dike: “Ma wê rebenê çi kiriye?”, xweha wî lêva xwe diqermiçîne û dibêje:

- Rebenê?!

“Ma ne reben e qey?” dîno dipirse û lê zêde dike: “Gelekî reben e ku ji wî qirdê bi navê Mem hez dike.” Hêvîn dibêje:

- Te dît? Ewê tu jî xapandiyî.

“Ê baş e xweha min, de çima tu çîrokê vîqasî dixwînî madam tu van xapan têde dibînî?”

- Ez dixwînim, min gote te, ji qehra Zînê re.

Li vir Dîno dixwaze di wê axaftina nêzîktirî henekan de bi xweha xwe re bimeşe:

Te kengî nas kir ku xapînok e?

Hêvîn dibêje:

Ji dema ku ewê Memo ji bo hezkirinê hilbijartiye.

“Ka xapandin li kû ye gava ku Zînê kesekî mîna Memo bihebîne?”

Yanî bi rastî ewê ji Memo hez nedikir, lê ji ber ku Memo kesekî sade bû, Zînê ew xiste xefka xwe, ew kesê tekane ye ku qebûl dike ewqase derd û jan ji bo çavên wê bibîne.

“Heq li ser Ehmedê Xanî ye ku ev çîrok nivîsiye xweha min”, Dîno dibêje, Hêvînê lê vedigerîne:

Ez bi xwe ji hêla xwe de tînim bîra Zînê ku ez lîstika wê nas dikim.

Êdî Dîno dikene û dîsa di wê şahiyê de bi xweha xwe re diçe: “Ma çi xema wê ye ku tu lîstika wê nas bikî?” xweha wî gotina wî dibirre:

Dilteng dibe... Zînê dilteng dibe.

Dibe ku Hêvîn bi rastî jî bikaribe evîndara biçûk Zînê dilteng bike, ewa ku di nav xişl û cilên xwe de di çîrokê de giran

giran dimeşiya, di wê çîrokê de xapandin naqedin, ax û nalîn jî tên ku bi destên hema hema dîtbar li tîpan bidin. Lê Dînoyê ku berî li malê bi pêşde tê û radyo di bin çengê wî de ye, sê kesên ji rolên xwe diltengbûyî dibîne: Zînê û Memoyê di çîrokê de û xweha xwe Hêvînê. Bala wî diçe ser birayê wî Mem jî di wê bêhnvedana biçûk de ku radyo ji binçengekî xwe dibe yê din. Ji cara ku Qadir Hemo -yek ji mêvanên şevbuhêrkên mala wan e- Hemdî agahdar kiribû ku kurê wî Mem dişibihe Simko Axa, bav êdî kurê xwe ji qedereke din re amade dikir, qedereke ku bi gelek destan hatiye stran û di leganeke mezin de mîna hêkên ku dê pê kulîçeyên cejnê çêbikin hatiye lihevxistin.

Qadir Hemo jî di berîka qutikê xwe yê hindir de tim resmekî rengçûyî ku spîbûna wî tev li reşbûnê bûye, sê mêr têde ne, du ji wan ji pê ne û rext li wan in, yê sêyem jî li ser sekoyeke ji heriyê rûniştiye, kaboka xwe ya ku ji qelşa paltoyê wî derketiye bi mistên herdu destên xwe girtiye, qelbeqekî qerxîzî bi pirç li serî ye ku naşibihe kumên stûr ên li serên herdu mêrên li çep û rastê wî: “Ev Simko ye.” Lê şibihandina iddiakirî ya di navbera wî û Mem de, her kes ji kesên rûniştî dikare piştrast bike, ji ber ku rûdêma wî mirovê di wêne de hema hema bi spîbûna li pişt wî re bûye yek. Hemdî jî dibêje: “Enî... Erê, herdu birhên badayî. Erê. Ev bêvil. Erê. Herdu lêv...”, bersiv jî her ew e, yanî ew hejandina dubarekirî ya seriyan e, tevî ku simêlên Simko lêva wî ya jorîn vedişêrin û siya wan simêlan dadikeve ser lêva jêrîn jî û tev li hev dibin.

Hîn çi jî? Ku Hemdî her roj bi kurê xwe de dinêrî, di navbera wî û Simko Axa de roj bi roj têkiliyek nezelal mezin dibû, Simkoyê hişk yê ku bi bîst û pênc salan berî Komara Mehabadê û berî Qadî Mihemed behsa dewleteke Kurdî kir, lê ewî xwest hesabên xwe bi herêmên li dora xwe hemûyan re safî bike, şerê Rûsan kir, şerê Tirkan û Aşûriyan û Îraniyan jî kir, geh bi ser diket geh jî têk diçû mîna ku wî her tişt dixwest, heta ku sala

1931an kete kemînekê piştî ku şikestî berî li Îranê bû ku serxwariya xwe îlan bike.

Lê Hemdî dawiya Simko paşguh dike, Simkoyê ku bi saya Ebdullah Tehmesbê serleşkerê artêşa Rizaxanê Pehlewî û alîkariya êlên Azeriyan bû gurekî reviyayî: "Ewan teşrîfek ji Simko re amade kiribûn dema ew vexwendibûn Şinoyê..." û çîrok ne çîroka teşrîfê bû jixwe, her wekî Hemdî bi xwe jî vedibêje, lê vedana kemînekê ji hêla dewleta ku serxwariya Simko bipejirîne, iddiayên Hemdî gurrtir dike ku ew jê ditirsiyan, û yê ku heybeta wî vî qasî hebe naçe serxwariya xwe ranagihîne û lêborînê naxwaze.

Û Hemdiyê ku gihişte mexazeya xwe, piştî ku Dîno radyo rakir û berê xwe da malê, awirek bi lez li dîwarê pêşberî derî xist ku wêneyekî mezin daliqandî bû, wêneyê Simkoyê rûniştî û herdu hevalên wî bû ku bi qelema risas hatibû kişandin, ew bi pisporî ji ber wêneyê di berîka Qadir Hemo de hatibû kişandin. Hemdî bi alî rastê de zivirî û berê xwe da maseya xwe ya hişk û dirêjik, çend musterên qumaşê ku firoşkarên dikanên biçûk topên wan dixwazin di nav destên xwe de qulibandin. Ewî qumaşê ku jê re ji Bêrût û Heleb û Mûsilê dihat bi tevayî difirot. Lê jêdera beşekî mezin ji wî cawê li textên koşedar gerandî tenê ji hin muşteriyan re tê gotin. Çiku ew caw di nav çiyan re ji Tebrîza Îranê, û di nav daristanên bakurê Sûrî re ji Diyarbekir û Edeneya Tirkiyê tê, ew bi tirseke mezin û xwêdaneke pirr di qonaxin re tê ku rûyê kesên qumaş radest dikin û yên werdigrin têne guhertin heta ku ew digihê kesin ku wî cawî li wan gundên bakur ên li ser sînorê Tirkî rêzkirî vedişêrin, paşê li ser pişta qantirên ku tenê bi şev dikarin bi aramiyeke ku mirîşkan jî natirsîne û nahêle seg birewin bimeşin digihîje malên tacirên komfiroşiyê û li mexzenên wan tê belavkirin.

Hemdî topek cawê giran ji ser refikê danî û li ser maseyê gindirand, çemekî pêldar ji cawekî ku pêçên wî dibiriqîn ji ber

şewqa di qulikên bilind re dihat herikî. Ew topa stûr hêdî hêdî vebû û Hemdî jî ew bi metra hesinî dipîva, topa ku êdî zirav dibû li aliyê din bê rêkûpêk dibû komeke bilind ku dilê mirov dibijande avjeniyê, eynî mîna avjeniya keçikên wî di nav hiriya ku diya wan li hewşê radixist de, ewan xwe davête nav mîna ku xwe bavêjin nava avê, ew hirî dikirin gulok û diavêtin hevdû û diavêtin jor û paşê digirtin tevî ku diya wan hîn ew hiriya li ber tava rojê zuha dikir nejenandibû. Diya wan hiriyê dişo û dijene da ku pê doşekan biheşîne û doşek qalind û nerm bimînin, nepixî bin û ew jî dilê mirovî bibijînin avjeniyê.

Hemdî carekê du caran pîvana qumaşê xwe rawestand û di windabûna kurê xwe Mem ya ji nişkê ve de fikirî, jixwe ewî dikira sond bixwara ku pêjna daketina kurê xwe kiribû, lê xewê zora wî biribû û nehiştibû ew serê xwe ji ser palgehê hilîne û binêre ka ew çi ye û rabûbû dîsa li ber xurexura jina xwe Kesboyê ketibû xewê. Hemdî dikare bi her halî dev ji wê ramanê berde ku çi nearamiyê li ba wî çênake, lê ew hew mereqek bû û ne tiştekî din.

"Kurdistan ne bi hewceyî pasportan e." Hemdî vê yekê li ber wî cawê kombûyî ji xwe re dibêje. Ew di hindirê xwe de amade dike tiştê ku dê Mem bidehfîne ber bi bayê qetiyayî piştî kuştina şoreşa Mela Mistefayê Barzanî li Kurdistanê, mîna ku bes be hema Hemdî şûjinekê û tayekî xurt ji qinebê yan jî ji teriya hespan piştî ku bi mûmê re were hûnandin, bixe destê kurê xwe Mem û hema jê re bibêje: "De kurê min. Bayê bidirû", û ew ciwan jî dê bayê qetiyayî mîna perdeyekê di asoyên bavê xwe Hemdî de bidirû.

Çima na? Ma li cihekî ji cihên vê erdê tişt weha dest pê nakin qey? Hemûyan bi peyvekê yan bi guleyekê dest pêkirine, de ka çi ji Mem kêm e? "Ew xwenda ye, têgihiştî ye", Hemdî her dibêje û lê zêde dike: "Kurdistan ne bi hewceyî pasportan e", mîna ku Kurdistan jê ve nêzîktir be ji zanîngeha Helebê a ku ji

derbasbûna wê re belge divên ku para Hemdî di wan de nîne li ba daireya nifûsê, ji roja ku herdu kurên wî lîse qedandibûn wan belgeyan giraniya xwe bêtir dane ser milê wî.

Jixwe şandina wan a ji bo derveyî welêt, wek ku hin cîranên taxê wiha kiribûn, tenê dikaribû di rêyên sext re di nav daristan û rêl û çiyan re ba, wê demê pasport tenê filitandina ji mirinê ye. Lê Memê ku di planên bavê xwe de bû, hay ji wan meselan hemûyî nebû, guh lê nedikir, eger li bavê xwe guhdarî dikir jî mîna ku li çîrokekê guhdarî bike. Dema ku xirecir di navbera bav û birayê wî de, di navbera dê û xwehên wî yan bavê wî de derdiket jî, ewî xwe bêalî dikir û ecêb dima ku ew sebebê wê xirecirê hemûyî ye: “Bavo ma tu rast dixwazî ez biçim Kurdistanê?”, bav vediciniqî û digot: “Ma qey em vî qasî behsa çi dikin....”, Mem peyva wî dibirrî: “Tenê min dixwest bizanibim” û dibişirî, Dîno rûyê xwe tirş dikir ji wê guhnedana ku Mem dide xuyakirin di her rewşeke ku girêdayî wî be ku di pey re dikete axaftineke sivik bi bavê xwe yê bixwebawer re.

“Ma wê Mem li Kurdistanê çi bike bavo?” Dîno ji bavê xwe dipirse, Hemdî vedigerîne:

Wê çi bike? Tiştê ku ew hêja bibîne wê bike.

“Ma ew nikare tiştekî hêja li vir bike?”, Dîno dîsa dipirse, êdî bavê wî yê simêlstûr dibêje:

- Jixwe hene, loma jî ew dikare tiştekî hêja li wir bike.

“Lê bavo rewş ji vir heta wir diguhere”, Dîno dibêje, bav serê xwe dihejîne û dipejirîne:

Erê. Ez dizanim û tu jî dizanî. Mem jî dizane û diya te jî dizane.

Dîno peyva wî dibirre: “Û xwehên min jî dizanin. Lê bavo mebesta min....”, îcar bavê wî bi bangkirina Mem peyva wî dibirre:

- Mem. Were ji birayê xwe re bibêje ka tuyê li Kurdistanê çi bikî.

Mem gavekê pêşde tê, yan jî eger rûniştî be hema ji cihê xwe de dibêje: “Ezê gelek tiştan bikim”, bav jî dibîne ku ew bersiv bes e: “Ma te dît Dîno? Te bihîst?”

Dînoyê ku radyo di bin çengê wî de û ber bi malê ve diçû, ji xwe re di wê aramiya birayê xwe de diramiya, bi taybetî dema ku mesele dibû rêwîtiya Kurdistanê... Ew dizane ku Memê nervûz, ê ku hema wilo hêrs dibe, ne li ser hev e yan jî vê wek lîstikeke şêrîn dibîne ku pê hinekan biqeherîne dibe ku diya wî yan jî Dîno bi xwe be. Lê çîrok hindik hindik mezin bû û mal hemî bi xwe mijûl kir heta Hêlîna pêncsalî jî her ku Mem dixwest derkeve ew dihat û li ber wî radiwestiya û dipirsî: “Tê ji min re çi ji Kurdistanê werînî?”, Mem bi porê wê yê kinik digirt, pê şa dibû û digot: “Ezê ji te re guliyekî pir dirêj bînim xûşkê”, êdî Hêlîn dibişire û diranên ketî xuya dibin. Lê dema ku Dîno û bavê xwe li ser Mem diaxivin, ew tê û wî laşê xwe yê topikî davêje ser milê Hemdî û bi devekî şil dibêje: “Ezê bûka xwe jî pê re bişînim Kurdistanê”, Hemdî bi milê xwe wê dûr dixe û axaftina xwe li gel Dîno berdewam dike, lê keçik dîsa xwe davêje ser bavê xwe û dibêje: “Baba bûka min jî pê re bişîne”, bavê wê dilê wê xweş dike bêyî ku lê bizivire: “Ezê bişînim... De ka rûne”, dema ku Hêlîn nermiya wî dibîne, pêde diçe: “Baba min jî”, dîsa bavê wê, wê ji xwe dûr dike û dibêje: “Û te jî”, keçik dibêje: “Ezê jê re nan bipêjim”, bav dibêje: “Erê”, Hêlîn êdî wî dihejîne: “Baba tu jî bi me re were”, êdî bav pê de dixeyide û dibêje: “De ka dûrî milê min biçe... Te şikand.” Êdî keçik dixeyide û bi paş ve diçe, dilikume û bi ser qûna xwe de dikeve û dengê giriyê wê bilind dibe, bav li dora xwe bi bêsebrî dinêre: “Ma qey kesek tune vê dêwê ji me dûr bike?” Dêya li koşeyekî rûniştî bangî keça xwe dike, û bi delalî dibêjê: “Were rihê min were. Bavê te dêw e”, keçik jî xwe dikişkişîne bêyî ku rabe ser piyan, dema ku digihîje diya xwe xwe davêje hemêza wê û dibe îskeiska wê.

Piştî Hêvînê ku cigareya xwe qedand, ji hindir derket û ji dê û xwehên xwe yên ku li ber derîzankê rûniştine pirsî: “Ma radyo negihîşt?”, Hêlînê got: “Ew ne ji te re ye”, diya wê ew aram kir: “Ew ji te re ye û ne ji kesekî din re ye delala min”, û ewa pirbêj sekinî.

Herdu darên kafûrê yên mezin siyeke tîr davêtin ser textê Hemdî yê xewê ku li nîvê hewşê û dûrî textê mezin ê malbatê bû, ew textê ku bi nêrdewaneke çar pileyî hildikişiyane jorê, gelek çivîkan jî daneyên ku li dora wan çewalên genim belavbûyî didizîn, bêtirî pêncî çewal genim li ber dîwarê rojava yê hewşê rêzkirîbûn û mirîşkek cîranan ji xwe re li jora wan sekinî bû, mirîşkên mala Hemdî nebûn ji ber ku jinika malê digot: “Mirîşkên min” -mebesta wê keçikên wê bûn- besî min in. Bistanê kulîlkan yê Kesbo ku hevşiyekî ji qamîşan û hinek kevirên li ser hev li dorê bû, bûbû cihê vingevinga mêşên hingiv, ew vingeving her bilindtir dibû dema ku roja sibehê di ser banên xaniyan re bilindtir dibû. Ew bistan jî deh metr di du metran de bû û li bakurî hewşê diket û gul û şitlên kulîlkan ên curbecur têde hebûn, kulîlkên reng geş û vekirî, reng tarî, yek reng û pirreng jî hebûn ku Kesbo nedihişt kesek nêzîkî wan bibe çiku ew tenê ji bo mêşên wê bûn.

Sê kewarên Kesbo hebûn ku berî şeş zivistanan kirîbûn. Wê demê mêşên hindik ên di kewaran de demsala xwe ya sar lê dibuhurandin û li ser bermayê hinek hingiv dijîn. Buhara di pey wê zivistanê re hat, xwarziyê wê Comerd bi qazmeyekî parçeyek erda ku ne zêdetirî du metran di du metran de bû eşêf kir ku bike bistanekî kulîlkan. Bi havînê re kewarên wê bûne pênc, û ku dawiya havînê hat ew êdî bûbûn heft kewar.

Kesbo di zivistanan de kewarên xwe tijî xurme dikirin û ji bo ku hindir germ bimîne qulikên biçûk bi heriyê digirtin, tevî ku mêşên hingiv bi xwe wan qulikan bi şemayê digrin. Her roj ewê guhê xwe datanî ser kewaran û guhdariya

vingîniya hêdî a di hindir de dikir û dilê xwe dixist cih ku jiyan di wan kewaran de û di nav qaşilên xurmeyên wê yên şêrîn de bi giranî dixulxule.

Her havîn, êlên qewitandî ji mêşên hingiv mîna goşiyan bi şaxên darên kafûrê ve dadiliqiyan, Kesbo jî dihat kewarin nû dianîn û berê devê wan dida wan goşiyên mêşan û bi destê xwe yê bi cawekî stûr pêçayî ew kom bi kom dajotin wan malên stûnî yên nû. Pirê caran wan refên qewitandî di hewşa malê de mîna bahozan hêlan dikirin bêyî ku li ser şaxên darên kafûrê deynin, wateya wê jî ew bû ku dê biçin deverin dûr, radibû Kesbo û keçên xwe li binê beroşan dixistin û êdî ewan refan xwe li deng digirtin û dihatin hema li ku ba; çiqliyek ba yan jî darekî di erdê de çikiyayî ba kom dibûn û ji jina Hemdî re amade dibûn, êdî çavên wê bi tîrêjin nermik ji razîbûnê dibiriqîn.

Kesbo xanîkê mêşan piştî sê salan mestir kir. Çiku kewarên ku wê bi destê xwe ji axa sor î tev li kayê û mû çêdikirin gihiştin bîst û sêyan ku mîna pîramîdan li ser hev danîbûn. Jê re zor bû ku bi tena xwe hingivê wan kewaran derîne, sînga wê ji ber dûyê ku pê mêş diqewitandin derve diêşiya. Ewê rêxa sewalan î şil vêdixist ku dû tîrtir be, bi wî awayî wê dikaribû kewar hêdî vekirana bêyî ku ji pêvedanê û vingîniya bi hêrs bitirsiya. Xwarziyê wê Comerd bi rewşa xaltîka xwe û tengasiya wê ya ji ber mêşan hisiya, rabû gotê ku ewê kewaran bibe gundê Herem Reş û bi xwe guh li wan bike beramber beşekî ji hingiv, ewê jî pejirand.

Piştî ku sê zivistan di ser kirîna wan kewaran re derbas bûn, erbaneyeke textîn ku sibeheke sar du qantiran ew dikişandin hat û bîst û sê kewarên di çewalan de pêçayî birin gundê Herem Reş ê ku ne pir dûrî Qamişlo ye û ew mêş ketin bin çavdêriya ciwanê nû zewicî, xwediyê kirasê ku qayîşeke pehn li newqê gerandî û desmala ku tim li dora qirikê ye û bi ser milan de

berdayî ye, ewê ku napeyive illa ku çavê xwe yê rastê nîvgirtinê bigre mîna ku çavê xwe ji biriqandinekê diparêze.

Zivistana çaran para Kesbo ne hindik bû, lê ne mîna ku wê hêvî dikir bû jî. Wê çi gilî û gazin diyar nekirin ji ber ku Comerd xwarziyê wê bû. Lê zivistana pêncan, dema ku wê herdu qutiyên hingiv ên ku gihabûnê tehm kirin û çêja dimsa erzan û şekir têde dît ku zora tehma hingiv biribû, bû dawiya şirîkatiya xaltîk û xwarzê, êdî Kesbo tenê bîst û sê kewarên xwe vegerndin piştî ku wî ciwanî sonda giran xwaribû ku mêşên hingiv ên ku bombusên[1] wan hev diqewirandin, heta ber sînorên Tirkî diteriqîn û ewî nikaribû biketa pê wan. Kesbo di wê roja ku ew û keçikên xwe çav li rêya radyoyê bûn de -yanî havîna li pê zivistana şeşan ku têde mêşên xwe yên delalî vegerandin- çavên xwe ji wê koxika di koşeyekî hewşê de nebirrîn, ew koxika dev mezin î mîna malzarokeke ji heriyê û bi aramî bîst û sê awlemeyên stûnî[2] jêve xuya bûne, her yek ji wan bi çavekî ye ku şema li dorê ye, mêşên hingiv jî li pêş çavên Kesbo dikevinê û derdikevin mîna ku razîkirina wê dixwazin, ew jî razî dibe.

Dema ku Kesbo mêzekirina koxika mêşên hingiv û bistanê xwe yê kulîlkan qedand, nexzek da keça xwe ya herî nêzîkî xwe û destnîşanî mirîşka ku hilkişiyabû ser dîwêr kir: "Vê qehpikê kiş bike.", Rehîma ya çîmdirêj rabû hilkişiya ser çewalên genim ên li ser hev rêzkirî mîna nêrdewanan û qîriya: "Kişşş", mirîşk tirsiya û bostekê bilind bû û bi dengekî xeniqî daket, paşê firiya û bi giranî hate xwarê û dengê ketina wê li hêla din hate guhên Kesbo.

"Welat tuyê ji îro û pê de di berevkirina hingiv de alîkariya min bikî." Kesbo ji keça xwe ya şazdehavînî re got û lê mêze kir, ew di nav wan xwehên xwe de bû ku nexuyabû ew jê didexisin. Keçika bi desmala ji ser porê wê yê xernûbî û pêlpêlî şemitiye

1. Şamêşên mêşan. (J. Dost)
2. Bîst û sê embrioyên di forma stûnan de. (J. Dost)

û ya şermoktir di nav xwehên xwe de ji ber sihra wê macerayê bişirî. Kesbo gotinin dilgermker jî tev li axaftina xwe kirin û got: "tuyê bibînî. Berhevkirina hingiv mîna neqişandinê ye, tiştê herî xweş têde ku tu şaneyan neşikînî", û da ku wê bêtir bihêvoje pêde çû: "Ezê lepikekî çerm ji te re bikirim. Mêşên hingiv dê nikaribin bi te vedin." Hêlîna pirrbêj wek her carê xwe avête nav axaftinê: "Yadê ejî lepikekî dixwazim.", Kesbo bêyî ku wê biêşîne ew hemêz kir: "Erê rihê min, ezê gemekê jî ji devê te yê biçûk re bikirim", keçika biçûk xwe filitand û bi serê diya xwe yê biçûk lîst, desmala Mûsilê ya sor ji ser porê wê yê wek du guliyan hûnayî û di navbera wan de ferqeke rast e şemitî.

Bêhna hingiv bi zêdebûna deverên ku rojê tava xwe davête ser li hewşê zêde dibû, ew bîneke xurt û mezeloqî bû, bi lingin nedîtîbû ku pê bi beştan ve, bi textên xewê ve, bi pelên darên kafûrê ve, bi kevirên bîra nêzîkî derî ve, bi dewla mezin ve û bi qurmên kulîlkan ve jî hildiperikî û mîna sîsirkan xwe çeng dikire hindirê odeyan û dikete nav lihêfên tewandî û rûyên balîfên ku bi wêneyên piling û quling û tawûs û şûrên lihevketî û gulên rengareng neqişandî jî. Kesbo dikaribû di nava wê bînê de bilind bifire û ji jor de karûbarên malê idare bike. Lê wê jî hikmeta ku dê Hemdî kurê xwe Mem bişîne Kurdistanê fêm nedikir, Kurdistana ku ji Kesbo re cihekî nenas û ne zelal bû, Kurdistana ku ew ne cih e û her cih e jî li gor ku Hemdî destnîşanî wê dike di nexşeyeka sala 1946an de, ku peyrewên Qadî Mihemedê serokê komara hezar bahozî Mehabada Kurdî ew kişandibûn.

"Wê Mem li Kurdistanê çi bike Hemdî?", jinik ji mêrê xwe dipirse piştî ku li rûyê wî mêze dike, Hemdî bersivê weha dide:

- Binêrê diya zarokan, hûn van rojan pirsên xwe zêde dikin, lê ez ji we hemiyan re rastiyê dibêjim ku, kêfa min ji vê meselê re nayê.

Kesbo dîsa pirsa xwe ya daliqandî bi ahengeke ku lav û hêvî têde, dike: "Hemdî..ne di taxa me de ne jî di taxên dûr de kesek heye ku kurê xwe şandiye Kurdistanê..", mêrê wê peyva wê dibirre:

- Tu nizanî..tu nizanî.

"Ez çi nizanim Hemdî?", jinik dîsa ji mêrikê xwe dipirse, êdî Hemdî enîşka xwe datîne ser palgehê, rûyê xwe bi alî koşeyekî ji koşeyên malê de bilind dike û difikire:

Jinê tuyê bibînî.

Kesbo li bendê dimîne ku mêrik jê re şirove bike ka ewê çi bibîne, ji xwe re cigareyekê sor dike û dû berdide, serî di ber de dibêje:

- Hemdî ma ka wê kî li wir hay jê hebe?

Hemdî bersiva wê weha dide: "Ewê bi xwe hay ji xwe hebe Kesbo. Her kesekî li Kurdistanê bi xwe hay ji xwe heye. Wê kurê te bibe tiştek. Ez vê di topika pozê wî de dibînim." Radiweste da ku malikek helbesteke Kurdiya Latînî ku berî çend rojan jiber kiribû bîne bîra xwe, Qadir Hemoyê ku wêneyê Simko tim di berîka wî de ye, zor dabû xwe ku Hemdî û mêvanên şevbuhêrkên wî bi dizî fêrî wê helbestê bike. Zimanê Kurdî qedexe ye. Remo Kirîv jî di zindana Hesekê de ye ji ber ku pirtûkin Kurdî pê re hatibûn dîtin û cîranê wî yê Suryanî, endamê partiya ku welêt birêvedibe gelaciya wî kiribû. Dewlet zindaniyên Kurd yên siyasî ku bi bergumaniya niyetên xerab girtîne ji Qamişlo dibe Hesekê dûrî hêrêmên sînor ku nearam bûn û cihên gumanê bûn tevî ku koçerên Ereb anînê jî û rê ji beşekî mezin ji Suryanan re vekirin ku rewşa wan zêde xweş bibe û tevgera Kurdan û xeyrî Kurdan bipên û azadiya -ku mîna giyayê ji herkesî re hebû- ji ber kesên bi xirecir û nakokî biparêzin.

Kesboyê -ya ku zarokên wê li dorê bûn û wan jî bendewariya radyoya bavê xwe li ber derîzankê dikirin- mêşeke bêcirr ji ser

rûyê Hêlînê dûr xist, ewê xwest ku mereqa xwe ya dengnizm jî ku ev pirs e: “Kanî Mem?” jî bi eynî şêweyê dûrxistina mêşê, dûrî xwe bixe. Ewê ew pirs gelekî ji xwe nekir, çiku wêneyê mêrê wê Hemdî bêtir dihate ber çavên wê ku çawa bi haydarî tiştin pêçayî tîne malê û tev li tiştin din dike ku li odeya mêvanan di tûran de vedişêre: “Dibe ku Mem bi hacetî wan bibe Kesbo”, ew ji jina xwe re dibêje, jinik jî serê xwe bêyî ku bawer bike dihejîne: “Û kî dê wan hilgire Hemdî?, mêrê wê çav dikê: “Xeman nexwe jinê. Emê çareser bikin.” Lê Kesbo her bawer nake, tiştê ku gumanên wê zêde dike ew e ku Hemdî bê hedan gelek parçeyên qumaş tîne, êdî jê dipirse: “Ev ji bo kê ne mêrik? Ma qey ewên li Kurdistanê tazî ne?”, dilê mêrik pê dişewite, lê dinêre û dibêje: “Ne pêwist e ku mirov tazî be heta ku bi hewceyî qumaşên zêde be jinê.”

Bêhemdî xwe Kesbo tiliyên xwe da pêşmalka xwe ya qesebkirî, paşê awirên wê jî çûn alî tiliyên wê û li wan xetên bilind yên di ber hev re li dora gulên zîvîn temaşe kir. Ku ewê awirên xwe bilind kirin û li hewşa malê nêrî dît bê çawa qumaş mîna maran ji deriyê odeya mêvanan dixuşe û di ser zixurên hewşê re dişemite û berî dide herdu darên kafûrê û pêve hildiperike û li qurmên wan digere, paşê ew cawê bi kulîlk û xêzik û diranok û sêkoşe û neqş û çarkoşeyên di rêzê de û xelek û rengên tekane her tiştekî li hewşê dipêçe heta bi textên xewê yên mezin û nêrdewanan û dîwaran û dîwarên odeyan û derdora bîrê û kewarên mêşan jî. Dema caw êdî nêzîkî bistanê Kesbo bû, ew qîriya: “Na, na” keçikên wê li cihê ku diya wan lê dinêrî nihêrîn û pirsîn: “Çi li wir heye?”, mîna ku wan diya xwe ji xewê rakiribin, êdî nema diya wan çi caw û qumaş dîtin, pêşiyê bişirî paşê bi xwe hisiya û keça xwe Hêvîna biçûk hemêz kir û dîsa wek bi henekan got: “Na, na” mîna ku dengê wê yê berî kêlîkekê temamiya dengê wê bû dema ku bi keça xwe şa dibû, keçên wê vegeriyan axaftinên xwe yên qeto qeto, tenê

Hêvîn berê xwe da hindir û cigareyek di mista destê wê de veşartîbû.

Hemdî pîvana cawê xwe qedand neqedand heta du polîsên rûsert derbas bûn û silav li wî û sê kesên din li kursiyên dûr hev li ber maseya Hemdî rûniştî dan, ewî ew vexwendinrûniştinê û li dora xwe mêze kir ku tiştekî ji bo rûniştinê peyda bike, wê demê du heb mêvanên wî rabûn û cihên xwe keremî polîsan kirin û ew bi xwe jî çûn li ser sekoyekî textîn di bin refikan de rûniştin. Dema her yek li cihê xwe rûnişt û nigek avêt ser nigekî, di gel peyvên pirsîna hal û deman, kurikê qehwexaneyê derbas bû û peyalên berê ên vala berev kirin. Hemdî du qedehên din wesandin, kurik derket û qayîşa wî ya lastîk a ku dihejiya û sê bostan ji nava wî ya ziravik derbas bûbû berî wî derket.

Diyar bû ku herdu neferan dixwestin tiştekî ji Hemdî re ragihînin lê ji ber ku ew sê mirov li wir bûn bêdeng man. Hemdî jî ev yek ji awirên wan û vexwarina wan a çayê bêyî ku li peyalên xwe binêrin nas kir. Xuyabû ku wan sê mêvanên Hemdî bala xwe nedane wateya wê bêdengiya ku tenê kuxtekuxtan û pêşkêşkirina cigareyan ew dibirrî, loma jî Hemdî xwest barê herdu neferan sivik bike û got: “Ev mîna birayên min in” û lê zêde kir: “Sir di nav me de nînin”, êdî wan fêm kir ku dikarin biaxivin.

“Birêz Hemdî...” ewan herdu mirovên di cilên xwe yên fermî yên kakiyê xwêdangirtî de bi hev re gotin û tavilê tê derxistin ku bi yek dengî dipeyivin rabû yekî ji yê din re rê vekir ku ew temam bike, ewî neferê zeîf, ê ku kumê xwe li ser tilîkekek xwe dizivirand û peyala çayê bi destê din digirt, got:

- Barê te yê ku do bi şev di rê de bû, niha li qereqolê ye.

Hemdî simêlên xwe bi aramî misdan û bi çavên fireh ên wan neferan de nihêrî, bi bişirandin pirsî: “Ma ew dizanin ku mal ê kê ye?”, herdu polîs jî bişirîn û serê xwe bi qerf hejandin, yê zeîf got:

- Herseŷan herfek jî negotin.

"Herseŷan?", Hemdî pirsî û bişirîna wî ji devê wî vekişiya, yê zeîf bi giraniyeke çêkirî got:

- Birêz Hemdî, mebesta me herdu qantir û ker e.

Pixînî bi Hemdî û hersê mêvanên wî ket, paşê hemdî vegeriya hin pirsên ku bala wî dikişandin: "Kes negirtin... yanî...", polîsê zeîf dilê wî xiste cih: "Na kes negirtin" û pêde çû rewş şirove kir mîna ku xwe ji meselê bêrî dike: "Ev cara yekem e ku digrin ser rêya di navbera baxçeyê giştî û girê firokxaneyê", û qedeha çayê danî ser maseyê piştî ku nîvrabûnekê rabû û weha pêde çû: "Mesele ne tesaduf e. Çavê dewriyeyan li rêl û daristanên nêzîkî sînor û rêyên bakur û rojava ye, lê rêya giştî…!!" û rawestiya û destên xwe vegirtin mîna yekî ku fatiheyê dixwîne, û dîsa pêde çû: "Rêya giştî a ku bajêr digihîne firokxaneyê, firokxaneyê jî digihîne dewletê û dewletê digihîne Xwedê..!!", û li hevalê xwe zivirî mîna ku xwe davêje bextê wî da ku şiroveyekê ji wê girtina ser rê re bibîne ku hîç nedihate ser bala kesekî li qereqolê, lê dît ew jî matmayî ye û bi çavên Hemdî de dinêre.

Hemdî ne bi hewce bû ji wan bipirse ka çawa wan naskiriye bê ew barê caw yê wî ye, çiku ew jî mîna wî dizanin ku mal tenê di wê rêya li ber çavê her kesî de ji Hemdî re tê, Hemdî jî bi firoşkarên caw re wisa li hev kiribû tevî ku ewan dîtibûn ku ne qenc e qantiran bi şev berdin ser rêya asfaltê, û di kîjan rêyê re? Di rêya her kesî, her siwar û her peyayî re. Hemdî bi rik bû ku qumaş li qantiran ne li erebaneyan bar bike tevî ku ewan jê re şirove kiribûn ku qantir baş in ji bo çûna di rêyên axê re ji alî gundê Hilêliyê yan deviyên li rex sînorê Tirkî heta taxên hemsînorên bajêr. Û ji ber ku malê wî dê di rêya asfaltî re biçe, otomobîl bêtir balê nakişîne. Lê hemî hewldanên bi Hemdî re hîç bûn. Û bi wî awayî qantir bêyî ku wek cara dawiyê ker bi wan re be, mîna kevanekî meşiyan, ji gundên li ber sînor heta

başûr û paşê jî di nav zadan re heta rêya giştî hatin û di nav rêyên teng re ku çirayên melûl li dorê ne, û dawiyê jî li ber dergehê mala Hemdî rawestiyan, di cî de wan herdu rêberan, ên ku cara dawiyê kerek jî anîbûn û bar hiştibûn û reviyabûn, barê ku top û buxçeyên tijî caw bûn ji ser pişta qantiran danîbûn, paşê jî sakoyên xwe ji xwe kiribûn û hibriyên Mûsilê yên hevirmêşî ku mirov dikare du metran jê di qutîkeke kibrîtê de veşêre, li newqên xwe gerandibûn vekirin.

Hersê mêvanên Hemdî rabûn û lêborînek li ser rûyê wan bû, ewî çaya sar î di binê peyalê de mayî vexwar û henek bi wan kir: "Minê bi her halî ev bar bi xêra xwe daba qereqolê", û li herdu polîsan nêrî û got: "Bi qurbana we be ew bar" û pirsî: "Ma hûn çayek din venaxun?", herdu ji ser kursiyên xwe rabûn bi wateya ku ewan têra xwe çayê vexwarine û êdî nema dimînin piştî ku xebera ku divabû bidinê danê, madam ku cilên jin û zarokên wan ji xêra qantirên Hemdî ne. Her pênc -hersê mêvan û ew herdu polis- ji cem Hemdî bi aramî rabûn bêyî ku xemxuriyeke zêde diyar bikin, çiku gelek rêyên axê li bakur hene, berriyên bêdawî hene, û rêyên emîn di nav têlên sînor de jî hene, rêberên ku dikarin rojekê bajaran jî li pişta qantiran bikin û ji cihekî bibin cihekî din jî hene.

Dîno bi wê radyoya di bin çengê xwe de ji nav peyarêya bi dar a di nîvê kolanê de derket û xwe avête aliyê din li kêleka kolanê ku peyarêyek di ber sûrê baxçeyê giştî hebû, ew çend gavan nemeşiya dengek bihîst, dengekî nerm ku navê wî bilind dikir û tev li orîniya motorê otombîlekê bû, Dîno zivirî û dît va ye Corc Qiryaqosê yekçavî serê xwe û destê xwe yê rastê di pencereya otombîlê re derxistiye û jê re dihejîne, ewî tenê dixwest balê bikişîne ser xwe.

Corc xortekî bi çend salan ji Dîno mestir e, çavekî xwe danîbû ser devê lûla çifteke nêçîrê 9mm û birayê wî yê biçûk bi şaşî pê li tetikê kiribû, êdî aveke reş û xwîn bi her alî de bela

bûbû. Ew birin û çermê li dora tasa çav dirûtin, û êdî qelşek biçûk di çerm de li şûna çavê wî yê rijiyayî xuya dibû. Piştî çend mehan duktorekî jêhatî çavekî cam di wê qelşa sor de çand, lê ew ji çavê rihet gelekî mestir bû û beloq bû û palikên wê qurç nedibûn, lê bi her halî ew ji wê kortika şeytanî a tasika çavê rijiayî çêtir bû.

Teksiyê ku gelekî hindik bûn û nû derbasî bajêr bûbûn, êdî li navendê û herdu kolanên sereke ên ku wê navendê digihînin taxên rojhilat û rojava, dihatin dîtin. Ew pêşî di navbera rawestgeha teksiyan û mîraya genim de, ku pîramîdên genim û ceh li hêviya barkirina bi tirênê bûn, diçûn û dihatin. Jixwe tenê tacirên genim û ceh û simsaran ew teksî bikardianîn û li wan siwar dibûn. Lê dema ku teksiyan êdî xizmeta xelkê din jî kirin, Corc Qiryaqus jî bû muşteriyekî çalak ê tembeliyê. Ewî dema ku bi dilgermî destê xwe ji Dîno re hejand, ne ji ber hevaltiyê wa dikir, lê tenê wî dixwest ku bibêje va ew li wir e, li pişt pencereya ku wî dikaribû cama wê bilind bike û daxîne û li ser rûniştgeheke çerm î ku di bin de dike zîqezîq her ku cawê pantelonê wî pê dibe rûniştiye û ewî çavê xwe yê rihet ji ber bayê germ î ku ji buhurîna teksiyê peyda dibe nîvgirtinê girtiye, çavê din ê ku gulleyek cam bû her bi sertî temaşe dikir mîna ku di qulikeke di nav bayê de bi dizî li Xwedê temaşe dike.

Dîno hîn li teksiyan siwar nehatibû, ew teksiyên ku gelek kes têde li rex hev rûniştîne û cigareyan dikişînin, yên qelew tên û yên zeîf dihêrin. Jixwe teksiyan bala wî nedikişandin çiku ew kurê bajarekî bû ku niştecihên xwe bi peyatî diçûn û dihatin, berê erebeyên ku hespên delalî ew dikişandin hebûn, ew li ser asfaltê bi teqteqa tekerên xwe ya xweş dimeşiyan û rêxa li pey wan nîşana buhurîna wan bû.

Memûr û karmend û hin neferên polîsan bi piskilêt bûn, pir kêm kes hebûn, bi taybetî bazirgan bûn, ku jîp yan pîkabên wan hebûn. Xelkên mayî mecbûrî bikaranîna muskilên xwe

bûn. Lê Dîno fêrî ajotina pîkaba xalê Şemso bûbû, ew bes bû ku Şêro Babanê xwediyê patozan ê bêsiûd wî bike şofêrê mûsimê, lê nîv mûsim derbas bû û Dîno hîn neçûbû ser karê xwe ji ber ku patoza Şêro xerabe bû bêyî ku çewalekî jî biçine ku Dîno bi pîkabê wî çewalî ji nav zadan bibe enbarên servekirî.

Berî ku Dîno sûrê baxçeyê giştî derbas bike çend zarok dîtin ku pêve hildiperikin û baz didin, li pişt wan jî dengê ketî yê pasvanê baxçe parçe parçe dibe. Ew baxçe cihekî aram e ji bo kişandina cigareyan û dûrî çavên mereqdaran e. Lê Dîno û hinek hevalên xwe ew ji xwe re kiribûn cihê xwendina bi dengê bilind ya berî imtihanan û bi hezarê caran di peyarêyên bi sî de diçûn û dihatin. Dema herî dirêj ku wî li baxçeyê giştî qedandibû, ew havîna ku têde radyoya bavê xwe ber bi malê ve dibir bû, çiku divabû ew xwe çil rojî ji bo imtihanên lîseyê amade bike, ewî desmaleke spî avêtibû serê xwe daku xwe ji ezmanê sincirî biparêze.

Bi her halî, ew sala dawî bû ku Dîno dixwîne. Kaxezên ku pê karibe bikeve zanîngehekê nebûn. Ew salek e hema bibêje vêketîbû ji ber ku hevalên partiya tekane ya desthilatdarî û azadiyê, li paytexê, li dijî hev qulibîn û êdî mamosteyê hizbî[3] û xwendevanên Ereb ên koçer ên ixbarcî ku li dibistana Dîno lê dixwend bûn ketin hev û lebikîn. Dema ku nû xeber belav bû hizbî kom bûn ku protestoyan bikin: "Bimrin yên derbe li dar xistine." Û bûne xelekên ji hev cuda û bi qêrîn digotin "Bijî heval filan... Bimre heval bêvan." Komek ji wan çûne qereqola ku berpirsyarên wê milên xwe dihejandin anku em tiştekî nizanin û fehm nakin. Ew qereqol bi her halî ne warê ku kesên hizbî protestoyan li dijî kesên din ên hizbî bikin bû. Ne xema polîsan e madam ku her tişt wek xwe ye. Çend seet neçûn muxaberatan xwe avêtin navê, ku ewan tenê dikaribûn bibin

3. Hizbî: Yanî endamê partiyê, lê li Sûrî tenê ev nasnavê endamên partiya BAASê bû. (J. Dost)

jêderekî qenc ji bo aramkirinê, daku meselê şirove bikin. Yekî hûrik î ku bişkokên gumlekê xwe heta qirika bê qerafêt digre û demançeyek di bin qutikê wî yê kinik de diyar dibe ku bi ser kulêmekên wî yên girover de hatiye berdan, simêlên wî li herdu koşeyên devê wî dawerivîne jêr, ewî li koma kesên li ber dergehê dibistanê rawestiyayî nihêrî paşê awirên xwe dagerandin kesin ku li himber wan li ber dîwarê pêşberî dergehê dibistanê rawestiyane, ewî kire birebir û bi gavin lezok û bixwebawer çû korîdora ku odeya mudûrê dibistanê têde ye, kêlîkek neçû heta vegeriya û mudûrê ku xwendevan hemî di hewşa dibistanê de kom kiribûn li gel wî ye, li wê hewşê du stûnên çemento li himber hev bûn ku li serê her stûnekî textekî çarkoşe û xelekek hesinî ku toreke kovikî pêve ye, ji jor de fireh û ji jêr de teng e daku gog têre derbas bibin di wê lîstika ku nav lê dikin basketball.

Mudûrê dibistanê li himberî koma xwendevanên ku qerebalixa wan hîn neqediyabû sekinî, destê xwe bilind kir û bi kuxtekuxtek got: “Guhdar bin... Ji kerema xwe”, dengek ji cihekî nenas hat: “Biruxe xiyanet”, zilamê muxaberatan bi awayekî hêrsane hejiya û li ser serê tiliyên nigê xwe rawestiya û bi awirin lêkolîner ji du çavên ku ji ber tirseke daimî kort bûbûn nihêrî û qîriya: “Kî ye evê bêedeb? Kî ye... Kî ye?” û dîsa xwe da ser pehniyên lingên xwe û li rûyê mudûr yê ku du bostan bi ser diket nihêrî û serê xwe hejand bi emîniya kesê ku rola xwe qenc lîstibe, û got: “Berdewam bike... Berdewam bike.” Mudûrê ku li diriyên li ser sûrê dibistanê û ne li rûyên xwendevanan dinêrî, berdewam kir û got: “Hevalan ev qasid bo we şandine.” û stûyê xwe ber wî mirovê hûrik de xwar kir. Ewî jî serê xwe mîna ku gotina mudûr piştrast bike hejand, û mudûr berdewam kir: “Heval dibêjin ku xirecira we ne di cih de ye. Di rejîmê de kêmasî hebûn, di dewletê de qusûr hebû, lê her tişt ê were serrastkirin. Mesele qediyaye.” Û dîsa stûyê xwe

ber bi mirovê hûrik de xwar kir, ewî jî destê xwe ji xweber dirêjî mudûr kir û dest dane hev.

Kêlîkek bêdengî kete navberê, mirovê hûrik dîsa li ser tiliyan sekinî mîna ku rûyên dûr û nêzîk dixwîne, pişt re zivirî û hema çû û mudûr bi lez kete pey wî û bang kirê: "Heval...", dema mirovê di gumlekê xwe de winda zivirî, mudûr destê wî yê rastê girte nav destê xwe û bi ser de xwar bû û kire pistepist ku hişt ewê hûrik kenekî zivir bike.

Ne pêwist e mudûr çi got ku hişt ew mirovê hûrik ê bi devoka çolistana Sûrî diaxivî bikene, çiku piştî hilkişîna grûba hizbî ya devliken di nav teqeteqa hestiyên ku jidestçûna desthilatê ew şikandin berî ku qundaxên tivingan wan bişikîne, tijî ken bû li dibistanê. Mudûr êdî pêkenok li ser "grûba berê" digotin berî ku xwendevan derbasî klasên xwe bibin, mamosteyên ku berê dihatin û rojnameyên partiyê di bin çengên wan de bûn, dîsa li gel wan rojnameyên ku navên wan eynî yên berê bûn dihatin, lê manşet ne yên berê bûn, ew êdî derbarê "Harbûnên duh" û "Serdestî" û "Qerf pêkirina sloganan" de bûn, mamoste êdî bêtir nêzîkî hev dibûn dibişirîn dikeniyan û nema yekî kîna yê din hilanî. Tenê xwendevanên ixbarcî ketin cirîda veguhestina xeberan a li dijî hev, û weha xwendevanên ne hizbî ji bo demeke kin ji wan rihet bûn. Paşê dîsa rewş vegeriya wek berê û bi lez ew rûyên berê bê kêmanî di hewşa dibistanê û bayê wê de hatin dîtin lê vê carê bêtir hay ji xwe hebûn û ji her kesî bi guman bûn.

Dîno di ber sûrê baxçeyê giştî re diçû û radyoya bavê di bin çengê wî de bû bêyî ku xwe bi pêşeroja xwendina xwe mijûl bike, çiku her pêşerojeke xwendinê dê bêguman eynî serencaman werîne ku bi hesabekî adilane belav dibin wek formên xwendevanên ixbarcî û bayekî bêalî û mudûrên mîna mudûrên hebsan û mamosteyên ku her yek xwe dide pêş daku ji bo gotûbêjkirina karûbarên partiyê heta piştî nîvro jî bimîne.

Berî ku Dîno sûr derbas bike radyo li kenarê sûr ê nizmik û pehn danî û bi qevdika xwe xwêdana li ser eniya xwe damaland, paşê du bişkokên gumlekê xwe vekirin û pifî sînga xwe ya tazî kir ku hênik bike. Bêhemdî xwe pozê xwe nêzîkî binçengê xwe yê çepê kir û ew bîn kir, kenekî ku di navbera ezmanê devê wî û gewriya wî de ma kir, çiku ew fikirî ku bîna serdînan jê tê, û kire birebir: "Mem....", ewî di navbera xwe û xwe de hewl da ku nehêle birayê wî pêkenokeke ku tim digot bibêje. Dîno naxwaze ew pêkenok li ser Şêro Babanê bêsiûd be, ku Mem iddia dike ewî xwarinek ji sêsed û çil qutîkên serdînan çêkiribû.

Sêsed û çel qutîk serdîn?!! Çima Mem xwest bi vî awayî henekê xwe bi Şêro Baban bike? Dîno ji xwe dipirse. Ew birayê xwe Mem tenê mîna darkolek yan jî mîna Silêmanê dunikil dibîne ku nikilekî li erdê dide û eger serê xwe radike nikilekî li bayê dide. Lê Mem dibêje: "Du nikil çêtir in ji ne tiştekî" û ji Dîno re dibêje: "Tu ji lingên wê mestir nabînî bêhişo. Tu nizanî çi ye yanî ku nigên keçikekê mezin bin." Dîno her digot ku ew cîrana xwe a ku Mem nav lê dike xwediya sola leşkerî naecibîne, çavên wê hûrik û mêşinî ne, porê wê xernûbî û xelekî û dengê wê mîna pifkirinê ji nav diranên wê yên kinik derdikeve.

"Rûyê wê ziravik û xemgîn e.", Dîno ji Mem re dibêje, Mem lê vedigerîne: "Tu dikarî soleke wek ya wê bibînî, lê tu nikarî lingê keçekê bibînî ku ew sol lê were.", divabû Dîno ji birayê xwe bipirse bê ew çi sihrê di lingên keçekê de dibîne ku tenê dikare solên stûdirêj yên mêran li xwe ke. Mem wî dihêvoje: "Tu ji ber xwe ve nas bike bêhişo."

Her tiştê xwediya sola leşkerî eşkere ye, Dîno jî ne bi hewceyî keşifkirinê ye. Keçik pantelonan li xwe dike, ew jî tiştekî balkêş e li wê taxa wan heta di nav Aşûrî û Suryanan de. Bavê wê bi Kurdî diaxive lê ne Kurd e, zaravayê wî yê Erebî nêzîkî zaravayê Misriyan e. Diya wê ji zû de miribû û bavî jineke din neanîbû.

Birayên wê yên xort hene ku di bûroyên emlakan de karmend bûn yan jî çavdêrên karkerên kolanan bûn, ew jî keça tekane ye di nav wan de. Tevî ku bavê wê zêde naşidîne jî lê ew diçe û tê ba Hêvîna xweha herdu cêwiyan da ku ji xwe re cigareyan bi dizî bikişînin, ew di sala duyem a lîseyê de û hêviya wê ew e ku biçe li Yekîtiya Sovyetê "Kristalografyayê" bixwîne. Ev peyva bi vizînî jî, yanî "Krîstalografya" mîna mêşekê di ber guhê Hêvînê û herdu birayên wê de hêlan dike.

Bi çi awayî be, xwediya sola leşkerî biryar dabû ku piştî qedandina lîseyê berê xwe bide wî welatê ku li hin herêmên wî şeş mehan roj dernakeve, hema ji wê salê de dest bi ristina goreyan û lepik û kenzeyên rîs û şalên dirêj ên ku ew dikare sê caran li dora stûyê xwe yê xûz bigerîne kir. Ewê ji bîr nekir ku rengê serdest di nav wan gogên de rîs rengê sor e, û bişkok jî pehn û sor in û heta berbiskên wê jî. Ewê tûrikin ji hinneya sor peyda kirin û biryar da ku hinnê di bin ezmanê enternasyonalizmê de bikar bîne. Paşê ewê ev hemû di çenteyekî taybet de parastin û du gogên neftelîna spî jî avêtin nav û sond xwar ku destê xwe nede wan.

Lê dîsa jî ewê kumek ji nav başqe kiribû, kumekî ku ne wê çêkiribû lê diyariya cîranekî wan î Ermen bû ku jê xwestibû ew wî bîne bîra xwe dema ku di ser ezmanê Ermenistanê re bifire. Ewê ew kumê ji mûyê bizinan her ku ewrek di ser banê mala wan re diçû li xwe dikir, eger Hêvînê bigotayê ku dem ne ya lixwekirina kuman e, ewê digot ku ew xwe fêrî lixwekirinê dike, çiku lixwekirina kumekî bêyî ku mirov fêr bûbe serêşê tîne, ew jî naxwaze serê wê li welatê Bolşevîkan biêşe ku zelaliya krîstalan û zanista krîstalan şêlû bike.

Her tiştê keçika xwediya sola leşkerî eşkere ye, ji kûraniya hinavên wê heta çavên wê yên sist, Dîno jî dikaribû guhê xwe bigre û hewldanên ne tekûz ên birayê xwe ku sihreke cîrana wan heye nebihîze, vê yekê bi xwe jî Mem gelekî aciz dikir, êdî

digot: “Minasibî wê ye ku ew motorsîkilekî bajo. Ma tu jî wisa nabînî Dîno?”, lê Dîno bersivê nade. Memê ku dawiyeke weha ji gotûbêja xwe re naxwaze, bang li keçikê dike dema dibîne ku ew û Hêvînê li ser keviya textekî ji textên hewşê rûniştine: “Hêêê... Ma tu ji motorsîklan hez nakî?”, êdî keçika milê xwe ji ber wê pirsa ji nişkêve hildide û dixumxumîne: “Niza. Dibe ku. Ez..”, Mem peyva wê dibirre: “Ez ji birayê xwe re şirove dikim ku mumkin e tu rojekê bi şofêrekî motorsîkilan re bizewicî.”, keçik dikene û bi şermeke sivik bersivê dide: “Ma çima na?”, lê Mem hîn jî bela xwe tê dide û jê dipirse: “Çima bavê te motorsîkilekê ji te re nakire?”, a wê çaxê keçik awirên xwe ber bi Dîno ve radike, mîna ku xwe davêje bextê wî ji ber wan pirsên nediyar û dîsa dike xumxum: “Ma qey tuyê dikaneke tamîrkirina motorsîkilan vekî?”

Dîno dîsa dikeniya, di wê sekinandina xwe ya li ber sûrê baxçeyê giştî dema ku pif dikire sînga xwe û zikê xwe di nav bişkokên vekirî yên gumlekê wî yê xwêdangirtî de. Erê. Hêja ye ku Mem dikaneke tamîrkirina motorsîkilan veke, lê ji ber planên lezgîn yên bavê wî dem têra wî nake: ew e ramana ku di serê Dîno de diqilqile. Û heta ku bibe dema rêwîtiya cêwiyê wî, bi şêweyekî ku hîn Hemdî ji kesî re rave nekiriye, wê dem ji bihevşabûnên din re jî hebe ku Mem xwediya sola leşkerî jî tev lê bike: “Ewê were hewara min.” Wî her ku çav lê diket ji Dîno re digot, Dîno lê vedigerand: “Tu her bi hewceyî alîkariyê yî.” Çîrok ew e ku Mem ji xwe re henekan derbarî çûna xwe nêzîk dike, ew fersendekê dide xwediya sola leşkerî da ku restore bike wê qedera wî ya riziyayî hingî ku bavê wî û mêvanên xwe di nav xwe de bibin û bînin. “Ewê, ji Meydana Sor heta bi Kurdistanê were hewara min.” Mem dibêje, lê eger bavê wî bibihîsta dê mesele henek nehesibandiba, çiku ew bawer e ku Sovyet deyndarê Kurdan in ku komareke Mehabadê yî din ava bikin piştî ku Stalîn pişta xwe da Mehabada yekem.

“Me hesp didane Artêşa Sor” Hemdî ê ji xwe re yan ji mêvanên xwe re yên ku ew jî mîna wî bûyerên serdema zêrîn a Kurdistanê sala 1946an dizanin, bibêje. Erê. Ebdellayêfê ku Rûsê tekane bû li Mehabadê, serkirdetiya karûbarên bidestxistina hespan ji ba êlên Kurdan û ji bo nuqteyên Artêşa Sor yên li Tebrîzê dikir, her weha ji karên wî bû ku têkiliyê di navbera wan êlan û artêşa Soveytî de li dar bixe. Ew artêşa ku li gel artêşa Ingilîzan li Îranê belav bûbû da ku alayên xwe yên ku di eniya Qefqasyayê de bi şûn de dihatin biparêze. Ewan herdu artêşan erd parvekiribûn, Ingilîzan ji Kirmanşah heta Sine û Sovyetan jî Mehabad û hin deverên din xistin bin baskên xwe. Li Mehabadê Kurdan heybeta xwe vegerandin piştî ku artêşa Sovyetî azadî bi ser wan de rijand da ku ajanên Almanan wan bi alî xwe de nebin û bi wî awayî serekên ku Riza Şah ew sirgûn kiribûn vegeriyan, artêşa Îranî jî ber bi başûrê welêt ve direviya û li pey xwe extreme û çek dihiştin ku tavilê diketin destê “Gurên çiyê” her wekî ku nav li Kurdan dikirin.

“Bavo ma deynê me yê di sikura Rûsan de wisa mezin e ku me revoyek hesp dabe wan?” Dîno pirsekê ji xwe dike ku nagihê bavê wî. Lê mesele ne meseleya hespan bû ku dibe gotûbêjeke hêdî di navbera Hemdî Azad û kurê wî de çêbike. Tiştê ku mirov jê piştrast e ew e ku Qadî Mihemed di 22ê kanûna duyem sala 1946an de, di axaftineke ku tenê ribek saetê dirêjkir de komareke Kurdî ragihand, “Komareke hêjayî milletekî ye ku ew jî mîna her milletî dikare çarenûsa xwe bi destê xwe saz bike.” Paşê xeftanê xwe yê dirêj ji xwe kir û di bin de taximekî leşkerî xuyabû ku li gor modela Sovyetî jê re li Tebrîzê fesilandibûn. Tê gotin ku Qadî Mihemed hat ku kumekî leşkerî jî bide serê xwe lê şîretkaran gotine ku şaşika spî bêtir layiqî alimekî oldar e.

Ew rojeke tavdar î germ bû di nîvê zivistanê de li bilindiya çarhezar û pêncsed metrî ji rûyê deryayê, weke ku berfa di roja

din de bi qerpalan bariya, xwestibû piştgiriya wî qadiyê rêzdar bike û barîna xwe dereng bixîne. Gelek şalûlan ji serê sibê de dilezandin ku daneyan berev bikin, ewan xwe ji rojeke bi ba û bahoz re amade dikir lê texmîna wan badihewa çû.

Li Mehabada ku malên wê yên kevirî di ser çemê Sablax re ne, gelek kes kombûbûn û bi alên rengîn berê xwe dabûna meyda Çarçirayê, ji wir jî şandeyek ji wan çûbûn mala Qadî Mihemed a ji qermîdê û ew bi xwe re anîbûn, ew jî hilkişiyabû ser sekoyekî li koşeyekî meydanê û ew axaftina xwe ya kinik da, di pê wê re dengê sêsed tivingî hat ku her yekê pênc gulle avêtin û vekirina qulekê di dîrokê de ragihandin ku Kurd tê re dikarin buxçeyên xwe, xişl û xemla xwe, hiriya beranên xwe û daholên dawetên xwe bavêjin cihekî emîn.

Axaftina Qadî Muhemed bi wê rewanbêjiya xwe ya Kurdî di nav wê koma ku bi Rûsî û Tirkî û Azerî dizanibû de, û bi amadebûna licneya merkezî ya Partiya Demokrata Kurdistanê, cihê razîbûna Moskoyê bû loma ewî giranî da têkiliyên Kurd û Azeriyan li wê herêmê ku hindik mabû nakokiyên di bin serpoşa Sovyetî de veşartî serî hildana. Bi rastî jî komareke Azerî otonom hebû ku ketibû reqabetê bi komara Mehabadê re, li herdu aliyên komarê gund û rê tev li hev dibûn û cudatiya fikrî jî bingehîn bû di navbera herdu komaran de: li Azerbeycanê komonîstan bi alîkariya mihacirên ji Azerbeycana Soveytî hukum kirin û xewnên wan ên sosyalîst gelek bûn, lê Kurdên komara Mehabadê kesin êlperest û dîndar bûn û bi wan nexweş bû ku azeriyên sor -ên bermayên partiya Tûde bûn û wergeriyane Partiya Demokrata Azerbeycanê- ixbarciyan li her cihî biçînin "Da ku paşverû rê li ber pêla cemaweran negrin." Jixwe çend roj di ser avakirina komara Kurdî re neçûn heta nakokiyên di navbera herdu gelan de derketin der û her yekî bi guman li yê din nerî, Soveytî rabûn peymaneke aştiyê ji wan re amade kirin ku ne zêde bi dilê herdu aliyan bû jî, lê bi

her halî qederê ji herdu komaran re jî eynî ziyan anî. Hema ku Sovyet bi xwe û karûbarên xwe li derveyî sînorên Îranê biliyan, Îranî hatin û ketin komara Azerbeycana Sor, di pê wê re komara Mehabadê ku navê wê arî bû jî herifî her wekî çawa Deryaza ku cêwiya Mehabadê ye û ew jî li ser keviyê Sablaxê bû di bin menceniqên Sefewiyan de herifî bû.

Ma wê Qadî Mihemed kariba çi ji komara xwe re bikira piştî ku dît çawa hikûmeta Stalîn dev ji komara Azerbeycanê ya sor berdide? Camêr hevalên xwe kom kirin û “Civateke şer” lidarxist ku tiştek ji bilî bendewariya hatina artêşa Îranî pêve di destê wê de nebû.

Şervanên Barzaniyan jî paşê ji Mehabadê vekişiyan û berê xwe dane Bokana li bakur, Qadî jî bi general Humayûnî re li hev dikir ku artêşa rejîmê derbasî Mehabadê bibe, ewî bi zîrekiya xwe dixwest êlên xwedîheyf dûrî Mehabadê herin ku talanan nekin.

Bi her halî, derbasbûna artêşê ji Mehabad re ne a yekem bû, berê Simko Axa jî sala 1921an derbas bûbûyê û hêza Îranî ya ku şeşsed nefer bû qir kir, û rehm li şandeya misyoneran jî nekir ku bi serokayetiya misyonerê Emerîkî Fossum ku xewnên wî jê re digotin ewê warekî xweş di nav Kurdan de bibîne li Mehabada ku malbatên fille û cihûyan jî lê hebûn. Fossum bi xwe jî pirtûkeke gramera Kurdî bi zimanê Ingilîzî nivîsî bû ku niha kêm peydaye. Dema ku bermayên şandeka wî mirovê xewndar çûn, her wekî ku di wêneyên fotografciyê Mehabadî Boxos de diyar e, keçika Norwêcî Dal xanimê xwest bi mêrê xwe yê ji malbata Hebîbî re bimîne û misyona xwe bi awayekî din berdewam bike û bimîne şopa tekane ji wê şandeka ku hiliya.

Tim dihate bala Dîno ku ji cêwiyê xwe Mem bi henekî bipirse: “Ez hêvî dikim ku tu jî li Kurdistanê nekî mîna ku yê dişibihî te kirî”, mebesta wî di bin re Simko Axa bû ku Qadir

Hemo her dibêje Mem dişibihe wî li gor wêneyê ku tim di berîka qutikê wî de ye. Mem jî bersiva birayê xwe yê çavkesk dida: "Dê kesek nefilite eger ku ez rastî şandeyekê bibim ku xwediya sola leşkerî di nav de be." Ku Dîno dipirse: "Çi dihêle ku tu guman bikî ewê bi şandeyeke misoneran re biçe Kurdistanê?" Cêwiyê wî vedigerîne: "Ne bi şandeyeke misyoneran re Dîno, lê bi şandeyeke Sovyetan re ku dê havdêriya komareke Kurdî ya nû bike", Dîno gefan bi qerfpêkirin lê dixwe: "Bêyî krîstalografyayê komareke nû nîne delalê mino."

Xwediya sola leşkerî ne Kurd bû lê Mem û Dîno ew derbasî lîsteya Kurdan kiribûn ji bo ku piştî çûna xwe ya Yekîtiya Sovyetê ew nêzîkî xeyalê Hejar Zendî be, ewa ku yekemîn keça Kurd bû bi şandeyeke Komara Mehabad re, ku dawiya wê bidarvekirina Qadî Mihemed û endamên hikûmeta wî bû di 30ê Adara 1947an de, çûbû wan welatan. Hejar Zendî xwest li Bakuyê bimîne ku li wî bajarî xwendevanên Kurd ên ku hatibûn şandin da ku piştî vegera xwe ya komarê bibin efserên pispor, û xwendevanên Azerî yên Sovyetî li gor dilê hev bûn, lê xwediya solên leşkerî ji bilî çar roj û du saetan pêve namîne, her wekî ku Mem dibêje. Ew du saet jî, Mem berdewam dike, ji bo ku keçika qeytanên sola xwe ya heta gurçika nigê wê dirêj girêbide ku hezar qulikên li himber hev têde hene, lê hema ew çar roj û çima çar roj in. Mem nikare tu wateyê bide wê: "Çar roj jê re divên, bi baweriya min, eynî wek ku çawa çil sal têra hinekan dikin. Mesele meseleya jîrbûnê ye." û bi tiliya xwe işaretî serê xwe dike: "Li vir ha. Jîrbûn di vir de ye, aliyê rastê ji serê wê." Dîno peyva wî dibirre û ew jî bi henekî dibêje: "Ê ew çar roj bes in ji bo fêrbûna tîpên Rûsî", Mem dibêje: "Tîp ji bo çi? Ziman ji çi re? Krîstalografya zanista çavan e heyrano." Ku Dîno serê xwe bi xemxuriyeke çêkirî dihejîne û dibêje: "Û bavê wê dê çi bibêje ku bibîne ew piştî çar rojan vegeriyaye?" Mem

vedigerîne: “Qurbano keçik ê tiştekî nebêje, çiku ewê venegere.” ku Dîno bi derewan matmayinê li ser rûyê xwe çêdike û dibêje: “Eger ew welatê Bolşevîkan biterikîne wê were welatê Hecî Umer” û destnîşanî dikancî dike. Mem dibêje: “Ne pêwist e ku ew vegere vê derê”, û bi kêfeke zarokane birhên xwe dilivîne. Dîno bi kêf lê temaşe dike û dibêje: “Ez guman nakim ku ewê berî te bigihîje Kurdistanê...” Mem peyva wî qut dike: “Têgihîştina te kêm e delalê mino. Te texmîna....” Dîno bi qerf jê rica dike: “Ez tika dikim ji min re zelal bike....”, Dîno çav didê: “Tuyê bi xwe fehm bikî Dîno dema ku tu sihra nigên wê yên pehn fehm bikî.”

Dibe ku keçik di nav krîstalên xwe de winda bibe: ev şiroveya tek û tenê ya peyva Mem î qutbiyî ye. Lê Dîno ê di tiştekî weha de nefikire, çiku kes di krîstalan de winda nebûye, ji ber ku ew zelaliya xurt û yekker û hemreng serhişk e û penaberiya tu laşên din mîna laşê xwediya sola leşkerî napejirîne, heta ku ew bi xwe biryarê bide jî ku hêdî hêdî bişemite prîzmayekê û di aliyê din re mîna gurzek ronahî derkeve ku her rengekê li halê xwe ye.

Eger Dîno bi awayekî ji awayan bixe serê xwe jî ku keçik di alaveke krîstalê safî de bi cih bûye, lê wê pirs ew be ka di kîjan alî de ji wî alavî dê sol ji lingê wê cuda bibe?

Lê Dîno tiştekî weha nake derd ji xwe re, lê xwediya sola leşkerî dê bi bawerî berê xwe bide wê valahiya di navbera henekên herdu cêwiyan de û xwe bavêje nav pêta sar a kûraniya krîstalên xwe û di nav re bikene ku çawa bi lez dişewite û werdigere gewdeyekî hişk î zelal î ku tîrêjên yekrêzî, yên gawir, yên zendîq jî li dora wê belav bibin. Ewê bibe we’zeke rengîn di devê xetîbekî de ku nû ji meziniya ebediyatê derketiye.

Dema Dînoyê ku radyo danîbû ser kevîka sûrê baxçeyê giştî piştî ku ewî pifî sînga xwe û binçengê xwe kir bi hênikiyê hisiya, dîsa ew radyoya di kertonê de rakir û bi gavin lezoktir

berê xwe da mala ku êdî şeş xaçirêk jê re mabûn. Çaxa ku daneyên xwêdanê yên nû diketin nav xêzikên sivik yên eniya wî de, diya wî Kesbo bi keçikên xwe re vedigeriya hindir piştî ku siya di hewşê de dageriya û hindik mabû bi derîzanka ber derî bibe. Ew çawa ketin hindirê ku xwe hîn bi hênikaya berbangê girtibû, yekser berê xwe dane metbexa tijî tûrikên arvan û mûnetê yên li ser depên ku wan ji rewaya erdê diparêze rêzkirî bûn. Bi wan tûrikên devvekirî re, du dolapên text jî hebûn deriyên wan tor bûn ne cam ku çend mêşên tenbel bi torên wan vebûn mîna ku ji xwe re di wan qulikan re li peyalên pir û sênîkên bi wêneyên ejderan neqişandî temaşe dikin, kezeba wan mêşan li ser wê bîna sivik ku ji firaxên devbi heriyê girtî yên tijî hingiv dihat, dişewitî.

Jinik û her şeş keçikên xwe li ser wan tejikên tenik î ziravik rûniştin û di nav xwe de sêniyeke fireh danîn ku komeke mezin ji burxulê ku demek dirêj di avê de hatibû nimandin heta bûbû mîna hevîr li ser danîbûn, paşê gelek pîvaz hûr hûrî kirin, yekê ji wan bi aletekê goşt hûr dikir; goşt dixiste devekê wê aletê yê jor de û di devekî dinî qulikqulikî re mîna werîsên ziravik derdiket û ku çawa bi sêniya di bin de dibûn diqurifîn. Dema ku goştê hêrayî temam bû Kesbo ew bi pîvazan re stra û beharat û xwê û beqdenûs tev lê kir, di ber re jî bi Hêlînê re dixeyidî çiku wê ji xwarina hevîrê burxul î xav hez dikir.

Goştê bi pîvazan re strayî di meqilkekê de danîn û Eyşanê ew bêyî ku bipêje raqeland, Kesbo her digotê: “Tev bide, li nav hev bixe.” û destê xwe li hewayê dizivirand, paşê tiliyên xwe dizivirandin mîna ku bişkoka radyoyekê digerîne: “Agir sivik bike... Ma bêhna şewata qûna te nayê te qey?” Ev hemû û Kesbo ji cihê xwe qe ji ser wê tejika tenik ranabe, keça wê jî her li ber goşt û pîvazan e li nêzîkî maseyeke zirav û dirêjik ku gazeke sêçavik li ser e û di bin maseyê de jî cerrê gazê yê zingarî tazî xuya dike û xertûmê lastîk ê ku diçe wan sê çaviyan li dora wî

geriyaye. Dema Kesbo destê xwe dawiyê bilind kir, meqilk daket û hate ber hevîrê burxul, Hêlînê qirika xwe dirêj kir û bi mereqdarî laşê xwe bi alî sêniyê de bir lê diya wê bi derbeke sivik li ser sînga wê re ew dûr xist: "Ma qey tu dixwazî bikevî meqilkê hê? Ew keliyaye... keliyaye", û bi tiliyekê keça xwe girt û anî ber keviya meqilka reş, keçika biçûk destê xwe bi xurtî kişand û kire barebar, Kesboyê got: "De îca niha tu dikarî di meqilkê de rûnî eger tu bixwazî rihê min."

Hindik hindik bloka hevîrê zivir biçûktir dibû di bin wan destên ku girikên di eynî pîvanê de jê dikirin. Ew girik paşê bi tiliyên şil têne qulkirin, da ku bi hindirê wan ve nezeliqin, û di pey re ew tijî goştê bi pîvazan re strayî dikin û keviyê devê wan digihînin hev û digrin, a wê demê jî her gogekê di mista destên keçên Kesbo de têne guvaştin û lûlikî dibin lê di nêvî de hinekî nepixîne. A li wir êdî "Kutilk" ji kelandinê re amade dibin.

Xwarina malbatê bi aramî amade dibû di nav xelekên keleboxê de ku ji xwe re rê di navbera qeraxên beroşan û qapaxên wan de didîtin, dûrî şerê ku ji nişkêve di nav keçên Kesbo de lidarket û ewan tev şerê xwe ji metbexê berê xwe dane odeyeke din. Paşê ew şer wek ku çawa ji nişkê ve dest pêkir ji nişkê ve rawestiya jî da ku keçik berê xwe bidin hewşê piştî ku yekê ji wan ku nêzîkî pencereya li ser kolanê bû û dîtibû ku Dîno tê bang kir: "Radyo... Radyo."

Keçikên Kesboyê negihan derî vekin tevî ku hemiyan xwe di ber hev re kirin û berê xwe danê ji ber ku birayê wan berî wan giha û tev li radyo derbasî hewşê bû, wan xwehên wî hindik mabû wî bidin erdê hingê destê xwe didan kertonê. Dîno bi pifeke ku devê wî tijî kir re got: "Yaaaaaah", êdî ew hinekî aram bûn û di nav xwe de rêyek jê re vekirin, ewî jî berê xwe da textê herî nêzîk û radyo danî ser û destê xwe yê tevizî rihet kir.

Kesbo jî derket lê derîzank derbas nekir. Ji cihê xwe awirek li kertona li ser kevîka textê xewê xist, bişirî, li wan keçikên xwe yên ku ji tirsa gefên diyar di çavên birayê wan yên kesk de bêdeng bûn nihêrî. Bi destekî xwe çavên xwe sî kir û bi destê din işaretî radyo kir û gote kurê xwe: "Ma qey tu radyo dikelînî?", Dîno bi tinazî got: "Ev cûreyekî nû ye yadê, ew bi tava rojê dixebite.", diya wî dikira bawer bikira ku keçikên wê nekeniyabana.

Gelek kes wê rojê di dikana Hemdî Azad re derbas bûn. Ewî ku roj hate nîvro karên xwe yên her roj dikirin; dexle û çekmaçeyên ku meqes û musterên caw û zerfên nameyan û kaxezên xêzikî têde bûn digirtin, metra hesinî jî datanî ser refikeke pişt xwe, desmala ku mîna şaşikekê li serî gerandî rast dikir, ku ne xwar ba jî, û taliyê hinekî qutiya tûtina xwe ditikand mîna ku dilê xwe dixe cih ku tiştek ji bîr nekiriye. A wê çaxê êdî kesên ku hîn neçûne malê xwe dizanin ku Hemdî dike dikana xwe bigre.

Hemdî destê xwe da berîka gumlekê xwe yê fireh berî ku kilîtê bixe guharê sifr û babide û ji wê zêrzemîna ku deriyê dikana wî digihîne erasa sûkâ sergirtî derkeve, ewî bi wê tebegra xwe dilê xwe dixiste cih ku nameya pêçandî di zerfa xwe de ye û li ber parsûyên wê yên çepê ne. Ewî ew nameya bi herfên Latînî di demin quto quto de nivîsî bû ku mêvan û muşterî diçûn û dihatin. Bi her halî rêz ne gelek bûn lê têra xwesteka Hemdî ya ji kesekî li Îranê dikirin. Û zerfa ku name têde jixwe bi pûl û demgeyan xemilandî ye ku her yek nirxekî xwe yê hesabkirî heye. Hemdî pirsî bû ku nameyeke heta Îranê çiqas dirav dike, û ji wê demê de ewî gelek pûl û demge kirîbûn û di çekmaçeyên maseya xwe de hilanîbûn û her carê jimarek hesabkirî ji wan radikir. Lê namebir û posteciyên îranî hikmeta wê yekê fêm nekirin ku kesek ewqase name bişîne navnîşaneke ku di tomar û qeydên postê de nebe, û hîç wezîrek di dewleta

wan posteciyan de nebû ku navê li ser zerfê yê wî be. Tew dê qet kesek nikaribe nas bike wezîrekî bi wî navê ku hemdî nameyan jêre rê dike ji dema Kisra heta şahê dawî. lê ne xema Hemdî bû ku postecî xwe bigihînin navnîşana ku berî bîst û pênc salan rast bû li bajarekî ku navê kolanan lê tunebûn, û her kolanek bi navê malbatên ku di niştecihbûnê de yên kevintir bûn ji malbatên din.

Dê Hemdî binivîse. Dê ew heta dilopa dawî ji murekeba li Qamişlo binivîse madam ku ew dikare niha bi tîpin ji bin simêlên wî yên ji cigareyan zerbûyî dertên xitabî kesekî li ser kaxezê bike. Dê Hemdî roj li pê rojê ji wezîrê perwerdeyê re di hikûmeta xedirlêbiyî de ya Qadî Mihemed binivîse.

Ewî dikaribû ji kê re ba binivîsanda lê wî ji nameyên xwe re wezîrek hilbijart, wezîr jî heybeta wan heye. Gelek tişt hene Hemdî dixwaze bibêje yan wesif bike. Erê. Hemdî dê weha binivîse; dê ew binivîse heta ku serê zêrîn ê qelema wî ya Tropen biçirre, ew qelema ku ji bo herf pehntir xuya bibin tê bikaranîn. Ewê bêtir giraniyê bide şandeyên perwerdeyê ku wezîr serkirdeyê wî karî bû di navbera komara Mehabadê û welatê Soveytan de:

“Mem, koleyê te, xwenda ye ey cenabê wezîr”, dê Hemdî weha binivîse. Dê binivîse û binivîse û şanî jina xwe Kesbo bike, bi xwebînî, wan xêzên xwe yên rastî hev, jinik jî dê bi israr kêfa xwe veşêre. Dê Hemdî kaxezeke xêzkirî li pê yeke xêzkirî de binivîse, û dema ku diçe dikana xwe yan tê û di ber avahiyê postxaneyê re biçe, dê dagere wê avahiya dîwarên wê zivir û berê xwe bide qutiya hesinî ya bi dîwarê derve ve li aliyekî ji aliyên derî, û dê ew nameya xwe bi hêdîka bavêje wê qelşa tarî ku qapaxeke mîna kuman li ser e, paşê wê ew pifî wê qelşê bike da ku dilê xwe bixe cih ku name dawerivî hinavên wî dêwê biçûk yê ku dilovaniya xwe ya hesinî li razên kesên ku xwe radestî deryayê dikin dipêçe. Paşê ewê bi awireke henûn xatir

ji qutiyê bixwaze û di dirêjiya rêya mayî heta malê de hufehufa dawerivîna nameyê bibihîze ku çawa di nişûva fireh ya dilê wî de tê xwarê û ber bi serê kajedarên li herdu rexên Sablaxê de diwerive. Û bêyî ku name li serê daran bikeve dê ba alîkarî û destkîsiya Hemdî bike û nameyê du metran dûr bixîne û ber bi rêza yekem ji malên Mehabadê de bibe. Wê çaxê êdî ne girîng e ka name li ku radiweste, çiku ewê ji destekî bikeve destekî, çi destên kesên dizanin bixwînin yan nizanin, dawiyê dê xêrxwazek wê hilgire û here li deriyê mala wezîr bide, wê keçikek yan lawek yan jinek yan jî zarokek derî veke. Ewê xêrxwaz dê bibişire, kesê derî vekiriye jî dê bibişire. Yê xêrxwaz dê destê name têde dirêj bike, û yê derî vekiriye jî dê destê xwe dirêj bike. Nîvê nameyê dê di nav tiliyên kesê xêrxwaz de be û nîvê din jî dê di nav tiliyên kesê derî vekiriye de be. Xêrxwaz dê tiliyên xwe yên li ser zerfa nazik sist bike, kesê din dê tiliyan bişidîne. Kesê xêrxwaz dê vegre bi rêya xwe de û dê li pişt wî bibe teqeteqa zeqateya derî ku tê girtin.

Bi eynî wan gavên pîvayî li ser wê erda kevirî li pêşiya postxaneyê, Hemdî berê xwe da qutiya hesinî ku nameya xwe ya nû dîsa bavêje hinavê qutiyê. Di wê rojê de wî radyo kirîbû û paşê di nîvroya mîna garisên li ser sêleke sincirî qelişî de rêya xwe temam kiribû û di eynî rêya ku bûbû şahida henasên kurê wî Dîno de dema ku radyo ji binçengekî dibire yê din, meşiya. Çaxa ku di dergehê hesin re derbasî hewşa malê bû û bi çepê de zivirî û berê xwe da odeya malê, dît wa ye jina wî û keçên wî û kurê wî Dîno xelek gerandine û li dora girekî ji kutilkên germ û lûleyî rûniştine û her yekî tasikek tijî dew li ber e.

Hemdî solên xwe yên çerm û tijî qulikên ku fersenda nefesê didin ji piyên xwe danîn û hema di cî de li wê şûna ku Welat û Rehîme jê re di navbera xwe de vekirin rûnişt û nefeseke kûr û bi dengê bilind, mîna nîşana ku xwarin bi dilê wî ye, kişand. Bi herdu destên xwe zerikeke zîvîn ku dew têde bû rakir û vexwar

û çawa ew vegerand cihê wê serê xwe yê gûzankirî kifş kir û bi kofiya xwe eniya damaland, paşê ew kire baweşînkek û pê ba li sîng û rûyê xwe kir berî ku hema çawa be bavêje pişt xwe, û dema ku kutilkek avête devê xwe kire birebir û got: “Kanî Mem?”

Bêdengiyên kesên din digot ku ew jî nizanin Mem li kû ye. Lê ewan cûtina xwarinê ranewestandin mîna Hemdiyê rûyê wî hinekî tirş bû û bişûn de çû û kûr li sêniya xwarinê temaşe kir, paşê ji nûve bi ser de xwar bû û serê xwe bi nerazîbûn hejand.

Dema ji malbat firavînê qediyan her yekî, ji ber tevizandina têrbûnê û germiya nîvroyê, li deverekê palda. Tenê Kesbo palneda û rabû zerikên vala ên dew û tasikên neqşkirî û pirtikên ji ber kutilkan mayî berev kirin. Çend deqe piştî wî şerê bi birçîbûnê re derbas nebûn êdî rewş tekûz bû û her yekî ji xwe re palgehek biçûk xiste bin serê xwe û bi xewnerojkên xwe daket, Kesbo jî cilikeke pemboyî li erda metbexê ya hênik raxist û li ber wan firaxên ku dê wan paqij bike kete xew.

Bêdengiyeke aram girte ser pencereyên perdeberdayî da ku hindirê malê ji dojeha derve biparêzin. Hewş jî ketibû bin bayê germ ê baweşînkên qijeqija nîvroyê, heta herdu darên kafûrê yên girs çilmisîbûn û çivîk li deverên sîdar de di nav şaxên wan de kombûbûn. Li bakurî hewşê jî bistanê Kesbo di halekî xirab de bû, kulîlkan hema çav bidana ser hev tavilê ji xew dipengizîn. Çiku mêşên higiv qenctir dibînin ku kulîlka xilmaş bidehfîne newala mîna şaneyek hingiv vekirî. Her ku kelkela germê şehweta wan ji wan re dixemiland, û rewrewkek ji “Lîçika şeytên” diherikand, mêşên hingiv har dibûn û bi kûlîlkan diketin û şîretên ji vingîniyê di guhên wan de digotin û mizgîniya qiyametekê didan ku her tişt têde ewar e û stêrkên biçûk in ji şimayê ku komên mêşan li dorê digerin. Çi ji destê kulîlkên Kesbo jî nayê ji bilî ku wan şîretan bibihîzin û di xewa xwe ya nîvroyê de ji bêgavî bibûrin ku dê heta heta yê nema bi

dest wan bikeve madam ku ew kulîlk her di demsalên ku rewanbêjiya mêşan têde dikemile dibişkivin. Lê eger ku Kesbo bikariba giliyê bistanê xwe bibihîzta dê ji xew rabûya û bi dilşewitîn berê xwe bida kewaran û çavên xwe hûrik bikrana ku xwe ji alawiya germê biparêze, paşê dê ew li himberî kewaran rawestiya û destên xwe bixistana newaqa xwe û bigota: "Mêşno ma hûn şerm nakin?"

Bêguman dê mêşên hingiv xwe ji pêlîstina kulîkên kesbo neşo, lê ewê behaneyan bibîne, çiku her ku kelkela germê zêde dibe, şehweta kişmekişê li ba wan zêdetir dibe: "Kesbo xanim tu dibînî kulîkên te nema eşkere ne." Dê Kesbo li wan vegerîne: "Belê eşkere ne, ez wan wisa dibînim. Bistanê min hemû eşkere ye." Dê mêşên hingiv ji ber vê bersiva wê bikin uftekuft û bibêjin: "Ew vê havînê ne eşkere ne Kesbo xanim." Dê Kesbo peyva mêşên xwe bibirre: "Ma divê kulîkên min çi eşkere bikin meşno?", dê mêş vegerînin: "Ji wan bipirse." Lê Kesbo ê hinekî hêrs bibe: "Ez ji we dipirsim mêşno." A wê çaxê dê mêşên hingiv di xelekekê de bifirin, yek lip ê ya din, dê ramanên xwe bisûn û sîqal bikin:

Meş: "Ma tu dibêjî qey em çi ji bistanê te berhev dikin?"

Kesbo: "Ba."

Mêş: "Na. Tiştê ku ramana me ye em berhev dikin."

Kesbo: "De wê demê ba ramana we ye, ne wisa?"

Meş: "Erê Kesbo xanim, lê em ne bayê berhev dikin, em…."

Kesbo: "Ez dibêjim hûn qernebîtan berhev dikin..."

Mêş: "Di bistanê te de qernebît nînin Kesbo xanim."

Kesbo: "De ka hûn ji hingiv pêve çi berhev dikin mêşno?"

Mêş: "Kesbo xanim em henekan nakin."

Kesbo: "Min nizanîbû ku mêşên min wisa qeşmer in."

Mêş: "Yê qeşmer bistanê te ye Kesbo xanim"

Kesbo: "De ka em dawiyê li vê meselê bînin. Hûn çi berhev dikin mêşno?"

Mêş: “Em wêneyê te yê belawela berhev dikin.”

Kesbo: “Wêneyê min?”

Mêş: “Erê.”

Kesbo: “Û hûn wêneyê min yê belaweka ji ku berhev dikin?”

Mêş: “Ji xeyalê kulîlkên te.”

Kesbo: “Ne hewce ye hûn berhev bikin, bila wêneyê min di xeyalê kulîlkên min de bimîne.”

Mêş: “Piştî niha tu dê nema xwe nas bikî Kesbo xanim.”

Û dê Kesbo li kulîlkên xwe bizivire û bêzariya ji rawestandina xwe ya li ber kewarên mêşan bida xuyakirin û ji cihê xwe de biqîre: “Kulîlkno ma mêşên min dixwazin çi bibêjin?”, û wê qêrîna bistanê li bakurê hewşê bilind bibe: “Haydar be Kesbo xanim. Mêşên te direvin.”

Kesbo di xewa xwe ya germ de bû dema ku dengê bistanê wê ji nav xewneke tevlihev hat, ku gelek ringînî têde hebû. Ew ji xew rabû û rûnişt, paşê stûyê xwe bi alî deriyê metbexê yê nîvvekirî ve dirêj kir û guh miç kirin û nas kir ku şahmêşek din jî bi refê xwe re reviyaye, hema bi xwas reviya hewşê û dît va ye goşiyekî mezin ji wan mêşan ji şaxekî dareke kafûrê daweriviye. Kesbo saniyeyek jî winda nekir û bi lez kewareke ji heriyê ku berê amade bû anî û destê xwe yê rastê bi desmala serê xwe pêça û mist bi mist ew mêş daxistin wê kewarê, dema ku ew goşiyê mêşan hemî xiste kewarê devê wê girt û ew siparte darê û bi lez çû misînek av anî û hinek axa hewşê wek hevîrekî stra û pê devê kewarê bi kewarê ve siwax kir û li wir hişt ku zuha bibe û paşê deyne ser rêza jorîn a pîramîda kewaran.

Dema ku Kesbo destên xwe ji heriya ku bi wan ve zeliqî bû dişûştin, kurê wê Dîno bi helkehelk ji deriyê odeyê derdiket û bi çavên xwe yên ji xewa nîvro sorbûyî li koşeyê rojhilatê hewşê nihêrî, dema ku daxwaza xwe li wir nedît kire himehim û got: “Yadê kanî ew cer?”, jinik ava ku li destên xwe dikir rawestand û bersiv da: “Min ew bire metbexê”, û li li durûvê wî nerî û li

sebebê pirsa wî cerî geriya, wî cerê ku Kesbo tu caran li hewşê nahêle dema ku dunya germ dibe.

Bala Kesbo kişand ku kurê wê li hewşa malê li cerê avê digere hal ew e ku divabû ew zanibe ku cer li metbexê ye yan jî li odeya malê ye. Mîna ku Dîno ji awirên diya xwe fêm bike ku wî rê şaş kiriye, bi şûn de zivirî odeyê û ji wir berê xwe da metbexê û dema ku gihişt cerê şilkirî çoçi berda hinavê û av derxist û vexwar, av bi ser çena wî, qirika wî û sînga wî der herikî. Dema ku ava di çoçikê de hemî berda hinavê xwe yeke din dagirt û vexwar piştî ku henasên xwe demeke dirêj sekinandin. Ku ewî têr vexwar hinek av rijande mista destê xwe yê çepê û reşande rûyî xwe yê çavgirtî, paşê devê xwe vekir û nefesa xwe berda.

Hemî ji xewa wê nîvroyê tî radibin, lê tîbûna Dîno ne tenê ji ber germê û wê xwarina çivir bû, çiku ew -piştî ku xeleka çoçikê bi çengelek biçûk î bi destikê cer ve kir- zivirî û li hinan geriya ku jê re reva wî ya di xewna berî çend deqeyan de tefsîr bike. Lê wî serê xwe daqûl kir û milên xwe berdan mîna ku bi şûn de vedikişe ji ber ku ne ecêbeke ku mirov di xewna xwe de bireve, her kes di xewna xwe de reveke mîna firandineke sivik dike, yanî jî mîna xuşîna giran a bi erdê ve ji tirsa giran.

Dîno guhê gumlekê xwe yê di bin qayîşa pantelon de kişand û xwe xwar rûyê xwe pê damaland. Di wê xwexwarkirinê de destê xwe da kabokên xwe dît ku diêşin, pantelon ji ser wan hilmaland dît waye çermê wan hinekî çelitî ye û hin birînên sivik heta pişta lingê wî jî xuyabûn. Ew ji kel de rabû û li deriyê yê metbexê bi ser hewşa ji germa re dilerizî zivirî, bêyî ku mebesta wî be li hewşê binêre, û bi hêdîka got: “Tu yê nekevî pêşiya min Mem.” Lê ew ji wê gefxwarina xwe ne piştrast bû, ji ber ku ewî cirîda nediyar di cihekî ji kûraniyên xwe de li ser çar piyan dikir ne li ser du lingan. Wî û cêwiyê xwe di nav giya û cobar û darkokên kinik de rê bi sînga xwe diqelaştin, dikirin

helkehelk û pirtikin spî ku ji giyayê strîdar difiriyan bîn dikirin, Dîno zivirî ku ji metbexê derkeve û hindik mabû li bavê xwe yê li cerê avê digeriya, bilikumiya lê di cî de rawestiya.

Bavê wî tasek av vexwar û ya mayî bi ser çewalê li dora cer gerandî reşand, li Dîno zivirî û pirsî: "Kanî Mem?"

Dîno bersiv neda lê bişkokên sînga xwe vekirin û keviyên gumlikê xwe ên di bin qayîşê de kişand ku gumlek ji xwe deyne, ji ber qayîşa wî perikek biçûk î rengcûnikî pekiya, gelekî li hewa hejiya mîna ku dadiwerive cihekî kûr, di wî halî de haya wî nema ji bavê wî ma, bavê wî yê ku bi dubarekirina pirsa xwe "Kanî Mem?" bi uftekuft ji metbexê derket.

Dîno xwarî wê perikê bû heta ew li erdê ket, rabû ew xiste nav du tiliyên xwe û kûr lê mêze kir û paşê tiliyên xwe sist kirin û dîsa ew perik hate xwarê mîna ku devekî veşartî pifeke sivik lê dide yan jî destekî nedîtî pê dilîze. Wê çaxê Dîno jixwekirina gumlekê xwe berdewam kir û hîn dikira bavêta ser çewalekî mûnetê dengê bavê wî ji nû ve bilind bû, ji cihekî nêzîkî deriyê malê dihat ku dîsa bêguman giliyê windabûna Mem dikir. Lê peyvên wî ne zelal bûn ji ber ku ewî derî derbaskiribû û berî dabû mexazeya xwe ya li sûka bajêr. Êdî Dîno jî pirsa windabûna birayê xwe ji xwe kir, ewî bi şeyalê xwe yê spî û bêzendik berê xwe da diya xwe ya ku bi bextewerî guhdariya mêşên xwe dikir, di wê çûnê de pê li li bermayê heriya ku Kesbo devê kewarê pê siwaxkiribû kir û hema ji yekî nenas re dijûn gotin: "Hey quzê bizinê" û meşa xwe di pişt dareke kafûrê re berdewam kir û ji diya xwe pirsî: "Yadê ji kengî ve Mem derketiye?"

Ew bexteweriya muhteşem ji ser rûyê Kesbo vekişiya, li kurê xwe nihêrî û lêva wê ya jor daliqiya: "Nayê bîra min", hinekî serê xwe daqûl kir û fikirî û got: "Ez nizanim. Ji xwehên xwe bipirse. Ez sibehê razayî bûm û min nedît ew derket. Dibe yekê ji wan ew dîtibe." Paşê vegeriya û bi çavên wî yên kesk de nihêrî: "şeva çûyî min pêjna wî kir ji serê ban bi nêrdewanê

dadiket, bi berbangê re jî min dît wa dîsa hildikişe serê ban û misînek av pê re bû", ewê li peyva xwe zêde nekir ku mumkin e Mem çûbe mîz kiribe, çiku ew herdu jî dizanin ku Mem di xwe re nabîne dakeve jêr bimîze û xewa xwe ji ser çavê xwe bibe, ew hema bêcemiyê xwe dadixe û ji jor de bi kolanê de dimîze û dengekî mîna dengê mezrîban ku avê bi ser asfaltê hişk de dirijînin tê.

Dema ku Dîno pirsa birayê xwe ji xwehên xwe kir, ewan guhê wî qulkirin bi wan çîrokên xwe yên mîna kespikan ku di sêlekê de bigindirin, deng bi ser peyvan ketin û çîrok li bin guhê hev ketin, ji hev ketin, bi hev ve bûn, mîna ku ew ne mirovên bi ziman bin belê ew mirîşk bin û erdê di siya darên kafûrê de dixepirînin. Dîno xwe ji nav wan derxist û lome li xwe kirin ku xwe kiribû nêçîrek di nav wan beqên ku li dora radyoyê bi parçeyek dantêlê qulqulî nuxumandî kombûbûn. Ewan derzî bi vir de û wir de dibirin bêyî ku li îzgehekê bisekinîn, her yekê ji wan îzgehek bi nalîna def û xirecira timbelekan dixwest. Kesî nikaribû ew ragirtana ji bilî Hemdî dema ku cigareya xwe dipêça, geş dikir û bi çavin xewndar guhdarî dikir û keçên wî jî pêre guhdarî dikirin. Tê bîra Dîno ku bavê wî carekê piştî firavînê li ber radyoyê paldabû, got: "Bêjerên vê aletê hîn navroja xwe nexwarine. Zengelokên wan zuha ne." Û paşê deng daxist bêyî ku bigre.

Saetên piştî wê xewa malbatê ya nîvro heta berêvarê ji hinan re giran meşiyan û bi hinekan jî asayî bûn. Û dema ku sî hemû- siya çivîkan, siya herdu darên kafûrê, siya textên xewê yên mezin û dîwarê malan û kulîlkên Kesbo û mûriyên ku bi hênikiyê re ji mûristanên xwe derdikevin û siya mirîşka tekane ya ku dîsa xwe li ser dîwarê rojava melisand piştî ku ji ber xwediyê xwe yê li aliyê din reviya, dageriyan, nearamiyê siya xwe ya birrekî mîna pelê xerşûfê li hewşa mala Hemdî veziland.

Malbatê nû şebeşek û hin kirtik penêr xwaribûn û her yek ji xwe re bi deverekê de çûbû li wê hewşê; ên ku ji xwe re li keviyên textan rûniştibûn, ên ku li ser kulavekî dirêj î li erda hewşê raxistî bû rûniştibûn, di wê kêlîkê de Hemdî derbas bû û li hemûyan nihêrî mîna ku wan dijimêre û paşê çû li ber sêniya tijî tirî û penêr û nan rûnişt, keça wî Hêlîn bi lez hat û xwe pê ve zeliqand. Hemdî libek tirî qut kir û xiste devê keçika biçûk û bi kerbeke ku bi janeke xweragirtî re têkel bû birebira wî: “Ez dibêjim qey ew miriye”, Kesbo ji cihekî nedûr qirika xwe dirêj kir û pirsî: “Kî miriye?”, mêrê wê bi cûtina pariyek nan re bersiva wê da: “tenê ê mirî dikare neyê malê.” Kesbo têgihişt ku ew behsa kurê xwe Mem dike, êdî xwest ku bide ber dilê wî û yê xwe jî û got: “Hemdî ew xort e ma wê çi pê bê.” Lê van gotinên wê hêrsa wî rakirin û wî sênî ji ber xwe dehfand û tiriyê li ser belawela bû, keçika biçûk ji ahenga dengê wî tirsiya û xwe bi bavê xwe girt: “Ma ji vê sibê de Kesbo? Eger wî bigota ezê herim cehnemê me dê zanîba ew çûye cehnemê”, Hemdî got û sênî ber bi xwe de anî, libeke din a tirî jêkir û da Hêlînê.

Xwarin di ber Hemdî re nediçû, ewî çend parî bi zorê xwarin û paşê bêdeng li wê hewşa aram a di nav bayê êvarê de dest bi kişandina cigareya xwe kir. Lê bêdengiyê dirêj nekir ji ber ku mêvanên Hemdî yek li pê yekî derbasî malê bûn. Yekemîn kes Qadir Hemoyê ku wêneyê Simko Axa di berîka wî de diqilqilî derbas bû, paşê Şêro Babanê ku bîneke wek ya rûnekî madenî ku di qutiyên şîn de tê firotin jê dihat, di pê wî re Mewla Can, Xidir Şêxo, Mecîd Mîrvan, Baqî Reş, Keftar Hesen û Sofî Recebê rîsor jî hatin. Jinên wan û hinek cîranên din jî hatin ji xwe re bi Kesbo re dûrî mêran rûniştin û behsa bûyerên roja xwe ya tenik a ku mîna nanekî sêlê ye suhbet kirin.

Axaftinên wan bi hêdî bûn li wê hewşê bêyî ku Hemdî giraniya nearamiya xwe û xemxuriya li Mem bavêje ser, û bêyî ku Kesbo jî li ber tirsa di hinavê xwe de teslîm bibe û êdî peyv

bihejin û di bin zimanê wê de herin û bên. Zarokên wan jî mîna wan bûn û rabûn ji xwe re hilkişiyan ser nivînên dirêjkirî li ser wan textan dûrî hemûyan û li gor zimanên xwe yên nermik jiyan fesilandin. Dîno jî tev li civata mêran bû. Marmarokên biçûk jî, ên ku derketibûn nêçîra perwaneyên li dora herdu lempeyên difiriyan. Ew di cihên xwe de cemidîbûn û tenê zimanên wan ên dirêj mîna birûskin ji şîrêzê diliviyan û kêzikên tenbel digirtin. Li jora hewşê jî, di ser wan barçemokên qeşmer û fira wan a qeşmer re, stêrikên biçûk rê ji xwehên xwe yên mezin re vedikirin ku ew jî ji xewa xwe ya rojê hişyar bûbûn û ronahiya ku bi porê wan ve bû di şiklê galaksiyan de dadiweşandin. Kesbo ji mêvanên xwe re digot ku melayiket wan komên stêrikan serrast dikin û seyrana wan a kevanî ji êvarê heta berbangê, û stêrika ku tesbîhên wî yên bi qasî tîrêjên wî ne nemînin, berî ên din diçe ava. Di wê kêlîka ku Kesbo ev axaftin dikir de stêrkek bi lez di quba şevê de xuricî û Kesbo got: “Bismillah, li Iblîs ket”, û bi bişirîn guhdarî kir mîna ku dê dengê herifîna pîramîdê nuhênî ya şeytanan bibihîze dema ku yek li ser pişta ê din siwar tê û nêrdewaneke qerase ava dikin, dawiyê jî Iblîs tê jora wan û bi çend bostan nêzîkî erşê dibe da ku guhdariya Xwedê bike, lê dê stêrikek mîna her şevê hemtayê xwe yê ku ew jî ji êgir e bavêje dûmaneke dûr da ku ewê serkêş janan bikêşe.

“Stêrikeke xuricû bes e”, Kesbo ji hevalên xwe re got û zêde kir: “Lê Xwedê, gava ku wehîy dadixist ser pêxemberê xwe, du stêrik diavêtin Iblîsê ku ji xweşikiya Cibraîl diheside û ew heta esfelussafilîn bidûrdixist.” Jê nedihate xwestin ku ew pesnê ciwaniya wî firişteyê ku kelamê Xwedê emaneta wî bûn bike, ewî firişteyî wehî dadixiste ser Resûlellah di şiklê sehabiyê bi navê Dihye El Kelbî, ku ciwantirîn mirovê dunyayê bû.

Lê Hemdî Azadê ku enîşka xwe daye palgehekê, dest bi axaftina xwe bi wan kesên ku ewan jî enîşkên xwe dabûne

palgehên li ser kulavan rêzkirî li ser radyoyê kir: "Kêfa min ji porê nûçebêjan re tê" ew dibêje, yek jî jê dipirse: "Ma tu nûçebêjan dibînî?" Hemdî dibêje: "Ne hewce ye ez wan bibînim daku bizanibim ew melhemên zeytê di porê xwe didin", û ku ew wisa mereqa guhdaran zêde dike, şiroveyan weha pêşkêş dike: "Xijexij nîne, xuşexuş bi dengê radyoyê nakeve, ma çima? Ji ber ku di ser porê nûçebêjan re bi nermî dişemite û nalikume. Eger ba bilikume dê pêl tev li hev bibin û xijexij bi radyoyê bikeve", û ji bo ku piştgiriya vê ramana xwe ya nelihevhatî bike bi bişirîn dike himehim û dibêje: "Dîno wisa iddia dike", serê xwe bi nerazîbûn dihejîne û dibêje: "Bryantîn... tenî... ma kî zeytê di porê xwe dide? Li ser çi palgehê radizê? Û xwe ji çi tozê diparêze? Ha?", dizivire û li yekî digere ku destekê bide peyvên wî, û gotinên xwe berdide: "Wê çi biba eger zeytûnan li şûna zeytê av herikandibana?"

Kesên rûniştî guh li axaftina Hemdî ya dawî ku li ser zeytê û dermanên poran bû nekirin, çiku wan di wê katê de piştgiriya gotina Şêro Baban dikirin ku behsa tenekeyên dimsa tirî, û çewalên xurmeyan dikir. Êdî Hemdî xwe hinekî komî ser hev kir û di nav derxistina dû re pirsyara Mem bi dizî dikir û nearamiya xwe ya veşartî jî bi dû re berdida. Qadir Hemo bi dengê xwe yê ketî û destê xwe yê li ser gepa xwe ya ji ber diranekî kurmî werimî ew veciniqand û pirsî: "Ka Mem?", Hemdî şiyar bû mîna yekî ku li hêviya kesekî bû ku jê re fitîla peyvê vêxîne: "Li cehnemê ye", Qadir ji bersiva Hemdî û hêrsa wî ya ji nişkêve veciniqî û got: "Mem xortekî baş e.", Hemdî peyva wî birrî û got: "Heta di cehnemê de jî xortekî baş dikare xeberê bigihîne malbata xwe ku ew di cehnemê de ye." Hinekî din ji kesên rûniştî xwe avêtin nav axaftinê û pirsîn: "Xêr e çi heye Hemdî?", Hemdî li wan vegerand: "Ji sibehê de venegriyaye malê", hinekan bi dengekê aramker got: "Ji sibehê de? Ê ev ne xem e. Hin hene bi rojan

bêxeber dimînin Hemdî, dawiyê li Bêrûtê yan li Diyarbekrê derdikevin. Xort me'zûr in."

Hemdî di peyva xwe de "Ji vê sibê de" fikirî. Na. Ew ne bawer e ku kurê wî sibeha wê rojê derketiye, çiku Hemdî zû ji xew radibe û wî nedît ku Mem ji mal derdikeve. Bivê nevê ew bi berbangê re derketibe. Erê. Lê ew ji vê jî ne piştrast e. Dibe ku ewê meselê bi şeva çûyî re muqayese dike dema ku dît kurik berbangê bi nêrdewanê ve hildikişe mîna ku ji derve tê. Lê dipirse: "Ma ewê li derve çi bike wê berbanga hênk î ku xew têde xweş e?", paşê mîna ku li ser vê şiroveyê lêborînê ji xwe bixwaze dibêje: "Ez nîvraketî bûm, ma çawa ezê bizanibim ku ew ji aliyê deriyê malê de hatiye?"

Kesboya li aliyê din î hewşê dikaribû ji wî bêtir nas bike ka di kîjan seetê de ji şeva çûyî Mem derketibû. Lê ew vegeriya malê. Hêlînê li ser dengê hilkişîna birayê xwe rabû û diya xwe şiyar kir û bi delaliyeke xilmaş gotê: "Ez ditirsim", diya wê serê xwe rakir û bi çavekî tenê nihêrî, dîsa serê xwe danî ser palgehê û got: "Rihê min ew Mem e." Kesbo van giliyan ji kûraniyên xwe yên bêdeng re dibêje lê ew baş dizane ku kurê wê îro piştî ku êvarî ji serê ban daket û terqîneke sivik ji deriyê hewşê yê hesinî li pê xwe hişt, nema vegere. Ewê tu tirs wê rojê, berevajî Hemdî, diyar nekir. Di wan saetên şevbuhêrka bi hevalên xwe re jî ku bi dûrûdirêjî behsa razên avê dikir, ew aramtir bû: "Her tişt li ser avê ye mîna palgehên li ser cilikekê." Kesbo got û pêde çû: "Temen, jiyan, nîmetên Xwedê, qeder, zarokên jidayik dibin, mirî, ezman, erd û ba ev hemû di rêzekê de li ser ava rûbarî rêzkirîne", çaxa ku jinek ji wanên rûniştî dibêje: "Li ser ava çemê Cexcex", Kesbo bi qerf lê vedigerîne: "Ev çemê ku xelk têde mîz dikin li kû ye û rûbarê Xwedê yê ku ne bi erdê dibe û ne jî di cokekê de diherike li kû? Çemê Cexcex li gor aşê Qamişlo hatiye afirandin, aqilmezinino."

Hemdî jî bi avê mijûl bû bêyê çi pêşgotinan, lê hevalên wî yên şevbuhêrkê her behsa nirxên patozên nû yên rojavayî ku bi awayekî otomatîk pûş dikin gurz û ne mîna patozên din ku pûş mîna berfeke zêrîn didêrin, her weha ewan behsa nûçeyên dawî yên barkirina "Heccana" dikirin ku ew jî pasvanên çolistanê bûn û dewletê ew anîbûn bakurê Sûrî yê Kurdî û ewan tirs berda bûn dilan bi kiryarên xwe yên talangeriyê, wan hindik mabû bajarên biçûk û gund jî talan bikira eger Xwedê ilham nedaba hikûmetê ku wan bişîne herêmên qûmê yên dûr.

Wêneyê mezrîbekê pêşî hate bala Hemdî ku li banê odeya malê nihêrî, ew ban xwar xuyabû mîna ku dê av ji nişkêve biherike hewşê. Ji xweber wî berê xwe da alî bîra kevînimik ku li rex wê du stûnên hesinî û jora wan stûneke din wan digihîne hev û di nêvî de bekereyek her ku yek dewla avê dikişîne dike zîqezîq. Dewla latîkî ya mezin ji Hemdî ve mîna serekî jêkirî xuyabû.

Bîra mala Hemdî ya li aliyê bakurrojhilatê hewşê kûr e. Kolana wê demeke dirêj ajot heta ku av derket, tevî ku mala Hemdî dema hatibû avakirin coyeke av di ber esasên wî re diherikî, ew cok ji cihekî dihat ku mêrik tew serê xwe jî bi naskirina jêderê re neêşandibû. Ew coya hanê ku pûng li herdu rexên wê şîn hatibû piştî çend salan çikiya lê demeke dirêj di bîra wî û jina wî Kesbo de mabû ji ber ku him aveke şêrîn bû him jî wensa wê, bi taybetî şevên havînan, gelek bû. Ew wisa bû berî ku sûrê hewşê ava bikin ji ber ku malin nû li hawîrdora wan mîna kakivîlkan şînhatin, ew mal dibe ku bûne sebeba miçiqandin wê coyê jî ku xuşexuşa wê wa nermik bû dema ku li ser keviran û di kûraniyên wî û jina wî de diherikî û ji Mem û Dîno re rêya zarotiyeke di nav pûngê de û bi pîrebokên avê û kurmikên sor û kevjalên biçûk û kêzikên avê re û li ber dengê qurequra beqan vedikir. Kêfa Hemdî dihat ku destmêja xwe êvaran bi ava wê bigire piştî ku

kelpîçekî çemento li keviyê wê datanî daku pê li heriyê neke, herdu cêwiyan jî bi gelek qerebalix hawê bavê xwe dikirin û cilên wan şil dibûn. Avrêja wê coyê roj bo roj tengtir dibû û keviyên wê yên zuha yên tijî hevirên biçûk û herî fireh dibûn li dora wî tayê avê yê ziravik î ku her û her ziravtir dibû heta êdî dikire helkehelk dema di ser qîtik yan çiqliyekî biçûk re ku dikete rêya wî derbas dibû. Paşê ew ta jî winda bû û li pey xwe li ser qûma hûrik şilahiyeke mirar hişt û hinek qalikên heywanan ku Mem û Dîno xistin berîkên kirasên xwe heta ku êdî li nav nivînên wan jî xuyabûn.

"Tu avê dixwazî?" Dîno ji bavê xwe yê ku li ser hev kuxiya pirsî, kuxika wî ji ber cigareya ku Keftarê Hesenê li rastî wî rûnişibû keremî wî kiribû. Hemdî serê xwe bi wateya erê hejand, êdî lawik li ser çokên xwe çû ber bi satilek ava li nîvê wan herdu rêzên mêvanan bû, tasikek bi destik ji ava wê ya ku parçeyek qeşa bi ser ketibû dagirt û bi eynî awayî vegeriya û da destê bavê xwe. Hemdî tasik pêşkêşî mirovên din kir bi edeb û rêzgirtin, lê ewan "Noşîcan be" gotin û êdî wî qurt bi qurt ew av vexwar û tasik li Dîno vegerand, ewî jî ava mayî bi ser kevirokan de rijand û tasik li wê satila sar î hesinî vegerand û paşê ji ber xwe ve rabû û çû ku çayê ji wan mirovên ku êdî bê çayê bêzar bûbûn re amade bike, çiku yek kes ji wan nikare rê ji zengeloka xwe re wê şeva sivik û cesûr veke eger ne qurtin xurt ji wê ava keliyayî vexwe. Dîno di nav xeleka jinan re derbas bû û çû aliyê din î hewşê, diya wî xwe sipartibû piyê textekî ji wan textan. Li metbexê Dîno çaydanê şîn î herî mezin di nav çaydanan de tijî av kir û danî ser êgir û peyal amade kirin. Ku av keliya Dîno kulmek çaya reş î hişk avête nav peqpeqok û pêlên wê ava keliyayî û devê çeydên girt û ew deqeyekê ji kîna keleboxê re hişt, paşê ew bi destekî rahiştê û bi destê din jî peyal û şekirê li ser tebeqeyeke heta qeraxan tijî gul danîbû rakir.

Firfira vexwarina qurtên çayê da ser sîrkesîrka çirçirkekî ehmeq ku hîn li ber şewqa lempeyê ya ku li aliyekî dareke kafûrî xistibû hişyar mabû. Hespê nebî jî xwe avête ser tebeqeyê û dengek jê peyda bû ku hişt Dîno bikene û bibêje: "Para xwe ji çayê dixwaze", paşê hêdî ew bi tiliyên xwe rakir û avête pişt xwe. Ketina kêzikê xişxişeke sivik li ser şijikan çêkir û paşê jî xiştexiştek din jê hat lê kesî guh nedayê. Li aliyê din î hewşa tarî dengê tiqetiqa kenîn dabû ser bihevçûnên keçikên Hemdî yên bêsebeb û paşê deng daket û her weha dengê mêran jî daket û êdî aramiyeke ku mirov dikaribû zimanê xwe bidayê li hewşê belav bû û pêre jî refekî gulestêran[4] mîna galaksiyekê (stêristanekê) ji hev belav dibû û dihate hev, pêl bi pêk, mîna ku tarî bi darê xwe yê kevanî hiriya beranekî ji ronahiyê dijene.

Gulestêr -ev kurmikên bi bask û ronîdar- bi xwe tena tena di hewşan re giran difirin û êdî zarok wan di mista destên xwe de kom dikin lê ew hingî ku nazik in tavilê dimrin. Ew bi xwe ne asayî bû dema ku gulestêr di refekî de di hewşa mala Hemdî de firiyan û qûnikên wan şewqeke qutoquto dida. Ew cara yekem bû ku qîjeqîj bi keçikên Hemdî yên biçûk neket, ew bi xwe dema wan kurmikan dibînin dibezin melkesan û pê li wan didin û digrin, loma jî di cihên xwe de li ser nivînan rûniştin û destûra awirên xwe dan ku herin nêçîra wê stêristana ronî ya ku çend bostan dûrî henasên wan difiriya. Ew gulestêr jî ewê ji fira xwe ya giran bawer, hîç ji xwe nepirsîn ka hikmet çi ye ji hatina wan î mala Hemdî di refekî de ku hema li ser serê mêvanan re digeriya weke ku dixwest bi wan rûyan şa bibe.

Dema ku mêvanên Kesbo, yekê li pê yekê, destûra çûnê xwestin û her yekê digot ku bûye dereng, wan gulestêran hîn jî li ser pêleke tenik ji tariya hewşê avjenî dikirin, lê hinekî ji hev belav bûn dema ku mêr bi hev re rabûne ser xwe û çûn di deriyê hewşê yê hesin re derketin. Ji wan gulestêran çendek

4. Gulestêr: kêzkên bi şev difirin û şewq didin.

man û ji wî cihê ku lê difiriyan ji xwe re çavdêriya çûna Dîno ya nav nivînan kirin, her weha çavdêriya rûniştina Hemdî kirin ku bi tenê li ser kulavê di gel cigareyên bû û her ku ewî qûnikek bavêta ser şîşikên hewşê agirê cigareyan belawela dibû. Ew çend gulestêr jî paşê belav bûn dema ku Hemdî dawiya dawî li ser taxûkeke ji nearamiyeke kedî şemitî valahiya xewê.

Gelo ma wan gulestêran hewş li pê xwe hiştin? Kes nizane. Jixwe eger li wê mabin jî û xwe li qelşên dîwaran û di qaşilên herdu darên kafûrê girtibin, şewqa berbangê ew tarûmar kirin û desthilata ku tariyê dabû wan ruxand. Hemdî berî her kesî ji xew rabû û tiştek ji wan gulestêran nehate bîra wî ji ber ku ew li sebeba xewa xwe ya di kirasê xwe de li ser wî kulavî geriya. Ew wisa razabû û cilika nimêjê avêtibû ser xwe û lerizîna sermaya berbangê ketibû roviyên wî dûrî wê nivîna xweş î ku divê mêr di nav de razê. Û berî ku Hemdî kûr di sebebên ku ew ji bo cara yekem di jiyanê de dûrî nivîna jina wî kirine de bifikire, kufletê wî yek li dû yekî ji xew radibû, hin diçûne avê vexwin û hin jî ji ber zexta li mîzokê dibû berî didan daşirê, lê hemiyan jî bi wê yekê dizanîbûn ku, bêyî lêbikolin, Mem ne di nav nivîna xwe ya li serê ban de ye.

Kes li gel kesî neaxivî ji bilî çend peyvên girîng. Taştê her ew bû lê xirecira sibeha ku dilikumî li pirtikên nan û hûrikên şekir û dilopên dimsê yan hingiv û keleboxa çayê û zeyta ku gogên mastê hişk têde avjenî dikir, nemabû. Hemdî û jina xwe Kesbo bi hev re rabûn, wî li wê dinêrî û wê li wî. Çaxa ku kefiya xwe ya belek li dora serê xwe mîna şaşikekê gerand, ku nîşana derketina wî bû, Kesbo bi qevdika kirasê wî girt, wî jî serê xwe bi erênî hejand lê nizanibû erê ji çi re! Û berê xwe da deriyê malê û derkete dikana xwe.

Roj giran û xurt bilind bû û sî hêdî hêdî vekişiyan eynî mîna ku Kesbo û keçikên xwe vekişiyan hindirê malê û bi qehr li hev

dinêrîn. Dîno jî piştî saetekê ji derketina bavê xwe gavên wî ew ber bi sûka qumaşan ve birin da ku ew jî mîna mêrekî nêzîkî wê rûbirûbûna li gel bûyera windabûna Mem be. Dema ew derbasî dikana bavê xwe bû dît ku ji şoferekî re dibêje ku bila li bîroyên otobusên ku diçin Heleb û Şam û Amûdê û Dirbêsiyê û Tirbespiyê û Hesekê pirsa Mem bike, dibe ku ew bi hoyekî ji hoyan çûbe wan bajaran.

Divabû ew lêpirsîn lidarbiketana heta dawiyê, tevî ku Dîno û bavê xwe dizanîbûn yek parçe jî ji cilên Mem ne kêm e û Mem hîç ne bi hewce ye ku ji malê yan ji xwe bireve. Ma ewê li wan bajaran çi bike? Boyaxçî be yan çayçî be? Malê Hemdî heye û dikare li xwe û zarokên xwe xerc bike, lê kula wî ya mezin ew bû ku nikare herdu kurên xwe bişîne zanîngehan, yan jî wan bişîne derve bi sebeba qedereke ehmeq î ku nehişt kaxezên wan ên fermî temam bin, ew kaxezên ku ji ardê textê daran û şîrêzê saz dibin û bi murekebekê mohrkirîne ku kîjan zarok be dikare wê bi ser teriya cewrikekî de birijîne.

Bi qijeqija germê re ku du destên terikî dane ber nîvroya bakur, encamên destvala yên lêpirsînan hatin dikana Hemdî: Mem neçûye çi bîroyên seferê yên bîna zeytên madenî ji wan difûre, ew ne di hebsê de ye jî. Yanî li pêşiya Hemdî tu tevdîr ji bilî biçe xeberê bide qereqolê nemane. Wê qereqola ku neferên wê winda dibin û kes nakeve pey wan. Hemdî û Dîno bi şoferê Mercedesê Marûf Gopal û xwarziyê katibê dadgehê yê ji bajarê Humsê Welîd El Neşşab çûne avahiya kevirî ku li bilindiyekê ye û li deviyê ku sînorê Tirkî û Sûrî ji hev cuda dike, dinêre. Ew zêdeyî bîst deqeyan li hindir neman, serbazekî her agahiyên ku Hemdî û kurê xwe dabûn, nivîsîn û soz da wan, di ber re destê xwarziyê katibê mehkemê diguvaşt, ku çi ji wî were dê bike, û bi rastî jî qereqolê karekî neasayî kir wê êvarê, wê polîsekî xwe şande mala Hemdî, û ku çawa ew gihişt ber derî heta bi xurtî lêda û keçeke Hemdî derî vekir, ewê polîs stûyê xwe di derî re

dirêjî hewşê kir û got: “Ez dixwazim bi zilamekî re biaxivim. Bavê te li mal e?” Keçê sere xwe bi erênî hejand û winda bû heta ku Hemdî hat û hemû keçên wî yên mereqdar li gel wî bûn. Lê ê polîs xwest tenê bi Hemdî re bicive, rabû Hemdî keçikên xwe dûrxistin û ew û karmendê dewletê yê ku kum li serî bi tenê man û kirin pistepist.

Matmayîneke gewre keçikên Hemdî girêda dema ku wan li gavên bavê xwe yên ku di siya gavên ewî polîsî de winda dibûn nihêrîn, berê herduyan li jîpeke leşkerî bû ku wê jî berê wan da kolana pehn a ku diçe navenda bajêr. Ew keçik vegeriyan hewşê tenê Rohat na, ew bi dû jîpê de hinekî reviya da ku binêre ka bi kîjan alî ve diçe lê ew vegeriya û baweriyeke ku ji dûmana berêvarê ne zelaltir bû bi xwe re anî.

Dema ku Dîno piştî çend deqeyan ji ciyê duristkirina patozan ku konekî du carî li hewşa mala Hemdî mezin bû û Şêro Babanê bêsiûd ew vedabû, vegeriya û derbasî hewşê bû dît ku dê û xwehên wî di nava bêdengiyeke sawdar de mane, di demekê de ku divabû çerqeçerqa kevçiyan ba li ser şîvê, û divabû mil li milan biketana dema ku bedenên li ser erdê rûniştî xwe bi ser sêniyan de xwar bikirana, divabû wê demê xirecira keçikan jî ba, qurîncok bidana hev û kulmisk li hev bidana. Û çawa ku ew derbas bû diya wî gotê: “Cîranekî me bi xwe re bibe û herin qereqolê.”, ku Dîno pirsî “Qereqolê?” Kesboyê got: “Polîsan bavê te birin”, rabû Dîno got: “Ma wê çi ji bavê min bikin? Hemî ji qumaşê wî dixwun yadê!”, û zivirî çû derve bêyî wê tirsa ku di ahenga dengê diya wî û di rûyê xwehên wî de hebû. Paşê ewî berê xwe da mala Cebbûr Murqusê Suryanî yê zimanxweş î ku nasên wî li qaymeqamiyê hene, ewî camêrî yekser xwe kar kir û ji Dîno re got: “Xeman nexwe”, û rabûn herduyan berê xwe dane qereqolê.

Şaşiyek hebû. Polîsên qereqolê ji Dîno û Cebbûr re gotin ku Hemdî nehatibû ji ber tawanekê lê ew ji bo ku biçe

nexweşxaneyê û termê li wê nas bike hatibû. Peyva “term”, ya ku jixweber û sar ji devê neferekî qereqolê derket, wisa zivir mîna kevirekî qûmê bi ser hinavê Dîno de hate xwarê, ewî di bin tesîra gêjbûneke ji nişkêve ku ji herdu cênîkên wî hilat got: “Termê kê ye?”, yê polîs gotê û çavekî xwe firkand: “Em nizanin. Xeber dane me ku termek li nexweşxaneyê ye. Ji ber ku we jî ji me re gotibû ku hûn li xortekî winda digerin me xwest hûn lêbipirsin, dibe ku... Ma kî çi dizane?”

Dîno û cîranê xwe Cebbûr di korîdorên nexweşxaneya bêdeng de dimeşiyan. Tenê dengê kuxikekê û dengê terqîna kabên solan li ser mermerê ku dinaliya dihat. Ewan herduya dabû pey meryolekî spî û bişkok vekirî ku li çîmên xortekî digeriyan. Wa diyar bû ku hebûna wî xortê ecele bi hebûna wî meryolî ve girêdayî ye, ewî bi dengê hêdî her di metran digot: “Di vir re... Di vir re...” dema ku hersê gihane nêzîkî korîdoreke dirêj û tarî, dîtin ku wa ye Hemdî li ser bankekî ji text li ber deriyekî ku lempeyeke sor li ser vêketiye rûniştiye. Di bin wê lempeya sor de jî lewheyeke rengtarî heye bi rengê spî li ser nivîsîne: Termxane.

Ew ne gavên Dîno bûn ku wî ber bi bavê wî de dibin, lê ew mermerê spî di bin lingê wî de pêl didan û êdî ew mîna kurmên hejîran bi pêşde de diçû. Dema ku bi bavê xwe re rû bi rû bû, dît ku bavê wî bi hêvî û niyaz lê dinêre, bi du çavên mîna yên zarokekî ku aniha hinek pêde xeyidîne lê dinêre. Cebbûr pirsî: “Çi heye?” Hemdî mîna lalan xuyabû loma jî Cebbûr berê xwe da xwediyê meryolê spî û gotê: “Ma ez dikarim çavekî li hindir bixim?”, û destê xwe dirêjî odeya girtî ku lempeya sor bi ser derî de vêketiye de bi xortê xwediyê qafê xwaromaro got: “Ne niha. Ew bi otopsiya term daketine, hindik maye biqedînin.”

Saetek nebuhurî di ser wê axaftina sar î di navbera Cebbûr û xortê nexweşxaneyê de yê ku xwe bi wê berdilka firiştan a spî û bîna penselînê jê difûriya didît, yekî deriyê termxaneyê vekir

û derket û awirin bêwate di Hemdî yê jihevketî î li rex wî cîranê wî yê suryanî vedan. Awirek di Dîno jî veda ku jipê û devvekirî û çîm ji hev dûr bû û pişta xwe dabû dîwêr mîna yekî li hêviya nêçîrekê be. Ewê ji derketî hindik mabû bihata xwarê dema Hemdî bi milê wî girt, paşê ji nişkêve Hemdî xwe rast kir û got: "Hûn çi ji min dikin!", ewê ku ji termaxaneyê derketî pirsî: "Tu?", û li dora xwe temaşe kir û berdewam kir: "Kî dixwaze xerabiyê bi te bike?", êdî Hemdî milê duxtor, yan kesê ku qaşo duxtor e, berda û Cebbûrê Suryanî bi dengekî bixwebawer got: "Em dikarin ewê di hindir de bibînin?", duxtor, yan wî kesê ku wan ew duxtor hesiband, got: "Erê jixwe. Ma hûn xizmên wî ne?", Cebbûr bersiv neda ji ber ku ewî xwe derbasî termxaneyê kir û xwest ku bibe kesê yekemîn ku term dibîne da ku derbê li Hemdî û kurê wî ku herdu jî dilerizîn sivik bike.

Hemdî hîn nizanibû ka ew term yê kurê wî Mem e yan na, çiku ji dema ku polîs ew bi otombîla xwe gihandibû nexweşxaneyê, ew her li cihê xwe rûniştî mabû. Wî xortê ku meryolê wî dida pêşiya wî jê re gotibû ku divê ew li hêviyê be heta ku duxtor term vedinêrin, û Hemdî mîna gunehkarekî bi ya wî ciwanî kiribû û hema bi ser wê banka texte de hatibû xwarê.

Ewê li ser maseya mermer î dirêj î nighewsinî ramediyayî Mem bi xwe bû ku du kes di berdilkên spî yên bi xwîn de li rex wî rawestiyane, yekî sêyem jî bi lez derket û li saeta xwe nerî. Ew ciwanê dirêjkirî zerhimî xuyabû û tayên porê wî bi eniya wî ve zeliqî bûn. Tenê rûyê wî diyar bû, ji ber şerşefeke spî bi lekeyên xwînê laşê wî veşartibû.

Cebbûr ji term dûrket û hat Hemdî bi xurtî hemêz kir û di wê navê de dengê giriya, Dîno yê xeniqî bilind bû, herdu xwediyên meryolên spî hatin bi gotinin sar î bê mebest ber dilê wî dan. Paşê bûyer lezandin û hinek hatin maseya term li ser di korîdoran re kişandin û sîrkesîrka tekerên wê da ser giriya kur

û bavê xwe. Li ber derî ambulanseke derî vekirî rawestiya bû û amade bû ku term, Hemdî, Dîno û Cebbûr bigihîne aliyê ku Cebbûr destnîşanî wê kir, şofêrê ambulansê -yê ku cigare di quncikê devê wî de bû- serê xwe hejand û got: “Ezê bifirim”, û deng da wê borîzana şeytanî ya ambulansê.

Gelek xelk wê şevê bêdeng li hewşa mala Hemdî û derveyî wê kombûbûn mîna ku li hêviya kesekî bûn daku rabe wê heneka giran belawela bike. Heta wan jihişçûnên Kesbo yên ku dubare dibûn û wê lixwexistina keçikên wê ku bi çavin zuha û mendehûş temaşe dikirin jî kesek iqna nekir ku trajedî bi bêşermiyeke nelayiqî wê li ser agirê qederên malbatê pijiyaye. Ew bi xwe bela û trajedî ku tên divê rê ji derbasbûna xwe ya bi xirecir re vekin heta ku xelk xwe amade bikin û xwe ji mendhoşiya xwe re bixemilînin.

Her tişt wê êvarê qut û birrî bû, îskeîska ku ji nişkê ve destpêdikir ji nişkê ve dihate birrîn jî, wîrewîra ku ji nîşkê ve parçe û belav dibû ji nişkê ve dihate hev jî, yê rûniştî tavilê radibû jipê disekinî, yê jipê hema dihate xwarê û rûdinişt, tenê termê Mem ê li ser doşeka li nêzîkî bîrê dirêjkirî di wî cawê gewrî spî yeker bû. Kesbo bi ser de xwar dibû, ew maç dikir û vedikişiya û ji ser hişê xwe diçû, êdî du jinên ku li dorê bûn ew digirtin. Hin jinên din jî keçikên wê biribûn odeyekê da ku nûzenûza wan a lawaz dûrî sertiya zengelokên şînger bin.

Şeva di ser wê koma ku belav bû re, şilekî bû, tenê du jin li cem Kesbo man û Qadir Hemo jî bi Hemdî û Dîno re ma. Yên çûbûn jî bi her halî uzrê wan hebû ji ber ku êvarê pêşwaziya wan bi wîrewîrê kir û hîn xwarin di hûrên wan de nehiliyabû. Ewan soz dane xwedema di derî re derdiketin ku sibe werin taziyê. Lê Hemdiyê ku hinekî dûrî laşê kurê xwe rûniştî bû ne bi hacetî sibe û taziya sibe bû ku dê mereqdar bi koman werin û hewşê tijî bikin. Ew dixwaze, bêyî ku kesek wî bibirre, saetên berî ku polîs were û wî bibe nexweşxaneyê vegerîne. Hemdî ji

saet û roj û salên berî mirina Mem bi xedrekê dihise û dema ku dê piştî wê kêlêkê were Hemdî nikare bibêje ku ewê demeke xwerû be, dibe ku bazarek be ne dem be, bazara tûtinê yan cawekî be, bazara patozin ji siûda Şêro Baban dîntir be û ji rengçîna wêneyê Simko Axa yê di berîka Qadir Hemo de hindiktir be, bazarek mêşin hingiv î ku bi xişm dikevin dilekî derblêket û derdikevin.

Ma dê çima dem ne bazarek be? Hemdî dê dem û bazarê tevlîhev neke, dem bi şûn de maye, piştî derketina termê Mem li termxaneyê maye, lê bazarê wek baweriyeke xwerû êdî destpêkiriye û ji Hemdî re, di kûraniyeke bilind î wî de, mîna zarokeke bêcirr î diranfîq difîkîne.

Şev di ser wan herdu jinên bi Kesbo re mayî şilekî bû, di ser Qadir Hemo re jî ku li ber Hemdiyê bêdeng û kurê wî Dîno bû di xew re diçû. Dîno li himber bavê xwe li ser kulavê bû, ew jî bêdeng bû û bi çavên xwe yê ku keskiya wan tev li ava ku Mem daqurtandibû dibû. Hemdî jî li eniya kurê xwe yan li milekî wî dinêrî û awira xwe ji çavên wî yên razdar î ku li valahiya parsekî di hindirê Hemdî de bûne yek dadigerand, mîna ku Dîno pirsan li pê hev ji bavê xwe dike, pirsa sihra ku hiştibû Mem xwe radestî avê bike, û li kû? Li çemê Cexcex yê nizmik ku xortekî mîna Mem bi ser ava wî dikeve û dikare ji jêdera wî heta avrêja wî bimeşe û cigareyê ji qûna cigareyê vêxîne bêyî ku şil bibe. Lê tiştê ku Hemdî û Qadir Hemo û Cebbûr diheyirand şopa xefka roviyan î li ser çîmê Mem bû, Cebbûr yekemîn kes bû ku şiroveya herdu duxtorên nexweşxaneyê bihîstibû, ewan piştî ku qefesa sîngê wî vekiribûn gelekî li pişikên Mem yên tijî av nerîbûn û gotibûn: “Ev xort di avê te fetisiye û gelek xwîn ji çîmê wî herikiye.”

Ê de ma wê Dîno bikaribe êdî di rûyê bavê xwe de çi bibîne yan Hemdî di çavên kurê xwe de? Kesin nenas termê Mem ji nav ava rawestiyayî ya koşerêya Cexcex derxistibûn ku li nêzîkî

xirbeyê Firensiyan bû. Ew xirbe û kavil sekoyên çemento bûn û hewdikên bi sûr bûn ku artêşa firensî ya ji ber dizanterî û belharsya û traxomayê, û ji ber gumana di xayintiya jinên devjêberdayî jî reviyabû.

Wê demê serkeftin jî -her wekî pirtûkên dîrokî yên herî nû li Sûriyê dibêjin- li gelên Sûrî bi wekhevî belav bûbûn, wekheviyeke ku yekîtiya bêguneh di nav milletên herêmê de diparast, lê bêhemdî xwe Kurd jibîrkiribû.

Dema ku termê Mem hate nexweşxaneyê û kesî lê nepirsî û qereqol jê agahdar bû, polîsek şandin mala Hemdî û bi hev re hatin nexweşxaneyê, yê polîs gotê: “Eger ew termê kurê te be ezê sibe werim ba te ku qeyda sebebên mirinê binivîsim.” Sebebên mirinê jî, ewê ku dê Hemdî sibe ji wî neferê polîsan re bibêje, dilê Hemdî naxin cih. “Ew fetisiye.” Jixwe ew nefer dê wê hevokê binivîse, çend gotinên berdildanê bibêje û hew. Lê giyanê bavê ê perçekirî bi wan şopên diranên xefka roviyan -her ku laşê wî bikeve xew- dê li nav odeyan û li hewşê bigere. Dîno yê ku wê êvarê bêdeng li bavê xwe dinêrî dawiyê got: “Bavo çi mesela şopa xefkê ye li ser çîmê Mem?” û serê xwe berda jêr bêyî ku li hêviya bersiva bavê xwe bimîne. Paşê dîsa serê xwe rakir û li Qadir Hemoyê ku çena wî bi sînga wî ve zeliqî bû nerî û bostekê du bostan hate nêzîkî bavê xwe û got: “Bavo”, bavê bi çavê wî yên di tariya hewşê de nedihatin dîtin de ziq nihêrî, û Dîno pêde çû: “Berî çend rojan min du caran Mem di xew de dît, û min her carê xewna xwe ji bîr dikir, niha tê bîra min”, eniya xwe damalan, bi alî bîrê de nihêrî, xûşka wî Hêvîn digiriya û bi alî diya xwe de ya ku di nav du jinan de winda bûbû çû, paşê Dîno vegeriya li bavê xwe mêzekir: “Em herdu jî li Qibrisê bûn.”, Hemdî got: “Qibris? Ez dibêjim min ev nav bihîstiye.” Dîno got: “Me di pirtûkên cografiyayê de derbarî wê de xwendiye bavo. Ew giraveke şikelê wê ecêb e, li nêzîkî peravên welatê me ye.” Hemdî bi dengekî nizm pirsî: “Girav e?

Yanî av li hawîrdora wê ye?", Dîno got: "Erê", bavê wî got: "Tirsnak e", Dîno gotina wî birrî: "Çi?" Hemdî di nav dûyê cigareye xwe de got: "Ku erd ji her aliyê xwe ve bi avê dorpêçkirî be."

Dîno hinekî bêdeng ma, dişibihî masiyekî ku di bavê xwe de difikirî yan jî di herfên navê wê girava ku mîna masiyê bi terî ye, bavê wî bi dengekî lerizî jê pirsî: "We li wir çi dikir?", Dîno got: "Ez nizanim çima em li wê giravê bi xwe bûn, lê em li wir bûn bavo. Ewî dixwest ez bizewicim. Tu bawer dikî? Wî dixwest min qani bike ku ez bizewicim.", dema ku wî dît bav lê guhdarî dike berdewam kir: "Qenc nayê bîra min ka ev xewn bû min pêşî dît ya xewna din bû ku ez têde bi çarlepikê ketibûm pey wî. Erê. Min reveke sivik li ser dest û lingan dikir. Min dixwest ku ez biaxivim lê min nikaribû. Lê ez kêfxweş bûm bavo", li satila avê zivirî tasek dagirt û vexwar, devê xwe bi zendika xwe paqij kir û pêde çû: "Mem bi çar mirovan re bû, li deriyên malan dixistin û li kesekî dipirsîn. Ez jî..." peyva xwe got û lêva xwe ya jêrîn dirêj kir: "Ez li ser dest û lingan dimeşiyam. Tim di xewnên xwe yê bi Mem re de ez li ser dest û lingan dimeşim. Lê ew girav... Ma xewna min ji wê pê ve nedît?"

Ma wê Hemdî çi şirove li ser xewnên Dîno bida? Hema wî berê xwe da wî termê mîna topek cawê spî ku li ser refekî ji refên mexazeya wî ye û serê xwe daqûl kir heta ku çena wî li sînga wî ket û da giriyekî ku bayê li dora Qadir Hemoyê di xew de çelqand û ew ji xew rakir. Piştî kêlîkekê Hemdî devê xwe û gepên xwe bi cemedana serê xwe paqij kir û bi niyaz got: "Ya reb... Ya reb", rûyê xwe bi alî kurê xwe Dîno de rakir û paşê bi alî Qadir Hemo de zivirand û gotê: "Piştî nîvro ez bi aciziyekê hisiyam dema min li wî nûçebêjê..." Hemdî rawestiya û li sifetekî pîskirinê geriya, lê gera xwe bi paşde xist û mîna ku bi xwe re diaxive pêde çû: "Min xewa nîvro nekir, yê nûçebêj pir

behsa avê kir, ewî ez gêj kirim hingî bibêje ku filan giya gelekî bi hacetî avê ye, bêvan giya na. Filan dar tenê li ber avan mezin dibe, bêvan dar ku li nêzîkî avê be wê bixeniqe. Ez gêj kirim evê....", û cigareyek pêxist û bi çend peyvên Erebî kire birebir, bi aksenta xwe ya Kurdî ew nermik bi lêv dikirin: "Rukn'el-Tebî`a"[5] ku navê bernameyekî kinik î rojane yê izgehê bû û berî bultena nûçeya diweşiya. Paşê dîsa navê bernameyê dubare kir: "Rukn El Tebî`a", û kuxiya: "Ez li wê bernameyê guhdarî nakim illa ji ber ku dikeve pêşiya nûçeyan. Ew bêjerê ku min gêj dike tim mêşeke şîn li dora wî dike vingînî. Ez vingîniya mêşên şîn ji yên din nas dikim. Dibe ku ew bêjer derbasî izgehê dibe û rêxa çêlekan di berîka wî de be.", Hemdî di bin gumlekê bişkok vekirî re sînga xwe xurand bêyî ku guh bidê ka herduyê li ber wî rûniştî guhdariya wî dikin yan na: "Çima ev bêjerê ehmeq dixwaze em hewşên xwe bikin bistan? De emê li kû razên îca? Em li kû herin û werin? Wê mêşên Kesbo aware bibin bêguman, dibe ku em jî werbigerin kêzikin biçûk da ku em bikaribin ji cihekî biçin yê din." Û wî çavên xwe girtin û gotinên ku bêtir dikarin di tasa serê wî de bi rîtm bin anîne bîra xwe: "Baxçe... baxçe...", got û bi qehr berê xwe da Dîno: "Ka bêje çi ji me dixwaze evê...?" Dîno bi dengekî hêdî gotê: "Bavo ew tiştekî naxwaze. Karê wî ew e behsa baxçeyan bike û hew", Hemdî tiliya xwe hejand: "Na. Ev ne kar e, ev têwerdaneke ehmeq e di karûbarên xelkê de", û destê xwe yê bilind daxist û got: "Ma nikare karekî din bike qey?" Dîno got: "Bavo ev karê wî ye."

Piştî wê axaftina kin a di navbera kur û bavê xwe de bêdengiyeke dirêj hat. Di navberê re dengin ji zengelokên kesên li dora termê Mem rûniştî hatin û tavilê qut bûn mîna ku rê ji seherê re vedikin da ku bi aramî derbasî malê bibe. Di saeta pişt re -ku berbangê bi sîrkesîrka çirçirkekî xilmaş î ku

---

5. Koşeyê Xwezayê. (J. Dost)

xwe bi qurmê dara kafûrê ve zeliqandibû li nêzîkî civata mêran rê pêşiya xwe vedikir- Hemdî çavên xwe dane ser hev û niviya, kete xewekê ku giyanê wî têde ta girtibû, û êdî bêjer ji ser banê ku Mem lê radiza dadiketin, ew bi wan çaketên xwe yên xweşik dadiketin û yekî pê li kenarê çaketê yê din dikir heta ku di hewşa malê de kom dibûn, ewan kaxez dianîne xewna şikestî ya Hemdî, bi niyaz û hêvî digotinê: "Tu bi Xwedê bikî birêz Hemdî, van kaxezan bigre." Ew çaketên xwe datînin û davêjin ser kevirokên hewşê, berê xwe didine Kesbo û diqîrin: "Em mêşên te nerihet nakin Kesbo xanim. Bi Xwedê. Em dixwazin tenê rakevin." Û bi bazdan berê xwe didin wan textên xewê yên mezin, wan ji hev dixin eynî mîna ku Hemdî wan bi hatina payîzê re ji hev dixe, ew wan radikin û berê xwe didin deriyê hewşê yê hesinî, işaretî Hemdî dikin û dibêjin: "Xeman nexwe. Emê niha vegerînin." û bi rastî jî vedigerin, di xewna Hemdî de, û berê xwe didin odeya bi ser ya mêvanan de û topên caw davêjinê, cuxçikan davêjinê ku li hewa vedibin û hibriyên Mûsilê jê dipekin, û ji nişkê ve ji bin darên kafûrê hespekî goşt herijî radibe, rengê wî mîna axê ye, çend gavan bi pêş de tê û tê xwarê, dişikê û bi xirecir belawela dibe. Hemdî hewl da ku biqîre bêyî ku bizanibe çima, û yek ji wan bêjeran hat û çend dane hingîdinyayê zerê zêrîn pêşkêşî wî kirin, ewî nexwest û got: "Simko Axa ji vî meyweyî hez nake." Êdî bêjer di cî de baz da û çû bi aliyê termê Mem ve û ew dane di bin wî cawê spî de ku di bin re li aliyekî serê mirî xuyabû veşartin, serê mirî bi çewalekê şil pêçayî bû, Kesbo ji tasikekê av lê dikir, bi tiqetiqa ken re digot: "Hemdî rabe. Rabe. Tu dereng mayî." Hemdî ji wê xilmaşiya xwe rabû û dît ku milê wî li ser du palgehên bilind e û Dîno li pêşiya wî xwe vedayî li ser kulavê dirêj kiriye, her weha Qadir Hemo jî xwe ji sermaya berbangê komî hev kiriye. Dema ku awireke westiyayî da bakurê xwe, ku li wir termê li ber bîrê dirêjkiriye, Kesbo û herdu jinên din dîtin, hemî di bin

lihêfekê de bûn lê di bin de diliviyan mîna ku ew jî wek wî ji xilmaşiyeke sivik radibin.

Giran bû û nediyar bû ew ronahiya şermokî a ku li ber çavên Hemdî dixuşiya hewşê, mîna ku sibeh pirbêjiyê dike bi zimanekî qurre wek zimanê bêjerên di nav têlên ziravik ên radyoya wî mirovê kezebşewitî de razayî. Ewî destê xwe dirêjî qutiya tûtina xwe kir û cigareyek geş kir. Dûyê wê kûr kişand heta ku gihişte kezeb û gurçikên wî. Paşê wî li aliyê wan textên qerrase ên ku li dora piyên wan giyayekî hişk şînhatibû nihêrî, bala xwe dayê ku Hêlîn ji xew rabûye û di nav nivîna xwe de rûniştiye û awirên xwe li derdorê digerîne, aram û kedî bû ew ne mîna tu caran. Paşê keçika biçûk rabû û di ser çîmên xwehên xwe re buhurî heta gihişt keviyê textê gewre û bi nêrdewaneke du pileyî dakete jêr û berê xwe da cerê avê, li ser tiliyên nigên xwe sekinî û çoçik di devê bilind re daxiste hindir û av kişand û vexwar, av bi ser sînga wê de rijiya, wê çoçik bi cihê wê ve hilawêst û bi gavin giran çû ber bi termê Mem ve û di ser milên wan her sê jinan re kûr lê mêze kir, ew her sê jin jî ji xeweke sivik wek a Hemdî şiyar bûbûn. Keçika biçûk zivirî û bi eynî wan gavên giran berê xwe da bavê xwe yê ku çavên xwe jê nebirrîbûn, û dema ku hat pêşberî wî, bi wî kirasê xwe yê kitan î dirêj î şîn î bêmil, bi dengekî sibehîn re hêdî got: “Baba...” Hemdî vegerand: “Çi ye dilê min?”, keçikê serê xwe xwar kir, li çavên bavê xwe yên kûr çûbûn nihêrî û got: “Çima Mem mir?”

# Para Duyem

Gumanên Dîno ku serencamin din ji cihekî din
siyên xwe bi ser hewşa malê de avêtibin.

Ev cara duyem e, îro, ku ez kincên xwe di vî çenteyê binî zivir de, yê ku me pirtûkên dibistanê têde vedişartin, kom dikim. Kesek ji malbata me dûrtirî nod kîlometran hîç neçûye. Ev cara duyem e ku ez kincên xwe kom dikim ji ber ku bavê min ew vê sibê berî biçe dikana xwe belawela kirin û bi ser min de qîriya: "Dîno bi kû ve?", min nizanibû çi bersivê bidim. Û ku wî pirsa xwe dubare kir: "Bi kû ve? Eger ez bikaribim alîkariya te bikim ezê bikim, tu bes bibêje berê te li kû ye." Min bersiva wî da: "Bavo ez hîn di çi deveran de nefikirîme ku biçimê, lê ez dê çenteyê xwe amade bikim û hew." Û va ye berî nîvro ye û ez bi amadekirina çente re wê perika biçûk î rengcûnikî a ku berê bi hewa ketibû vedigerînim tariya binê çente.

Ez nizanim ew perik ji ku kete nav cilên min ên di çente de pêçayî, lê ew ji nişkê ve li ber çavên min diyar bû dema ku bavê min bi qehr çente vekir û çi têde bû li ser erdê û li ser nivîna min belawela kir. Min guh li cilan nekir dema li hewa difiriyan yan jî ku li dora me diketin, lê tenê wê perikê bala min kişand, bi hatina xwe ya xwarê re di nav wî bayê nearam ê odeya wek bavê min qeherî de çep û rast dihejiya. Min hewl da wê perikê

bigrim berî ku bikeve erdê lê ew ji ber tiliyên min filitî û tavilê li ser tejika zer bi delaliyeke bêdeng venişt.

Piştî çend rojan ji binaxkirina birayê min Mem, ez pê hisiyam ku divê pişta xwe bidim mala me. Ez di cihekî bi xwe de nefikirîm. Di çi bajarî yan welatî de nefikirîm, lê min xwest ez hinekî dûrî wê odeya em herdu têde radizan bikevim, ez dûrî wê hewşa ku hestiyên me sal bi sal ava kiribû bikevim. Û ji ber ku min xwe bi wê xwesteka mezin a çûnê veciniqandibû berî ku cihê dê berê xwe bidimê bi nav bikim, min dît ku ya baş ew e ez bi kêmanî çenteyê xwe amade bikim, û hema min cilên xwe yên hindik hepişandinê, û çend rojan ez bi eynî cilan mam heta bavê min bala xwe dayê û got: “Çima tu pantelon û gumlekê xwe naguherî?”, min bersiv dayê: “Min cilên xwe dane hev”, ew lerizî û got: “Te dane hev? Te li kû dane hev?”, min gotê: “Di çente de.” Ew rabû ji odeya malê derket û berê xwe da odeya min û ez jî li pê wî çûm, wî çente vekir û her tiştê têde belawela kir û cil pekiyan her deverê, wî her dipirsî: “Bi kû ve? Ka bêje min berê te li kû ye?”

Min, ku diya min pantelon û gumlekê min dişûşt jî, bêcemeyê xwe li xwe dikir, ku ew zuha dibûn min dîsa li xwe dikirin. Di nav re min awirin dilovan li çenteyê xwe yê di navbera textê min û dolapa vala ya cilan de bi dîwêr ve sipartî, dolapa cilan jî vala bû ji ber ku mala me kincên mem hemû dane merivên me bi xêra giyanê birayê min ê ku wek ez guman dikim bi şaxekî dareke kafûrê ve eliqî bû. Çenteyê min jî bi awayekî ji awayan dişibihî kêlegorekê hema mirov dikare bibêje ku ew di qelafetê xwe de yekane ye di nav kêlegorên goristana gundê Hilêliyê de ku li tixûbên rojavayê Qamişlo ye û Mem li wir binax bûye. Ew bi xelk li vir kuçan li ber ser û nigê yê mirî de datînin lê ew kêlegor bi formeke hendesî bû, dirêjik û nivîsandineke têkçûyî li ser bû ku sûreyê El-Fatihe û navê kesê mirî bû. Lê ez naxwazim di wê goristanê de werim veşartin, di havînan de gelekî diqelişe û hindik

dimîne mirov miriyan di nav qelşan re bibîne ku çawa bi aletên hesinî, yên mîna aletên tamîrciyê sobeyên mazotê, hestiyên xwe tamîr dikin. Ez jî ji xwe dipirsim: ma çima goristan? Çima xelk miriyên xwe davêjin hevpariyekê ku hîç kesek nizane ka nakokiyên wê çi ne di bin wî qaşilê tarî yê erda ku çavê xwe ji qabhetên mirinê digre? Ez naxwazin min di goristana Hilêliyê de veşêrin. Rêza min ji wan miriyên ku ez wan nasnakim re heye, çiku ewê -her ku rastî hev werin di korîdorên xelekî yên rastiya ku wan di valahiya xwe ya dadwer de dicivîne- gelekî henekê xwe bi zemanê ku xwe bi kêfxweşî pêşkêşî zindiyan dike, bikin. Lê, di gel wê rêzgirtina min jî ez meyldarî wê yekê me ku her miriyek cihekî wî yê nêzîkî nefsa wî hebe, yanî mesela di odeya xwe de were veşartin ne di goristana bajêr de. Ez jî, bi rastî, dixwazim ku li ber dîwarê nêzîkî kewarên mêşan li hewşa me werim binaxkirin. Li wir ezê bikaribim wan kêlîkên girîng bibînim ku çawa di kewarên diya min de şamêşek şamêşa din[1] diqewitîne dema ku li eynî kewarê dicivin. Li wir ezê bikaribim wê viyan û xwesteka nediyar a ku di çavên çivîkan de dibiriqîne dema ku ji ser darên kafûrê êrîşê mêşên tewş dikin. Ez dixwazim nas bikim jî bê çi wê mirîşka cîranan dikişîne dîwarê hewşa me û her saetekê hildikişê tevî ku xwehên min xwe didin bendê û wê dadixin. Ez dixwazim jî nêzîkî wan darên kafûrê bim ku bêdengiyeke giran î ne layiqî dareke ku qaşil ji ser koka wê radibe û mîna paçikan tê avêtin, li wan hatiye pêçan. Lê ew dîmênê wan î kotî dihêle ku bi şev ew herdu dar di neynika hewşê ya tarî de ku ezman mîna fetisiyekî li ber xwe dide bêtir desthilatdar bin. Wekî din jî dibe ku ez bikaribim xeyalê cêwiyê xwe Mem bipêm, çiku ez guman dikim ewê topên caw ji cihê ku bavê min ew têde veşartine ji bo rêwîtiya Kurdistanê bidize.

1. Şamêş: şaha mêşan: Em mêşa hingiv a mezin ku serokatiya civaka mêşên hingiv di kewarê de dike “bombus.” (J. Dost)

Ez naxwazim rojekê ji mirina xwe rabim û bibînim ku heywanên erdê bi hestiyên min lîstine û ew tev li hestiyên kesekî din kirine. Ez şerekî ku serêşiyê peyda dike naxwazim, nakokiyekê ku delî têde parçe dibin dema miriyek ji yê din re bibêje: "Ev hestiyê lingê min e, yan ev lûleyek tiliyeke min e." Ezê bi serrastkirina baweriya xwe mijûl bim, ezê bi durustkirina tariya guhlênebûyî ya li dora xwe mijûl bim.

Niha ez hêvî dikim, piştî ku çend roj di ser veşartina Mem re derbasbûne, ku bavê min li şûna cêwiyê min ez ji bo rêwîtiya Kurdistanê amade kirbama. Lê ez berê di vê yekê de nefikirîbûm. Min Mem ji xwe re dikir armanca henekan, min xwe dixist şûna bavê xwe û serencama wî li ser kaxezên nameyan dinivîsî: "Ha ji şikeftan hebe kurê min, kêzikên cawxur di şikeftan de har dibin û barê te jî caw e.", Mem jî dikeniya.

Na. Ez di çûna Kurdistanê de li şûna wî nefikirîme. Dema ku Qadir Hemo, duhî, hewl da hinekî ber dilê bavê min bide û di ber re avêt ku ez dikarim biçim û got: "Birêz Hemdî Dînoyê te heye. Mêrek di malê de heye." Bavê minê ku riya wî ya sorikî şîn hatibû li min kûr mêze kir, lê min bi lez gote wî mêvanê me ku ew wêneyê Simko Axa yê di berîka wî de şanî min bike, wî jî wêne derxist û şanî min kir, min bi çavekî biçûk li wêne nihêrî û got: "Ev e yê ku dişibihe Mem? Ew naşibihe tu kesî." Qadir pêşwaziya besiva min bi sîngeke fireh kir û wêne nêzîkî min kir û detnîşanî pozê Simko kir: "Dîno ji vir û bi jêr de binêre.", û qirşika di nav tiliyên xwe de ji pozê Simko heta çena wî daxist, min gotê: "Lingên wî dişibihin yên Memî." Qadir jixweber awirên xwe bi jêr de anîn û li lingên Simko, yên ku cihên wan di wêne de nebû, nihêrî, û paşê çavê xwe bi alî min de rakirin û nas kir ez qeşmeriyan dikim. Ewî awirên xwe di min de çikandin û peyvên ku wî dixwest bibêje xwe di ber hev re rakirin, lê wî bi rabûna xwe re, bi tiliya xwe işaretî min kir û got: "Tu fêm nakî."

Bavê min duh hemûyî aram bû, û dema ez îro difikirim ku min bi zirziya xweya ne layiq zulm li Qadir kir, ez di aramiya bavê xwe de jî difikirim. Gelo ma wî lome li xwe dikirin ku çima wî ez jî ji rêwîtiya Kurdistanê re amade nekiribûm? Ma ez bi hewceyî çi me ku ji wê rêwîtiyê re amade bim? Bes bû ku ew bibêje: "Dîno tuyê rojekê mîna birayê xwe biçî Kurdistanê." daku ez xwe amade bikim, bi tirs û mereqdarî û xewnerojkên xwe ve sînorên Tirkî di serî de biborim û ji wir berê xwe li gel rêberan bidim rojhilat û bibînim ku wa ye min hemêza xwe ji bayê ku asoyan dîmen bi dîmen û bi tayên Kurdî pîne dike re vekiriye. Lê bavê min ji xwe re behsa rêwîtiya min nekiribû, min jî herweha. Û va ye niha ku ez bi mista xwe guharê kilîta çente, ku bêzariyeke eşkere têde dibînim, difirkînim, axaftineke qetqetî nêzîkî deriyê odeya min dibe û paşê xweha min Hêvîna rû zerhimî derbas dibe û piştî wê xwediya sola leşkerî ku rûyê wê yê xemgîn xemgîntir bûye.

Herdu jî li ser du palgehên li ser tejikê rûniştin û pişta xwe dane dîwêr, ez jî bi şûn de çûm û li ser kenarê textê xwe rûniştim. Cara yekem bû ku min didît xweha min kulmek tûtin ji berîkeke di kirasê xwe de derdixe, mîna ku nû dizîbe. Pelek ji pelên qermiçî yên cigareyan bi nazikî rast kir û tayên tûtinê li ser dirêjkirin û pel li tûtinê pêça, tavilê pêçekeke lûleyî ji nav tiliyên wê derket, rabû êdî kenarê pelê şil kir û gezin sivik lê xistin ku bi hev ve bibe. Ku pêçana wê qedand ew pêşkêşî xwediya sola leşkerî kir û ji xwe re jî yek amade kir, û herdu cigare bi darikekî kibrîtê vêxistin.

Ez dizanim ku xweha min cigarekêş e. Min gelek caran jê re cigare pêçane û wê jî bi dizî dikişandin. Lê ev cara yekem e ku ew razê xwe yên biçûk eşkere dike bêyî ku xema kesekî bixwe. Min dikira jê bixwesta ku ez jê re çend cigareyan amade bikim lê min nexwest ez rûniştina wê lê biherimînim û li hêviya wê yekê me ku ew herdu keç tiştekî bibêjin, çiku ew derbasnebûne ku hema wisa ji xwe re rûnin. Awirên min di navbera rûyên

herduyan de dabeşbûbûn û xwediya sola leşkerî, a ku solên havînî di piyên wê de bûn û tiliyên wê xuyadikirin, awirên xwe yên bi koşeyên çavan ji min nedibirrîn. Rabû min palgehek kişande ber xwe û pala xwe dayê û rûyê xwe xiste mista destê xwe, riya min a zivir ku şînhatibû ez veciniqandim, min xwe rast kir û dîsa li kenarê textê xwe rûniştim û min destên xwe xistin hemêza xwe. Min awirên xwe ji ser penceyê dagerandin xwediya sola leşkerî, ewê bi komek kaxez dilîst ku xiştexişta wan bala min kişand. Ku min kûr lê mêzekir, dengê keçikê hate min bêyî ku di nav diranan re pifîniyê derxe: “Ezê van kaxezan bidim kê?”

Xwediya sola leşkerî, bi aramiyeke lal koma kaxezan di rûyê min de bilind kir û hevoka xwe dubare kir: “Ez wan bidim kê?” Min çavên xwe bi mereqdarî fireh kirin û pirsî: “Ev çi kaxez in?” Ewê got: “Yên Mem in.” Lê ez ranebûm ku wan ji destê wê bigrim û min pirseke din kir: “Ma çi di wan de heye?”, xwediya sola leşkerî awirên xwe daxistin û li wan nihêrî û got: “Hîç. Lê wî dixwest ez wan li Yekîtiya Sovyetê radestî wî bikim.”, hindik mabû ez bibişiriyama: “Yekîtiya Sovyetê? Tu piştrast î?” Ewê serê xwe bi bawerî hejand, êdî min gotê: “Mem dê çûba wan deveran.”, ewê dîsa serê xwe bi bawerî hejand û got: “Ew dê ji Kurdistanê çûba Yekîtiya Sovyetê.”

Rûyê xemgîn yê xwediya sola leşkerî aram xuya dikir, mîna ku wê ji bîr kiribe ku hîç belgeyên cêwiyê min nebûn ku bikaribin wî derbasî welatê Bolşevîkan bikirana, vê yekê bi xwe hişt ez bipirsim: “Ma wê Mem li Yekîtiya Soveytê çi bikira?”, ewê bi pistîneke sar bersiv da: “Dê bihata civana min.”

Ez nizanim ka gelo pêlîstinek heye dihêle xwediya sola leşkerî wan bersivan bide yan jî rast dibêje, loma jî ez piştî kêlîkekê şemitîm merqedariyeke mîna konkê pîrebokê:

“Û çima dê Mem bihata civana te?” min pirsî û wê bi şerm bersivand:

- Me wisa biryar dabû.

“Kê çi biryar da bû?” devê min kete hev û min pirsî, wê bersiv da:

Min û Mem me biryar dabû ku kengî ew ji karê xwe yê li Kurdistanê biqede em li Yekîtiya Sovyetê hevdû bibînin.

“Çi kar?”, min ji xwe pirsî berî ku ji wê bipirsim. Min hîç ne ji bavê xwe û ne jî ji Mem bihîstibû ku misyoneke Mem heye dê ji bo wê biçe Kurdistanê û ji wê derkeve. Ku min bi çavên keçikê de nerî, bi wê matmayîna di herdu çavên min de, keçik weha pêde çû: “Dê Mem çûba civana…”, û palikên çavên xwe nêzîkî hev kirin û li saniyeyekê li nav geriya, paşê tîp bi zelalî gotin: “Behram… Behramê Gûr.”

Min awirên xwe bi alî xweha xwe Hêlînê de dagerandin û min dît ku ew dirame bêyî ku haya wê ji axaftina me hebe. Min dîsa bi alî pencereya pehn de nihêrî ku tenê têre ezman dibînim û min di ber xwe de got: “Behram… Behram”, weke ku ez davêjim bextê kesekî ku ew dikare li gel min vê henekê derbas ke. Min bêhemdî xwe stûyê xwe dagerande aliyê xwediya sola leşkerî û jê pirsî:

- Ma tu dizanî Behramê Gûr kî ye?

“Mem behsa wî ji min re kir”, ewê bersiv da û ez dîsa pêde çûm û min pirsa xwe bi hinek qerfpêkirin pêça:

Ez dibêjim qey wî ji te re gotiye ku Behram bi salekê du salan ji mestir e ne?

Xwediya sola leşkerî bêyî ku bersiva min bide li min mêze kir, ez pê hisiyam ku ew qerfpêkirina sivik a di pirsa min de ne di cihê xwe de bû. Paşê ez hinekî hêrs bûm û êdî peyv bi lez di devê min derketin: “Wê ew çawa Behram bibîne? Ma Mem negote te wê çawa ew bikaribe kesekî ku bi sedsalan di navbera wan de ye bibîne?”, keçikê çavên xwe ber bi koma kaxezên di hemêza xwe de berdan û got: “Ferq nake Dîno, misyona Mem dê biqediya ku li gel Behram biciviya, û wê zûtir biqediya ku çav pê neketiba.”

Min hinekî awirên xwe ji wê dagerandin û dîsa li rûyê wê temaşe kir weke ku ez li rûyê birayê xwe binêrim, birayê min î ku ji xwe re hevdîtineke bi mîrekî efsaneyan re -ku dapû pey xezalekê heta şikeftekê û êdî nema jê derketibû- lihevaniye û ji vê keçikê re vegotiye. Ji min re balkêş bû ku ewî ew kesayetî bi xwe hilbijartiye, ewî dikaribû kî ba ji xwe re hilbijarta da ku misyona xwe ji xwediya sola leşkerî re bi wate bikira. Min jê pirsî: "Ma Mem çi ji Behramê Gûr dixwest?", ewê got: "Hîç. Ne tiştek."

"Ne tiştek?" bi matmayîn min pirsî, wê bersiva xwe dubare kir:

- Ne tiştek.

"Ê de çima dê Mem li gel wî biciviya?", min bi ahengek nerazîbûn têde diyar bû got, ewê li kaxezên di hemêza xwe de nihêrî û bersiv da:

- Mem dê li gel wî necive Dîno. Mem dê wî nebîne. Behram ji sedan salan ve ye ku di şikeftekê de winda bûye.

Ez keniyam. Rewş ne ya keniyê bû lê ez keniyam û min pirsî: "Û te çi ji wî re got gava ewî gote te ku dê ew Behramê Gûr bibîne?", ewê bersiv da: "Min tiştek negot. Em, ez û Mem, dê li Yekîtiya Sovyetê pêrgî hev bihatan, lê ewî dê li Kurdistanê çi bikira, ew karê wî tenê bû."

Min ji nû ve jê pirsî mîna ku ez dixwazim wê hêrs bikim: "Ma tu pê nehisiyayî ku Mem henekê xwe bi te dike gava ji te re behsa hevdîtineke xwe û Behram dike?", ewê lêva xwe ya jêr dirêj kir û bi pistînî got: "Na. Kêfa min ji çîrokê re hat", hinekî bêdeng ma û paşê bi bişirîn got: "Min ji çîrokê hez kir."

Xweha min Hêvîn di nava axaftina min û xwediya sola leşkerî re her cigare dipêçan, yek li dû yekê, û her ku yek dipêça li ber ya berê pêçayî li ser tejikê mîna gulleyên di rextekî de rast dikir. Dema ku axaftina me rawestiya, Hêvîn ew cigare di destê xwe de kirin gurzek, yek ji wan ji xwe re yek jî ji hevala xwe re vêxist û rabû, xwediya sola leşkerî jî rabû û ber bi min ve hat û

koma wan kaxezan di hemêza min de danî, û herdu ji odeyê derketin hewşa malê, tayekî dirêj ji dûmanê li pey wan diçû ku êdî wî tayî xatir ji rojên berê ên ku têde bi dizî cigare dikişandin dixwest.

Bi awayekî ji awayan kêfa min ji wan herdu keçikan re hat, ewên ku dê awirin tûj ji mezinan li wan werin vedan û pirsin ku bi lomeyan pêçayî ne dê ji wan werin bibin.

Bi hêdîka bala min ji ser wan çû ser koma wan kaxezên di nav destê min de, min ew mîna banknotan yek bi yek vekir, ew hemî dirêjikî û bi şarezayî qusandî bûn, li ser kaxeza yekem min hevokek dît ku ji min ve bêwate xuyabû: “Ev Almanên protestant derewan li we dikin”, min kaxezeke din kişand, û yeke din û yeke din û yeke din û paşê min hemû kaxez tevlihev kirin û dîsa li ber xwe rêzkirin û qulibandin, min dît ku eynî hevokê li ser her spîbûnekê ye: “Ev Almanên Protistant derewan li we dikin”, rabû min koma kaxezan rakir û berê xwe da deriyê odeyê û ew avêtin hewşa sincirî di qijeqija nîvoroyê de, kaxez firiyan û gihiştin siya herdu darên kafûrê. Ez bi helkehelk vegeriyam hindirê odeyê û dîsa li ser kenarê textê razanê rûniştim. Lê du deqe neçûn ez ji ser nivîna xwe nermik rabûm û min berê xwe da çenteyê ku xwe li çermê xwe gerandibû û min ew bi xurtî kişandin ku pê re min dengê nalîna kincan di hindirê wî bihîst.

Min hindek gav ber bi nîvê odeyê ve avêtin, paşê jî min çenteyê naveroksivik danî ser tejikê û ji bilindiya xwe de lê nihêrî lê min nedît ku ew mîna kêlegora ku min li goristana Hilêliyê dîtibû ye. Ez bibêjim ku ew çenteyek e û hew. Çenteyekî qehwerengî, destik ji sifrekî qaşil ji ser wî çûye, xêzikin kûr şopa qelemên risas li ser çermê wî hene dibe ku ez sebebê wan xêzikan bim, yan jî cêwiyê min Mem be dema ku em zarok bûn. Lê min hîç ji xwe nepirsîbû ka ev çente ji kîjan çaxê de derbasî mala me bûye. Tiştê ku hişê min belawela kir, di wê sekinandina min de, vingîniya mêşeke hingiv bû xwe ji alî

hindir de li tora hesinî ya tenik î pencereyê dida. Ewê carekê li pê yeke din, bi rik, xwe li torê dida ku derkeve ronahiya hewşa serxweş, ez ber bi wê ve çûm û min mista destê xwe lê pêça bêyî ku bi ser de biguvêşim, ew hindekî di tariya mista min de bêdeng bû lê paşê ez bi şewatek sivik hisiyam ku pêvedana wê bû. Wê çaxê min ew bi aramî danî ser kevîka çemento ya pencereyê, ew nefiriya lê sergêj meşiya ji ber wî laşê xwe yê ku sivik bûbû piştî ku dilopên kuştinê jê derketibûn. Û ez jî vegeriyame çenteyê xwe û bi ser de xwar bûm da ku cilan jê derxim û bi edalet bavêjim her deverê. Lê ew perika rengcûnikî -ya ku min berê di nav cilan dîtibû û ew li çente vegerandibû-rep î rast bi jor de çû bêyî ku xwar biçe, û paşê bi nazikî, hejiyayî, hêdî, dilovan û nermik nermik hate xwarê mîna ku rê dide min ez jî li gel wê di daketina girover de werim xwarê û berê xwe bidim wî cihê ku divê tesaduf efsûngeriya xwe dubare bike.

# Para Sêyem

Dîno ber bi randevuya xwe ve diçe

Wê sibeha ku ezmên têde xwe westand û bi ewrin risasî derbasî herêmên payîzê bû, bayekî sivik baweşînkên xwe bi ser hewşa mala Hemdî Azad de xistin. Welat piştî ku diya wê ya li metbexê çend caran gotê, bazda derve û kincên şil ji ser ristê daxistin ji tirsa ku çipikên barana serê payîzê -ya ku daneyên heriyê bi xwe re tîne ku ew jî toza havînê ye ku di bayê de eliqî maye- wan gemarî bike. Ewan çipikan jî, hinekan ji wan hinek cilên spî lewitandin. Cilin ku Kesbo hunera xwe hemû têde bikaranîbû û ew bi destan firkandibûn ku cawê wan bibiriqe. Aha ewan çipikan zengeloka jina Hemdî li ser qêrîneke xeniqî vekiribûn ku di rûyê keça xwe de werkirin, û bi ser de jî ew bi guhlênekirinê tawanbar kir di gel ku ewê bi destên xwe yên dirêj çi jê hatibû kiribû û bi çûn û hatina xwe re ew cilên wek ehmeqiyên rengîn î li rex hev ji serî heta dawiya ristê daxistibûn.

Nêzîkî meh û nîvekê ji ser mirina Mem re çû, dema ku wan çipikên pêşî biryar dan ku Kesbo hêrs bikin. Piştî ku Welata ranhişk î di wî fistanê dirêj de ku di bin pêsîran de teng e û ji wir û bi jêr de fireh e ew cilên li ser ristê hemû xistin nav cawekî ku li ser textekî mezin vedabû û girêkek lêda û ew bû mînak

buxçeyeke gewre, ewê bi wî barê xwe ve bazda û çû hindirê malê û baranê dayê.

Ewan çipikan li kevirkên hewşê didan û bi qasî tiliyekê tozeke sivik hildipekiya jor û tavilê winda dibû. Bi wê bîna ku dabû ser wê roja rawestiyayî re, di gel ku ba lawaz bû jî, pozên xurt dikaribûn hestên herî kûr di qaşilê heriyê yê tenik de bîn bikin ku girtibûn ser tiştan, ew hestên di toza ku miriyan û giyayan li pê xwe ji bayê re hiştibûn. Lê paşê ew qaşilê tenik î ji heriyê heliya û pelên herdu darên kafûrê, kevirkên hewşê û banên textên gewre geştir xuyabûn, têr rewa bûn û bîna xurt ya şîrêzê ji wan difûriya. Di wê çaxê de Kesbo li kurê xwe Dînoyê ku cildekî şîn li hinek defterên dibistanê dixistin zivirî û gotê: “Ku bavê te vegere divê ev text werin vekirin.” Dîno rûyê xwe bi wan herdu çavên kesk î melûl rakir û bersiva wê da: “Eger bavê min ne westiyayî be emê di saetekê de biqedînin. Lê textê min bila bimîne çaxekî din.” û li defteran vegeriya, di ber re jî got: “Ez nikarim li hindir rakevim. Ode hîn bîna mirovan teng dikin.” Kesbo bi nerazîbûn serê xwe berda ber xwe, ewê nedixwest baranek bi şev lihêfa Dîno û doşeka wî şil bike, çiku ew wisa dê bêgav bibe ku rûyê wan veke û hiriyê derîne û bide ber tavê û ji nûve bijene. Şilayî hiriyê kifikî dike û qumaşan dirizîne. Her weha roja sibehê ya xurt rengê qumaşan têkdibe dema ku zarokên Kesbo sibehan tenbeliyan dikin û di bin lihêfên xwe de dimînin.

Dema ku Hemdî berêvarê, li mal vegeriya, xirecira keçikên wî zêde bilind bûbû, ewan şer dikirin li ser bermayên selofanê yên tenik ku birayê wan Dîno nizanibû ka wan bide kê. Ewî di dirêjiya hingura êvarê de ji wan re gelek defter û pirtûkên wan ên dibistanê bi cild kiribûn da ku ji destê şerxwazan di dirêjiya salê de werin parastin, ku mumkin e di sala din de werin firotin. Ku bavê keçikan derbasî malê bû, xirecira wan kêm bû lê neqediya. Hin ji wan çûn giliyê xwe pê kirin û gotin dê sibehê mamoste li defterên wan binêrin, Hemdî awireke bi

bêzarî di wan veda, xwe xwar kir ku li ser cilika dirêjkirî rûne û got: “Ma qey selofan li sûkê qeliya?”, û bi rûniştina xwe re li Dînoyê ku porê wî heta guhên wî hatibû nihêrî û pirsî: “Ma qey ev kaxezên şeytanan li vî welatî neman?”, Dîno vegerand: “Ev keçên te ecele dikin yaw! Min gote wan ku ezê sibe du metrên din bikirim”, Rohat bi dengekî kelogirî got: “Wê mamoste sibe li defterên min binêre” û dubare kir: “Sibe. Sibe”, bavê ku li hêviya şîvê bû û cigareyek vêxistibû bi dengekê sar got: “Sibe neçe dibistanê.”

Ew dawiya axaftina di navbera Hemdî û keçên wî de bû, tevî ku hinekan bêdeng protesto kirin û bi destên xwe nerazîbûn nîşan dan û li vir û li wê pehîn li defteran xistin, lê bavê wan guh li wan nekir û bala xwe da Kesboya ku bi hêdîka got: “Ma tuyê niha şîva xwe bixwî yan tuyê bimînî heta tu û Dîno vekirina textan diqedînin?” Hemdî birhên xwe hildan û pirsî:

- Ma qey me ji bo vê meselê li hev kiribû?

Kesboyê got: “Baran dibare.” û tiliya xwe nîşanî hewşê kir, mêrê wê got:

- Ne xem e. Bila bibare.

“Wê ji baranê birizin. Ma tu nabînî”, Kesboyê got û Hemdî vegerand:

- Heta sibe bimînin dê nerizin Kesbo, dixwazî bila baranek ji hestiyê kalkê min jî bi ser de bibare.

Wê şevê malbatê ji xwe re nivînên xwe li ser erda odeyên ku bayekî rawestiyayî girtibû ser wan û pêşî û kelmêş kişandibûn bal xwe ve, danîn. Dîno tenê ji xwe re nivîna xwe li ser textê li hewşê rast kir. Barana yekemîn di wê payîzê de hûrik dibariya ku hîç dê balgeh û lihêf zêde şilnekira. Dîno lihêf davête ser rûyê xwe dema ku çipikên baranê bi ser de diketin û êdî sebra wî dihat bi wê çipeçipa şêrîna ya nikilên avî bi ser qumaşî de, ku baran disekinî jî ji xwe re li ezmanê ku bayê û giraniya hewaran ew dabeşkiriye, û bûye herêmin zelal û herêmin tarî.

Her kêlîkekê jî valahiyin fireh yan teng çêdibûn ku têre galaksiyên herî dûr xuya dibûn û reşahiya ku di wê valahiya ezelî de bi stêrikên lerizî neqişandî diçirisî paşê jî ewrên xam û nûhatî ji xwe re sihra xwe ya ku nadomîne pêşkêş dikirin.

Lê dengin din, ji bilî çipeçipa dilopan li ser lihêfa Dîno di wê bêdengiya şayik de dihatin guhên wî. Li aliyê bakur bi xwe, ku zevî ji malan rizgar in bi hoyê nêzîkiya ji sînorên di navbera Tirkiye û Sûrye de, zûrîna çeqelan ji êvar de heta derengî şevê ku Dîno çû nav nivîna xwe -piştî civîna wî û bavê wî belav bû û têr behsa baranê û gunehên baranê û xêra baranê û hunerên baranê û jirêçûnên baranê û xapên baranê û cesareta wê û dînbûna wê kirin- qut nebûbû. Dengê heywanan ê hemaheng û kovî ku nêzîkî dengdana mirovan a kovî ye, ew tîrbûna ku Dîno xwe têde li gel giraniya aramiyê ku payîzê ew şil kiribû belawela dikir, û êdî pala xwe bi enîşkên xwe da erdê û stûyê xwe ji ser palgehê rakir û guhdarî kir.

Çeqelan ji veşargehên xwe yên di tariya tîr de, bi zengelokên xwe û hemahengiya wan, hawê bûriyên xwe dikirin, divabû Dîno jî -di kêlîkeke ji wan kêlîkên nenas ên haydariya mirovane- bi kûraniyên xwe hemûyî di wê hemahengiya deng a tijî çewtî de biramiya, çiku ew mîna dengekî heywanî veşargehên aram yên ku mirov her hewl didin wan heta hetayê aram bihêlin vediciniqîne. Ew paşê vegeriya serê xwe danî ser palgehê, çavên xwe girtin da ku xwe dûr bike ji wan çipikên giran ên ku yekê ji wan li enî û palika çavê wî da. Paşê ji ber ku baranê dayê lihêf hemû girte ser xwe û rûyê xwe jî, lê ew lihêf bi nazikî ji ser rûyê wî çû. Dîno dîsa hewl da ku bikişîne ser xwe lê dengekî nizim ji aliyê serê wî li rex textê wî hat ew ji bin de hejand: "tu çima naxwazî min bibînî?"

Dîno ne bi hewce bû ku rabe bibîne ewê li ber serê wî rawestiyayî Mem e. Lê mîna her kesekî ku dizane mirî venagerin malên xwe, ew li hev ket, û ew mesele mîna xeyalekê hesiband, paşê rûnişt ku dilê xwe bixe cih, dît wa ye

cêwiyê wî lê dinêre û mîna ku dibişire, êdî dengekî xeniqî ji Dîno derket û pirsî: “Ma tu Mem î?”, cêwiyê wî yê mirî got: “Ma ezê kî bim bêhişo” û destê xwe dirêj kir û bi porê Dîno lîst û got: “Ez fêr bûme ku hûn zindî ne, de hûn jî fêr bibin ku ez mirî me”, û hilkişiya ser text û li ser nivînê li ber lingên birayê xwe rûnişt, ew ling bi nazikî dane aliyekî û got: “Ka ciyê min çêke.”

Dengê Mem dişibihî zimîniyekê di guhê Dîno de. Dîno çîmên xwe kişandin û bi sînga xwe ve zeliqandin piştî ku bi pişta xwe pala xwe da hesinê kenarê text. Dengê Mem êdî lihevhatî û bîneke zindî jê dihat: “Ma ji te we bû ku min dev ji vê hewşê berdaye?”, Mem got û bi xwe bersiva xwe jî da: “Na. Ji çûna min re hîn zû ye”, û piyekî birayê xwe Dîno hejand û got û pêde çû: “Ma dengê min tê te? Mi ew tiştê ku kirin, hemî kirin ne ku dawî dûrî vê hewşê bikevim Dîno.” Dema ku matmayîna ku Dîno cemidandibû dît, bi lez got: “Ne mebesta min bû ku ez te wisa veciniqînim Dîno. Lê... Tu dizanî. Na. Ne hêsan e ku mirov her tiştî bi yek derbê re li dû xwe bihêle û biçe. Ez dudilî me. Tu min nas dikî. Ez dudilî me. Ezê paşê biçim, dema ku bavê xwe bînim rayê ezê biçim.”

Dîno bêdeng ma, çîmên wî hêj bi sînga wî ve zeliqîbûn, kêlîkên bêdengiyê mîna ebayeke qulikqulikî ku kelmêş têre derbas dibin dabûn ser lihêfa wî. Wê demê Mem xwe bêtir nêzîkî wî kir û bi pistînî got: “Tu tasek avê dixwazî? Tu behitî yî û ez jî behitî me. De ka em hinekî dev ji vê behitandinê berdin Dîno, ji xwe tişt ne hergav bi hewceyî zelalkirinan in. Mesele hemî ew e ku ez dixwazim bavê xwe iqna bikim û bînim rayê”, ew hinekî rawestiya û kûr ji firnikên xwe nefes kişand û vegeriya pirbêjiya xwe: “Min jî dixwest wek te ji bin lihêfa xwe de vê şevê bîn bikim Dîno. Min dixwest van dilopan heta sibê gez bikim. Û helbet ez dikarim lê hebûna min a di hewşê de ji hebûna te ya di bin lihêfê de ferq dike. Ez nema ditirsim Dîno, nema haydar im jî loma text û baran û hewşa

malê û mêşên diya min jî ji min rizgar bûne. Lê tu! Text milkê te ye, baran û hewş û mêşên diya min û ev şev bi xwe jî milkên te ne loma jî tu ditirsî û haydar î Dîno." Mem bi vê gotina xwe re tiliya xwe ya nîşanê da ber devê xwe û got: "Bêdeng be." Paşê vegeriya û di wê girava şevê de got: "Dengê bavê min tê min ku di xew de li gel xwe diaxive. Ew di navbera xwe û xwe de bawer e lê rikeberiyê bi min re dike. Ev meh û nîveke ku ew rikeberiyê dike. Min gotê: diva bû ez wisa bikim bavo, çiku xwediya solên leşkerî dê ji bo te ji welatê Bolşevîkan venegeriyaba Kurdistanê."

Nediyarbûna peyvên Mem mifteya tekane ya vekirina matmayîna Dîno bû, ku ew jî bi giranî şemitî vepirsîna birayê xwe: "Ma ne bes e ku tu min bi hebûna xwe mat bihêlî, bi ser de tu min bi axaftina xwe jî mat dihêlî?", rabû Mem xwe li ber piyên birayê xwe dirêj kir û xwe siparte enîşkeke xwe û got: "çima hebûna min te mat dihêle? Ez li vir im ji bo ku bavê xwe iqna bikim."

"Ma tu li gel wî axiviyî?", Dîno bi mereqdariyeke tinazker lê tehl jê pirsî, cêwiyê wî bersiv da:

Ez her şev bi wî re diaxivim. Ez vê gavê ji ba wî têm û va ye min rêya xwe bi te xist.

"Û çima te berê rêya xwe bi min nedixist?", Dîno jê pirsî, Mem keserek bi dengê bilind hilanî û got:

- Ez dixwazim kesekî din tev li xwe bikim. Ew serhişk e.

"Ma tu dixwazî wî bi çi iqna bikî?" Dîno dîsa pirsî û Mem bersiv da:

- Ku neçe Kurdistanê. Ew ne biçûk e ku Dîno bi vê macerayê rabe.

"Min hîç guman nedikir ku niyeta wî heye berî bide Kurdistanê. Min nebihîstiye ku ew…" Dîno got û Mem bi keslaniyeke diyar bersiva wî da:

- Bavê te miriyê sola wê ye. Bavê te hatiye sihirkirin. Ax ji wî cawê reben re.

“Sola kê? Cawê çi? Bavê min....”, Dîno kire birebir lê Mem li devê wî da:

- Bêhişo ma tu tiştekî li ser xwediya sola leşkerî nizanî?

Dîno bi hêrs bersiva wî da: “Ez dizanim. Ez dizanim çawa dê bida pey te û biçûya Kurdistanê”, û ber bi birayê xwe ve bi pêşde xwar bû û temam kir: “Te çima wî qasî henekê xwe pê dikir û te bi wê re çîrokin dirêj li hev dianîn Mem?”

“Dirêj?” Mem pirsî û li pirsa xwe zêde kir: “çi çîrokên dirêj bêhişo?”, Dîno vegerand: “Sozên we ku hûn dê hev li Kurdistanê bibînin. Ewê emaneta te şanî min kir. Kaxezên te yên ku kenê mirov tînin şanî min kirin.” Mem rabû li kenarê nivînan rûnişt û ji Dîno pirsî: “Ma wê got ku ewê min bibîne?”, cêwiyê wî got: “Ez bawer nakim ku ewê ez dîtibama mîro.” Mem kêlîkeke dirêj bişirî berî ku hin peyvan bibêje û Dîno li bin guhê hev bixe: “Ewê dê bavê te bidîta dîko. Bavê te Hemdî Azad”, û berî ku birayê wî kûraniyên xwe yên belavbûyî careke din bicivîne got: “Ewê raya xwe guherî. Ew pêşiyê bi dîtina bavê te ya li Kurdistanê razî bû û bavê wê jî ku mala wî tijî caw bûbû ew mesela bêdeng pejirand, lê piştî du salan keçikê raya xwe guherî. Ewê tenê ji min re got: “Mem çima ezê ji Yekîtiya Sovyetî herim Kurdistanê?” Min digot qey di dirêjiya wan du salan de ew ji bavê min hez dike. Ewê jê hez dikir.” Mem hinekî rawestiya û li çavên birayê xwe yên di tariyê de ewrgirtî nihêrî û got: “Ma dengê min tê te?”, Dîno serê xwe bi hejandineke ku nayê dîtin hejand.

Bi aramî Mem encameke alozker ji çîrokên xwe yên alozker pêşkêşî cêwiyê xwe kir: Hemdiyê bavê wan, ê ku bi maqûlî bi xwediya sola leşkerî ve hatibû girêdan, gelek diyarî bi ser wê û malbata wê de rijandibûn, ew jî ji aliyê xwe de bi wî ve hatibû girêdan û ji xwe re keça wî Hêvîna razveşêr kiribû behaneya çûna malê ku nameyên wê digihandin bavê.

“Ma Hêvîn jî çîrokê nas dike?”, Dîno pirsa xwe ya tekane ji cêwiyê xwe kir û bêdeng ma heta ku Mem her tiştê li ba xwe

got, bi kurtî ewî got ku Hemdî bi xwediya sola leşkerî re lihevkiriye ku keçik bi behaneya xwendinê biçe Yekîtiya Sovyetê û ji wir were Kurdistanê û xwe bigihîne wî, Kurdistan jî paspot jê re nevên. Behaneya Hemdî ji çûna Kurdistanê re jî hebûna Mem a li wir e, û mexaze jî dê dest Dîno de bima. Lê keçika xwe di vê qonaxa ji çîrokê de giran kir, li gor ku Mem got, li soza xwe qulibîbû bêyî ku ji kesekî ji bilî Mem re bibêje.

“Û çima ji soza xwe vegeriya?” Dîno ji cêwiyê xwe pirsî ku wî jî di cî de bersiv da:

Nigê wê mezin bû kurê min. Nigê wê mîna ku te dîtiye mezin bû û aqilê wê jî mezin bû.

“Divabû te ji bavê min re bigota” Dîno got û Mem bersiv da:

Min nikaribû, lê min Hêvîn hêvot û gotê: “Keçê hevala te li soza xwe poşman bûye. Wê germiya bavê xwe rawestîne”, lê Hêvînê ew xapand.

“Hêvîn bavê min xapand?” bi matmayîn Dîno ji cêwiyê xwe pirsî, Mem gotê: “Ew bi temamî xapand. Ewê gotê ku ez bi aqilê keçikê dilîzim ji bo ku ji min re be. Tu zanî ev tê çi wateyê?”, û Mem destê xwe li sînga xwe da û dengê xwe yê xeniqî veşart û got: “Hêvîn di vê meselê de gelek zêdegavî kirin. Gelek.”

“Ma bavê min jî bawer kir?”, Dîno ji cêwiyê xwe pirsî wî jî bersiv da:

- Bavê te ji mûriyê jî bawer dike.

“Û paşê çi di navbera we de çêbû?” dîsa Dîno pirsî, Mem got:

- Tenê carekê bavê min pirsî: “Ma rast tu wê ji xwe re dixwazî?” ewî ez veciniqandim û lal kirim. Piştre ew nema bi min re axivî, tenê yekcaran. Her ku min ew li cihekî bi tenê didît jî min hewl dida ku şiroveyeke aloziyê zelal dike bikim lê ewî bi destê xwe ez radiwestandim û digot: ”Mem ez naxwazim bizanibim.” Loma jî min biryar da ku bi awayekî din wî iqna bikim.

“Û ew awayê te yê din çi ye?”, Dîno pirsî û Mem bi dengekê tev li henekan re got:

- Ez bi avjeniyê berê xwe bidim Tirkî.

“Ev çi ehmeqî ye!”

- Ehmeqiya wê çi ye?

“Ma kî dikare heta Tirkî berevajî herikîna çemê Cexcexê avjeniyê bike bêhişo? Û tu çi dibêjî ji wê pira ku serbazên Tirkan ji wir ve avê dipên?” Dîno bi qerfpêkirina veşartî ji birayê xwe pirsî wî jî bersiv da:

- Ez heta pirê bi sobayê çûm û vegeriyam jî.

“Tu vegeriyayî jî?” Dîno bi matmayîn got, û lê zêde kir: “Mebesta te tu mirî vegeriyayî”, Mem got:

- Ew çîrokeke din e.

“Bihêle ez pirseke rasterast ji te bikim Mem. Ma te xwediya sola leşkerî iqna kir ku ew li sozên xwe yên bi bavê min re biqulibe?” Dîno pirsî û Mem jî hêrs bû:

- Ma çima na? Ma min dê bihişta bavê min ehmeqiyeke ku bi temenê wî nakeve bike Dîno?

“Yanî Hêvînê bavê min nexapand?”, Dîno got û Mem bi dengekî nizm lê vegerand:

Ew hogirî xapandinê bûye. Ew hîleyan dike heta ku ez nizanibim ew dike jî.

Li vir herdu cêwî bi peymaneke ne eşkerekirî derbasî bêdengiyeke dirêj bûn ku çipikên baranê yên tenbel ew şil kirin. Xilmaşiyê, xilmaşiya tev li reva ji wê rewşa alozker, Dîno diajote zêrzemînên xwe yên kedîbûyî, lê Mem xwe bi xirecir veparimand û bi dizî got: “Ezê niha dev ji te berdim”, cêwiyê wî çavên xwe vekirin û pirsî: “Ma te tiştek got?”, Mem gotê: “Na”, û heta kenarê nivînê xuşiya û peya bû, li ser erda bi şijik ji pê rawestiya, Dîno laşê xwe pêşde bir ku dilê xwe bixe cih û pirsî: “Ma tuyê biçî?”, Mem got:

- Erê.

“Bi kû ve?” cêwiyê wî pirsî û Mem got:

- Seyrana min hercar heye.

Dîno hinekî bêdeng bû û di pirseke ji pirsên xwe pirr ên ku dihatin bala wî de ramiya, paşê kire pistînî û got: "çi meseleya şopên xefkan ên li ser herdu çîmên te ye Mem?" Mem serê xwe bê hemdê xwe daqûl kir û di wê tariyê de li çîmên xwe nihêrî û got: "Ah..." û berdewam kir: "Ma te dît? Te ew çawa dîtin?", Dîno gotê: "Min ew li termxaneyê dîtin."

"Ah..." Mem herfên xwe yên bi pistînî gotibûn dubare kirin û lê zêde kir: "Di rêya heta çem de min gelek xefkên roviyan li pê xwe kişandin", Dîno mat ma û gotê: "Ma çiyê te û xefkan e Mem", cêwiyê wî vegerand: "Ji bo ku tu nekevî wan eger ku tu bidî pey min." û zivirî û meşiya. Lê Dînoyê ku di nivînê de li ser kabokên xwe rawestiyabû, pirsa xwe ya dawî bi dengekî hinekî bilind kir: "Kaxezên te... Mebesta min kaxezên ku te bi keçikê re hiştibûn...mebesta min ka çi hikmet di wê hevoka te a dubarekirî de heye?", Mem li cêwiyê xwe zivirî û bi dengekî mîna zimîniyê got: "Ew çîroka min hemû ye."

Çipikên tenbel yên baranê, piştî çûna Mem, her dibariyan. Çipikên baranê yên bi yek ahengê li lihêfa ku Dîno heta rûyê xwe kişandibû diketin, di lihêfê de, di laşê Dîno de, di nivînê de û di depên textê razanê de qulin kûr vedikirin ku heta kûraniya erda bi şijik diçûn. Dîno -yê parçebûyî di navbera hetîketiya ku cêwiyê wî şev avêtibû nav de û xilmaşiya ku dixwaze hewşa mala Hemdî bi çengelên xwe yên xurt hilkişîne-mîna cercereke bêdeng li dora xwe dizivirî bêyî ku laşê wî bilive, heta ku dît va ye êdî rûyê wî û milên wî jî şil dibe, wê gavê ew têgihişt ku barana di zayîna xwe ya yekem de piştî wê havîna fetasî, barana ku wî hesab dikir ew dê zû bibûre, ji mekanan re cidala xwe ya hêzdar pêşkêş dike. Xortê çavkesk xwe komî serhev kir û rahişte lihêfa xwe û ber bi odeya xwe ve baz da, û di nig de vegeriya û doşeka giran da ser milê xwe ji bo ku ji baranê rizgar bike û wîrewîra diya xwe nebihîze.

Ba li odeya ku piştî mirina cêwiyê Dîno bi wî tenê mabû, sekinî bû lê wî xwe bi giranî avêta ser doşeka ku hema çawa be

ramedandibû û kêlîk bi kêlîk dişemitî ewrekî lerizî mîna mûskilekî gurandî, ew ewr tavilê bû mîna torekê ku wî xwest xwe jê rizgar bike lê çarlingên wî yên heywanî bi wî re nehatin, ew rabû bi dengekî qêriya ku mîna orîna çeqelan lê vegeriya ew deng. Dema ku dorpêça herdu pişikên wî pûç kiribû lê giran bû, dengekî nazik î ku ji deriyê vekirî dihat ew veciniqand: “Hê... Dîno... Dîno”, ew xweha wî Eyşanê xwediya herdu birûyên stûr bû, wî got: “Ez şiyar im, şiyar”, û laşê xwe yê sist ji nav nivînê kişand, rûnişt û jê pirsî: “Saet çend e?” Keçikê got: “Ez nizanim. Lê tu dereng mayî. Bavê min ji berî saetekê û bêtir derketiye.” Ew bi xwe her sibeh Dîno bi bavê xwe re diçe mexazeyê yan jî piçekî piştî wî diçe eger keslaniyan bike. Lê wê sibehê wî dît ku du saetan dereng maye, mîna ku nîvrojê berî wî xwe gihandibe mexazeya bavê wî. Lê ewî ji xweha xwe nepirsî ka bê çima ew jî wisa dereng maye û neçûye dibistana xwe.

Ezman ewravî bû dema ku Dîno di kolana bi dar ya pehn re meşiya û berê xwe da sûka bajêr û silav bi serê xwe yan bi hildana destê xwe li xelkê dikir. Dema ku dawî derbasî eraseya sergirtî bû lawikê çayçî gotê: “Min du caran çay bo te anî, bavê te vexwar.” Dîno tenê awirek bêwate tê veda û rêya xwe ber bi baxçeyê razayê yê qumaş de çû.

Dema ku dîno derbas bû û berê xwe di cî de da sekoya ku topên caw ên vekirî li ser bûn û bavê wî ew raberî mişteriyan kiribûn û ew dîsa pêçandin, Hemdî li wî nenihêrî. Lê ku axaftina xwe ya kinik bi du mirovên ku rûdêmên wan kenokî bûn re qedand, di bin simêlên xwe yên stûr de kire birebir bêyî lê binêre: “Pirsa te kir ewê hanê...” û bi tiliya xwe işaretî derî kir wek ku ew bes bû ji bo kesê ku qala wî dibe were nasîn. Dîno serê xwe hejand wek ku naskiribe û got: “Ma tiştek ji bo min da te?”, Hemdî got: “Na.”

Piştî buhurîna kurtedemekê di ser wê axaftina peyvhindik re, mexaze ji Hemdî û Dîno re vala ma, êdî kur ber bi bavê

xwe de çû, topek cawê ku wî hîn bi temamî nepêçabû rakiribû, û bi hêdîka got mîna ku bi xwe re diaxive: "Şeva çûyî min Mem dît", û bi çavên heta dawî vekirî nihêrî da ku bibîne ka tesîra wan peyvan li bavê wî çi ye. Lê Hemdî tenê hinekî nivîsîna reqeman û navan di deftera xwe ya pehn î xêzdar de rawestand û tavilê got: "Ma hate serdana te jî?", Dîno behetî heta ku di bin çermê rûyê xwe de bi çizîna derziyan hisiya. Dema ku piştî hilweşînê xwe careke din ragirt, bi dengekî xemgîn ji bavê xwe pirsî:

- Bavo çi diqewime?

Hemdiyê li ser kursiyekê li nêzîkî maseyê rûyê xwe ber bi rûyê kurê xwe ve bilind kir, bişirî û got: "Birayê te pir dide pê tiştan. Ew berî mirina xwe iqna nebû û va ye niha jî iqna nabe."

"Min fêm nekir" Dînoyê ku peyvên bavê wî ew tarûmar kirin got û Hemdî jî bi wî ve nihêrî û got: "Te çi fêm nekir?"

"Kî ji we dixwaze yê din iqna dike?" Dîno ji bavê xwe pirsî, bavê wî serê xwe daxist û li metra xwe ya hesinî ya li ser maseyê nihêrî û got: "tu çi texmîn dikî?" Dîno lê vegerand: "Mem got ku ew hewl dide ku te iqna bike tu neçî Kurdistanê."

Hemdî kursiya xwe bi şûn de da heta ku pişta wî bi dîwêr bû, di çavên wî de qerfpêkirineke tev li mereqdariyê çirisî û got: "Ma ezê çima biçim Kurdistanê? Min hewl da ku ez wî bişînim lê wî nemerdî kir. Û ez jî...", li refikên qumaşên li dora xwe nerî û temam kir: "Hêvî dikim biçim lê berpirsyariyên min hene, ez nema ew xortê ku bikaribim vê rêwitiyê bikim im Dîno."

"Û çi mesela cîrana me ye." Dîno ji bavê xwe pirsî, bavê wî bi bêsebrî bersiv da:

- Ezê çawa birayê te iqna bikim? Keçik xweha wî ye, lê ew bi israr dibêje ku ez berevajî wê yekê bibêjim.

"Xweha kê ye?" Dîno bi çavên bavê xwe de nihêrî û got. Hemdî têgihişt ku xelekek winda di axaftina wan de heye, ji ser kursiyê xwe rabû û bêtir xwe nêzîkî kurê xwe kir û got: "Ma ji

te re qala tiştekî weha nekiribû qey?" Lêva Dîno ya jêrîn daliqiya û kire birebir: "Tiştekî çawa bavê min?"

Bav bi aramî li dora xwe nihêrî, xwe avête bextê valahiyê û qumaşan, paşê bi tiliyên xwe li ranê xwe da û bi keser got: "Min hewl da ku wî iqna bikim ku keçik xweha wî ye, ha va ye divê ez te iqna bikim." Dîno piştî ku bi tevizîna mofirkên çîmê xwe hisiya, ji xwe re li cihekî rûniştinê geriya, û ew çawa ku li ser topek cawê bi kaxezekî xurt pêçayî rûnişt, pirseke xeniqî ji bavê xwe kir: "Mebesta te ew keçika xwediya sole leşkerî ye?", bavê, ku dilê wî bi xwe û Dîno şewitî, bi koşeyê çavan li kurê xwe nihêrî û gotê: "Ma kengî hûnê, tu û birayê xwe, nave wê hildin Dîno?"

"Bavo min hîn jî fêm nekiriye", kur got û bavê bi serhejandinê gotina wî piştrast kir û got: "Eger ez di şûna te de bama minê jî fêm nekira. Lê Dîno çîrok ew e ku ez..", û Hemdî nefeseke kûr ji bayekî ji mexazeya xwe dûrtir kişand û got: "Ez mirov im. Dema me mala xwe ava kir jinekê alîkariya me kir, ew diya.." û bi bişirîn li kurê xwe nihêrî û paşê berdewam kir: "Diya keçika ku hûn nav lê dikin xwediya sola leşkerî. Erê. Gelekî alîkariya me kir berî ku bimre", û çavên xwe daxistin û zêde kir: "tiştê ku bû bû", û bi çavên xwe ji ber kurê xwe revandin û got: "Dikare wisa bibe. Ez jî…" û vegeriya kursiyê xwe li pişt maseyê, rûnişt û bi keser got: "Ma ez çi bikim Dîno? Ez…", kurê wî bi hêrs ew birrî û got: "Bêje bavo, bêje", bav ji cihê xwe rabû û wî jî bi hers got: "Ma tiştê ku min got ne bes e qey?"

Aramiyeke şahîger girte ser bav û kur piştî hêrsa herduyan ya ji nişkêve, pêşî ew bişirîn û paşê kenekî sivik kirin bêyî ku li hevdû binêrin, paşê jî Dîno ji bavê xwe pirsî û di çavên wî de nazikiyeke şikestî hebû: "Ma rast ew xweha me ye bavo?" Hemdî gotê: "Ma ferq çi ye Dîno? Eger hûn herdu bawer bikin ku ew xweha we ye, êdî ew xweha we ye bêguman."

"Lê ku bi rastî ne xweha me be?" Dîno got û bavê bersiv da:

\- Mem dixwaze vê ji min bibihîze.

“Ê de bila Mem vê ji te bibihîze bavê min”, Dîno got û Hemdî serê xwe bi bêzarî hejand û got:

- Ew wê çaxê êdî nema diçe.

“Û çima dê neçe.” Dîno ji bavê xwe pirsî, bav pê de çû û got:

- Çiku ewê keçikê iqna bike ku ez li Kurdistanê li hêviya wê me. Ma hewl neda ku te jî bi tiştekî din iqna bike? Çi hîlevan e ew!

“Bavo te ez heyirandim. Ez êdî nema ji hev derdixim ka kî dixwaze ê din iqna bike.”

- Xeman nexwe. Ya pêwist ew e ku tu iqna bibî.

“Bi çi iqna bibim?”

- Bi tiştê ku tu dibînî.

“Te? Yan xeyalê Mem? Yan xwediya sola leşkerî ya ku bûye xweha min?” Dîno bi hêrs got, bavê wî ew bi dengekî mişt gazin qut kir û got:

- Navekî keçikê heye Dîno. Navekî wê heye.

“Navê wê? Navê wê heye? Bavo ezê biçim Kurdistanê” Dîno bi rengekî otomatîk got mîna ku heyfê ji kesekî hiltîne, bavê wî bi aramî gotê:

- Çima na? Bi her halî her tişt amade ye.

Dîno bi derenceyê dindik ên ku mexazeyê digihînin eraseya sergirtî ve hilkişiya, paşê bi alî rastê de zivirî kolana pehn û gavên wî ew ajotin aliyê postxaneyê û ji wir jî ber darên sîdar yên di nîvê kolana ku ber bi rojava de diçû ku mala wan î bi awayekî hendesî hatiye avêtin nav cihekî ku malan ew li wê derê di bêzariya hişk de kolabû. Dîno ne piştrast bû ji sebebê ku dihêle ew berê xwe bide malê, lê tunelekî di valahiya bayê de rê nîşanî laşê wî dikir. Ew tenê carekê li koşeyê ku kolanê û deriyê kevanî yê baxçeyê giştî digihîne hevdû rawestiya. Qalibên bûzê yên dirêj li her deverê belawela bûbûn û parçe jî bûbûn lê hîn nehiliyabûn, li dera hanê jî erebaneyeke textîn û dirêjikî ku mirov li şûna qantiran dikişînin li ser kêleka xwe

qulipî bû û Hezîmê lal bi wî laşê xwe yê dagirtî û ne lihevhatî li ber bû sixêf digotin û qêrîneke nezelal dikir. Otomobîla ku lê qelibî bû ne li wan deran bû, wisa dîno ji xelkên ku kombûbûn fêm kir, ewan erebane rast dikir û parçeyên qeşayê didane hev û ber dilê wî xortê lal î ji qehran behitî didan, ew bi her halî bi şidetkariya xwe dihate nasîn, hîn ji dema ku karmendê karxaneya ruxsetkirî bû de ewî di tenekeyan de ava bîrê ji qehpikan re dibir. Dîno jî xwe xwar kir û qeşaya lewitî civand û danî ser pişta erebaneyê ku çewalên şil jî lê vegerandibûn, ew çewalên ku li ser û binê qalibên bûzê bûn. Dema ku wan kesan alîkariya lalo kirin û ew barê spî yê cemidî danîn cihê wî û destên xwe yên sor bi sakoyên xwe yan bi pantelonên xwe yên fireh zuwa kirin û bi awireke dilovan li Hezîm nihêrîn, ew ciwan dev ji hev ber bi erebeya xwe ve çû, û li bermayê qeşaya xwe temaşe kir, nîv xelekê li dora xwe zivirî, xwarî destikê erebaneyê bû û rabû ser xwe, erebane jî pê re ji erdê rabû, yan jî weha xuyabû, lê tavilê bi rexekî bû û bermayên wan depên sar î spî gindirîn û bi ser deverin de ketin ku bi cara yekem re bi ser de neketibûn.

Ew koma biçûk î ku alîkariya lalo kir belav bû û li wan deqeyên ku vala çûn poşman bûn, Dîno jî di bin wî ezmanekî nediyar de rêya xwe ya malê berdewam kir. Ewî ezmanî her ku tulpekî ewran li aliyekî kom dikir, li aliyekî din hin ewr belav dibûn. Ba jî têra xwe wê rojkê ji sibeha zû de bi hunermendî xapandinên xwe pêşkêş dikirin, deqeyek nediçû qelşên erdê û giyanên ku şilahiya şeva çûyî xwe ji baranek bêtir re amade dikirin, lê wê baranê xwe radigirt. Dema ku Dîno gihişte malê yekser berê xwe da koşeyê bakurî hewşê û çû odeya xwe, tevî ku dem dema firavînê bû, dengê diya wî hatê: “Ma tu û bavê xwe hûnê van textan li vê hewşê heta roja qiyametê bihêlin?” Dîno berê xwe dayê û rûyê xwe tirşkir û got: “Dibe ku em roja qiyametê bi hacetî van textên te bibin dayê” û di odeyê de winda bû.

Lê Dîno di odeya xwe de gelekî nema, xweha wî Eyşanê bang kirê, Eyşana ku karê wê ye bangî wî bike yan nameyên devkî ji dê û bavê xwe bigihînê mîna ku dengê wê û rûdêma wê ya geş dihêlin ew bibe qasidek ku Dîno jê aciz nebe her wekî çawa Mem jî jê aciz nedibû. Xortê çavkesk, dema ku dengê xweha xwe kir, ji ser kenarê textê xwe yê hesinî peya bû û ber bi hewşê ve çû, çipikên baranê pêşî li pêşenîka wî kirin, pişt re li qevdikên gumlekê wî û paşê jî pozê wî û pişta nigên wî ku di solên havînî de xuyabûn, hewş bi xwe jî di aramiyeke balkêş de mabû û hiştibû ku baran ji xwe re xewnerojka xwe di bêdengiyeke kûr de bibîne. Lê ji nişkêve du teyrik hatin û dûrî wî bi çend metran li ber herdu darên kafûrê veniştin, kumikên wan bilind bûn, ewan teyran bala wî kişandin çiku teyrên zeviyan bûn û ne adet e ku li hewşên malan yan li nêzîkî dîwaran deynin. Ewan herdu teyran perikên xwe hinekî raweşandin û paşê jî di cihê xwe de sar man û ziq li wî nihêrîn. Ewî bi destê xwe çend livên ehmeq kirin ku bifirin lê ew nefiriyan. Wê çaxê ew li textê xwe zivirî û çû nêzîkî wan bû, herdu teyran xwe bi erdê ve zeliqandin lê nefiriyan, Dîno heta çend gavan hat û nêzîkî wan bû û paşê jî rêya xwe ji ser wan dagerand û berê xwe da odeya malê ku firavîna wî li hêviyê bû, lê ewî hîç çavên xwe ji wan teyran danegerand.

Hemdî ji pişt dîwarê ku deriyê hewşê vedişart derket, ew hatibû firavînê, Dîno xwe ragirt heta ku bavê wî pêşiyê derbas bû, paşê jî ew û ew hema di cî de li ser sifrê rûniştin. Sênîk di ber hev de bûn û tijî birinc û goştê mirîşkan bûn, kevçî jî hatin li kenarên sêniyên ferfûr ketin. Piştî ku Dîno çend parî daqurtandin, Hêlînê berî da bavê xwe û got: “Ma emê hinek xwarin ji Mem re bihêlin?”, Kesbo bi bişirîn got: “Wê xwarin têra Mem bimîne delala min.” Lê Dînoyê ku kêfa wî ji wê axaftinê re nehat got: “Mirî naxwin Hêlîn”, diya wî pêde xeyidî: “Wisa ji xweha xwe re nebêje Dîno.” Dîno cûtina pariyê xwe

rawestand û got: “Mem mir”, û li xweha xwe ya biçûk zivirî û got: “Mem mir, û mirî wek me naxwin Hêlîn.”

Hêlîn wa xuyabû ku gotina birayê xwe bawer kiriye, ewê bi çavên wî yên kesk de nihêrî û got: “Min pariyek nan û sê lib zeytûn vê sibê dane Mem”, Dîno awirên xwe jê dagerandin û li rûyên din nihêrî. Diya wî bi rûkenîn gotê: “Mem gote min ku ew şeva çûyî bi ser te ketiye...”

Du reh bi xurtî di cênîkên Dîno de çeng bûn û çena wî ya jêr hinekî daket û hindik mabû parî ji devê wî biketa, devê xwe girt û serê xwe bi şûn de da û pariyê xwe daqurtand û ji li xweh û diya xwe nihêrî û got: “Ew dixwaze we bi çi iqna bike?”, awirên wî hatin ser bavê wî, ji wî re got: “Ez bawer dikim ku Mem gora xwe aniye malê”, û rabû pêxwas ji odeyê derket.

Çipikên baranê jixwebawer û yekker bûn di barîna xwe de, hindik mabû Dîno bi bazdan hewş qut bikira lê herdu teyrên ku li ber darên kafûrê li dora xwe dizivirîn gavên wî giran kirin, ew hema li ber textê xwe rawestiya û bêdeng li wan nihêrî herdu teyr jî rawestiyan û kumikên xwe raweşandin, yek li yê din zivirî û pirsî: “Ew di çi de difikire?”, yê din got: “Hîç, ew xwe ji firandinê re amade dike” û berî ku erdê du caran nikil bike keniya. Lê teyrê ku pirsa xwe kir dîsa got: “Ew ne bi hewceyî firandinê ye, çima xwe amade dike?”, yê din got: “Ew xwe ji firandinê re amade dike ji ber ku ne bi hewceyî firandinê ye, eynî mîna me”, yê yekem got: “Ma tu henekan dikî? Em du balinde ne, em teyr in...” Yê din ew qut kir û got: “Mebesta min ne firandin e, mebesta min axaftin e. Em ne bi hewceyî vê axaftinê ne û tevî wê jî va ye em diaxivin.” Yê yekem dîsa kumika xwe raweşand û bi nerazîbûn got: “Ev ne cara yekem e ku em diaxivin. Em tim diaxivin”, yê din got: “Lê ne wisa bi dengê bilind”, yê yekem mat ma û got: “çi dengê bilind? Em her car weha diaxivin”, teyrê duyem bi nikilê xwe işaretî Dîno kir û got: “Ew me dibihîze.” Yê yekem mat ma û got: “Kî?” yê duyem got: “Ev xortê xwe ji firandinê re amade dike”, û kenekî dirêj kir

ku pêre teriya wî hejiya û baskên wî li hev ketin. Paşê jî ew li dora hevalê xwe zivirî û got: "Çi perik! Çi perik!", hevalê wî jî vegerand: "Çi perik" û li Dîno nihêrîn, Dîno jî li laşê xwe nihêrî, ji piyên xwe yên xwas heta sînga xwe mîna ku li perikin ji nişkê ve şîn hatibin bigere. Dema ku wan teyran dît ew wisa ye, qêrîna xwe ya bi kêf berdewam kirin: "Çi baskên dirêj. Tu li baskên wî!..." Ewan pê re li milên Dîno dinêrîn, Dîno jî bêhemdê xwe matmayî li milên xwe nihêrî. Matmayîna wî zêde bû dema ku wan teyran bi hev re bangkirin: "Ew bask lê didin. Xort dê bifire..." Dîno herdu milên xwe li sînga xwe dane hev wek ku bi rastî du baskên wî hene û dikin wî bi jor de bifirînin, ew lerizî heta ku çipikên baranê ji pêşenîka wî weşiyan. Teyr firiyan û bi jor ketin, wî dîsa li xwe venêrî berî ku xwarî erdê bibe û perikek ku heriyê li qeraxê wê girtiye rake û berê xwe da odeya xwe, derbas bûyê û şopên lingên bi herî li ber derîzankê û li ser hesîrê hiştin. Ewî yekser çenteyê xwe yê cilan vekir û ew perik avêtê û çente girt û vegerande cihê wî di dolapa biçûk de.

Mezrîban xwe dane pêş, piştî ku Dîno derbasî odeyê bû, şireşira wan bilind bû, bayekî melûl ji derî û pencereyê hat ku bîna avê davête hindir, Dîno rabû pencere girt û derî li halê wî hişt û vegeriya xwe avête ser hesîrê, palgehek xiste bin çengê xwe û kete ramanan. Malbatê jî ji xwe re li dengê baranê guhdarî kirin û ketin xilmaşiya nîvroyê. Lê Hêvîn ne bi wan re bû, strana wê bi dengê baranê re radibû û dadiket. Dîno rabû di cama pencereyê re awirek li xweha xwe ya ku cilên wê yên xakî ku dişibihin cilên leşkeran lê bûn xist, ewê bi bêreke biçûk cihok vedikir, cihokek ku ji ber kewarên mêşan heta herdu darên kafûrê diçû diherikî.

Porê Hêvînê yê tarî şil bûbû û bi aliyekî rûyê wê ve zeliqî bû, carcaran pifî çipikên baranê yên ku li ser bèvila wê diherikîn dikir. Dema ku rawestiya û xwe siparte bêrê û li cihoka ku wê kolaye venerî, baranek sivik bû, ewê rûyê xwe berjor kir û

daxist û li hewşê nerî heta ku awirên wê ketin pencereya Dîno, dît ku wa ye ew li pişt camê ye, di rûyê wî de bişirî û çavek dayê. Ew cara yekem bû ku jê re wisa xuya dikir ciwan û lihevhatî bi wî rûdêmê xwe yê aram, xwest ku wê kêlîkê jê re cigareyekê bipêçe û di nav lêvên wê de bi cî bike çiku destê wê yên şil dê nikaribin cigareyê bigrin. Dîno berî da derîzankê û rawestiya, wî jî çavek da xweha xwe û bişirî, destê xwe dirêjî gelek cihan kir ku av têde kom bûye. Hêvînê milekî xwe bilind kir ku tiştê wê kiriye bes e û zêde ye jî. Lê Dîno tiliya xwe dirêjî ezmanan kir, xweha wî jî li jor nihêrî û vegeriya li wî nihêrî mîna ku mebesta wî fêm nekiribe, ewî bang kir: “Ezman...”, keçikê hinekî li wê valahiya arîrengî a di ser xwe re nihêrî û pirsî: “çi pê hatiye?”, hinekî li hêviya bersiva birayê xwe yê şad ma, birayê wê got: “Bikole da ku av bi ser hewşa mala cîranê me de birjê û em rihet bibin.”

Dîno li hêviyê nema ka bê dê hevoka wî ya henekdar çi ji xweha wî bike, çiku peyva “mala cîranan” ew hişyar kir û wî li dergehê hewşê yê li aliyê rojhilat nihêrî û bi gavin giraan berê xwe dayê, Hêvînê dengê xwe bilind kir: “Cîranan berî me wa kir. Ewan cihokek di ezmên de vekirin û berî dane hewşa me.” Dema ku Dîno gihişte dergehê, ew vekir û berê xwe da mala xwediya sola leşkerî ku dîwarê wê bi dîwarê mala Hemdî ve ye û gelek parçeyê caman ji bo parastina ji dizan li ser in. Dema ku rastî deriyê wan bû heyirî, hindik mabû li xeleka sifir ya mezin bide lê jê vegeriya. Ewî nizanîbû ka dê pirsa çi bike. Hema çû û hat û nerawestiya heta ku dît wa ye xweha wî Hêvîn ji derî bi mereqdariyeke aram lê dinêre, destên xwe hildan wek ku bibêje bes binêre: “Ma tu nabînî ku girtiye?” Û bi hemû laşê xwe zivirî deriyê xwediya sola leşkerî. Xweha wî birhên xwe bi matmayîn hildan û got: “Çima deriyekî girtî te bînteng dike?”, paşê zêde kir: “Ma tu tiştekî ji cîranên me dixwazî?” Ewî bersiva wê bi heyecan da û got: “Eger derî vekirî be minê tiştek bigota”, xweha wî bi serê xwe işaretî derî kir û got: “Lê bide.”

Tevgera Dîno hinekî hêdî bû, di dudiliya xwe de ramiya. Weke ku rêyek dîtibe, bangî xweha xwe kir: "Hêvî were", keçik hat heta ku nêzîkî wî bû, ewî gotê: "Li derî bide", lê wê xwe ragirt û pirsî: "Ma tu kê dixwazî?", ewî got: "Hevala te."

Hêvîn bişirî mîna ku hoyê dudiliya wî naskiribe. Dema ku hat li derî bide işaretî wî kir ku dûr bikeve çiku ne hewce ye ew jî li rex wê be, dibe ku yek ji malbata keçikê derî veke, Dîno işareta xweha xwe pejirand û berî da malê û li ber derî bi rûyekî tijî bi mereq sekinî.

Deqeyek neçû xwediya sola leşkerî derî vekir, herdu keçikan hinekî peyivîn û paşê berê xwe dane Dînoyê ku ziq li xwediya sola leşkerî û rûyê wê û porê wê yê xernûbî yê gijikî û dirêj nihêrî, xweha wî zixtek dayê, dema ku nêzîkî wî bûn, û gotê: "Ma tu wê cara yekem dibînî qey?", ewî çavên xwe hindekê girtin û paşê li çepê xwe li valahiyekê mêze kir û got: "Ew dişibihe me" û vegeriya hewşê û herdu keçik matmayî li pê xwe hiştin. Ewî di cî de berê xwe da odeya malê, hemî ji xew rabûbûn, ew du gavan ber bi bavê xwe de çû, bavê wî qeytanên solên xwe dişidandin da ku derkeve, Dîno bi sarbûn gotê: "Bi rastî ew dişibihe me bavo." Hemdî hinekî rawestiya û bi rûyê kurê xwe de nihêrî, Kesbo ew kêlîk bi dengê xwe birrî: "Kî dişibihe we Dîno?", kurê wê yê ku çavên xwe ji çavên bavê xwe qut nekiribûn, got: "Xweha me ya nû yadê. Keça cîranê me. Hevala Hêvînê", kenekî şêrîn da ser lêvê diya wî û mîna ardekî bi ser hestiyên wî de bariya, diya wî bi peyvin hêdî berdewam kir: "Ma ecêb e? Jixwe dê bişibihe we, ew xweha we ye."

Bi hêdî Dîno xwe ji odeya malê vedizî, awir sar û gav sar ew derket, qet mereq di rûyê wî de nebûn, mîna ku gotinên diya wî yên nediyar di kûraniyên wî de rêyek ji aramiyeke ku mîna kevirekî şûştî dibiriqîne re vekirin. Ku giha odeya xwe derî li xwe girt, dengê gavên bavê wî li ser kevirokên şil dihat ku berê xwe dabû deriyê hewşê û mexazeya xwe ya qumaşan.

Baran bi yekcarî sekinî hingûra wê rojê, ewr belav bûn û şopa desthilatdariya wan nema ji bilî hinek şilayiyê ku erdê dikira ew zuwa bikira. Lê çeqelan zû êrîşî werzan kiribûn û dengê xwe bi qasî ku zengelokên wan ên heywanî dikaribûn xwe bi sihra deng paye bikin, hildabûn, mîna ku deng bersiva Xwedê ye di wan de ji bo her pirsê, madam ku Xwedê bersiva mirovan e ji her pirsê re. Dîno ji odeya xwe ya hîn ku lempeya wê vênexistibû de bi hewesdarî pêşwaziya zûrîna wan heywanokên ku bi dengdana zûrînê serbilind bûn kir, rabû di pencereyê re li hewşê temaşe kir û dît ku siya darên kafûrê, siya kewarên mêşan û siya textên razên yên mezin winda bûye. Bi desthilatdariya şevê re Dîno bi xoyê xwe yê hindirîn re ku şaş nabe berî da cihê çente û bi destikê wî girt, piştî ku bi destê xwe çermê wî yê zivir peland, rakir û derkete derve.

Dînoyê di gumlekê havînî de guh li sermaya li derve nekir, ewî bi bawermendî rêya xwe girt û bi aliyê dergehê hewşê de çû bêyî ku bizivire û li ronahiya tîr a ku ji derî û pencereya odeya malê diherikî biner. Lê dengekî naskirî gavên wî rawestandin, wî li quncikê tarî nihêrî û dît va ye Mem bi giranî nêzîkî wî dibe û dipirse: "Tu dê biçî kû Dîno?", Dîno bersiveke bêwate dayê û got: "Oh... Ev tu yî?", û meşa xwe berdewam kir û derî vekir.

Ku Dîno derkete derve, Mem xwe gihande ber derî û bi pistînî gotê: "Dîno... Dîno", Dîno rawestiya bêyî ku bizivire û bi bêzarî got: "Niha tu çi dixwazî?", Mem bi ahengeke ku lav û xweziyeke veşartî têde bû got: "Ma tu naxwazî guhdariya min bikî?"

"Guhdariya çi bikim? Tiştekî ku ez jê hez nakim diqewime li vir.", Dîno got. Mem bêtir hate nêzîkî wî û got:

– Ev tiştên asayî ne Dîno. Teyê çi bikira ku tu di şûna min de bayî? Teyê çi bigota ku te Mirovê Mezin bidîta her wekî min jî ew dît?"

“Kîjan mirovê mezin?”, Dîno ji cêwiyê xwe pirsî, paşê destê xwe yê rastê hilda bêyî ku bizivire, mîna ku naxwaze tiştekî bibihîze: “Dev ji min û çîrokên xwe berde Mem”, û meşa xwe berdewam kir, Mem bi lav û niyaz bi dû de çû û pirsî:

– Tuyê biçû kû Dîno?

“Ezê biçim Kurdistanê.” Dîno vegerand û nefeseke kûr kişand mîna ku xwe ji zorî û zehmetiyan re amade dike, hindik mabû destê Mem bigihişta milê wî û ew rawestanda dema ku wî ji birayê xwe yê çavkesk pirsî:

– Û tuyê çi bikî ji vî çenteyî?

“Cilên min têde ne” Dîno bersiv da û cêwiyê wî pirsî:

– Bavê te qumaşê ku şandiye Kurdistanê têra ebayekê ji çiyayê Toros re dike, li wir tuyê hinekan bibînî ku ji te re cilan jê bifesilîne.

Dîno gavên xwe berdewam kirin wek ku guhdarî nake, Mem hêrs bû û bang kir: “Çawa tu min bi tenê dihêlî? Min hîn bavê xwe iqna nekiriye.....” Dîno bi hêdî bersiv da: “Jiyan wî hemû li pêşiya te ye Mem. Ecele neke.”

Mem meşa li pê cêwiyê xwe rawestand, ew bi gavin aram di kolanê re diçû, kolana ku bi ser hin sikakan de vedibe ku ew jî di dawiyê de bi ser werzên bakur de vedibin, lê ewî hevoka dawî ku Dîno dikare bibihîze avêt, bi dengekî lerizî got: “Baskên xwe bi kar bîne birayê min. Baskên xwe bi kar bîne”, Dîno lê zivirî, ew cara yekem bû ji dema ku ji hewşa malê derketibû lê dizivirî, bişirîneke ku nedihate dîtin hate ser lêvên wî: “Ne niha Mem” got û dubare kir : “Ne niha”, û kûrtir dawerivî valahiyê, meşiya û kete pêşiya tariyê û tarî kete pêşiya wî.

Bi awayekî ji awayan, hemî axaftinên di malan de, li kolanan, di hindirê kesan de wê êvarê dihatin bihîstin eger kesekî bixwesta guhdariya wan bikira, ji serê bajêr heta dawîya bajêr. Dengê mamosteyan, yên ku li avahiya liqê partiyê di nîvê bajêr de civiya bûn, mesela tev li dengê Şêro Baban ê ku gef li jina xwe dixwar û digot ku ewê bireve Tirkî eger ku patoz di sala bê

de xayintiya wî bikin, dibû. Axaftina Hezîmê lal ya ku li gel xwe dikir û behsa karekî bê barkirina qeşayê dikir tev li axaftina qaymeqamê leşkerî ku ji xwe re behsa maleke bê siya daran dikir dibû. Her weha fîkandina hestiyan li goristana Hilêliyê ku li rojava ye tev li fîkandina hestiyan a goristana Qudûr Beg a li bakurê rojhilat e dibû. Xwediya sola leşkerî jî, dibe ku tekane kes bû ku ji xwe re yan ji kesekî din re tiştek nedigot wê êvarê, çiku ewê hema ji hingura êvarê de di neynikê re li xwe mêze dikir, bêyî ku li muqayeseya di navbera rûdêma xwe û rûdêma kesekî din de bigere, tevî ku peyvên Dîno zingîniyek xerîb di kûraniyên wê de hiştin dema ku ewî got: “Ew dişibihe me.”

Ji 20/2/1988
Heta 3/8/1989

Selîm Berekat, yek ji navdartirîn nivîskarê Kurd yê Erebînivîs e. Ew "Yaşar Kemalê edebiyata Ereban" yan jî wek "mirovê ku hevsarê zimanê Erebî di destê xwe de digire" dihête nasîn. Berhemên wî herçiqas bi Erebî hatibine nivîsîn jî bingeh û xîmên berhemên wî tarîxa Kurdan e. Berekat berhemên xwe digel hişmendiyeke mêjûyî dinivîse û tarîx û çanda Kurdan bi zewqeke edebî vedibêje û pêşkêşê xwendevanê xwe dike.

Nivîskar, di romana xwe ya sêyemîn Perikê de digel rojên ciwaniya xwe yên giran, hestên xwe yên nostaljîk ên derbareyê Kurdistanê -ku ew bîranînên dijwar yên jiyanên miştextîbûnê ne- wekî destaneke ji êş û azaran avvexwarî vedibêje. Di vê romana Bereketî de, Mem xortekî Rojavayî ye û ji bo dîtina mirovekî esrarengîz û mezin radibe diçe Qibrîsê û di rêwîngiya wî xortî ya di navbera rastî û xeyalê de dihê û diçe de jiyana wî gelek caran wekî şexsiyetên Kurd yên tarîxî dibore. Loma jî ew rêwîngiya wî bi têkçûnê dawî dihêt û ji ber wê "têkçûn" jî ji îmajekê zêdetir wek tarîxa Kurdan vedigerîte "çîrok"eke têkçûyî.

Di vê romana wekî çîrokên efsaneyî de, rastî û xeyal û niha û borî bi hostayane têkelê hev dibin. Digel wê, lehengên tarîxî û tebîeta Kurdistanê dihêne ziman û herwisa gava Kurdistan wek welatê xewn û xeyal û bîranînan dihête nasîn, xwendevan jî dibite agahdarê jiyanên nemirên miştextî û sirgûnî.

THG
18837
CYC